**Naverok**

**DESTPÊK** ..............................................................................

**ÇIMA JINEOLOJÎ?** ...........................................................

Ji Bo Gihîştina Raza Jiyanê ................................................
Ji Bo Rast Avakirina Hevjiyana Azad .................................
Ji Bo Ronakbiriya Jinê Ava Bikin .......................................
Ji Bo Teoriyeke Zanînê Ya Digihîne Pêkhatina
Civaka Azad Û Takekesa/ê Azad .......................................
Ji Bo Şoreşa Di Zanistên Civakî De ...................................
Ji Bo Pêşxistina Rêbaza Lêkolîneke Li Gorî Rastiya Jinê ......
Ji Bo "Serhildana Mêtingeha Herî Kevn" Bigihînin Serfiraziyê
Ji Bo Dijderketina Cinsperestiya Ku Bîrdoziyeke
Desthilatiyê Ye Jineolojî .....................................................
Ji Bo Parastineke Cewherî Ya Têk Naçe .............................

**JIN ÇI YE? JINEOLOJÎ ÇI YE?**

Bi Zimanên Cuda Jin ......................................................
Rêwîtiya Ber Bixwe Ve ....................................................
Kolaneke Arkeolojîk: Di 9 hezar salan de 9 tebeqe ...........
Sê Tebeqeyên Destpêkê: Çaxê Xwedavendan ..................
Tebeqeya Çaremîn: Lîlîth ................................................
Tebeqeya Pêncemîn: Xanima Parsûyê ............................
Tebeqeya Şeşemîn; Xwedavendên Bi Destê Mêr Hatine
Çêkirin ..........................................................................
Tebeqeya Heftemîn: Demarên Berxwedêr ên
Xwedavendê-Keybanû .....................................................
Tebeqeya Heştemîn: Jina Hezret .....................................
Tebeqeya Nehemîn: Keybanûya Metayan ........................
Bı Jineolojiyê „Xwebûn" ...................................................
Zanista Jinê: Jineolojî ......................................................

**JINEOLOJIYA KU JI CÊRIBANDINA ME YA LÊGERÎNA JIYANA WATEDAR DIHERIKE**

**RÊNÎŞÊN ÇALAKIYÊN JINEOLOJIYÊ**

ETÎK Û ESTETÎK ...........................................................
ABORÎ ..........................................................................
DEMOGRAFYA ..............................................................
EKOLOJÎ ......................................................................
DÎROK ..........................................................................
TENDIRUSTÎ ..................................................................
PERWERDE ...................................................................
POLÎTÎKA .....................................................................
ENCAM .........................................................................
ÇAVKANÎ ......................................................................

**DESTPÊK**

Bi hezaran sal berê dapîrên me di nav şert û mercên dijwar de şoreşa gund bi ser xistin ku vê şoreşê mohra xwe li dîroka mirovatiyê dabû û bi vî hawî jî berdewamî, hebûn û jiyana mirovatiyê misoger kiribûn. Em nevîyên wan jî bi derfetên bêhempa yên di destê me de jineolojiyê pêş dixînin. Hiş û rihê xwe , hêza hest û fikrê xwe, mirovatî û jinaniya xwe li ser rîşeyên xwe ji nû ve şîn dikin. Rojhilata Navîn ku li dorhêla jinê jiyanan afirandiye, derketina ramana jineolojiye li ser vê axê bi van kokan ve giredayî ye. Ev axa qedîm hemû destpêkên pozîtîf yên jinê dihewîne. Dîsa her ew axe ku bêsiûdiya hemû destpêkên  negatîf ên ku li ser jinê qewimîne jî dihewîne.

Yekem warên ku jinê li ser textê xwedavendiyê runiştandiye jî ev war in û her ew war in ku yekem car jinê ji textê xwedavendiyê dûrxistine. Jinê li van deran civak-hiqûqa ku navenda wê dayike pêşxistiye. Dîsa li van deran ji hêla pergala baviksalarî ve yekem car lêdan û binketinê jiyaye. Mîtolojî, ol, felsefe û zanist xwedî gelek daneyane ku vê rastiyê piştrast dikin. Rojhilata Navîn şahidiya jinê kir ku di navbera du çeman de jiyanê avakir; her wiha şahidiya jina ku bi destê kurê xwe hatiye qetilkirin û parçebûyî jî kir ku ji termê wê erd û ezman û ji hêsrên çavê wê Dîcle û Firat ava bûye. Jinan li vê cografyayê bi deh hezaran sal li ser textê Xwedavediyê rûniştin. Ev pênc hezar sal in jî di bin

lingên hemû ew kesên çûne ser text de yên yekem candayî jî ew in. Lê wê demara berxwedêr, zîndewer û bi hezkirineke azad lê dide ji dest nedan. Jineolojî bi vê demara berxwedêr pêş dikeve.

Em hemû nîvcomayiyên vê serpêhatiya jinê, serketin û binketinên wê, her rewşa wê ya rûhî, nasnameyên jinê yên ku jiyane, yên heyî û yên divê bên avakirinê, hebûn û têkoşîna jinê çendîn lêkolîn bikin û fêhm bikin, wê ev demarên berxwedêr jî bêtir xwirt û zêde bibin. Rojhilata Navîn bi trajediyên civakî yên bi keda mezin a jinê hatiye avakirin, dagirtiye. Li ser vê axê li hemberî îdeolojiya cînsîyetparêziya civakî nîqaşkirina jineolojiyê wek pêkhateya dijderketinekê, bi awayekî eşkere hêza civakîbûnê ya navend jinê îspat dike.

Li gorî lêkolînên zanistî yên heta niha serpêhatiya civakîbûnê heft mîlyon sal berê li xetta Rifta Rojhilatê Efrîqyayê destpêkiriye û pêncî hezar sal berê jî ji ser kevana Toros-Zagrosê li ser rûyê dinyayê belav bûye; di vê serpêhatiyê de jin bûn hêmanên herî xwirt ên seretaya jiyanê, diyarde û rê dide ber. Di têkoşîna hebûn û tunebûna yekemîn komên mirovan de, jinan bi hişmendiyeke nazenîn, bi sebir û berxwedêriyê, bi dil û rihekî bi şewqat, di nav hemû şert û mercan de ji bo civakên di nav de dijîn, her dem bûn hêza bingehîn a jiyanê. Ji ber vê pîrozî bûn. Di gelek hêlên jiyanê de ji ber bi hêzbûna xuliqdarî,hişmendî û keda jinê xwirt bû, bi xwe re gelek berhemdarî û zêdekirina nirxên madî û manewî anî. Jinan li ser vê zêdahiyê teknîk, zanist, wêje, huner, ol û fikra qonaxa neolîtîkê ava kirin û pêşxistin. Ji her kêlî û pêdiviya jiyanê re çareseriyên şoreşane peyda kirin. Zehmetiyên ku zorê didin hebûna civakê û ew diçewisînin, bi dil û mêjiyê jinê beralî kirin. Li Rojhilata Navîn jiyana civakî bi karakterê exlaqî û polîtîk rîşeyê xwe berda, pêşket û berfireh bû.

Di mîteolojiya Sumeran de ew 104 Me'yên Înannayê ku tê gotin, di cewherê xwe de hemû zanist û teknolojiya qonaxa Neolîtîkê ne. Çand, huner û felsefeya wê demê ne. Amûrên şaristaniyê ne. Bi zanista dayika xwedavend û bi taybetmendiyên xwirt yên bêhejmar ava bûne. Zanista jineolojiyê di roja me ya îro de wê bibe ji nu ve vejînkirina zanîna dayika xwedavend. Ev zanist wê bibe xwe gihandina zanista ku Rêber Abullah Öcalan dibêje; ' Li Rojhilata Navîn zanyariyên xwedavend ên nûbûyî...'

Ji saziyên civakî bigre heta rêzik, teknîk û hunerê 104 Me'yên ku bi hemû qadên jiyanê re têkildare, her wiha sedema şerê di navbera Xwedavend Înanna û Xweda Enkî ye, Jineolojî zanista xwedî wê iddîayê ye ku bi serfirazî vî şerî bigihîne encamê. Wê bibe ew zanista ku ji nu ve ew Me'yên jê hatiye dizîn, yanî ' teknolojiya neolîtîkê ku li derdora jinê bi rêxistin bûye' (1) bi dest bixe û nûjen bike.

Rojhilata Navîn yekem ew cîh û ware ku çanda xwedawendiyê lê ava bûye û dîsa yekem ew cîh û ware ku li ser asasê înkar, qetilkirin û biyanîkirina jinê hilweşandina heman çandê lê qewimiye. Bi vê hilweşandinê pirsgirêka jinê derketiye holê ku em dikarin bêjin yekem pirsgirêka civakî ye. Jineolojî ew zaniste ku xwedî îddîaya peydakirin û pêşxistina çareseriya yekem pirsgirêka civakî ye. Ji bo vê wê derbarê hemû diyardeyên bi jinê re têkildare , derbarên

pirsgirêkên têkiliyên jin û mêr de wê li bersivên bingehîn ên azad û wekhev bigere, jin û mêrantiya ku hatiye çêkirin, têgihiştinên heyî yên cinsiyetparêz ên çor û li gorî kevneşopiyê, wê analîzên zanistî pêk bîne. Bi hebûniya mirovî yên jin û mêr wê li rê û rêbazên ku ber bi azadiyê ve dibe, pêş bixîne. Jineolojî ew zaniste ku bi vê îddîayê radibe.

Zanist û teknolojî, çand, huner,raman, ol û gelek sazîbûnên ku di dema Neolîtîkê de li dorhêla jinê bi rêxistin bibûn, bi hemleyên 'mêrê serwer û xasûk'(2) hilweşiyan. Ev 'zilamê serwer û xasûk' hemû palpiştên saziyên madî-manewî yên jiyana civakî ku li dorhêla jinê pêşketibû bi ser hev de hilweşand, reş kir, ji bîreweriya civakê bir û xwe bi rêxistin kir. Bi aqilê ku pêşxist, li gorî baviksalarî, dewlet û hemû zanînên desthiatdariyê mîtolojî, ol, felsefe û zanistê ava kir.Lanetê li hemû pîroziyên jiyana civakî yên li dorhêla jinê ava bûyî anî. Tevahî nirx û danehevên rabirduyê dizî, ji cewher kir, veguhest û pîroziyên xwe ava kir. Li gorî qonaxên dîrokî ev pîrozî diguherîn. Lê rêzika vê pêkhateyê qet nediguherî; jin divê bi tu awayî ne ji serfiraziyên madî û ne jî ji yên manewî carekedin sudê wernegirta. Hemû kodên heyî, eyarên zirav û propagandeyan li gorî vê pêkhatibûn. Ew jiyana bihuştî ya li dorhêla jinê pêşketibû diviyabû ji bîreweriya mirovan derbiketa. Diviya bû bibîr nehata ku demekê Serdema Xwedawenda hebû. Divê ew pergala civakî tu carî bi bîr nehata ku jinan ew xuliqandibû û bi rê ve biribû.

Aqilê mêr ê serwer di vê maweya pênc hezar salî de bê navber ji bo vê yekê xebitî, dixebite. Mirov ji aqilê bi vî hawî kar dike ne bi hêviye ku ne di qadên jiyana civakî de û ne jî di saziyên fikrî de wê hebûna jinê nas bike, pênase bike, bibîne û nirxekê bidê. Ji xwe wisa bû û wisa dibe jî. Ma gelo hebûneke ku ji hêla mîtolojî, felsefe û olan ve hatiye lanet kirin û weke hevala şeytên tê dîtin, zanista ku objektîvîzm û pozîtîvîzmê mîna fermana xweda dihesibîne dikare cîh bide wê? Na! Di encam de ne da jî. Hebûna jinê, nasname, têkoşîn, çalakî, serhildan, vedîtin û keşfên jinê ji hêla alema zanistê ve ji nedîtî ve hate dîtin û ev nedîtîbûn hê jî berdewam e. Di vê qadê de keda jinê ya aşkere û veşarî hat înkarkirin û ev înkar hê berdewam e. Ji ber vê yekê zanistên civakî,civaknasî,  xwezaya jinê ku di xwezaya civakî de xwedî beşeke grîng e, heta roja me ya îro hêjayî lêkolînkirinê nedît. Di disîplînên zanistê yên cuda de nîv nîvçe, bi ramanên çewt derbarê jinê de hin lêkolîn û tez pêşketibin jî, zanist, jinê wek hebûnekê bi awayekî giştî negirtiye dest. Ji bo vê jî bi senteza jîrekiya analîtîk û hestiyar nêzîkbûna qada zanistê, îdîa û hedefa Jineolojiyê ye. Wê bi zanistî hebûna jinê bigire dest û dest pê bike. Jineolojî bi rexneya ku ev çend sal in zanista civakî çima weke disiplînekê zanista jinê ne fikiriye û pêşnexistiye, derdiçe. Jina ku cewhera xwezaya civakî ye, jina ku xuliqdara civakê ye çima bi qasî beşên sosyolojiyê yên din di nav sosyolojiyê de cihê xwe nagre, dide ber lêpirsînê û pêş dikeve. Jineolojî ew zaniste ku dizane jin her çend hêmanê esasî yê civakê be jî çima nebûye mijara lêkolîna zanistên civakî ku  ev yek encama rastiya pergala li gorî aqlê mêr ên serwer e. Ew zaniste ku li gorî zanebûna vê rastiyê armancên xwe lêkolîn û lêhûrbûnên xwe diyar dike.

Her zanist û ramanên nû yên pêş dikevin, pêhisandina rihê demê jî bi xwe re tînin. Jineolojî ku zanista qirna 21.ê ye, wê pêhisandina rihê şoreşa jinê bi

xwe re bîne. Him wê rê li ber şoreşa jinê veke û xwedî bike û him jî wê ji vê şoreşê bi bandor bibe, jê xwedî bibe.(jê hêz bigre) Kapîtalizm bi fermana ‘Destpêkê li jinan bidin’(3) dixwaze Sedsala 21ê bi kuştinên jinan ve girê bide, Rêber Abdullah Öcalan bi bangawaziya ‘Destpêkê jinan rizgar bikin’ vê sedsalê bi vejînkirina wicdan, bi jiyanên jinê ve girê dide. Jineolojî wê bi vî wicdanî pêş bikeve. Bi gotina Rêber Abdullah Öcalan; ‘Tevgera jinê tevgera sedsala 21ê ye. Tevgera jinê mijara sedsala 21ê ye. Heke mirovatî ji îro û pê ve derçûneke grîng pêk bîne, wê di kurahiya jinê de vê derçûnê bi dest bixe. Di roja me ya îro de, Sedsala 21. ferz dike ku pêşekî ji şoreşa jinê re bê dayîn. Drûşmeya; ‘An jiyan an barbarî’ vê şoreşê ferz dike.Çawa ku pêdiviya civaka Rojhilata Navîn bi şoreşeke dûwem a gund û çandîniyê heye, di heman demê de pêdivî bi duwem soreşa jinê jî heye.’ Her du ‘pêdivî’ him sedemên derçûna jineolojiyê ne û him jî çavkaniyên bingehîn in ku jineolojî wê li ser vê bingehê xwe xwedî bike û pêş bikeve. Pêşketina jineolojiyê wê di ruhê serdema şoreşa jinê de bê neqişandin. Pêşketina jineolojiyê wê rê li ber duwem şoreşa gund-çandiniyê û dûwem şoreşa jinê re veke ku pêdiviya civakê bi van her du şoreşan heye. Di heman demê de pêşketinên şoreşa gund-çandiniyê û şoreşa jinê jî wê lezê bide pêşketina jineolojiyê.

Di derçûna jineolojiyê de gelek çavkaniyên bingehîn hene. Zanista dîrokê ya di bin banê jineolojiyê de wê van hemû çavkaniyan bigre dest û analîz bike. Yek ji van çavkaniyan heke çanda xwedavenda dayik a li ser axa ku em jiyan dikin be, çavkaniya din jî berxwedaniya jinê ye ku piştî hilweşandina xwedaventiya dayik, hin caran weke takekes hin caran jî bi rêxistin pêşketiye. Ji bo dîroka nêz jî tevgerên femînîst, jinên berxwedêr yên di têkoşînên rizgariya netewî de cihê xwe girtine, jinên gerîlla, rêxistinên jinan û nasnameyên jinê ku di tevgerênmuxalîf ên civakî de cihê xwe girtine ji van çavkaniyan in. Ew nirxên azadîxwaz û berxwedêr in ku jinên cîhanê ew xuliqandine.

Bingeheke din a girîng ku Jineolojî li serê pêşketiye, hêz dayê û jê hêz girtiye; Şoreşa Azadiya Kurdistanê ye ku hê ji destpêkê ve di rengê (di kirasê) şoreşa jinê de ye. Li gorî rîşeyên dîrokî zanista jinê li ser vê erdnîgariyê pêşketiye. Di dîroka nêz de, di şoreşa Kurdistanê de, di cewherê xwe de mîna şoreşa di nav şoreşê de, merhaleyên pêşketina tevgera jinê rû dane. Xebata Jineolojîyê van merhaleyên pêşketinê yê ku tevgera me dijî û her wiha ew merhaleyên nû yên tevgera me xwe gihandiye, muxatabê xwe dibîne û hatiye pêşniyarkirinê. Em jin ji dawiya salên 1970an heta serê salên 1990î bi danehevên cewherî û çendahî bi herîkîna jinane di şoreşa Kurdistanê de me cihê xwe girtiye. Di sala 1987an de **YJWK** (Yekîtiya Jinên Welatparêzên Kurdistan), ji sala 1993an û pê ve **artêşbûna jinê**, di sala 1995an de **YAJK**, di sala 1996an de **Teoriya Qutbûnê**, 1998an de **Îdeolojiya Rizgariya Jinê, Projeya Jiyana Azad û Veguhestina Zilam**, di 1999an de **ceribandina partîbûyînê**, di salên 2000an de **ceribandinên Peymana Civakî û Konfederalîzma Jinê** pêş ketin. Em ew tevgera azadiya jinê ne ku me pêvajoyên şoreşane jiyan kiriye û azadiyê di ruhê demê de neqişandiye.

Jineolojî van pêvajoyên şoreşgerane ji bo xwe dike bingeh û pêş dikeve. Felsefeya xwe ya zanînê li ser danehev û nirxên van pêvajoyan ava dike. Em

jin bi tecrubeyên dehan salan ên di nav şert û mercên giran ên ku di şer de bi ser hev de anîne, di derbarê her qada jiyanê de xwedî tecrube û dewlemendiyên bêhempa ne. Jineolojî ji tecrubeyên me yên têkoşîna sî salî dadiwerive. Jineolojî ku wê bibe palpişta sazîbûna jinê, pênaseya giştî ya nirx û wateyên me ye û wê weke zanisteke civakî ya li dorhêla jinê pêş bikeve.

Jineolojî, bi îdîaya derxistina dînamîkên civakî û bi rola neqişandina ruhê demê radibe. Bêyî ku civakê kategorîze bike, armanca wê ewe ku bi têgihiştineke şoreşgerane xizmetê ji dînamîkên xwe re bike. Pê bawere ku jin di nav tevna civakeke wiha de bi awayekî azad dikarin biryar bidin bê wê çawa bin û çawa bijîn. Ji bo pêşketina kes û civakeke azad, armanca Jineolojiyê ewe ku bi nêrîn û feraseteke jinane,nirxên ku di tevahiya têkoşîna jinan ên di hemû beşên civakê de kom bûne, tecrube, serpêhatî, tengavbûn û potansiyela dînamîkên pêşketinê ji nû ve şîrove bike. Neqişkirina van xezîneyên me yên jinane yên pêhempa ku di vê qadê de kom bûne, ji ruhê Sedsala 21ê re, bawer dike ku wê bi şoreşa jinê re pêngavên dêwasa bide avêtin.

Dema nivîs û gotin bi dil û aqlê jinê ve bê rapêçandin, wê ruhê dema ku jiyan dike vebêje. Nexwe beriya her tiştî divê em dîroka ku tê de ne bi wate bikin. Divê em karakterê Sedsala 21ê li ber çavan bigrin û li gorî vê bipirsin bê; Çima Jineolojî? Heke em ji Rojhilata Navîn a Sedsala 21., ji Kurdan, ji jinên vê erdnîgariyê, ji êşên wan ên ku di roja me ya îro de jiyan dikin, ji bedewî û ji berxwedêriyê cuda bikin, wê tu nirxeke jiyanî ya Jineolojiyê nemîne. Ji xwe heke ev berxwedêriya ku rojane pêk tê nebûya, wê xebata Jineolojiyê jî pêş neketa. Ev qonaxa ku Jineolojî xwe gihandiyê, beriya her tiştî di encama keda mezin a şehîdên leheng pêk hatiye ku li hemberî hebûna kurdan êrişên xwedî planên navnetewî yên hovane sekinandin û derfetê xebatê ji bo me afirandin. Her wiha ji zindanan, ji her herêma qadên Parastina Rewa û ji qadên xebatên civakî, heval nêrîn û pêşniyarên xwe gihandin. Wekî din alîkariya ramanên hevalên ku tevlî nîqaşên dibistan û akademiya bûne jî heye.

Jineolojî ku li ser berxwedan, danehev û hewldanan pêş dikeve; ji bo watedayîna jiyanê, pêkanîna zanistê û afirandina çareseriyên bingehîn divê ji kêli'ya ku tê de ye dest pê bike. 'Ez dizanim ku dahatû ji niha derbas dibe, yê ku niha analîz û çareser neke ez ne bawerim ku wê dahatuyek jê re hebe.' Divê vê baweriya Rêber Abdullah Öcalan di dilê xwe de rapêçe û bi vî hawî pêş bikeve. Heke Jineolojî dest bide her qad û her kêli'ya xitimî, dikare bibe derçûnek.

Li ser van hemû bingehan heke em bi nirxînin Jineolojî ku me weke zanista jinê pênase kir çi ye? Çi dike?Armancên wê çi ne?Çawa dixebite? Rê û rêbaz an go rêbazên wê çi û çawa ne?Felsefeya Jineolojiyê ya zanist, hebûn û etîk-estetîk çi ye? Kîjan beşên civakê ji pêşxistina Jineolojiyê berpirsiyar in? Jineolojî wê teoriyên zanistê yên heyî li gorî çi ji hev bineqîne, wê yên çawa bipejirîne û yên çawa, bi çi hawî red bike? Wê di jiyana civakî de Jineolojî beranberî çi be? Wê bi çi hawî bandorê li ser jiyana jin, zilam, zarok, kal û pîr û zîndewerên din ên di xwezayê de bike?

Dema ku em nirxandinên Rêber Abdullah Öcalan ên derbarê Jineolojiyê de

lêkolîn dikin, em digihîjin wateyên epîstemolojîk, îdeolojîk, felsefî û zanistî. Li gorî van wateyan em dikarin pênaseyên cuda ji bo Jineolojiyê pêş bixînin. Jineolojî di cewherê xwe de zanista jinê ye. Di heman demê de zanista jiyan û civakê ye, zanista hevjiyana azad e, zanista jinê yê moderníteya demokratîk e. Ew zanist e ku JIN û JIYAN, çawa, li ku derê, çima, bi çi û bi destê kê ji jin û ji jiyanê hate dûrxistin, derxistin; teyisandina li ser civakê lêkolîn dike; her wiha ew zaniste ku jin û jiyanê bi wateya xwe ve yanî bi jiyan û jinbûnê re digihîne hev.

Jineolojî li hemberî hemû îdeolojiyên deshilatdar ên li ser cinsparêziya civakî avabûyî, dijderçûnekê îfade dike. ‘ Dibe ku maneya jinbûnê, mirova herî zêde di zor û zehmetiyê de be.’ Ki dikare ji jinên ku bi destê mirovên xwe yên herî nêz ve tên kuştin, pêrgî tecawuzê dibin, ji hêla çeteyên herî bi rêxistin yên moderníteya kapîtalîst ve tên revandin û di bazarên koleyan de tên firotin, dema ku li sikakan dimeşin him bi gotin û him jî fîîlî pêrgî tacîzan dibin, li kargehan hêza kar ê erzan in û li nav malê jî keda wan tê mêtin, bêtir vê gotinê fêhm bike û di dilê xwe de hîs bike? Kî dikare ji jinên gerîlla ku li hemberî rûyê herî dijwar ên şer û ji jinên ku di zindan û li meydanan berxwe didin, bêtir vê gotinê baş fêhm bike? Moderníteya Kapîtalîst bi xistina jinê ya zorê, qira civakê tîne. Bi vê qirkirinê, civakê li qeraxa tunebûn, întîxar û dînbûnê re dibe û tîne. Jineolojî bi rawestandina qirkirina civak û jinê, bi daketina çavkaniyên wê, bi analîzkirin û bi aqlê jinê bi bihûrandina ji vê yekê pêş dikeve. Ew zaniste ku yên di herî zor û zehmetiyê de vediguhêse yên herî azad.

Rêber Abdullah Öcalan Jineolojiyê ji me jinan re di demeke çawa de pêşniyar kiribû?Rêber Abdullah Öcalan heta roja me ya îro bi israr dibêje; ‘Jineolojî dikare bibe derçûneke bingehîn.’ Gelo vê pêşbiniya derçûnê ji çi, ji ku derê, çima, bi çi,çawa, bi kîjan amûran û bi kê re dibîne û pêşniyar dike?

Jineolojî beriya her tiştî wê bibe zanista bihûrandina jiyana civakî ya ku xitimiye û navend deshilatdar e. Yanî wê tedawî, sererastkirin û paqijkirina her tiştên ku heqîqeta jiyana civakî xwîni dikin texrîp û qirêj dikin, dike armanca xwe. Ji ber vê yekê, em weke gava destpêkirinê niyet bi Jineolojiyê dikin, carîkirineke ruhî û zihnî, weke şêmûka vê zanistê dizanin. Di kîmyayê de şêmûkên enerjiyê hene. Hin element heke ji van şêmûkan derbas nebin, nikarin bigihîjin hev û molekulekê ava bikin, an jî nikarin ji hev bibin û veguhezin elementekê. Ji bo me jî ev qanûn bi vî hawî derbasdar e; em jin jî hê di destpêka vê zanistê de heke niyet bi paqijbûna ji qirêjiya desthilatdar û serweriyê nekin, emê ji vê şêmûka zanistê derbas nebin.Emê her tim di asta destpêkê de , di asta lêkolînê de û di asta amadekariyê de bimînin. Pêşdeçûn ji şêmûka enerjiyê derbasbûne, ji bo vê jî paqijbûn şert e.

Aqlê mirovan, bi taybetî jî aqlê jinê heke bi hêrsa deshilatdariyê xera bûbe, her roj qiyamet e. Qiyamet e ji ber ku aqlê bi hêrsa deshilatdariyê xera bûbe; sehek, hizir û hestan jî qetil dike. Qiyamete ji ber ku ev hêrs çavên li jiyanê, gel, mirov, jin, zarok û li kalan dinê re xera dike. Tişta heyî, ya aşkere xuya dike an şêlo dibîne an jî nabîne. Qalibên jiyanê mehkûmê mutlaqan e. Weke înyat li hemberî ewên mutlaqan ferz dikin, Jineolojî mîna hîsa navê romanekê

ye; ‘Hezar Rojên Muhteşem’ (5)…Bê hejmar ew fikrên bi ronî, çalakî û rêgeha ronak ku wê jiyanê ronî bikin! Rêbazên ronî yên bê hejmar û pêkanîn. Jinên ku şewqê didin, dibiriqin, jiyan û mirov. Ev jî encax heke aqlê jinê ji deshilatdariyê, ji hemû îdeolojiyên deshilatdariyê û ji hemû qalibên fikrî yên ku di bin bandora wan de ye azad bibe, mumkine. Jineolojî ew zaniste ku bi jiyanîkirina vê îdîayê pêş dikeve.

Di parêznameya Rêber Abdullah Öcalan a bi navê **Bihurandina ji Pirsgirêkên Modernîteya Kapîtalîst û Modernîteya Demokratîk** de pênaseya sosyolojiya azadiyê em dikarin weke perspektîfeke bingehîn ji bo Jineolojiyê bigrin dest; ‘sosyolojiya ji alî civakî ve mijara dema kin a herî kin a afirandinê digire dest, divê mirov jêre navekî bifikire. Pêşniyara min a şexsî ew e ku mirov ji bo sosyolojiya bûyerên civakî di ‘kêliya afirandinê’ de digire dest bibêje ‘sosyolojiya azadiyê’ wê li cih be. Ya hînê girîngtir, bi saya civakbûnê mirov gihişt qabîliyeteke bê hemta û zêhna wî ya nerm rê li ber afirandineke nedîtî vekir. Ji lewra ez yeqîn dikim ku ev sosyolojiya em hinekî weke sosyolojiya zêhnî dibînin û dikarin weke sosyolojiya azadiyê bi nav dikin, gelekî hewcedarî pê heye. Îrade û fikra azadiyê divê yek ji mijarên sereke yên lêkolîna wê be. Jixwe pêşketina di dema kêliya afirandinê de pêşketinek e ku aliyê wê yê azadiyê heye. Ev kêliya herî kin ‘kêliya kûantûm’ û ‘neqeba kaosê’ dikare her weha weke Sosyolojiya Afirandinê jî were binavkirin. Ji ber ku ev Sosyolojiya Afirandinê herî zêde qada civakî digire nava xwe, ango zêdetir pêre eleqedar dibe, “Sosyolojiya Azadiyê” dibe yek ji mijarên divê herî zêde were pêşdebirin.’

Di serpêhatiya pêkhateya jinê de, di çîroka pêkhateya nasnameya jinê de, emê wê kêliya kaosê ya herî kin, kêli’yan,  kêliya kaosê çawa bizanibin? Emê ‘Îrade û fikrê azadiyê’ çawa lêkolîn bikin? Pêdiviya nirxandina ‘xulikdarî-zîhniyet-sosyolojiya azadiyê’’ ku di nasnameya jinê de cihê xwe digrin ji çi tê û têkiliyên vê bi kêliyên xulikdariyê re çi ne? Di vê qirna em tê de derbas dibin de ma ev ne pirsên di cihê xwe de ne? Bi taybetî jî hovitiya di vê demê de ku li hemberî Tevgera Azadiya Kurdistanê, li erdnîgarî û mîlîtanên wê û li hemberî jinên ji Rojhilata Navîn ên çanda xwedavendiyê afirandine û nasnameyên gelan li bazaran mîna kole kirîn û firotinê ferz dikin re rû bi rû ne!Ma hemû şaneyên jiyanê banga zanista jinê, hizra jinê, hesta jinê, aqil, dil û destê xwedavenda bi merhamet nake? Li vê erdnîgariya ku jiyan heta şaneyên xwe hatiye qetilkirin de ma gelo êdî ne dema zengilê zanista jiyanê, zanista jiyana civakê, kêliya xulikdariya zanista jinê ye ku lê bide?

Tevgera me xwedî wê rûmetê ye ku li ser navê jinê, civakê, jiyanê yên ew kêliyên xuliqdariyê ne, temsîliyeta cepheya berxwedanê bike. Ji hemû dinê re îspat kir ku hêza wê ya parastina kêliyên ‘jiyanê’ heye, bêyî ku teslîmê rûyê mirinê yê herî hov û dirinde be. Car din nîşan da ku ev ax warên xwedavenda ye û wê her tim wisa bimîne. Ji ber vê li gorî rewşa niha yê ku herî zêde nêzî kêli û kêli’yên xulikdariya zanista jinê  ye û berpirsê pêkanîna derçûna ye, tevgera me bi xwe ye. Ji bo me bersiva pirsa ‘Çi ye Jineolojî?’ ev e; Kombûna tevahiya kêli’yên xulikdarî, azadî û jiyanê ye. Ji bo vê divê mirov amûrên zanist, felsefî û çalakiyê yên ku potansiyela me ya îfadekirinê ne, peyda bike. Di nasname û di kesayeta xwe de pêkanîna îrade û fikrandina azadiyê ye.

Bi bersiyar pêkanîn û pêşxistina sosyolojî, zanista civakî û hunera vê ye. Heke em vê bi ser nexin, ji herikbariyê wêdetir, wê kêliyên  qutbûyî rû bidin û emê jî mehkûmê wan kêliyan bibin, her wiha bibin destikê yên din ku li ser wan kêli'yan siyaset û jiyanê bi rêxistin dikin. Ji bo ku em kêli'yên xwe yên azad veguhêsin jiyanên xwe yên azad divê em xwedî heqîqeta xwe bin, yanî divê em xwedî ziman bin. Yanî divê em di wan kêli'yan de azad bibin, ji potansiyelbûnê xwe derxînin. Em dikarin derçûna di vê hevokê de ku dibêje; 'Jineolojî dikare bibe derçûneke bingehîn.' (6) bi vî hawî fêhm bikin. Jineolojî ew zaniste ku azadiya di kêli'yê de li jiyanê belav dike, diherikîne jiyanê, di jiyanê de berdewamiyê pêk tîne û bi teoriya zanist û rêxistinê re bi sîstem dike û dihone. Jineolojî heqîqeta hêza me ya potansiyel e. Çawa? Bersiva vê pirsê feraseta jiyanê, terz û pratîka wê ye. Em kilîl û deriyên wê di pêkhatina hemû têkoşînên di oxira azadiyê de, di teoriyên zanist û ramanê de, di jiyanê de, di tecrubeyên bêhempa yên jinên cihanê yên derbarê jiyanê de, di hemû tecrubeyên civakî de, di xwezayê de û di analîzên van tecrubeyan de dibînin.

Bi potansiyela watedayîn û nirxên ku di nasnameya jinê de ne, ew hêza me heye ku ne tenê xwe, em dikarin hemû dinyayê û mirovatiyê jî ber bi rizgarîbûnê ve bibin. Ji bo vê  ne ku di kêlî û demên diyarkirî de û ji ber naçariyê, pêwistiya me bi sîstematîzekirin û terzê jiyaneke herikbar heye. Jineolojî wê şêwazên vê pêdiviya me pêş bixîne. Li ser vê bingehê pênaseyeke cuda ya Jineolojiyê jî ev e; bi ziman û heqîqetbûna wate û enerjiya potansiyel a jinê ye. Jineolojî bi zimanbûna jiyana jinê, jiyana civakî, nasnameya jinê û potansiyela derbarê têkiliyên di navbera jin û mêr de ye, yanî heqîqetbûna wan e. Bi qasî wate û danehevên bi sedan sal ên ji nav tevgerên azadiya jinê kom bûne, bi zimanbûn û heqîqetbûna wate û potansiyela jinane ye ku bi hezaran sal ji van tevgeran re palpiştiyê kiriye. Derçûna ji koletiyê ye, azadî ye. Tevgera me jî di hin aliyan de, wate û potansiyelê veguhestiye heqîqetbûnê. Herî dawî berxwedana me ya bêhempa ya li Rojava, ji bo vê mînakeke grîng e.Lê ji bo ku ev di tevahiya jiyanê de, di tevahiya civakê de û di tevahiya kesayeta me de xwe bi cîh bike, pêdivî bi zanist, zanyarî û felsefeyeke bêtir xurtbûyî re heye.

Êdî feraseta zanista xwedî karakterê baviksalarî ku ji her hêlê ve deşîfre bûye û her wiha li ser pênaseyên jin ên ol, huner, felsefeyê jî divê bê sekinandin. Di roja me ya îro de di bingehê pirsgirêkên gran ên civakî de, pênaseyên jin ên zanist, felsefe, ol,huner û feraseta jiyanê ya li ser van pênaseyan pêş ketiye, heye.Li ser vî asasî Jineolojî çavkaniyên pirsgirêkên civakî jî, çareseriyan jî, di pênaseya jinê de û di çarçoveya rola wê ya di jiyanê de esas digre. Yanî ne ew zaniste ku tenê di lehê jinan de, yê ku jinê weke cinsekê digre dest û lêkolîn dike an jî ji bo wan zanist di afirîne. Li ser rastiya ku divê her zanistek civakî be, em bawerin ev civakîbûn di dîrokê de û di roja me ya îro de divê li derdora jinê şêwazê xwe bigre.

**ÇIMA JINEOLOJÎ**

Li dijberî çi û çima Jineolojî? Jineolojî gelo pêwistiyeke? Zanista pozîtîvîst ku ev çend zihnên seqet û parçekerî diafrîne û encama zihnên seqet e, gelo bi pêveka 'Jin'ê, 'lojî' yeke 'nû', bi rastî jî wê bibe zêdahiyek ji jiyanê re? Li pêşberî me goristaneke berfireh ê pratîkên alema akademîk, zanista pozîtîvîst, qadên zanistê yên parçekirî û teoriyên cuda heye ku em bi vê bawer bikin. Tunebûn û tunekiriyên ku dema meriv li wan dinê re, hindirê me dicemidîne û ji mirovatiya xwe şerm dike hene, kirêtbûn û ji rê derketin hene.Nexasim jî li ser zemîna modernîteya kapîtalîst. Ew modernîteya ku hêza xwe ya esasî ji 'utopyaya sosyalîst jî di nav de, hemû utopyayan di nav lîberalîzma xwe de dixeniqîne.' digre.

Bi rastî jî di roja me ya îro de erkeka lojî'yan heye? Bi taybetî jî ji bo jinan ku di her kêliya jiyanê de tên qetilkirin û îhtîmalên cur be cur ên qetilbûnê dijîn. 'Em li vir şoreşê pêk tînin, lojî'ya çi? Em li vir dimrin, lojî'ya çi?Bîrçîne, bê star in, dibin êşkencê de ne, bi mêtingerî û heqaretan re rû bi rû ne, bê perwerde ne, jar in, biçûk tên dîtin, tune tên hesibandin û tên tecawizkirin. Bedenên me li bazaran, hetta hin ji yên me ne li bazarane jî, di nav malên veşarî de-şûnên veşarî yên di bin erdê de- tên firot in, pêrgî şiddetê dibin. Loji'ya çi?'

Jineolojî ji ber bi îdîaya ku bibe zanista jinê, zanista jiyana civakî û hevjiyana azad radibe, divê bersivê bide van pirsan û pirsên din ên xwerû û wêrek. Çima Jineolojî? Jineolojî çima 'dikare bibe derçûneke bingehîn?' Sedemên pênaseya jineolojiyê, nîqaş û pêkhateya wê çi ne? Rexne li çi dike, çi di pejirîne? Jineolojî divê bersivên gelekî xwirt bide van pirsan da ku qad û beşên xwe bi awayekî bi rêk û pêk û mayinde û saz bike.

Ji bo pêşxistina Jineolojî gelek sedemên me yên cûda û cûr be cûr hene.Hin ji van sedeman pozîtîf in. Ew sedem in ku palpiştiya aliyê hindirîn ê dinyaya jinê dike û divê potansiyela vê dinyayê derkeve û bi mirovahiyê re bê parvekirin. Di vê pêvajoya ku em tê de ne ev, pêdiviyek ji pêdiviyên herî acîl ê mirovatiyê ye.**Divê ev dinya bi rihê jinê bê rapêçandin an jî divê ev dinya bi rihê jinê bê rêsandin.**

Sedemên din jî yên negatîf in. Şiddeta li ser me,mêtingerî, biçûk dîtin, tune hesibandina îdeolojîk, înkar, qirkirin...Rawestandina van pêdiviyeke lezgîn e. An na wê dinya bibe gerstêrkeke ku xwe dadiqurtîne, mirovati jî wê bibe civakeke ehmeqan ku ji ber bê aqiliyê dara bin xwe dibire û bi vî hawî xwe tune dike.

Di dîrokê de demeke gelekî dirêj, jinan pergaleke civakî ya dayiksalarî ava kirine, bi rêxistin kirine û dane meşandinê. Divê pergala xwe ya civakî de aşitiyê, edalet û bereketê hakim kirine.Bingeha gelek vedîtinan di qonaxa neolîtîkê de çêkirine. Di roja me ya îro de gelek karên ku mîna 'karên jinan' tên hesibandin û biçûk tên dîtin, di rastiya xwe de çendîn bi hejmaran, matematîkê,hesabên zirav, eyarên demê û bi zanîna hişmendiya analîtîk û hestî ve girêdayi ye û palpiştiya wan dike gelekî aşkere ye. Aqlê mêr ê serdest bi xasûkiyeke mezin van didize û dike xercê sîstema xwe. Ji bo ku vê diziya xwe jî veşêre bigotina 'karên jina' biçûk dibîne, karîkaturîze dike. Bi gotina; ' bi hevîrê destê xwe, tevlî karê mêr nebe' erzê wê biriye. Ku ew hevîrtirşê hevîrê di destê wê de, yekem ji vedîtinên zanista kimyayê ye. Heke ne ji wî hevîrê

destê wê be, ew ‘zilamên bi aqil’ ji birçiya nikaribûn yek gavê jî biavêtana. Mebesta me ewe ku, ji bo em berê xwe bidin jineolojiyê, bi sedan sedemên me yên pozîtîf hene ku li ser bi sedan nirxên me yên pozîtîf bilind dibin.

Emê nebêjin ku di ser re bi hezaran sal der bas bûne. Lê pêdiviya me pê heye ku yên ji me hatine dizînê, yek bi yek keşif bikin û bi nav bikin. Pêdiviya me pê heye ku ji wan keşfan her çend dereg bûbe jî rûmeta para xwe bijîn û hemû wê çanda şermiyê ya ku şaristanî li derdora nasnameya me pêça ye, parçe parçe bikin. Beriya her tiştî û ya grîng jî ewe ku ev gerdûn, dinya, xwezaya ku di bin êşê de ye, civaka ku ji qirkirinê derbas dibe, jin û zarok, taritî, biçûkdîtin û diziya li dinyaya jinê qewimiye, bi nirxên pozîtîf re pêdiviya hevdîtinekê heye. Ji ber vê em dibêjin **jineolojî**.

Jineolojî wê xwe bigihîne van nirxên pozîtîf. Wê yên derketî sîstematîze (bi pergal) bike, arşîv bike û ji bo ku veguhêze rêxistinbûyînê, wê têgihiştinê xwirt bike. Wê bike malê pêşketinên zanista ku bi aqil û hestê jinê dixebitin. Ji bo ku yên veşarî jî aşkere bibin wê hewl bide , bi jinê dinyayê re nîqaş, plansazî û terzê liv û tevgerî, rê û şêwazên vê pêş bixîne. Ji bo pêkanîn, destpêkirin, lêkolîn û rêxistinbûyîna  van hemûyan pêk were em dibêjin **Jineolojî**.

Sedema herî bingehîn a ku Jineolojiyê ferz dike eve ku di kaosa Sedsala 21. de şensê derçûna azadiya jinê, bi destkeftiyeke mezin bi awayekî baş nirxandine. Ji bo pirsgirêka azadiya jinê ku di vê sedsalê de bûye ‘dayika(maka) pirsgirêkan’(8) pêşxistina çareseriya dayik e (makê ye). Ji bo serkeftina vê; divê em jin hizra koletiya li ser dinyayên me û bihurandina ji vê yekê bi dest bixin.Bi rêbazên lêkolînkirinê ya bi palpiştiya jinê, bi destxistina danehevan, divê em xwe bigihînin pênaseyeke rast a azadiyê. Wek zanista jinê, beriya her tiştî divê em bigihîjin pênaseyeke bergeha azadiyê ya ku ji bergeha koletiyê ya li ser me jinan derbas dike. Heke vê pênaseyê pêş bixîne wê bikaribe zanista wê jî pêşbixîne. ‘Beriya her tiştî hewceyî bi terîfeke azadiyê heye, ji bo bersivê bide koletiya bi jinê hatiye daqurtandin.’(9) deşîfre û analîzkirina bergeh, qad, şêwe û amûrên di gotina; ‘ koletiya bi jinê hatiye daqurtandin’ û her wiha ji bo pêşxistina pênaseyeke azadiyê ya ku ji vê koletiyê derbas bike em dibêjin **Jineolojî**.

**Ji bo Gihandina Raza Jiyanê**

Di vê serdema lanetî de ku em qirkirineke civaki jiyan dikin, Rêber Abdullah Öcalan em fêrî hêza utopyayên azadiyê dike û di vê serdema em tê de ne, bi van gotinên xwe bersiveke baş dide  pirsa bê ‘Çima Jineoljî?’ ; ‘ Jiyan divê raserî her tiştî bê dîtin. Peywira wê ya bingehîn jî fêhmkirin e.Fêhmkirin jiyankirine. Jiyankirin ji bo fêhmkirinê ye.’ Ji bo cehalet û koriya derbarê jiyanê de ji holê rabe divê Jineolojî pêş bikeve.

Her jineke di nav lêgerîna azadiyê de, di qonaxeke jiyana xwe de bi kurahî vê biwêja navdar a Spînoza ku dibêje; ‘Fêhmkirin azadiye.’ têdigihîje. Ji ber ku mirov heke dinyaya di nav de dijî, civakê, malbatê, tevna têkiliyan û hebûna xwe ya ku bi van hemûyan re girêdaye fêhmbike û wate bidê dikare azad bibe. Ji bo mirovê/a ku vê fêhm nake, ev hemû têkilî û girêdayîn wê her tim bibin ben û qeydên dest û ling pê girêdayî û hebûnên ku astengî û koletiyê diafrînin. Çendîn bi hunereke zirav bê rapêçanê jî; jin û mêr çi mirov dibe bila bibe tercîha jiyana xwe çawa dike bila bike,

rabûye pêdarê û civak ji qirkirinê derbas dibe de, her kêlî vê heqîqetê di qîre. Wek rêzdariyek ji felsefeya azadiyê re, dibe ku yekem heqîqeta ku divê em fêhm bikin ev be. Ji bo gihandina vê raza heqîqeta jiyanî û parvekirina vê heqîqetê em dibêjin **Jineolojî**.

Rastiya mirov û civaka ku wate nade jiyanê û di nav bê watebûyînê de dixeniqe, gihandina raza jiyanê rewşeke gelekî zehmet e. Em vê rastiyê li pêş çavê xwe digirin û em vê pirsê ji xwe, dipirsin; ' Li ruxmî vê rastiya jiyana bi êş û azar kê/î ye yê ku divê xwe bigihîne vê razê?' û bi dil, bi hizir û bi hestên xwe dizanin ku Ew; jin e. Her çend qurbaniya qirbûnên xweza,civak û jinê be jî, wê jin xwe bigihîne vê razê. Ji ber vê em hemû hewldanên xwe ber bi wê ve diherikînin. Ji bo kurbûna van hewldanan, rêxistinkirin û çalakbûna vê, ji bo herikandin, guherandin û gihandina raza jiyanê, em dibêjin **Jineolojî**.

Modernîte li dijî dîrok, manewiyat, gerdûn, hemû hest û ramanên me, li dijî nirxên me yên jinane û mirovahiyê êrişan pêk tîne. ji bo avakirina hêz û zanista ku van texrîbatên li ser hemû heqîqetên me yên ku em bi xwe ne ji holê rabikin em dibêjin **Jineolojî**. Heke wate tune be jiyan jî tune ye! Em bawerin ku bi merceka jinê, hê ji nêz ve mêzandina rastiyan, wê hêza me ya watedayînê bêtir xwirt bike. Lê bêyî qutkirina têkiliyên di nav bera wate-jiyan-civak-jin de qutkirin...

**Ji bo Rast Pêşxistina Hevjiyana Azad...**

Jiyan, xwezaya civakî, gerdûn dîlemma ye (dubandi ye), dîyalektîk e.  Rûyek ji rûyê vê dîlemmayê (dubendiyê) jin e yên din jî mêr e. Ev her dû rû, bi têkiliyeke watedar,xwerû, azad, wekhev û afîrîner bîmînin, wê xwezaya civakî jî bi rêk û pêk bimeşe. Lê heke ev her dû rû, bi hincetên cûr be cûr yên bi hezaran salî hewla hevûdû tune kirinê, dijminahiyê, biyanîbûn û dûrbûnê bikin, wê ev yek bike ku xwezaya civakî her tim bi alozî, pirsgirêk, krîz û bi mirînî be.Xwezayên jin û mêr ku hevûdû temam dikin û hebûna wan bi hev re ne, ji hev cûda û bi hev re, bi bandorbûna ji hev lêkolînkirin, rewşa xwezayî ya van xwezayan, rewşa yên ku wan ji xwezayan wan dûr dixe, sedem û encamên mudaxeleyên hêzên deshilatdar ên li ser van xwezayan analîzkirin, di bin berpirsiyariya Jineolojiyê de ye. Wekîdin ji pêşxistina rêbazên ji nû ve yên di çarçoveya azadî û estetîkê de gihandina van xwezayan jî Jineolojî berpirse û bi vê îdîayê radibe.

Jineolojî di heman demê de navê avakirina pêşxistina teoriya hevjiyana azad û afirandina wê ye. Yek ji elîfbêya sosyolojî û jiyana rast jî pêşxistina hevjiyana azad e. Ev rastiya ku Rêber Abdullah Öcalan diyar dike bê çima ev mijar elîfbêya jiyanê ye; 'Divê mirov baş zanibe ku hevjiyana bi awayekî civakî hatiye avakirin. Ev jiyan di navbera nêr û mê de pêk nayê; di navbera jinîtî û mêrîtiya civakî ya avakirî de pêk tê. Divê neyê jibîrkirin ku avabûna hegemonîk herdu cinsan jî seqet kiriye, têkiliya di navbera wan de ji wê bi tesîr bûye û weke têkiliya hegemonîk xwe nîşan daye. Di têkiliya hegemonîk de eşq pêş nakeve. Di eşqa mirov de şertê bingehîn ew e, divê îradeya azad ê her dû aliyan jî hinkufê hev bin.'  Pirsgirek ji têkiliya di navbera du kesan wêdetir, pirsgirêkeke civakî ye. Di navbera du cinsan de  astê pênasekirin û bi rêxistinkirina têkiliyên bi civakê re, polîtîka, çand û huner, etîk-estetîk û aborî de,  ew mijar in ku bi hemû civakê re tekîldar in.

Li her devereke dinyayê, nirxandineke kurt a di derbarê têkiliyên jin û mêr de ku

ev têkilî bi gengeşe, pirsgirek û rûxiyayî ne, wê me bigihîne heman encamê. Bingeha jiyaneke bi wate, azad û demokratîk, di van têkiliyan de bidestxistina zihniyet, exlaq û çandê ve girêdayî ye. Bi destxistina van jî bi hizirkirina bergeh û kurahiya vê pirsgirêkê ve, bi astê diyarkirina hebûna civakê û bandora wê ya li ser jiyanê ve girêdayî ye. Analîzên bi rêk û pêk ên ji bo vê divê, diyare ku zanistên civakî bi qîmê pêk naynin. Her jin û zilamê li hemberî mirov, jiyan, xweza û hebûna xwe rêzdar e, di vê mijarê de yekem berpirsiyariya wê/î ewe ku ronî û serwext bibe û xwe bi perwerdeyê ava bike. Şaşiyên di vê mijarê de wê mohra xwe li hemû jiyana ferd bidin. Ji ber vê her ferd û civak, pênase û çareseriya vê mijarê, afirandina alternatîfan ji bo xwe dike derdê sereta. Ji xwe heke ev kesên ku tên behskirin, sosyalîst, şoreşger, femînîst, anarşîst, demokrat yanî hêzên modernîteya demokratîk ên dijberî pergalê bin, ev hêz, berpirs û xwedî wê îdîayê ne ku bi rola pêşengtiyê rabin û ji civakê re bibin mînak. Ji ber vê hevjiyan, hebûn û têkiliyên jin û mêr, zarok mîna mijarên jiyanî bin, wê di nav bergeha zanista jinê de cihê xwe bigrin. Jineolojî dema ku bi ser vê mijarê ve çû wê destpêkê hevjiyan û têkiliyên heyî analîz û bi nav bike. Pişt re jî li gorî bergeha teoriya hevjiyana azad, wê têgihiştina alternatîfbûyînê, pênase û analîzên xwe pêş bixîne û li ser vî asasî jî proje û pêşniyarên çareseriyê wê pêşkêş bike.

Ji ber ku jiyan bê dualîte nabe û ew jiyana di navbera du hebûnên bingehîn de jiyaneke bi gengeşiye, zaf di cihê xwe de ye ku Jineolojî weke pêngava yekem li ser vê mijarê bisekine. Di sersedema derçûna zanista jinê de rewşa bi kaos an go krîza jiyana civakî heye. Cihê herî kur ê vê kaosê qada hevjiyanê ye. Ji bo têgihiştina krîz û kaosa heyî, divê em pêşdeçûna dîrokî ya têkiliyên hevjiyanê bizanibin. Rêber Abdullah Öcalan vê pêdiviyê bi vî hawî dinirxîne; ‘ Nasnameya azadîxwaz a herî radîkal, di nêzikahiya jinê de an go bi gîştî têgihiştin û derbaskirina pergala têkiliyên jin û mêr guncav e. Heke têkiliyên di navbera jin û mêr de neyê fêhmkirin, tu pirsgirêkeke civakî têra xwe ne tê fêhmkirin û ne jî tê çareserkirin. Ji bo mirov vê pirsgirêka stûna navmalê ya dil û mejiyê pirsgirêkên civakî ye çareser bike, divê bi awayekî bingehîn bi zanistî, felsefî, etîk û estetîk nêzî meseleyê bibe. Di serdema me de, ji bo hevjiyana azad bi jinê re di şert û mercên modernîteya kapîtalîst de berpirsiyarî û hêzeke mezin a zanistî, felsefî, etîk û estetîk divê. Mirov heta statuya jinê ya di dîroka şaristaniyê de û di serdema modern de nizanibe û nebe xwedî wê hêzê ku karibe helwesteke etîk û estetîk nîşan bide, pêre kîjan bihevrebûnê biceribîne bila biceribîne, her jiyana bi wê re wê bi şaşîtî, bêexlaqtî û kirêtiyê bi encam bibe.’

Ji xwe her devera dinyayê îro ji ber van; ‘şaşî, bêexlaqtî û kirêtî’ mîna dojehê lê hatiye. Jiyana rojane, lêgerînên evîn-hezkirinê, cînseliya ku hatiye sorkirin, cehalet û bêbersiyariya mêr a ji bo jinê û jin a ji bo mêr, pêxirtengiyên nasnameyên cuda yên ceribandinên bi ser navê azadiyê û tenêbûnên di nav qelebalixiyan de. Di encam de dinya dibe gerstêrkakesên ku di nav van ceribandinan de difetisin û her qad û kêliya jiyanê ji hev re dikin dojeh. Bi taybetî zilam, jinê mîna mirovekê, dostekê, hevjînekê, hevjîneke ruh nikare bibîne. Ji ber ku deshilat û çanda baviksalarî, di bin fêrbûnên çewisandin û kontrola bê sînor de,  jinê binpêya xwe, mêtingeha xwe, jin an hezkiriya xwe û milkê xwe dibîne. Ji ber sorkirinên pergalê yên li gorî eyarên xerîzeyên cinsî, jinê weke nesneyekê dibîne ku hemû arezûyên xwe pêk bîne.  Dema ku fêrbûyîn û

zilam jî li hemberî potansiyela jinê ya xwedî sekneke azad û bi rêgez re dibe kemînek.

Ev metaforên Rêber Abdullah Öcalan ku dibêje; ‘ Di qefesa pilingê nêr de mêpilinga bûye êm an jî teslîm bûye, di qefesa mêpilingê de nêritiya ku di hêla biyolojîk de hatiye nepixandin an jî pilingê nêr ku bi hemû çanda civakî, bi çanda jinkokiyê bûye psîkek’ gelekî balkêş in. Di roja me ya îro de têkiliyên van her dû metaforan, di nav bera wan de şer, li dijî hev êriş û qetilkirinên fîzîkî û rûhî rû dide. Lê bi piranî tişta ku diqewime ev e; mêpiling li hemû qadên pergala baviksalarî ku qefesa pilingê nêr e, li her qada civakî ku bêparastin tevlî dibe, êdî nêçire ji bo pilingê nêr. Di têkiliyên rojane de ji hevdû heznekirin, ji etîk û estetîkê mehrûmbûn, bêparbûn, li ber ferasetên namûsa klasîk têkçûn û hwd. gelek faktor, kêli bi kêlî hevjiyanan diqedînin û vê rastiyê pêk tînin.

Di hevjiyanên ku êdî li ber sînorê bêtehammuliyê de ne; di asteke mezin de êm bûyîn, teslîmiyet an jî mirin para mêpilingê dikeve; para pilingê nêr jî li hemberî mêpilingê pilingê nêr e lê li hemberî pergala baviksalarî û dewletê jî bi çanda jinkokiyê pisîkbûyîn û di bin çewisandina van her du diyardeyên bi nakok de perçebûyîne. Di serî de ji bo herduyan û zarokan, para xwezaya civakî jî bêbextiyarî, pêxirtengî û qirbûyîna hestî ye. Ev rastî bi xwezaya zindî jî karesatên ekolojîk dide jiyankirin. Hilweşandinên di dinyayên jin û zilam de ku berdewamiya xwezaya zîndîwer jiyan dikin, yekser  li xwezaya zindîwer jî dide.Hevjiyana ku rast nayê fêhmkirin, pênasekirin, nayê zanîn û jiyan kirin, di her kêli’yê de dibe bela serê jiyanê. ‘ di serdema me de têkçûna hêzên mêtinkar û desthilatdariya hegemonîk herî zêde bi hilweşîna di warê hevjiyanê de xuya dike. Têkiliya jin û mêr ewqasî deklase bûye, maneya xwe ji dest daye, ne bêyî wê dibe ne bi wê dibe ango êdî li ber qedandinê ye. Yên şoreşa destpêkê nesipêrin analîza vê rewşa kaotîk, bêgav wê kaosê dewam bikin.’

Ev rewşa kaotîk ku Rêber Abdullah Öcalan balê dikşîne, di nava civaka dîrokî de çawa hatiye pêşxistin bi xetên giştî em hinek binirxînin. Dema ku em bi berçavkên lêkolînên ceribandinên teoriya hevjiyana azad li dîrokê dinêrin, em pêrgî hin tecrubeyên grîng tên. Bi awayekî baş xwendin û têgihiştina van, li kû derê, çawa, bi destê kê û bi çi armancî darbe xwariye, ji rê derketiye, çawa bûye çavkaniya krîza pirgirêkên têkiliyên civakî, em dikarin hîn bibin û vê qada ku di roja me ya îro de bûye girêkeke kor ronak bikin.

Em dibêjin; ‘Hevjiyanan derbe xwarine, ji rê derketine’ ji ber ku di navbera modelên jiyana hevbeş ên di destpêka civakîbûyînê û malbata ku piştî civaka dewlet û çîn avabûyî de gelek cudahiyên mezin hene. Ji dîrokê û vir ve û beriya dîrokê bihevrebûna jin û zilam ji bihevrebûna dîroka nêz û ji ya roja me ya îro  ku em dibînin gelekî cuda bûye. Li gorî pergala civakî ya her qonaxekî gelek şêweyên cuda yên yekeyên jiyanên bi hev re hebûne. Di dîroka nêz de heta di roja me ya îro de şêweyên cuda yên jiyana bi hev re hene. Mînak; li hin herêmên  Çînê di nav hin komên dayiksalarî de heta Şoreşa Çînê zewac tune bû. Li gelek deverên dinyayê di nav gelek çandên gel ê cuda de şêweyên têkiliyê yên li ser asasê pirzewaciya jinê hebûn. Yanî ev şêweyê jiyanê yên zewac-malbat-hevser ku li hemû dinyayê fez kirine û di çavê piraniyê de normal bûye, di dîrokê de demeke dirêj anormal bû. Ya rast têkiliyên hevjiyana heyî û şêweyên malbat û zewacê di dîroka mirovahiyê de aîdê

dema herî kurt in ku ne bi qasî ji % 2 ye jî. Lê awayê ku îro hakim e ev e.

Beriya dîrokê û di dîrokê de bi taybetî formê malbat klan ê li dorhêla jinê, berfireh bû. Di vê forma malbatê de zilam-mêr zêde nedihat naskirinê û bê bandor bû. Xal û zarok hene. Di dîrokê de demeke dirêj jî modela malbatê an jî hevjiyanê hebûye ku di vê modelê de jin û mêr hinkufên hev in. Berevajiya baweriya giştî, ev model di dîrokê de demeke dirêj bi berfirehî hatiye jiyankirin.  Pergala malbatê ku zilam reîs e û awayên hevjiyanê gelekî şunda ye. Weke tovê sêlingiya Xanedanî-deshilatî- dewletê bi sazî bûye. Di vê qonaxa deshilatdariyê de armanca vê kirinê jî, jin û zarokan bi deshilatdariyê ve girêdane, di kesayetên wan de girêdayîna bi deshilatiyê ve pêşxistine. Her çend di havênê xwezaya civakî de tune be û teqabulê tu pêdiviyeke civakî an jî xwezayê neke jî zihnîyeta mêr a deshilatdariyê, saziya malbatê ya pirhevserî û bi mirina jinê ya pirzarok afirandiye. Ev modela malbatê ji roja ava bûye heta roja me ya îro bûye sedema gelek pirsgirêkên giran ên civakî.

Di bingeha vê modela malbatê de berjewendiyên deshilat û dewletê hene. Hemû deshilatên serdest di tevahiya dîrokê û di roja me ya îro de ji ber ku her tim pişta xwe spartine hin xanedanan, modela malbatê ya pergala deshilatê jî dilê xwe bijandiye vê. Xanedanên deshilatdar di nava civakê de kopyayên xwe ava kirine. Û her reîsekî malbatê yên van kopyayan xwe li şûna reîsê xanedan ê deshilatdar xeyal kiriye. Berdêla vê xirsa zilam a sorkirî beden û ruhên jinên di malên taybet de hatine girtin didin ku di rabirduyê de azad bûn. Bi cariyebûnê, bi nesnelkirineke zêde, ji ber ku milkê mêr e ji destdirêjiyê re heta dawî bi vekirinê, bi welidandina gelek zarokan ku xwezaya wê ya fizîkî bi vê nikare, pêdivî bi rêz û hezkirinê nedîtinê û bi qasî zarokên kur bi nirx dayîna wê... Di vê modela malbatê de ku mêr vê modelê weke garantiya hêz û jiyanê dihesibîne û dilê xwe dibijîne xanedaniyan,dibe qefeseke ku jin kêlî bi kêlî tê mêtin û tûnekirinê. Mixabin ev modela malbatê bi zihniyeta ku li ser civakê hakim e her tim hatiye teşwîqkirin. Her çend rê ji gelek pirsgirêkên civakê re vekiribe jî nehatiye beralîkirin.

Herî zêde di vê pêvajoya çanda xanedaniyê ya hakim bûyî de, hevjiyanan derbe xwarine û ji rê derketine. Ev çand ne tenê çanda Rojhilata Navîn e, çandeke ku li seranserê dinyayê belav bûye û bandora xwe heta roja me ya îro bi veguhêstinan berdewam dike. Ol û dewletan her tim vê çandê pesendkirine û palpiştiya wê kirine. Ev çand di roja me ya îro de jî li Rojhilata Navîn bi awayekî xwirt jiyan dike. Ev çanda malbat û xanedaniyê li milekî rê li ber nifûsa zêde vedike li aliyê din jî xirsa ku para zêde ji dewlet û deshilatdariyê bi dest bixe zerarê dide xwezaya civakî. Ev çanda hevjiyanê, ji bo jinê piçûkdîtin, newekhevî, nehezkirin û tune hesibandinê; ji bo zarokan nehezkirin û bêperwerdehiyê, ji malbatê re şidetê, ji zarokên keçîn dest pê dike ji jinê re di bin navê namûsê de qetlîm an jî esaretê ferz dike; ev çanda hevjiyana ku ji rê derketiye ye. Dahûrandin û veguhêstina vê modela hevjiyan an jî malbatê, ji bo dahûrandina pergalên deshilatdar û dewletdar şertê pêşî ye. Ji ber vê têgihiştina pêşmerhaleyên vê modela malbatê, çavkaniya wê ya dîrokî û xwe gihandina  roja me ya îro grîng e.

Heke em berê xwe bidin mîtolojiya erdnîgarî û dîroka xwe, bawerî, felsefe û zanista xwe ji bo pirsa emê çawa zanista qada hevjiyanê pêk bînin, gelek daneyan bi dest bixin. Di rabirduya vê erdnîgariyê de em dikarin ji roja me ya îro baştir  perspektîfên

têgînên kapîtalîzmê yên bi kar aniye û beralî kiriye; ‘qada taybet-qada giştî’ çendîn têgînin sexte û bê bingeh in. Di roja me ya îro û dîrokê de civak û dewletan, bi regehên mîtolojî, ol, felsefe û zanistê ve şekil dane hevjiyanan, mudaxele kirine û sînoran dane ber. Qada taybet her tim bûye qada giştî, qada giştî hatiye nîqaşkirin, di asasê xwe de diyar bûye. Heke mîna yekemîn formên pêşketina fikirandina mirovatiyê mîtolojî û ol û dîsa heke yasa û hiqûqa împaratoriyên destpêkê bên analîzkirin, wê bê dîtin ku hevjiyan çawa weke hîmê esasî, weke mijareke navendî hatiye nirxandinê. Mîtolojî, ol, felsefe û zanist bi awayekî kur heta bibêjî li ser vê mijarê sekînîne, mudaxele kirine, hewl dane şeklê baviksalariyê bidinê. Pêvajoyên şikestinên cinsî yên yekem û duwem ku li dijî jina hatine afirandin û jiyankirin, di vê mane yê de bûne pêvajoyên şekildana hevjiyanan.

Di mîtolojiyê de têkiliyên di navbera xweda û xwedavendan de dîsa nemir û bimiriniyan de vegotin bi zimanê helbestê ye. Her çend ziman helbestwarî be jî, di mîtolojiyên serdemên destpêkê de, li tenişta xwedavenda ku bi tena serê xwe li ser text e,çîroka trajîk a gav bi gav bi cîh bûna bavek, lawek, hevserek, hezkiriyek, pişt re bi destê van çawa ji textê xwedaventiyê hatiye durxistin, di kerxaneyan de fahişekirina wê, di malên taybet de pîrekbûyîna wê heye. Em dikarin van çîrokan weke çîrokên ji hevjiyanên azad û helbestwarî çawa ber bi pergala hevjiyanên koledarî û efendîtiyê ve ketine, mehkûm bûne jî bixwînin.Çîrokên trajîk ên jinan ku mîtolojî vedibêje di cewherê xwe de çîrokên hilweşîna civaka azad in. Ji têkiliyên jin û mêr ku derbarê hev de xwedî tevgerên bi zanist in, bi pîvan û rêzdar in û tu carî nabin milk ji hev re, dîsa jina ku bi zanistî, bi xwe baweriyeke mezin hêza rê nîşandanê pê re heye, gav bi gav destpêka tunebûnê, kêmbûnê heye. Planên destpêkê yên tevnên aqil û destên nêr ên serdest ku hev iyana bi krîz a roja me ya îro afirandine, çawa li jinê û civakê dane hene. Ev tevnên ku mîtolojî bi zimanê helbestê vedibêje, ji Hammûrabî dest pê dike û ji hiqûqên împaratoriyên berê mîladê re bûye îlham. Van hiqûqa di nav malbat û civakê de cihê jinê, têkiliyên jin û mêr, li hemberî tecawuz û xapandinê cezayên ku wê li jinê bên birîn û hwd. li ser hevjiyanan xwe gihandiye pênaseyên diyarkirî.

Olên yekxwedayî jî derbarê pênase û rêgezên têkiliyên jin û mêr de gelek hikûm birîne. Mînak ola Xiristiyaniyê jiyana rahîb û rahîbeyan esas girtiye. Cînseliyê ji qadroyên xwe re qedexe kiriye û her wiha ji bilî zarok anînê hevşabûnê  guneh hesibandiye. Rûxmî xweragirtina xerîzeyên cinsî, bandora li ser civakê ya van qedexeyan li ser navê beralîkirin û jibîrkirina nêzikahiya dayika xwedavend a cinsiyê, divê bi her alî ve bê lêkolînkirin. Rê li pêş hevjiyana azad vekirin an astengiyên nû afirandin? Divê ev werin lêkolînkirin. Di demên şunde modernîteya kapîtalîst li ser navê azadiya cinsî, rê li pêş cinsiyeke zêde (beloq) vekir. Divê di bîra me de be ku ev yek li hemberî van qedexeyan mîna berteka pêşket û li gorî vê divê di roja me ya îro de bandora hikmên Xiristiyaniyê ya li ser hevjiyanên bi krîz bê lêkolînkirin. Derbarê vê mijarê de li Rojava kulliyatên grîng ên rexneyî yên derdorên femînîst û akademisyenan heye. Lê ji van kîjan vediguhêzin rûyê rastiya ku rexne dikin û kîjan ji wan rexneyên di cihê xwe de ne û rê vedikin divê bên lêkolînkirin.

Bi taybetî di jiyana civakî yê Rojhilat de, ji bo Îslamiyetê jî ku li ser teorî û pratîka hevjiyana azad de gelekî bi bandor e, bi heman awayî nêzîkahiyeke rexne û analîzê asas e. Di çaresariya Îslamiyetê de cinsiyetî ne guneh û ne jî qedexe ye.  Lê mêr

Îslam ji zilam dixwaze ku di nav harema xwe de adil be ku ev harem herî kêm ji çar jinê pêk tê. Ji jinan re jî dibêje bi hevserê xwe re dikarin cinsîbûnê jiyan bikin ku ev mafê wan e, lê bi gelek şertan. Şertê herî grîng ev e; ‘ Li jorê xwedê çi be li jêrê jî mêr ji bo jinê ew e. Ew çi bêje wê weke wî be.’ Bi pêkhateya haremê mêr kerxaneyê aniye nav mala xwe û vê bi zemînê meşrûiyeteke olî jî rapêçaye. Bi taybetî li Rojava û di roja me ya îro de li seranserî dinyayê çand û polîtîkayên cinsî yên ola Xiristiyaniyê bandora xwe dike. Her wiha bandora polîtîka û pêkûteya cinsî ya ola Îslamiyetê jî li ser beşeke nifûs û herêmeke grîng ê dinyayê heye. Yên bixwazin zanista hevjiyana azad pêşbixînin ev daneyên destpêkêne ku divê li ser wan lêkolîn bikin. Ji ber ku li ser meşrûkirina polîtîkaya cinsî ya ku rabûye pêdarê, hatiye sorkirin û di bin navê azadiyê de ji rê derketiye, bandora Xiristiyaniyê gelek diyarkere. Dîsa polîtîkaya cinsî ya ola Îslamiyetê ku têrkirineke zêde ya mêr teşwîq dike; koletiya jinê bêtir kur dike û diyarker e ku mêr di sekna xwe ya deshilatdariyê de bi israr be.

Felsefe û zanist jî hê di despêkê de li ser vê mijarê ponijîne, mijûl bûne. Weke mînak felsefeya Yewnan ku çavkaniya felsefeya rojava ye vê teoriyê pêş dixe; cinsiya bi jinê re tenê ji bo zarokanînê ye; ji bo zewqa cinsî jî zarokên kurîn ku hê kamil nebûne dikarin weke xoşewîst diyar bikin. Ev têgihiştina ku dibêje; ‘ Jin zilamê kêm e an jî yê seqet e. Ji dostaniya zilam re ne guncav e.’ li hemû warên ku vê felsefê jiyan kirine an go ji vê felsefê bi bandor bûne, di seqetmayîna hevjiyanên azad de xwedî berpirsiyariyeke giran e. Divê ev felsefeya ku bi piçûkxistina jinê cinsitiya bi xortên ne kamil re meşrû dibîne û îstîsmara cinsî ya her du zayendan mafê mêrên kamilbûyî dibîne bi awayekî xwirt bê analîzkirinê. Ji ber ku genên çanda ‘pîrektiyê’ ku bandora xwe li ser hemû şaristaniyan kiriye ev polîtîkaya cinsîye ku felsefeya Yewnan jê re meşrûiyetekê bi dest xistiye.

Gelek argumanên ku alema zanista pozîtîvîst çêkiriye û pêşkêşî civakê kiriye jî, ji vê hevjiyana derbxwarî herî kêm bi qasî her sê qadên din berpirsiyar e. Di texrîbkirina hevjiyanên azad de, ji ber rola xwe ya bi krîz û qetlîamkar, zanistperestî, alema zanista bi feraseta pozîtîvîst pêş ketiye, qadeke ku divê bi tena serê xwe were lêkolînkirin. Her ku modernîteya kapîtalîst pêş ket û civakîbûnê parçe kir, qetlîamên nav zewacê ku bilindkirina ferq û cudahiya di nevbera qada giştî û qada taybet palpiştiya van qetlîaman dike, ew pêvajone ku divê him bên lêkolînkirin û him jî hesap bê pirsîn. Di nav civakên Ewropayê de di serdema kapîtalîzma endustriyê de bi civaka gund re malbat û jin jî hatin belavkirinê. Kapîtalîzma pêşket, çawa ku mirovan ji axa wan der kir, ji mal û malbatên wan jî dûr xist. Di cewherê xwe de kapîtalizm, ferdpereziya di xwezaya xwe de ji bo ku di nav civakê de bi cîh bike, heta bi şaneyan civakê parçe kir. Ji bo mirov û xwezaya mirov daxîne asta zindiyên yekşanik û yek bi yek li ser wan bi bandor be bi vî rengî parçe kir. Malbat û bi awayekî herî dijwar jinê para xwe ji vê girtin.

Di roja me ya îro de rojava, dinyaya li derveyî xwe paşverû û hov dibîne. Di vê sedsala dawî de, di hemû êrişên xwe yên li ser rojhilat de, argumana deshilatiya mêr û pêkûteya çanda Îslamê ya li ser jinê bi kar tîne. Di vê mijarê de deşifrekirina dirûtiya Rojava, bi taybetî di serdema kapîtalîzma endustrî û pêvajoya dû wê de, bi zanebûna me ya rewşa malbata rojavayî ve girêdayi ye. Ji bo zanisteke nû ya civakî, jineolojî ku di nav zanistên civakî de bi îdîaya derçûneke şoreşê radibe; di derbarê hevjiyanên azad de rastiya rojava, bi taybetî jî ji hêla sosyolojiya rojava sedema serdegirtina vê

û çawa malbat hatiye belavkirin û tunekirin. Di serdema kapîtalîzmê de ku dibêje di vê serdemê de jinê azadiya xwe bi dest xistiye û gelekî propagandaya vê dike, ji derewekê bêtir ne tişteke. Ji bo deşîfrekirina vê derewê û ronakkirina beşeke grîng a dîroka hevjiyana reşkirî, divê ev lêkolîn kur û fireh û bi awayekî ciddî bên kirin.

Mîsyon û pênaseyên ku mîtolojî, ol, felsefe û zanist ji bo jin û mêr raber dikin, her qadên têkiliyên jin û mêr seqet kirine. Ji bo beralîkirina van seqetiyan û pêkhatina têkiliyên azad ev perspektîfa Rêber Abdullah Öcalan; ‘ Divê mirov bi girîngî fêhm bike ku mîtolojî, dîn, felsefe, zanist û huner ji bo jiyanê ne, û rola wan a sereke pêkanîna hevserî û hevaltiya azad e, û di vê çarçoveyê de divê mirov wan exlaqî û estetîk bike.’ kilîleke grîng e. Hêzên deshilatdar ên bi hezaran salî mejiyê xwe bi giştî di têgihiştina ku mirov û hevjiyan di xizmeta mîtolojî, ol, felsefe û zanistê de ne qefil kirine. Lê teoriya hevjiyana azad bi nêrîna dijberî vê têgihiştinê vê qeflê vedike. Ev teorî ji hemû qalibên raman û saziyên têkildarin re vê rolê raber dike; ‘Pêkanîn û înşaya hevaltiya azad’ . Yanî jiyana azad a însên dike navend û mîtolojî, ol, felsefe û zanistê jî dide bin xizmeta însên. Ev şoreşeke fikrî ye. Ev teorî li hember Xiristiyaniya ku dibêje; ‘guneh e’, Îslamiyeta ku dibêje; ‘ jinên we ji bo we zevî ne, li gorî dilê xwe berê xwe bidin zeviyên xwe’, felsefeya ku dibêje; ‘mêrê kêm e’, mîtolojiya ku dibêje; ‘ him fahîşe û him jî dayika pîroz e’, nêzikahiya hûnerê ku jinê weke xemlê bi kar tîne û texrîbatên xwezaya seqetbûyî yê di nav bera jin û mêr de, xwedî wê îdîayê ye ku ji holê rake.

Di têgihiştina kevneşop de wateya hevjiyanê her çend mîna têkiliyên jin û mêr, xoşewîstan de bê fêhmkirin jî bi tena serê xwe hevjiyan ne ev in. Têkiliya hestî û cinsî ya di nav bera jin û mêr de tenê aliyekî vê jiyanê ye. Lê ji ber ku deshilatî ji bo ku bi taybetî vî alî digre dest û hewl dide şekil bidiyê, rastiya vê yekê mohra xwe bi giştî li têkiliyê dide. Heke pênaseyên jin û mêr, di nav pênaseya civakîbûnê de bên kirin, wê hingê bigihîjin wateya xwe ya rastîn. Ev watebûyîn, wê aliyên hest û cinsiyê jî ku bi krîz in, estetîze bike û bike xwedî etîk. Rêber Abdullah Öcalan ji bo fêhmkirina teoriya hevjiyana azad wiha dibêje; ‘ Sîstemên şaristaniyan hevjiyan weke qada ‘jiyana taybet’ pîroz kirine û ev jî hukmek e ku herî zêde heqîqeta civakî berepaş kiriye. Ya rastî, gelemperî weke taybetî, taybetî jî weke gelemperî were fêhmkirin wê bêhtir li xwezaya civakê were... Divê mirov têkiliyên hevjiyanê weke têkiliyên di navbera du kesan de fêhm neke. Fêhmkirineke bi vî rengî kêm e. Bêguman têkiliyên dualî yên hevjiyanê dikarin pêk bên, lê bi tenê bi vê yekê bê fêhmkirin rast nîne. Hevjiyan bi hêzeke mezin a manedan, estetîk û exlaqê pêk tê, ji dualîbûnê şuştî ye û bêhtir jiyaneke bi xwe û cewherî ye. Jin û mêrên bi jiyana sosyalîst ve girêdayî, kengî jiyana azad bi awayekî gerdûnî û kolektîf pêk anîn, dikarin û şensê wan heye bi awayekî taybet jî rast û xweşik bijîn... Têkiliya hevjiyanê xwedî xisletên welê ye ku ji binî ve tesîrê li têkiliyên civakî û gerdûnî hemûyan dike. Durûtiya herî mezin a şaristaniyê ew e, ev têkiliya gerdûnî bi tenê weke têkiliyeke mahrem a dualî û taybet hesibandiye. Yek ji sedemên bingehîn ku hiştiye zanîna sosyolojîk bêqîmet û bêkêr were hesibandin, ev e.’

Li ruxmî ku mîtolojî, ol, felsefeyên cûre bi cûre û ekolên zanistê derbarê têkiliyên jin û mêr û nasname û hebûna jinê de kulliyateke bêhempa pêş xistin bin û rê li pêş gelek texrîbatan vekiribin jî ; her tim di zihniyeta mêrê deshilatdar de bûye hebûneke bi raz, kabûs, nayê zanîn û şeytanî. Lê mîtolojî, ol, felsefe û zanist ku li gorî qalibên zihniyeta mêrê deshilatdar pêş ketine tu carî jinê, têkiliyên jin û mêr û tevna têkiliyên

li dorhêla jinê ji rojevên xwe dernexistine. Ev rewş bi heqîqeta jiyanê ve girêdayî ye. Bingeh, pêşketin, rêxistinkirin, berdewamî an go di roja me ya îro de ji ber gengeşeyên kur di berdewamnekirina hevjiyanan de gelekî grîng e. Ji ber ku tovê hemû têkiliyên civakî ye hevjiyan. Di vê qadê de astê zîhniyet, hest, ruh, rêz û hezkirin çi be, wê li ser civakê jî ew bandor bike. Sekna despotîk û hegemonîk ya deshilatdariyê û rojane pêkûte û şiddeta mêr a li ser jinê li kêleka hev dimeşin. Hevjiyana mêrên ku deshilatdar in çawa be, hewl didin bi heman awayî welêt jî bi rê ve bibin.Di jiyana mirovên ji rêzê de jî têkiliyên hevjiyanê diyarker in. Mêr an jineka ku di hevjiyana xwe de bi krîz- kaos û pêxirtengiyê dijî, gelekî zehmete ku di têkiliyên civakî de aram, kêfxweş û serkeftî be. Di şekilgirtina hebûnên dewlet, aborî, ol û gelek tiştên jiyanî de hevjiyan diyarker in. Ji ber ku ev bandor bûn hê di serî de bi awayekî diyalektîk ava bûye. Têkiliya kole-efendî ku di hevjiyanan de hakim bûye, pişt re di hemû saziyên civakî de hatiye bi cîh kirin. Li seranserê dinyayê  kaosa herî kur ku di hevjiyanan de tê dîtin, ji ber yekemîn dubendiya kole-efendî ya vê têkiliyê ye. Jin an mêrê ku bi awayekî aram, azad, serbixwe, bi rêgez û li gorî pîvanên etîk-estetîk hevjiyanekê jiyan dikin, ne mumkine ku di qada civakî de tengav bibe, zordestiyê bike an jî bê çare bimîne.

Me bi xetên giştî derbarê dîrok û di roja me ya îro de hevjiyanên azad nirxand. Ev nirxandin ji bo ravekirina bê çima zanista jinê wê li ser vê qadê lêhûrbûnekê çê bike bû. Ji yek ew qadên ku jineolojiyê ferz dike qada hevjiyanên azad in. Ji ber ev qade ku di dîroka bi hezaran salan û di roja me ya îro de hebûn û yekparebûna  jinê herî zêde parçe kiriye û bi koletiyê ve girê daye. Dinyaya me di roja me ya îro de hema bêje serê deqîqê carek dibe şahidê kuştin û tecawiza jinekê. Li ser vê qadê mitalekirin, pêdarkirina wicdan, aqilû hestan, li ser vî asasî çalakiyan pêşxistin û afirandina teorî û ramanê pîvanên bingehîn ê însan û şoreşgerbûnê ne. Cahilî û qetlîamên di vê qadê de di nav hev de dimeşin. Ji ber vê di vê qadê de di nav hev de meşandina ronakbiriya teorîk-rêxistinkirina fikrî û pêkanîna çalakiyê wê bêtir bê fêhmkirinê.

Wekîdin, bi taybetî li dorhêla esareta jinê di destê pergalê de, hevjiyan li hemberî civakê mîna çekekê tê bi kar anîn. Pirsgirêk bi rîşe û kur bûne, krîz gihîştine lûtkeyê, ev jî nîşan dide ku çareseriyên pirsgirêka jî xwe gihandine gelek zemînan. Dîsa yê ku bikaribe bibe derçûnek ji bo hemû xitimandinên di qada civakî de ev qad e. Rêber Abdullah Öcalan şertê destgirtina zanistî-hunerî û felsefîk bi vî hawî dinirxîne; ‘Kesên şexsî yan jî kolektîf gavê diavêjin, eger vê qadê di warê zanistî, felsefî û hunerî de bikin bingeh, bi tenê hingê dikarin ber bi hevjiyana azad ve gava xwe biavêjin. Ev gavên pêşî yên bêne avêtin, weke ku gelek caran yeqîn tê kirin, gavên taybet ên di navbera du kesan de têne avêtin nînin, der barê civaka sosyalîst demokratîk a bê pêkanîn de gavên pêşî yên gerdûnî ne.’ Ev şert rave dike bê divê çima jineolojî pêş bikeve. Ji bo bi dest xistina nêrîna felsefîk- zanistî û hunerî ku pêdiviya hevjiyanan e divê jineolojî pêş bikeve. Yek ji asas armancên jineolojiyê ewe ku ferzkirina cahiliya kur a li ser hevjiyanan ji holê rakirine. Ev cahilî îro li nîvê kevçika dilê jiyana civakê dixe. Mîna ku qirra dewletê têr nake; her roj bi destê mêr civak di vê mijarê de gihiştiye qeraxa harbûnê û di hindirê  xwe de jî ji qirkirinekê derbas dibe.Di dîrokê de demeke dirêj îspat bûye ku hevjiyan ne ku qirra civakê tînin, dijberê vê ew hêze ku civakê bilind, mezin û berhemdar dike. Her çend ev halê bi krîz û qetlîam di vê dîrokê

civakê wê di rêya xwe ya xwezayî de nemeşe.

Ji bo ku di nav mijarên dubendî, têkilî û hevjiyanên jin û mer de rewşa bi krîz bê beralîkirin, pênaseya hevjiyana azad weke namzetê balkişandin, bêhn berdan û îqna kirî dixûye. Di navbera têkiliyên hevrûyên jiyanê, hevruh û hevhebûnan de bi îdîaye ku pênase û çareseriyê pêk bîne. Vê qadê, aliyê dubendiya xwezaya civakî mîna ‘ yekemîn qada ku divê zanista wê bê kirin’ diyar dike. (14) Rêber Abdullah Öcalan bi gotina; ‘Hevjiyan, nexasim zanista li dora jinê were pêşdebirin, wê bibe gava pêşî ya ber bi sosyolojiya rast ve bê avêtin. Têkiliya hevjiyanê xwedî xisletên welê ye ku ji binî ve tesîrê li têkiliyên civakî û gerdûnî hemûyan dike. Durûtiya herî mezin a şaristaniyê ew e, ev têkiliya gerdûnî bi tenê weke têkiliyeke mahrem a dualî û taybet hesibandiye. Yek ji sedemên bingehîn ku hiştiye zanîna sosyolojîk bêqîmet û bêkêr were hesibandin ev e. Ti qada jiyanê bi qasî qada hevjiyana azad xwedî xisleta bingehîn û diyarker nîne. Ekonomî û dewlet weke têkiliya bingehîn têne hesibandin û ev fikreke sabit a sosyolojiya modernîteyê ye.’ hin rêgezên bingehîn ê teoriya hevjiyana azad nîşan dide.

Yek ji îdîayên teoriya hevjiyana azad, dewlet, aborî, ol û gelek saziyên civakî di xizmeta hevjiyanan de dîzaynkirine. Îdîayeke din jî destberdana sosyolojîya çewt û şaş e ku hevjiyanan dike bin xizmeta van. Rêgezên bingehîn ê teoriyê; ‘Beriya her tiştî pêdivî bi têgîneke hevjiyana ekolojîk heye ku di bingehê wê de pirrbûn û dewamkirina zurriyetê tineye, li gorî îdeala mirovatiyê ya gerdûnî ye û hebûna zindiyên din jî li ber çavan digire.’(15)ye. Li hemberî hêzên mêr ê deshilatdar û serwer têkoşîn kirin, di hemû sazî û zîhniyetê de tesfîyekirina jiyana civakî ya cînsiyetperez, redkirina nêzikahiya ku jinê milk dibîne, beralîkirina jina ku amûrê berdewamkirina zurriyetê, nesne, bêkar an jî karkera erzan û bêheqdest tê dîtin û afirandina jina ku li ser asasê azadiyê hebûna xwe ava kiriye, weke rêgez em dikarin rêz bikin. Ji van rêgezan jin û mêrên ku bi hev re ji avakirina hevjiyana azad berpirsiyar in derbasdarin. Netewa demokratîk, ji bo avakirina civaka demokratîk teoriya hevjiyana azad ; wê yekem qad be ku jineolojî li ser lêkolîn bike û ‘zanista wê pêk bîne.’

Di hevjiyanan de ‘pêknehatina eşqê’ bandoreke çawa li ser jiyana civakî dike? Divê hevjiyan çawa pêş bikevin da ku kaos û qetlîamên ku qada civakî dorpêç kirine bi dawî bibin û jiyana ku layiqê însane li ser asasê etîk û estetîkê bê avakirin? ‘Li cihê ku ji eşqê re ne vekirî be, demokrasî, azadî, wekhevî û welatparêzî pêş nakeve. Bi jinê re li ser bingehên wekhevî û azadiyê jiyaneke demokratîk, heke nebe nabeya jiyanê ye. Lê ji bo vê exlaqê koletiyê û ji rê derxistina kapîtalîzma hemdem ku xwe kur bi cîh kiriye, bi exlaqê azadiyê (ETÎK) û bi jiyana xweşik (ESTETÎK) bê beralîkirin. Bi jinê re (her wiha bi mêr re jî) bi ser nexistina jiyana rast (zanist –jineolojî), baş (etîk- têgihiştin û helwesta exlaqê nû) û bedew (pîvanên nû yên estetîkê, jiyana azad), bi ser nexistina ber bi civaka sosyalîst ve di heman wateyê de ye. Ji kaosa dawîn a pergala kapîtalîzmê , li dorhêla jina azad bi afirandina hêza mezin ku ji eşqa rastîn tê hêvî kirin, derçûnekê pêkanîn, karê herî bi esîl û pîroz ên kesên lehengên birra yên dil û mêjiyê xwe dane eşqê ye!’

Ev tespîta Rêber Abdullah Öcalan bi piranî bersiva pirsên me di hindirê xwe de dihewîne. Di heman demê de prensîbên sereta yên sosyolojiya eşqê jî di hindirê xwe de dihewîne. Şûneke ku ji eşqê re nevekiriye, jiyaneke bê demokrasî, kole,

newekhev û welatparêziyê nahewîne, nîşan dike ku eşq bi qasî yê kesayet e bûyereke civakî ye jî. Pêkhatina eşqê, bi awayekî têr bi ronakkirina hebûnên jin û mêr ê heyî û li ser asasê xwezayî û azad ji nû ve bi afirandina hebûnên jin û mêr ve girêdayi ye. Di asta radîkal de bi lêpirsîna cinsiyetiya civakê ve girêdayîye ku wê jinê ji çanda koletiyê û mêr jî  ji çanda serweriyê rizgar bike, her wiha bi pêkhatina azadiya cinsî û bi afirandina kesên jin û mêr ên ku têkoşîna azadiya civakê serkeftî bimeşînin ve girêdayî ye. Di modernîteya kapîtalîst de însan gurê însan e, ji ber vê eşq beriya her tiştî bi avakirina ew şûnên ku taybetmendiyên herî bingehîn ên ku însan dike însan û nirxên jiyana civakî bi awayekî azad dikare bijî ve girêdayî ye. Di roja me ya îro de eşq; tenê li ser arezûyên cinsî,di nav krîzê de li ser bingehê mêrê serwer û jina kole jiyan dike. Tabloyeke ku mêr bi awayê herî hovane û bi halê rûhî yê cinnetê bi piranî hevser an jî hezkiriyê xwe dikûje û bi rolên hezar û yek maskeyan ber bi hev ve diçin dertê pêş berî me. Em dikarin bêjin şahidiya têkiliyên bi aheng, bi rêz û hezkirin, ji civakîbûnê xwedî dibe û civakê xwedî dike, hevaltiya li ser asasê kedê, demokrasiyê, jiyaneke hevbeş û azad hema hema ne mumkine!

Di ev çend pirsgirêkbûna têkiliyan de faktorê herî diyarde, sorkirina cinsiyê ya zêde ye. Cinsiya ku di hemû xwezayê de bi zêdebûn û berdewamiya jiyanê ve girêdayiye, bi mêr re cûda jiyan dibe. Di rastiya şaristaniya ku jinê dike girtiyê mal û mêr, rolê asas yê cinsiyê dane arezûya cinsî. Lê di modernîteya kapîtalîst de, ji bo teqîna vê arezûya cinsî, pêşketina wê ya çeloxwarî û rizîna têkiliyên jin û mêr pergal bi her alî gelekî xebitiye. Weke objeyeke cinsî jinê di reklaman de bi karanînê bigre heta di pêşxistina pornoyê de, bi hev guherandina rolên jin û mêr bigre heta piyasaya ku cinsiyê sor dike û dike pîvanê asasê azadiya kesayet, kapîtalîzm bi gelek amûran xebateke teorîk-îdeolojîk ê cinsiyeke bi vî hawî,kesayet û civakê aniye ber keviya tûnebûnê. Kapîtalîzm  polîtîka xwe ya cinsî ya bi vî hawî afirandiye û dimeşîne. Di roja me ya îro de pergal di vê mijarê de ewqas ji xwe bawere ku îdîa dike bê bi polîtîkaya xwe ya cinsî dikare hemû aliyên civakê bike nêçîra xwe û bi vî hawî ji bo pergalê bike piyon. Di asteke grîng de vê bi ser dixe jî.

Bi vê polîtîkaya cinsî, jin jî mêr jî ji hevjiyana azad gelekî dûr ketine. Tişta herî bi êş jî kêminiya kesên ku di hizra vê rastiyê de ne û lêgerên hevjiyana azad in. Di nav rastiyeke wiha de, nîqaşkirina polîtîkayeke nû ya cinsî, li pêş çav girtina gelek zor û zehmetiyan, bi biryar bi her hêlê ve têkoşînkirina li hember hêzên pergalê, vegûhestina têgîna ku dibêje; ‘ azadiya cinsî azadiya takekesiyê ye’ û di fikir de rûniştiye û bi serxistina gelek erkên din ve girêdayî ye. Beralîkirina gelek sektorên endustriyê divê ku cinsiya di xwezaya mirov de ku enerjiyeke xwezayî ye lê ev endustrî vê enerjiye bi qanûnên kar ve girê didin. Hevjiyan û eşqê daxistine nexweşiya hevşabûnên cinsî yên rojane. Dane jibîrkirin bê di civakbûnê de têkiliyên cinsî çawa tên înşakirin û di xwezayê de bi zindiyên din re têkiliyên cinsî çawa ne. Li hemberî deshilatdariya hegomonîk ku birçitî û zêdekirina cinsî pêş dixe û li hemberî modernîteya kapîtalîst ku li gorî vê civakê înşa dike, bi her alî ve, şerekî her tim divê.

Îro ev têgihiştina cinsîtiyê û jiyana wê ku li ser civakê bi zanebûn tê ferzkirin heke rast bûya, wê mirovahî bextewar, serfiraz û azad bûya. Lê cinsiyeteke ev çend hatiye sorkirin, civakeke tam harbûyî diafrîne. Bunyeya civakê dikûje. Xwezaya jin û mêr a mîna beridandina gerdûnî pêş dikeve, vê şêwaza cinsitiyê ku di xwezayê de tune ye ne mumkine bi demdirêjî bi rê ve bibe. Wê ev yek zû an dereng di kesayetan de

A grîng ewe ku di vê mijarê de ji holê rakirina cahiliya civakê ye. Divê nîqaşên polîtîkayên cinsîtî yê bi cewherê xwezaya civakî û çandê re di nava ahengekê de ye bê pêşxistin. Ji ber van sedeman, hevjiyan ji qadên bingehîn ê Jineolojiyê ye ku li ser lêkolîn bike, nîqaş û tezan pêş bixe.

Wê bi ezmûna têkiliyên hevjiyanê bê fêhmkirin ka me ji şêmûka mirovbûnê derbas kiriye an na. Jineolojî, ji bo ku her însanek di vê ezmûnê de bi serkeve asta têgihiştin û daneheva ku divê bi destxe bixe ye. Zanista jinê ku îddîaya me ye, beriya her tiştî, bi naskirin û wate dayîna xwezaya jin û mêr wê jiyanî bibe. Ji ber vê teoriya hevjiyana azad; wê weke qadeke bingehîn a Jineolojiyê pêş bikeve.  Jineolojî bi pêşxistina vê qadê; di serî de li Rojhilata Navîn di nav gelek çandên cuda yên gelan de têkiliyên jin û mêr lêkolîn dike û bi narîniyeke mezin vedikole. Harbûna ku pergala kapîtalîzmê rojane dide jiyankirin, ne rastiya xwezaya civakî ye. Di nav gelek çandên gelan de her çend hatibin jibîr kirin û ji bo roja me ya îro bandora xwe kêm bûbe jî derbarê hevjiyanan de gelek kevneşopiyên bi kok hene ku em dikarin ji wan feyz bigrin, dersên grîng jê derxin û manewiyata xwe xwirt bikin. Dema ku em wekheviya jin û mêr, rêzdariya li hemberî hev, di qadan de berpisiyariya hevbeş û dabeşkirina kar dinirxînin, ev çand li pêşiya zanista civakî, zanistên sosyolojî û demografyaya roja meya îro ne.

Di vê mijarê de li Kurdistanê wekheviya jin û mêr ên di Mazdekîtî/Xurremîtî, Yarsanî û Elewitiyê de tê parastin û ji hêla hêzên serwer ve bi awayê; ‘ Di nav însanan de, wekhev parvekirina jina’  tê beravajîkirin, hêjayê lêkolînê ye. Piştî Zayînê di dawiya sedsala 5. û destpêka sedsala 6. de piştî anîna rêgeza wekheviya jin û mêr ji hêla Mazdek ve, bi pejirandina Hikimdarê Sasanî yê demê Kawadê (Kawaz) yekemîn ve, tevahî haremên qesr û mîrîtiyan tên belav kirin. Jin tevlî jiyana civakî dibin. Ev pêkanîn ji hêla mêjiyên ku jinê tenê mîna cariye û malê harêmê dibîne ve her çend hatibe çeloxwarîkirin jî; di nav çandên bi kok ên gelan de di hin hêlan de, nîşanî me dide ku ji têkiliyên jin û mêr ê roja me ya îro bêtir bi nirxe. Disa di nav Yaresaniyan de bi taybetî di sedsalên 7-8. heta ber bi sedsalên 12-13. ve bi qasî 12-15 helbestvanên jin hebûne. Navê hin ji wana; Celale Xanima Loristanî, Dayê Tewraza Hewramî, Rihan Xanima Loristanî, Lîza Xanim, Nazdar Xatûn û Nêrgiz Xanim in. Ji bilî nivisandina helbestê taybetmendiyên ku van jina bêtir grîng dike ewe ku di heman demê de ev jin pêşengên olî ne jî. ‘ Di rîtuelên Yaresaniyan de afîrînerên berhemên helbestwarî di heman demê de niviskarên pirtûkên pîroz in jî. Ne tenê berhemên helbestî, metnên olî yên ku asasên exlaq, şîretên olî û îbadetê diyar dikin, hin beşên wan ji hêla mêran û hin beşên wan jî ji hêla jinan ve hatiye nivisandin.’ (16) Bi mêran re hevbeş nivisandina pirtûkên pîroz ên baweriyekê, bi wan demên ku ola xwedavenda dayik hakim bûye ve girêdayîye. Û heke di baweriya gelekî de ev rewş hatibe jiyankirin, di hêla hevjiyanên azad de, wê bawerî û çandê dike mijara lêkolîn û vekolana ku eleqeyeke bi vî rengî heq dike. Li ser vî asasî, Jineolojî   wê çandên Kurdistanî , hevjiyanên azad çawa pênase kirine û çawa jiyane, wê bike mijarên lêkolînên berfireh.

Di vê mijarê de çandeke din a divê bi baldarî were lêkolînkirin jî kevneşopiya bi kok a Zerdeşti ye. Felsefeya têkiliyên jin û mêr a vê kevneşopiyê, bi bawerî û çandê ve girêdanên wê û teyisandina li ser dema me,di lêgerîna afirandina hevjiyanên azad de, wê bibin çavkaniyên sereke yê ku emê berê xwe bidinê.

Lêkolînkirina Mosuoyiyên ku li Çînê her çend kêm bin jî, Nagovîsiyên li Girava Bouganvîllê dijîn (Li Bakûrê Awustralyayê, li beramberî Gîneya Nû ya Papua) ku jin serweriyê dikin, Mînangkabaularê ku li rojavayê Sumatraya Endonezyayê, Khasîlerê dewleta Meghalaya bakurê rojhilatê Hindistanê, Atabaskên Alaskayî, Brîbriyan, Fîlîpînî ( him dayiksalarî him baviksalarî), Garoyî, Hopî, Îbanî (him dayiksalarî him baviksalarî), Îrokuayî, Synteng, Karen, Hassî, Marşallî, Sîrayî, Tlîngîtî, Vanatînaî, Sînîxt (18) û komên cuda yên kî dizane dibe ku li deverên hê nehatine keşifkirin dijîn, ji bo ezberên me yên di mijara hevjiyanên azad de bişkînin, grîng e.

Hevaltiya Rabîa Adewiye û Hesen Basrî ku derwêşên herî navdar ên tevgera Zuhd-Zahidiyê ne balkêş e. Ev gotinên Hesen Basrî ku dibêje; ‘ Ez û Rabîa tam 24 saetan bi hev re man. Li ser tarîqat û heqîqetê axivîn. Di vê maweyê de nehate bîra min ku ez mêr im û nehate bîra wê ku ew jin e.’ me dide fikirandin bê di tekkê de pîvanên têkiliyên jin û mêr bê çawa ne. Dîsa gotina mutesewifê navdar Beyazid Bîstamî yê di heman demê de jiya ye ku dibêje; ‘ Pîrê min jineke’ gelekî balkêşe. Ji bo mirov bi perspektîfeke cuda li têkiliyên jin û mêr binihêre mînakeke seyr e. Disa mutesewifê navdartirîn yê demê Îbnî Erabî di derbarê jinê de di nirxandinên xwe de îfadeya ‘bi qasî ku Xweda di sûretê jinê de dibîne’(20) bi kar aniye. Di navbera sedsalên 8 – 12 an de li qada tesewifê çalakiyên jinan û têkiliyên wan ên bi tesewifvanên mêr re, heta bibêjî di taybetiyeke balkêş de ye. Ev balkêşî; derbarê têkiliyên jin û mêr û hevjiyanên azad de ji Jineolojiyê re, deriyên tecrubeyên pir dewlemend ên li Rojhilata Navîn hatine jiyankirin vedike. Jineolojî wê bide dû van tecrubeyên ku di van deriyan de xuya dikin.

Heqîqet hin caran di hûrgûliyeke bi hezaran an sedan sal berê de veşartiye.Ji ber vê jin û mêrên ku bi îddîaya afirandina hevjiyana azad radibin, şerte ku noqî deryaya berfireh ê erdnîgarî û nirxên çanda xwe, her wiha nirxên bi hezaran sal ên xwezaya civakî bibin û avjeniyê bikin. Ew nirx, ya rast di her kêliya jiyanê de bi me re diaxivin. Tenê em dengê xwe yê hindirîn ji dest nedin û teşqeleya jiyanê bidin aliyekî û gûh bidine vî dengî.

Jineolojî wê rêgezên beralîkirin û bihurandina pirsgirêkên derbarê hevjiyanê de, bi jin û mêran re wê bixe rojeva qadên civakî û nîqaşan pêş bixîne.Dîsa Jineolojî rewşa heyî yê zarokan ê di nav malbatê de û asta ku divê, bike mijara nîqaşan. Ji ber ku lêgerîn, hewldan û têkoşînên heyî li ser rêgez û bi awayekî hevgirtî bi berdewamî nabin, krîzên hevjiyanan qat bi qat dewam dikin û tevahî xwezaya civakî tehdît dikin. Em vê tehdîtê bi nêrîn, çavderî û hestiyariyeke Jineolojîk dibînin, têdigihîjin û nîqaş dikin.

Heke mirov di têkiliyên jin û mêr de koletiya tê jiyankirin binihêre û derfetên azadbûna di vê qadê de jinedîtîve were, wê pirsgirêk dîsa neyê derbaskirin. Ev derfetên azadiyê çi ne? Ev cota xwezaya civakî, heke di nav şert û mercên gelek zehmet ên xwezayê de bi hev re jiyana civakî ava kiribin û jiyankiribin, îro jî dikarin bi rengekî azad, wekhev û demokratîk têkiliyên jin û mêr ava bikin û bijîn. Ji bo vê, divê jin jî mêr jî xwe azad bikin. Heta ev pêş nekeve, ne ferdên baş û qenc dibin, ne di navbera jin û mêr de têkiliyên baş ên hevjiyanê pêş dikevin, ne jî di qadên azadiya civakî û siyasi de rolên xwe dikarin bileyzin. Heta dubendiya mêrê serwer û jina kole neyê derbaskirin, têkoşînên ji bo azadiyê jî nikarin serkeftî bibin.Heke zîhniyeta ku têkiliya mulkiyet û deshilatdariyê li ser jinê ferz dike were derbaskirin û jin jî ew

elimandinên fikrî û hestî yê ku di nav vê dîroka dirêj de girtiye derbas bike, têkiliya jin û mêrê azad dikare pêk were.

**Ji Bo Ronakbûna Jinê**

Ev nirxandina Rêber Abdullah Öcalan ku dibêje; ‘Bê nîqaş e ku jin weke hem fîzîkî û hem jî wate, beşa herî berfireh a xwezaya civakî pêk tîne. Wê demê, çima vê perçeya xwezaya civakî ku ewqas grîng e, nebe mijara zanistê? Ta ku xwezaya jinê di taritiyê de bimîne, wê tevahiya xwezaya civakê weke neronîbûyî bimîne. Ronîbûyîna rastîn û berfireh a xwezaya civakî gengaz e ancax bi ronîbûyîna berfireh û rasteqîn a xwezaya jinê. Zelalkirina şûngeha jinê, ji dîroka mêtingehbûna wê heya mêtîngehbûna wê ya aborî, civakî, siyasî, zîhnî(mejî) wê tevkariyeke mezin bike li zelalbûyîna tevahiya bi her milî ve mijarên din ên dîrokê û civaka rojaneyî.’ ji aliyekî din ve nîşan dide bê çima pêdivî bi Jineolojiyê heye.

Beriya her tiştî, ji bo rastiya jinê ya heyî ronî bibe Jineolojî! Rastiya jinê, qadeke ew çend hatiye tarîkirin, di tariyê de hatiye hiştin û ji bo di nav tariyê de bimîne karên tarî hatine kirin ku ji bo ronîkirina vê qadê, roniyên lawaz, parçeyî, demdemî, berdîberdan û belave têr nakin. Li hemberî berdewamî û israra tarîtiya sîstematîk a ku li ser rastiya jinê tê ferzkirin, bi qasî erîşkariya vê taritiyê, ronîbûneke jinê ya ku ji vê taritiyê derbas bike hewce ye. Nîvendkirina (Lêcivîna)şewqa ronahiya jinê, tîrbûna wê, bi pergal bûn, hedefgirtin û berdewamiya wê divê.Wê ev ronî bizanibe bê kengê, çawa, li ku derê, bi kîjan hêlî û bi tîrbûneke çawa bide.Wê bizanibe kîjan tarîtiyê ronî bike û ji bo vê çiqas û çawa bimîne.Di tarîtiyê de wê şerê xwe, tarîtiyê, xwe bizanibe, her wiha berdewamiyê jî. Ya herî grîng jî wê çavkaniyên tarîtî û roniyê bizanibe. Di sedsala 21. de; li hemberî taritiya li ser jinê tê ferzkirin, reşkirinan, karên tarî yên li derdora nasname û jiyana jinê de, ji dinyaya jinê, bi destê jinê, bi aqilê jinê, bi ruhê jinê, bi sehekiyên wê û bi dîroka jinê pêdivî bi roniya jinê, şewqa jinê heye.Di dîrok û rojaneya reşkirin û tarîtiyên em xistinê de, bi pêşketina Jineolojiyê, di serî de qada dîrokê û qadên din wê ronî bibe.

Jin heke bikeve ferqa înşaya tarîtiya li derdora xwe, dikare wê hilweşîne...Lingekî vê tarîtiyê, girêdana hestên xwirt ên jinê ne ku bi olpereziyê ve hatiye girêdan. Lingekî din girêdana hestê welatparêziya jinêye ku bi dewletparêzî û netewperestiyê ve ye. Lingê din li dibistanan xesandina potansiyela xwirt a mêjiyê jinê ye ku ber bi pozîtîvîzmê, zanistperestiyê hatiye herikandin û girêdan. Lingekî din jî hestiyariya jinê ya bi hezar û yek rengan xemiliye ku mîna rojê germ û dewlemend e lê di bin navê fedekarî, dayiktî û hezkirinê de bi mêtingeriyê ve hatiye girêdan. Meriv dikare gelek taritiyên ku li ser xwezaya jinê, dinya û nasnameya wê pêk hatiye rêz bike.Lê lingên wê yên asasî bi vî hawî dikare bê îfadekirin.

Divê her jin yek bi yek çîroka dîrokî ya pêkhateya van înşayan û dîsa çîroka bê rojane ev çawa tên înşakirin bizanibe. Heke jin bigihîjin vê têgihiştinê wê ev lingên tarî bikevin. ‘Derbarê xwe de xwedî hişmendî, bê şik û gûman di gerdûnê de hebûna herî bêhempa ye. Beredayî xwedatî lê rûneniştiye.’ (21)tam jî xitabê kesên xwedî van çîrokan dike.Jibo em derbarê xwe de xwedî hişmendiyê bin, xweşhaliya vê bijîn û dinyayên tarî yên li ser me hatine avakirin hilweşînin, em dibêjin **Jineolojî**!

Ji bo ev dinyayên tarî werin hilweşandin, bedena jinê, ruhê wê, aqil û dilê wê azad û ronî bin, divê em Jineolojiyê pêş bixin. Jina ku van dinyayên tarî ferq dike, dest bi

lêpirsînê dike, dixwaze rizgar bibe lê ji ber ku tenê ye, têra xwe xwirt û rêxistinkirî nîne û nizane wê çawa vê rizgariyê pêk bîne, têk diçe,bi her têkçûnekê bêtir di lîtava koletiyê de asê dibe an jî tê qetilkirin. Ji bo em ji van qetil û qirkirinên jinê re bêjin; 'Raweste!', û hîmên wê saxlem deynin, em dibêjin **Jineolojî.**

## Ji Bo Teoriyeke Zaninê ya ku Digihîne Pêkhateya Civaka Azad û Takekesa/ê Azad

Ji avakirina binyatên ramanê yên li ser bingehên mîtolojî, felsefe, ol û zanistê heta niha, têgihiştina ku zanistê di bin hikmê mêr de dibîne, vedîtin û afirandina cewherî ya mêr dihesibîne û qadeke mêr a ku dikarin li ser tecrubeyên xwe biaxivin qebûl dike heye. Di cewhere xwe de beşek giran rastiya vê têgînê jî heye.Ji avakirina deshilatdariya mêrê serwer heta niha, bi alîkarî û şekilgirtina bê sînor a van her çar qadên ramanê, zanîn ji jinê, jin jî ji zanîne hatiye dûrxistin. Ji bo vê jina di mîtolojiyê de, di şexsê Tîamatê de bi destê kurê xwe Mardûk ve tê kuştin.Jina di olê de bi alîkariya hevalê xwe yê mar ji ber ku ji dara zanînê sêvê birî û da hevserê xwe ji buhiştê hate qewitandin. Di felsefeyê de jin di pênaseya; 'jin mêrê seqet e' de hate sicinkirin. Di tevgera ramanê ya Ronakîbûnê de ku zanist hê gavên xwe yên destpêkê diavêt, jin a 'cadû' li ser qazoxan bi saxî hate şewitandin. Hin caran keç li pêş çavên dayika xwe û hin caran jî dayik li pêş çavên keça xwe şewitîn lê wicdanê zanistê qet neliviya. Ji ber  ku li gorî zanistê wicdan diyardeyeke metafîzîk bû û wicdan nedihat ceribandinê, nedikete dest, nexwe tune bû.

Ji bo ku jin careke din bi zanyarî-zanîn-zanistê re, bi taybetî jî bi zanatiyê re negîhîjin hev, mîtolojiyan qetlîama dayikê jî mîna qehremantiyê pêşkêş kirin. Olan jinê kirne hevalên şeytên ku nefreta civakê, herî zêde jî nefreta mêr li ser vî melekî bû ku li hember xweda serî rakiribû. Felsefe bi 'bêhişiyê' ew piçûk dît, zanist pêdiviya pênasekirina hebûna wê, di bin navê disîplînekê de pêdiviya lêkolînkirina wê nedît, bi vê kirinê weke însên ew nehesiband. Jin weke ku mêtingehiya mêtîngeriyê, koleya yekem û ya herî kevn, heta yê mîna hemû azadiyên din, mafê wê yê wergirtina zanînê, afirandina zanînê û têkiliya bi zanînê re hatiye şewitandin, di bin xirbeyên şoreşa gund a neolîtîkê ya ku wê afirandibû de mabe.

Xasûkiyeke ku aqlê mêrê serwer keşif kiriye û bi hezaran sal ew çerx kiriye eve ku kê bixwaze ji bo ew tune bike, dema nêzî wî bibe dike hezar û yek parçe. Fermanekî keşfa xasûkiya vî aqlî dibêje ku divê jin êdî tu carî negihîje zaninê û zanîn jî tu carî divê bi hişmendiya jinê ya bi hestiyar, hîs û hizir ve dagirtî re nebe yek. Ji bo ev ferman kite bi kite pêk were dinyaya baviksalarî ya ku mêrê serwer ew afirandiye, di mîtolojiyê de efsaneyê, di ol de bi navê xweda ferman dayînê, di felsefê de ku mîna hezkirina zanînê tê pênasekirin ji jinê kerixînê, di bin navê zanistê de jî îşkencekirina wê ji xwe re heq dîtine.Û bi van lîstokan aqilê mêr deshilatdariyê bi dest xistiye.

Her çend piştî pênc hezar salan li ser hîmên zanîn, zanist û zanyariya dizî ya deshilatdariyê nîqaş pêş bikevin jî, ev yek heqîqeteke mircanê îspat dike. Her wiha li hember hişmendiya jinê ya nazenîn, hestiyar, bi hîs û hizir binketina vî aqlê mêr ê serwer dike, ruxmî fêlbazî û leyistokên vî aqlî. Ji ber ruxmî ewqas hewldan nikaribûye bibe asteng bê ji nû ve jin xwe bigihîne zanînê û zanîn jî xwe bigihîne jinê. Zanîn-zanist-zanatîya diziye û çavkaniya zanatiya dayik ku bivê nevê dixwaze tune bike

vedigere hişmendiya jinê. Ji bo bîreweriya rûhê hemû jinên zana û cadû yên ku bi hezaran salan hatin qetilkirin û ji bo ev veger bi awayekî saxlem, etîk-estetîk pêk bê û didariyeke ji nû ve bi civakê re, em dibêjin **Jineolojî**!

Di dîroka bi hezaran salî de, zanîn, bi daneheva ceribandinên civakê ve pêk hat. Dibe ku li gorî zanistê 2,5  milyon sal berê yê/ya ku hişkebera bi hev daye û amûrên destpêkê çêkiriye û bi kar aniye Homo Habîlîs e, yanî Mirovê bi Kêrhatî.Çêkirina kevir bi destê Mirovê/a bi Kêrhatî zanist û teknîk jî destpê kir.Lê ew pêvajoya heta çêkirina wî kevirî pêvajoya danehevê ye. Di vê maneyê de zanînbi civakî hatiye hilberandin.Di civakên dayiksalarî yên ku nasnameya civakî û derdor a jinê palpiştiyê dike, hemû pêdiviyên jiyanê yên rojane (şer û aşitî, çandiniya axê, sewalkarî, starbûn, koçberî, têkiliyên jin-mêr û zarok) bi zanîna civakîbûna jinê ava kiriye û pêş xistiye, hatine pêşwazîkirin. Ev pêvajo, heta destpêkirina demên baviksalariyê bi deh hezaran sal, bûye forma jiyanê ya mirovahiyê.

Dinyaya baviksalar ku vê dîroka qirase nejiyayî dihesibîne,hemû zanînên bi nirx ên di destê jinê de dizî û dî zîguratên xwe de, dibistan, leşkergeh, navendên lêkolînê yên zanistî û di zankoyên xwe de, bi gotina 'yên min in' mohr kiriye.Piştre hemû karên jiyanî yên ku jin dikin weke 'karên jinan' bi nav dike , aqil û nasnameya jinê 'darê şikestî' piçûk dibîne. Lê di nav ew karên ku weke 'karên jinan' nav lê dike û piçûk dibîne de, di roja me ya îro de jî hişmendî, nazenînî, hesab û pîvaneke bêhempa heye. Zanatî heye. Tê de ruhekî germ û xeşîm ê wan demên ku zanîn hê yekdestdar nebibû an go ew demên ku zanîn hê neketibû bin destê yekdestariyên zaliman û ji hêla wan ve nedihat birêvebirin heye. Destê bi şîfa yê dermanê mirov heye. Dewlemendiyeke zanînê ya ku birra hez dike heye. Peyvên bi cewher ên ku peyvên herî akademîk li hember şift û tazî dimîne heye. Zanatî, zanîn, zanist û zanebûn ji ruhê axekê, ji ruhê zemanekê xwedî dibe. Hevîrê wê bi însên, bi ceribandin û serpêhatiyên însên ve tamê digre. Zanîn bê ruh nabe. Vî ruhî ji hemû nirxên civakî yên bedew, bi wate û yên ku jiyanê rengîn dikin bi dest dixe. Ji bo lêger û bi destxistina ruhê zanînê ku di roja me ya îro de zanîn ruhê xwe wenda kiriye, sar û qerisiye û analîtîk maye, em dibêjin **Jineolojî** !

Kî, çawa, bi berdêla çi û bi kîjan amûran digihîjin zanînê? Kî bi çi hawî zanîna xwe gihandinê bi kar tînin? Hemû zanîn û zanatî mîna ku hin bizavên femînîst û post-modern îdîa dikin, deshilatdarîne gelo? Li gorî me têgihiştina ku dibêje; 'Zanîn wekhev deshilatdariyê ye, zanebûn, zanîn û zanatî wekhev deshilatdariyê ye, ji ber vê yekê jî bila ji me dûr bin, em her cureyê wê red dikin' bi awayekî cuda moderníteya kapîtalîst anîna ziman e. Ev yek palpiştiye ji nêzikahiya zanîna deshilatdariyê re ku ji bo jin û zanîn bi hezaran sal ji hev dûr bikevin, ew qas operasyonên bîrdozî, siyasî û aborî li dar dixin, bi zora çor û bîrdozî di nav de bi kar tînin. Heke di çavkaniya hin pirsgirêkên bingehîn de nezanî hebe, bi zanebûn ji zanînê dûrxistin hebe; mirov zanînê bigihîne wan qadan an jî pêvajoyên zanînê pêş bixe û bibe alîkar ku ew bi xwe zanist û rêbaza zanîngirtinê peyda bikin, gelo ku dera vê deshilatdariye? Em têgihiştina ku dibêje; 'Zanîn tenê deshilatdari ye' red dikin. Bi hezaran sal zanîn, zanist, zanatî û zanyariyê ji jinê dûr xistibin jî; em dibêjin ew hilberîn û afirîneriyên cewherî yên wan bi xwe ne.

Zanîna jinê ye ku jiyan û jiyana civakî, hezkirin, edalet, azadî û gelek nirxên bedew û xweşik ê ku mirov kirine mirov afirandiye. Zanyariya wê, avahî û formên wê ya zanînê ne. Her çend bi awayê zorê jinê ji jiyana civakî dûr xistibin jî ku demekê jin kirdeyên sereke yê jiyana civakî bûn, ev zanyarî di dilê jinê de, di hewza wê ya gen de, di ruh û mêjiyê wê de her tim jiyan kir. Jineolojî di nav vê hewza wê ya zanyariyê de şax da. Em bawerin wê pêdiviya zanyariya vê serdemê jî, bi epîstemolojiyeke nû ku karibe bibe bersiv ji pêdiviyên bingeh ê jiyanî re dê bi destê jinê pêk were.

Armanca esas a avahiyên fikrê yên di hezar salan de hatine avakirin, berdewamî û ewlehiya sazîbûyîna baviksalariyê pêkanîn e. Mirov li vê rastiyê bifikire jî ji bo dest ji epîstemolojiyên bi patenta modernîteya kapîtalîst berde sedemeke têr û tije ye. Hemû zanînên ku bi hezaran salan hatine avakirin, bi taybetî ji bo ku di nav pergalê de bimînin, tevahî hêzên desthilatdariyê di nav hewldaneke taybet de ne. Ji bo ku hemû zanîn, bi qasî sînorên zanînê yên ku pergalê raber kiriye pêş kevin, bi dest û aqlê hêzên desthilatparêz û dewletparêz, tedbîrên piralî û zirav hatine pêşxistin. Ji bo ti awayê zanebûnê yan jî pêkhateya zanînê ji pergalê re nebin gefeke esasîn, demdirêj û kur, li hindir û derve tedbîrên cur be cur afirandine. ‘ Pêkhateyên zanînê di vê mijarê de her tim di nava du şaşitiyan de çûne û hatine: yan di nava pêkhateyên zanîn û desthilatiyê de bi tevahî heliyane, yan jî bi awayên mezhebên sekter (bêyî ku karibin zanistên xwe, bijareyên xwe yên siyasî û helwestên xwe yên exlaqî bi rengekî serbixwe bibijêrin), nekarîne xwe ji bicûrkbûyînê yan jî ji bûcirkmayînê rizgar bikin. Bê gûman di vê yekê de pêwîst e mirov bi berdewamî rola zorê û sermaye, ku mirov ji serî derdixin, li ber çavan bigire. Ta ku van herdu ferasetên pêkhateyên zanînê neyên mehkûmkirin,  mirov nikare bijareya şaristaniya demokratîk bide xuyanîkirin.’

Em di nav van tespîtên hêja yên Rêber Abdullah Öcalan de aliyên ku jinê eleqedar dike xeyal bikin. Di roja me ya îro de jî gelo di nav pêkhateyên zanist deshilatdar de talûkeya helandin an jî qot mayînê heye an na?Weke tevgerên jin gelo me vê talûkê beralî kiriye an na? Ev pirs pirsên jiyanî ne. Di wateya rastîn de pirsen jiyanî ne! Em jin heke bersivên têr û tije yên ku wê veguhêzin polîtîkayeke pêkanîn û pratîkê nedin van pirsan, ev dinyaya mêrane her kêlî, her deqîqe li her devera dinyayê canê me distîne. Di vê qirkirina rojane de gelo çiqas para pêşnexistina me ya epîstemolojiyeke rast an jî ji bo gihandina epîstemolojiyên rast peydanekirina me ya rê û rêbazan heye?

Ji bo zanînê pirsên me yên bingehîn hene. Di pêvajoyên dîrokê de awayên zanînê û rêbazên gihandina zanînê yên jinê çi bûn? Çavkaniya zanînê çi ye? Zanîn bi kêrî çi tê? Kî/ê, çawa û ji bo çi zanînê diafrîne? Divê zanîn di xizmeta kê de be? Divê têkiliyên zanîn û jiyanê, zanîn û civakê, zanîn û jinê çawa pêş bikevin? Jineolojiya ku em weke zanista jiyanê jî pênase dikin; em zanînê çawa kom dikin, jiyan, civak û jiyana me ya civakî em bi van zanînan çawa ava dikin û divê bikin  jî digihîne îfadeyekê.

Beşeke grîng a zanîna jinan ji ceribandinê pêk hatine. Piranî mirovan çi bibinin ji wê bawer dikin. Jin jî wisa. Baweriya wan bi zanîna dinyaya ku tê de bi rojane tên qetilkirin, bi destavêtin û destdirêjiyê re rû bi rû dimînin, di nav şer û pevçûnan, koçberî, feqîrî û bêkariyê de dixeniqin heye. Em tevgerên jinê, dikarin ji vê rastiya jinê, pêkhateya zanîneke razber, wê parçeyî dibine an jî nabîne, li gorî berjewendiyên xwe dibîne, teoriyeke elît jî derxînin.  Bi ceribandinên wan ên zanînê em dikarin danehevek bi hevpariyên ku me jiyan kiriye jî pêk bînin.  Bi hevpariya cêribandinên wan ên zanînê, em dikarin ji hevpariyên me jî berhev bikin. Jiyan û gerdûn, hinek zanînan, tenê ger tu li mekan û demên diyar bî û li ser nêrîneke rast bî û carna jî kesa rast bî bi te re parve dikin. Her kes nikare bigihîje her zanîna rast. Her zanîn di her şert û mercî de nayê çêkirin. Îro em pir bixwazin jî, derbarê mêjiyê mirov yan jî civakîbûna delfînan de em her tiştî nizanîn. Heta dibe ku di vê dinyayê û gerdûnê de, bêhejmar diyarde, zanîn an jî rewşên ku em dizanin ku derbarê wan de ti tiştekî nizanin jî hebin. Dema mirov vana li ber çav bigire, jin zanînê ji ku deran, çawa, kîngê

û bi kîjan rê û rêbazan, bi kê re û ji bo çi yanê bi kîjan armancan wê berhev bikin û ava bikin? Ev pirs bêtir girîng dibe û careke din pirskirinê heq dike. Alessandra Tanesînî dibêje; “*Di zanistê de kîjan pirs hêjayî lêkolînê ne, cinsparêzî û netewparêzî dikarin bandorê li ser wan bikin. Ev pêşdarazî, dikarin li ser bersivên ji pirsên zanistî re tên dayîn jî bandor bikin. Mînak; (fikra) weke di dolgirtinê de hêk pasîf e*.” Bîrdoziya baviksalar û deshilatdar, li gorî berjewendiyên xwe dikarin şekil bidin zanînê. Dikarin pêkhateya zanînê xera bikin, texrîb bikin û veguherînin amûreke derew, şaşkirin û xapandinê. Wisa be em jin, li hember gavên modernîteya kapîtalîst ên mîna netewparêzî, olparêzî, zanistparêziyê ku ji bîrdoziya cinsiyetparêz xwedî dibin, emê her tim gumanbar bin. Tevî ku em ê pêkhateyên zanînên xwe yên heta niha lêpirsîn bikin, ji niha û şûn de em ê çawa zanînê berhev bikin û li ser çi bilind bikin baş hilbijêrin.

Kîjan zanîn zanîna rast e? Zanîna bi qasî pêwîst dike çi ye? Berê civakan bi qasî ji wan re pêwîst kiriye hilberandine. Niha pergal, bêsînor hilberandina zanînê pêşberî me dike. Di vê enflasyona zanînê de kîjan zanîn zanîna rast e? Zanîn çi ye? Çawa û çima tê hilberandin? Bi kêrî çi tê? Kî zanînê diafirînin? Kîjan zanîn berhema kîjan dem û mekanan e? Pîvandina rastiya zanînê çawa tê kirin? Dikare were kirin? Çend cure zanîn hene? Zanîn çawa tê avakirin, çawa tê xerakirin? Zanîn çi hildiweşîne, çi înşa dike? Em zanîna derbarê xwe de dikarin çawa bizanibin? Têkiliya zanîn-cêribandin, zanîn-têgihîştin û zanîn-diyardeyê çi ye? Hêza guherîn û veguherîna zanînê çi ye? Zanîn bi rêya pratîkan tê avakirin? Bi sehekan? An jî bi çavdêriyan? Di heqîqeta me, di rastî û jiyana me de cihê zanînê çi ye? Em dikarin derbarê zanînê de çi bê bîra me, bêsînor û bêhejmar pirsên sivik jî bipirsin.

Epîstemolojî; bi navên mîna teoriya zanînê, zanista zanînê, zanista gihandina rêbaz û zanînê, avahiya zanînê, felsefeya zanînê û pergala fikran û hwd. tê ravekirin. Epîstemolojî, ji peyvên epîsteme-zanîn, gnosîs-zanist û logos-doktrîn, tê maneya zanist-zanîn û gnoseolojî, zanîna zanînê. Carna jî mîna xwezaya zanînê, çavkaniyên wê, kokên wê, nirxa wê, weke şaxeke felsefeyê ya bi bergeh û çavkaniya wê re eleqedar dibe yan jî lêkolînkirina zanîna felsefîk tê nasandin. Epîstemolojî; dîsîplîna fikra felsefîk e, ka em zanînên xwe çawa dizanin, em ê çawa îspat bikin, zanîna me rast e an na nîqaş dike. Em dikarin bibêjin zanîna rast û şaş ji hev veqetandin e. Rêber Abdullah Öcalan jî epîstemolojiyê mîna “*zanista gihandina rêbaz û zanînê*” pênase dike.

Ji çaxên destpêkê ve fîlozof, ketine nav lêgerîna fêmkirina gerdûn, xweza û civakê. Fikrên ku ev lêgerînvan gihanê cuda bûne. Vê carê jî lêgerînek li ser ev fikrên cuda yên gihanê û çavkaniyên vana pêş ketiye. Aqlê mirov zanînê çawa berhev dike, çawa dixebitîne û li ser vana çawa digihê hikman? Zanîna rast, saf heye? Hebe çi ye û mirov çawa digihê? Li derdora pirsên wiha lêpirsîna rastiya zanînên mirov û pêvajoya rê li ber felsefeya zanînê vekir dest pê kiribû. Bi demê re felsefe yan jî teoriyên zanînê yên pir cuda ku xwe dispêrin qalibên diyar, rêgez an jî şêwazan pêş ketin. Ev hemû bandorî û rengên dem, mekan û çanda têde pêş ketine digirin. Weke mînak felsefeyên zanînê yên fikra Ronakbûnê; li ser fikra Kartezyen pêş dikeve. Fikra Kartezyen, mîna alternatîfek ji desthilatiya teolojiya ku gerdûnê li gor fikra Xweda rave dike, zanist û aqil esas digire. Fikra Kartezyen ya Descartes pêş xistiye, bi nirxandina ‘her tiştên aydî zêhn in, li derveyî bedenê ne, her tiştên aydî bedenê jî li derveyî zêhn e’ xwe dispêre dijayetiya zîhîn û bedenê. Yek ji kesayetên herî li pêş ê Ronakbûnê Descartes, ji bo zanistê dibêje ‘zanîna misoger a aşkere’. Ji bo wî îhtimal betal û pûç in.

Ji sala1980an û pê ve fikirdarên femînîst epîstemolojiya kevneşop rexne kirin. Diyarkirin ku derbasdariya teorî an jî zanînê bi kesên ku ew pêkanîne ve girêdayî ye. Her wiha têgînên heqîqet, objektîfî bi nirxan ve ne girêdayî ye û ev yek serweriya mêr pêk tîne. Ji ber vê jî teoriyeke nû ya zanînê ku pêdiviya redkirina vê diparêze pêşxistin. Epîstemolojiyên heyî him weke naverok û him jî weke pêkhate rexne kirin. Pêkhateya fikirandina rojava ya bi terzê nêr ku tenê aqil esas digre û zîhîn û beden ji

hev cihê dike da ber lêpirsînê.

Epîstemolojiyên femînîst ên li ser vî hîmî pêş ketin, her çiqas pirparçeyî bin jî hin rêgezên hevpar parastin; “*zanîna heyî ku ji aliyê tora wate û nirxên xwe dispêre nêrîn û perspektîfeke civakî ya diyarkirî pêk hatiye deşîfre kirin.*”**(22)** Bi nêrînên alternatîf, ji epîstemolojiyên ku li ser xweza û jinê desthilatdariyê ava dikin, epîstemolojiyên alternatîf pêş xistin. Li şûna nêrîna feraseta epîstemolojiya Rojava ku li ser dijayetiyê ye, têkiliyên di navbera du aliyan de, mînak di navbera subjektîvîte û objektîvîte, aqil û hest de nirxandineke rast û li gor pêdiviyê parastin. Gotin ku divê em, di zanînê de rola hest, sûbjektîvîte û bedenê cidî bigirin. Gotin divê em aqil, hest, objektîvîte û subjektîvîteyê weke taybetiyên di yekdestdariya mêr an jî jinan de nebînin. Dîsa hin epîstemolojiyên femînîst, bawer kirin ku li ser zanînê her tim bandora subjektîvîtiyê heye. Ji ber vê yekê hewl dan ku teoriyên zanînê yên bi fikra jin û sûbje re biaheng in deynin holê.

Îtîraza Jineolojiyê ji bo van tune ye. Hemû jî rêgezên jiyanî yên ku divê bibin bingeha felsefeya zanînê ne. Tevî avakirina epîstemolojiyên alternatif, aliyên femînîzmê yên parçeyî dimînin û hevpar nabin hene. Di heman deme de dema ku pêşniyara hevparbûnê ya rêgezên bingehîn tê kirin jî refleksên ku vê mîna homojenbûnê dibîne, bi zeaf û ji binketinê re vekirî  nişan dide heye.Dîsa hin meylên femînîst  ên ku hemû awayên zanînê rasterast bi deshilatdariyê re girêdayî dinirxînin, di nav her cure zanînê de her tim li serweriyê digerin, epîstemolojiyên femînîst ên heyî ku ji rexne û rexnedayînê re nevekirîne, li gor zanîna jinê avakirina dinyayê mîna kêmasiyekê dinirxînin, baweriya ku emê bikaribin civakê biguherînin nişan nadin jî hene.  Meylên bi vî rengî dibêjin, her kesek û rastiyeke xwe heye, hemû nasname di encama avakirineke jor in, li ser navê hinekên din avakirina dahatûyekê nêzikahiyeke deshilatdar e û civak li pêş Azadiya takekesi pêkhateyeke asteng e. Bi vî hawî jî enerjî û çalakbûna civakê, bêalî û qerisî dihêlin. Lê beralîkirina vê pirsgirêkeke jiyanî ye.

‘Pekhateya zanînê ya sîstema cîhana kaptalîst, herî kêm bi qasî amrazên desthilat, berhem û danehevê, di nava qeyranê de ye. Ji ber ku pêkhateyên zanînê, li gorî pêdiviya xwezaya xwe, bêhtir meyldar in ji bo gotûbêja azad, vê yekê derfetên berfireh pêşkêş dike li ser rehendên qeyrana zanistî. Rola zanînê ya di pêkhateyên civak û desthilatî de, di rehendên ku bi ti serdeman re neyên berawirkirin de, dikare wate wergire.’ Nirxandinên bi vî awayî yên Rêber Abdullah Öcalan sedemên vê bi zelalî îfade dike. Heke em naxwazin mehkûmî pêkhateya zanîna ku pergala dinyaya kapîtalîst û ferzkirinên awayên jiyana wê bibin, divê em  pêkhateyên xwe yên zanînê, bi civakîbûna xwe re di nav girêdaneke saxlem û bi kok de bihonin.

Jineolojî, bi vê mebestê pêvajoya honandin û pêşxistina epîstemolojiya xwe, dixwaze bi analîzkirina objektîf û xurt a teoriyên zanînê yên heyî pêş bixe. Dema vê analîzê dike, yên bi rêgezî li dijberî wan disekine jî hene, yên ji epîstemolojiya xwe re mîna tevkarî digire û jê feyde distîne jî hene.Bi nêrîneke azad, nûbûnan tevlî dike jî hene.Jineolojî bi nêrîneke rexneyî nêzî fikra Kartezyen û teoriyên zanînê yên xwe dispêrin vê fikre dibe ku bi misogerbûna zanînê bawer e, di bin navê analîzkirinê fikir û pirsgirêkan parçe dike, li gorî xwe dizayn dike, dadixîne û dualîteyên bingehîn ên jiyanê her tim dide ber hev. Teoriya xwe ya zanînê, bi mesafeyên bi rêgezî dihone.

Jineolojî, di teoriya zanînê de felsefeyên ku lîberalîzmê derbas nakin rexne dike. Di vê mijarê de li ser xebatên akademîk ku dibin cîgir û şûngirên femînîzmê û modernîteya kapîtalîst lêhûrbûnan dike. Di asta akademîk de hilberandina zanînê girîng dibîne, heta ku bi azadî, serxwebûn, jîrekiya jinê, xwezaya jinê, ji qenciya jin û civakê re be. Jineolojî, di her qada jiyana civakî de, ji bo bigihîje zanîn û hişmendiya rast, pêşxistina epîstemolojiyeke nû hedef digire. Dema vê dike, destpêkê dîrokên zanist û pêkhateyên zanînê digire dest û nîqaş dike. Di van qadan de bi lêkolînên berfireh, pêşniyarên avabûn û pênaseyê ku ji jirêderketin û nebesiyan re tîne, wê naveroka Jineolojiyê pêk bînin. Ji ber ku Jineolojî, ji bo epîstemolojiyên heyî, yên ji jiyana civakî re bersivan naynin, dixitimînin derbas bike pêş dikeve.

Her wiha qada epîstemolojiyê, ew qade ku beriya her tiştî pêdivî bi lêkolîneke

cidî, şîrovekirin û zanakirinê heye. ‘Li gorî min epîstemolojî (pêkhateyên zanînê) yên heyî nekarîne xwe rizgar bikin ji bûyîna perçeyek ji amrazên desthilatiyê. Vê yekê, tevî vîna wan, wisa ye. Qet gûman jê nîne ku kesekî xwedî nêzîkatiya herî zanistî weke Karl Marks, kesekî wisa ye ku rûyê rasteqîn ê kapîtalîzmê bi awayekî herî xurt dîtiye. Lê vê taybetmendiya wî ya pirr girîng têrê nekiriye ku wî ji moderniteya kapîtalîst qut bike. Pêkhateyên zanînê ku Marks xwe dispart wan û jiyana wî, bi hezaran pabendan girêdayî moderniteyê bûn. Ez vana diyar dikim, ne ji bo tewanbarkirinê, lê ji bo ku rastiya wî were têgihîştin. Pirsgirêkên dirûv ji bo Lenîn û Mao jî derbasdar in. Sîstema ku dihizirîn, bi gelek pêşaneyan (di serî de pêkhateyên zanînê û ferasetên jiyana nûjen), girêdayî jiyana modernîte (modernîteya kapîtalîst) bû. Rexneyên min ên li ser sosyalîzma pêkhatî di van hemû mijaran de pirr zelal bûbûn. Lê rexne têrê nake. Divê ez çi deynim şûna wê? Pirsa girîng ev bû. Dîsa, pirsa ez tim li ser lêhûrbûm jî ev bû.’’ Ev tespîtên Rêber Abdullah Öcalan grîngiya analîzkirineke rast a epîstemolojiyên heyî, bi qasî dîtina şaşiyên wê dagirtina şuna wan jî nîşanî me dide.

Li ser vî asasî, di mijarên ku em îdîaya bi zanîna wan radibin de, Jineolojî berpirsiyariyê ji me dixwaze. Aliyê exlaqî yê zanînê her tim li ber çav digire. Pirsgirêk ne zanîngirtin e, ya girîng, bi zanîna te girtî, di jiyana takekesî û civakî ya zanînê de kapasîteya estetîzekirinê ye. Jinelojî, dema felsefeya zanînê pêş dixe, çalakbûna jiyana civakî, pirbûn, curbecurî, nermbûn û guherînên di van mijaran de her tim çêdibin, girîng dibîne. Di vê mijarê de, çavdêrî, cêribandin, guhdarîkirin û girtina nav xwe esas digire û wateyên nû hildiberîne. Jineolojî, zanîna bi jinanî, serwextbûn, berhevkirina zanînê, çêkirina zanyariyê hêja dibîne, heta dawî feyde jê digire û pêş dixe. Biçûkdîtin û bênirxkirinên ku zîhniyeta mêr a desthilatdar di bin navê zanatî an jî rêbazên jinanî de dibîne, analîz dike û di vê mijarê de perwerdekirin û veguherandina mêran jî hedef digire. Di wê baweriyê de ye ku aqlekî nêr divê bikaribe mê bixebite, aqlekî mê, bi çavê wan, li dinyaya mêran binihêre û hîn bibe. Lê ji rêgeza enerjiya mê ya ku jiyanî ye, hiskirin, têgihîştin, çavdêrîkirin û zanatî ye tawîz nade.

Jineolojî vê tespîta Rêber Abdullah Öcalan ya ku dibêje; “*Kirdeya me ya herî bingehîn mirov e, wisa be ji sazî û fikrên ku wesfên herî bingehîn ên vê kirdeyê ne, yanê exlaq, ol, bi hemû şaxên xwe ve huner, civaka teorîk, heta tevahiya civakê nas neke, îdîaya me ya ji vê çavkaniyê gihandina zanîna têr, wê kêm bimîne*.” esas digire û teoriya zanînê ya nû dihone.

**Ji Bo Şoreşa Di Zanistên Civakî De…**

Pêşniyarkirin, avakirin û pêşxistina Jineolojiyê, li ser zanistên civakî bi tena serê xwe rexneyek, mudaxeleyek e. Ger ku ji aliyê pênase, bergehî, pêkhateyên zanînê, awayên zanîn û lêkolînê û rêbazên wê ve xwe rast bi rêxistin bike û civakî bibe, em dikarin îdîa bikin ku wê di derbaskirina krîza ku îro zanistên civakî dijîn de bibe hêza çareseriyê. Bi jiyana ku wê li derdora jinê pêşbikeve re, divê mirov neheyire ku wê zanista civakî ya li dorhêla Jineolojiyê jî pêş bikeve.

Jineolojî, di zanistên civakî de, şoreş, vebûn û nûbûna hewcedarî pê heye bixwe ye. Di qada zanistî de, veguherîna bingehîn a pêkhatina wê jêneger e. Bi aqlê mêr, pêkhatina wê, ji ber gelek sedeman pir zehmet e. Koka tevahiya zanistan civakî ye, civakîbûn civakbûn e, yanê afirîneriya jinê ye. Zanist, zanîn û zanatî bi destê jinê, bi ruh, dil û hezkirina wê, dikare li asoyên din vebibe, dinyayên din keşif bike, bide keşifkirin. Dikare di dogmayan de hebsbûnê ji çarenûsê derxîne. Sînoran bêwate bike. Bi jîrekiyeke hezkirin, bi sehek û bi hîs li dinyayê nihêrtin, dema weke jêravahiya zanistên civakî û tevahî zanistên bingeha wan civakî ye pêş bikeve, wê şoreşa ku pêwîstiya hemû mirovahiyê pê heye jî dest pê bike. Ev jî, bi pêşxistina zanista jinê wê mimkun be. Yanê bi pêşxistina zanisteke wateyê ya nû, bi zanista jiyaneke civakî ya

nû mimkun e. Weke zanisteke civakî ku wê tevahî tevgerên jinê yên têkoşîna azadî û demokrasiyê xwe dispêrinê, Jineolojî namzeta pêşketinê ye.

"*Di van demên dîrokê de gelek kar dikevin ser milê zanista civakî û exlaqê. Zanisteke civakî ku ji yekdestdariya deshilatdarî û zanînê derketiye, diwêre zanista xwe ava bike, di derketina kaosê de ji bo çareseriyên berhemdar jiyanî ye. Ji bo avabûna civakeke zêdetir demokratîk, bi azadîxwaziya cins û ekolojîk, pêşî hewcedarî bi avabûna zanisteke civakî heye. Tiştê ku em dixwazin bikin, pêşnûmeyeke bi esil û heyecan a vî karî ye."* Di vê nirxandinê de Rêber Abdullah Öcalan pênaseya "ji yekdestdariya desthilatî û zanînê derketiye" û "diwêre zanista xwe ava bike" dike. Jin ew beşa civakî ye ku wê bi layiqî û cewherî vê pênaseyê bigire ser milên xwe. Ji ber ku di sedsala 21. de, mirova herî zêde di bin bindesta desthilatdariyê de ye, jin e. Jin dikare hêza wêrekiya avakirina zanista xwe ji dîroka xwe bigire. Lewra jin, vedîtina, îcada gelek tiştên pêşîn kiriye ku bi vana mirovahiyê û civakê pêk anîne. Tib, aborî, ekolojî, edebiyata devkî, dengbêjî, çandinî, enstrumanên, sazamûrên muzîkê yên destpêkê, (*amûr û qalibên muzîka wê demê, di ruhê me de hê jî bandorên herî bi saw û ji kûr ve dihejînin dixemilînin.*)**(23)** endustrî-pîşesazî (B.Z. di 6000 û 4000'î de vedîtinên teknîkî yên Neolîtîkê ku li kevaneya Toros û Zagrosan hatine afirandin, encax mirov dikare bi vedîtinên Ewrûpayê yên piştî sedsala 16. re bide ber hev) hejmar, nivîs û bêhejmar vedîtinên zanistî, vedîtinên jinê bixwe ne. Ev hatibin dizîn û îro pê li jinê jî bidin ev rastî naguhere. Ji ber van her du pênaseyan, dibetiya ku zanista jinê, zanistên civakî yên navborî, pêş bixe pir xurt e. Beşên "ji bo derketina ji kaosê, çareseriyên berhemdar" bi dildarî û jêhatî pêşkêş bikin wê jin bin.

Rastiya civakî ya jinê û rastiya civakî ya civakê paralelên hev in. Hêza têgihiştina cewherî ya jinê, wê bi hêza pêşxistina zanistên civakî re parelel bi meş e. Dema mijarên di bergeha Jineolojiyê de li ber çav tên girtin, wê bê dîtin ku Jineolojî li dorhêla jinê bi îddîaya avakirina zanisteke nû ya civakê radibe ku wê ev zanist bikaribe tevahiya valahiyên zanistên civakî yên heyî dagre, jirêderketinên wan sererast bike û ji aqlê mêr ê serdest xalî bike. Pêşxistina pergaleke aboriyê ya li dorhêla jinê, têgihiştineke ekolojîk ku hîs û zennê jinê cidî digre, zanisteke demografyayê ku mîna berê wê jin xwedî gotin û biryarê bin, polîtîkayek ku wê zanîn û zanatiyên jinê di mekanîzmayên biryardayînê de cihê xwe bigrin, qadeke tenduristiyê ku her çend di nav çalên dîrokê de bên veşartin jî ew destên jinê yên bi şîfa ku heta roja me ya îro berxwe da ye û bi ruhen xwe derman dikin, terzê hînbûn û hînkirinekê ku li dorhêla jinê şekil digre û belav dibe, zanisteke estetîkê ya jiyanê bedew dike, zanisteke etîkê ku rastî û başiyê hakim dike… Em dikarin vê rêzê dirêj bikin.Dema ku zanista jinê ya ku ev qad tê de cihê xwe digrin bi awayekî xwirt pêş bikeve, wê di zanistên civakî de jî ew şoreşa pêwistî pê heye pêş bikeve.

Çiye ev şoreş? 'Divê ez careke din destnîşan bikim ku milliyetgirî argumana dînî ya bi tenê ya modernîteyê ye, lê xwedayê jêre xizmetê dike û di bin fermana wî de ye, dewleta netewe ye. Dewleta netewe û milliyetgirî weke du têgîn û diyardeyên pozîtîvîst, 'rejîma heqîqeta civakî' çeloxwarî dikin û di tariyê de dihêlin, ji lewra ev herdu têgîn di asta herî jor de, hêza vê yekê temsîl dikin. Ji awirê şoreşê ve wezîfeya herî girîng a zanista civakî ew e ku hêza çeloxwarîkirin û tarîkirinê ya li ser heqîqeta civakî tesfiye bike.' Berdêla herî giran a hêza çeloxarîkirin û tarîkirina milliyetgirî û dewleta netewe ya li ser heqîqeta civakî ku Rêber Abdullah Öcalan behs dike, jinê da. Li qadên şer, zarokên xwe yên bi hezar kul û derdî mezin kirine winda kirin, erd û zeviyên bi hezar kedî ji çandiniyê re vekiribûn bi bombeyan şewitîn, bêçandinî, bêkar û mal mane, bi birçîbûn, tunebûn, serma û germê re têkoşiyane, di serî de perwerde, ji hemû mafên xwe yên takekesî bêpar hatine hiştin, gelek fikrên paşverû, bi dewlet û hiqûqê, li ser navê netewê erê kirine. Ev tablo rojane hê jî tê jiyankirin. Gelo heqîqeta civakî çawa û bi çi hat serobinkirin û hê jî tê serobinkirin? Berdêla vê kê, çawa dide? Gelo ev çarenûseke mutleqe? Herî baş jin vê yeke ji dil de hîs dikin. Ji ber vê jin ji bo pêkanîna şoreşa civakî ku pêdivî pê heye, di hêla zîhnî, ruhî û hestî de bêtir amade ne. Ji ber ku sedemên wan zêdetir in. Ji bo bersivdayîna van sedeman, bi îdîaya

pêşxistina zanisteke jinê radibin ku wê ev zanist rastiya dîrokî ya hemû diyardeyên ku heqîqeta civakî tarî û serobino dikin, ronî bike. Ji ber ku heqîqetên herî bingehîn ê civakê ew heqîqetin ku bi dinyaya jinê re, nirx û xwezaya wê re pêk tên. Diyardeyên ku dinya, nirx û xwezaya jinê tarî dikin, heman diyardene ku heqîqeta civakê tarî dikin. Ji ber vê şoreşa di zanistên civakî de, li dorhêla jinê bi awayekî serkeftî ji nû ve înşakirina heqîqetên civakî ne.Ev jî tê wateya pêşxistina Jineolojiyê.

Gelek dîsîplînên zanistên civakî ku îflaskirî derbasî sedsala 21. bûn, ji jiyana civakî dûr, qut, biyanî û di pozîsyoneke dijminane de ne ku navê xwe ji wê jiyana civakî wergirtine. Jineolojî kîjan mijara zanistên civakî bigre dest bila bigre lê destpêkê divê bi vê rastiya zanistên civakî re bikeve nav hesapdayînekê û bi awayekî rast têbikoşe.Jirêderketin, xitimandin, xwe tekrar kirin û halê navend deshilatdariyê yê zanistên civakî, encax bi zanatî û ilme jinê bê beralîkirin. Di roja me ya îro de di nav zanistên civakî de mijara jinê, pirsgirêk û tevgerên wê hema bi qasî ku tune be cihê xwe digre. Berpirsiyara vê yeke kê ye? Helbet, şaristaniya serweriya mêr û pêkhateya wî ya zanîn û deshilatdariyê ye. Yê ku mohra xwe li hemû zanist û zanistên civakî daye îdeolojiya mêr e û derbarê jinê de gotinên derew û xemilî ne.Ev jî ji bo ser tawanbariya pênc hezar salî ya li dijî jinan binixûmînin vê dikin. An na di jiyanê de rewşa jinê ya rasteqîn gelekî cuda ye. Di afirandina vê yeke de zanist û zanistên civakî xwedî pareke girîng in. Ji bo ev bûyer bê aşkerekirin, em dibêjin Jineolojî!

Pir ecêb û xerîb e, zanistên civakî ku di nava xwe de xwedî gelek şaxan e lê aqil nekirine derbarê jinê de ku cewhera xwezaya civakê pêk tîne ji bo lêkolînekê, dîsîplîneke zanistî veqetînin. Bi qasî ku ecêb e, di nav mantiqa xwe ya hundirîn de hevgirtî û lihevkirî ye. Zanyarên mêr, bi sedsalan derbarê mijarên ‘jin heye yan tune ye? Ruhê jinê heye yan tune ye? Jin, mêrekî seqet, kêm hatiye afirandin e?’ de cidî cidî nîqaş meşandin. Zanyarên mêr ên îro, peyrewên, xelefên wan in. Yên ku hebûna jinê qebûl nekirine, heta belkî hinek ji wan, ji hebûna jinê bawer nekirine, ger ku ji bo jinê dîsîplîneke zanistê neveqetandibin, ji aliyê wan ve hevgirtîbûnek e. Lê li gorî beşeke gelek girîng a ev “zanyarên mêr”, ji jinê re dîsîplînek veqetandin û li ser vê qadê lêkolîn kirin, xistina mijara zanistên civakî, heta bêjî talûke ye. Tiştekî mîna vekirina qutiya Pandorayê ye. Şiyarkirina xwedavendan ku bi hezaran sal in bi hezar şer û zoriyê, bi hîle, bi hezar û yek derewan hatine bêdengkirin, teselîkirin, xapandin, biçûkkirin, di hêlînên biçûçik de hatine hepskirin, ma qet karê aqilên nêr e? Ev hebe nebe, fikreke fesat a aqlê jina ku hevala şeytan e, yan jî karê ‘ewladekî bixêr’ ê ku tu car ‘dest ji bawerkirina xwedavenda dayîk bernedaye’. Lê ji bo jinê dîsîplîneke zanistê fikirandin û veqetandin ne kare aqlê nêr e.

Ji ber vê yekê, ya ku derbarê wê de herî zêde pevbestinên îdeolojîk tên afirandin, vegotin tên çêkirin, di nav hezar dîsîplînî de bedena wê tê parçekirin, mîna ku ev têr neke, ew hebûneke ku bi zanistî û îdeolojîk jî tê parçekirin. Îro di vê rewşê de ye. Lê hebûn, rastî, dîrok û nasnameya wê, tu carî bi qasî ku ji dîsîplîneke zanistê re bibe mijar nabe heqîqetek. Bi Jineolojiyê, em ji derewa sîstematîk a pênc hezar salî ya ku mêr, derbarê jinê de li hev aniye re îsyan dikin! Ji bo vê derewê ji binî ve hilweşînin em dibêjin Jineolojî. Em ê zanisteke ku têde bikaribin ontolojiya xwe, dîrokê, estetîk û etîkê, aborî û ekolojiyê, demografyayê û êdî derbarê jiyanê de çi hebe, jiyan li ku derê ji jiyanbûnê hatibe derxistin, zanisteke jinê ya em ê wan qadan bigirin dest çêbikin.

Wê ev zanist bibe enerjî, ruh û mala sosyolojiya azadiyê. Wê bibe palpişta herî saxlem. Wê ev zanist, bibe ew zanista ku pêdiviya zanistên civakî bi şoreş û derçûneke exlaqî heye. Rastiyên ku bi destê vê zanistê derkevin holê, wê ji gelek şaxên sosyolojiyê ne kêmtir bin. Ji bo dîroka mêtingerkirina jinê ya zîhnî û bedenî, her wiha aşkerekirina cihên wê yê aborî, civakî û siyasal em dibêjin Jineolojî! Ji bo di mîtolojî, ol, felsefe, huner û zanistan de avahiyên zanînê û pevbestinên îdeolojîk yên

hatine avakirin deşîfre bikin em dibêjin Jineolojî. Zanista ku mîna "Bûyer û diyardeyên di gerdûnê de bi pergalî lêkolîn dike, di destgirtina daneyên cêribandinê de sehek û hîpotezan jî înkar nake, çalakiya fikrî" tê pênasekirin, girîng e ku di îfadekirina hebûna jinê de mîna rêbazek were bikaranîn. Lê di merhaleya em gihanê de bûyera em jêre dibêjin rêbaza zanistî jî, bi lezgînî pêwîstî bi aqlê jinê, jîrekiya wê ya bi sehek û hest heye. Rêber Abdullah Öcalan vê pêwistiyê bi vî hawî dinirxîne; 'Eger em zanistê weke şîroveya pêşketî ya maneyê bi nav bikin, em ê ev çend bi lez yekbûna wê bi desthilatdariyê re yan li ser navê zanistê weke têkçûnê yan jî em ê weke pirsgirêkeke ciddî ya bi navkirina zanistê fêhm bikin. Tevî ku ew bi xwe dîn gelekî rexne jî dike, pozîtîvîzm ji dîn û metafizîkê jî paşdetir bi materyalîzmeke çor di zikhev de dîn û metafizîkek e, û ev yek xwe di asta bêberpirsiyariya wan de bi awayekî eşkere nîşan da. Ji vir encama divê em derxin ew e ku zanist hewcedarê şîroveyeke nû ya maneyê ye. Zanist hewcedariya xwe bi şoreşeke nû ya paradîgmatîk heye.' Hêza ku wê destpêkê vê "şoreşa nû ya paradîgmatîk" bike, weke hêza herî zêde li derveyî desthilatiyê dimîne yan jî desthilatî zêdetir wê li derve dihêle, tevlî nake, wê jin be. Zanista jinê, wê rizgariya zanistê jî pêk bîne.

Bêguman dema ku em zanista jinê pêşniyar dikin, di vê mijarê de bêhejmar teoriyên femînîst ên hatine meşandin, tên meşandin û me ronî dikin, xebatên akademîk û tezên zanistî dibînin û ji van feyz digirin. Lê ev, li dijî hêza modernîteya kapîtalîst ku hemû alternatîfên xwe dihelîne û dişibîne dijberê wê, belave, bêrêxistin û bandora wan lawaz in. Nikarin dinyaya jinê ya hatî tarîkirin ronî bikin. Ji bo vê, mîna zanista civakî ya jinê, bi şêwazekî ku wê binyata zanistên civakî jî gav bi gav nû bike û pêş bixe Jineolojî, yan jî mîna mala sosyolojiya azadiyê Jineolojî, wê bi demê re baştir were fêmkirin ku ev, pêwîstiyeke jiyanî ye. Lezgîniya wê heye. Eniya jinê jî, heta îro heke mîna qadeke sosyolojiyê yan jî di bin banê zanistên civakî de zanista jinê nefikirîbe; mirov dikare vê yekê wiha rave bike; ketina kemînên aqlê nêr û rejîmên wan ên zanînê, bi tiştên pir kêm qîma xwe anîne, tengbûna asoyê û ji sînorên modernîteyê derbas nekirin. Ji bo em van lawaziyên xwe beralî bikin, bi Jineolojiyê, bi zanistên civakî yên jinê, bi sosyolojiya azadiyê, avahiyên fikrî yên mîtolojîk, olî, felsefîk, îdeolojîk û zanistî, teoriyên zanînê di ber çav re derbas bikin. Van teoriyên zanînê emê carek jî li bêjinga jinê bixin û bi çavê jinê lê binêrin, yên me bi dest xistî emê carek jî di tevna jinê de bihonin. Lê aşkereye ku herî kêm bi qasî me, pêwîstiya sosyolojiyê, zanistên civakî, zanist û jiyana civakî bi vê heye.

'Di dîroka modernîteya kapîtalîst de rola dane zanistên civakî ew e, qutbûna ji rastiya civakî rewa û heta weke pêşketinekê ferz dike. Li ser navê zanistê derbeke girîng a li civakbûnê tê xistin jî ev e.'(24) Jineolojî wê bibe ew zanista civakî ya ku navend jin bi xwe ye û li hemberî ew hêzên ku vê derbeyê pêkanîne, bi rêxistinkirina gelek aliyên civakê wê mîna hêza parastina civakê tevbigere. Ji bo pêşketineke meşru ji civakê qutbûyînê na, dijberê vê wê weke awayê zanisteke ku ji her ferdekê/î re wateya herî bingehîn û sereta ya felsefeyê civakîbûna wê/wî dide fêhmkirin pêşbixîne. Di vî warî de abeceya, elîfbaya zanistên civakî wê wiha hîn bibe, wiha bide hînkirin. Rêzika zêrîn a "Mirov encax bi civaka xwe mirov e" wê mîna yek ji hîmê esasîn a felsefe û zanista xwe diyar bike û bide pejirandin.

Di vî warî de em Jineolojiyê, li ser qada zanistên civakî, mîna mudaxeleyeke zîhniyetê ya pir xurt a bi nêrîna jinê were kirin, dikarin bigirin dest. Ya rastî em dikarin bibêjin pêvajoya avabûneke îdeolojîk ku li derdora jinê tê honandin û vesaziyên bi bêhejmar îmge, pênase, îfadeyên îdeolojîk hatine afirandin, bi şêwazekî alternatîf hem jinê, hem mêr û giştiya civakê û her bûyera têkildarî jiyanê ji perspektîfekê xurt bixwîne. Bi giranî bi şîroveyan dikare pêş bikeve, jixwe hewcedariya jinê zêdetir bi vê heye. Demekê wê bi giranî bi şîroveyan pêş bikeve, pêvajoyeke nîqaşê çêbibe û zanista jinê argumanên xwe, bi nêrîna jinê wê neqiş bike.
Destpêkê di zanistên civakî de hin qadên diyar – ew qadên cewherî yên despêkê jin jê hatine avêtin- wê bigire dest. Bi demê re wê mijarên tevahiya jiyana civakî

eleqedar dikin bigire bin banê xwe û ji hundir ve wê li ser qada zanistên civakî weke mudaxeleya îdeolojîk û zîhniyetê û cudahiya şîroveyê wê Jineolojî cîh bigre. Em dikarin ji Jineolojiyê re bibêjin, bi nêrîneke komple, cudabûna zîhniyeteke di hemû qada zanistên civakî de.

Jineolojî, despêkê divê di qada zanistên civakî de xwedî hêza dahûrandinekê be. Ev dahûrandina me, bi guherîna ku modernîteya demokratîk di qada zanistên civakî de pêş  dixe re grînge ku weke hev be. Nêzikahiya bi tevahî ya ji zanistên civakî re, zelaliya ji aliyê rêbazê ve bi dest xistiye, ji nû ve û hîn xurt pênasekirina zanistên civakî şert e em bi kûranî têbigihîjin. Zanista civakî ku bi taybetî bûye keleha herî xurt a pozîtîvîzm û lîberalîzmê, bi nêrîna jinê, bi rexneyeke esasîn were rexnekirin û nirxandin, wê bibe xebata herî bingehîn a Jineolojiyê.

**Ji Bo Pêşxistina Rêbaza Lêkolîneke Li Gorî Rastiya Jinê**

Ji bo pêşxistina rêbazên lêkolînê yên li gorî jinê û bikevin xizmeta pêşketina fikir û çalakiyên azadiyê, em dibêjin **Jineolojî**. 'Kengî mirov hewl bide pirsgirêkên civakî çareser bike, divê mirov hûrûkûr li ser diyardeya jinê bifikire, ji bo hewldanên wekhevî û azadiyê jiyana jinê bike çavkanî û ev yek divê hem bingehê rêbaza lêkolînê û hem jî bingehê hewldanên zanistî, exlaqî û estetîk ên hevgirtî be. Rêbazeke lêkolînê ya ji rastiya jinê bêpar, têkoşîneke azadî û wekheviyê ya jinê nexe navenda xwe, nikare bigihîje heqîqetê, nikare azadî û wekheviyê pêk bîne.' Ev gotinên Rêber Abdullah Öcalan, ji bo me jinan, ji nava dilê jiyanê tên, tên zimên. Têgihîştin û sehekên me yekser van gotinan hildibjêrin, dibînin, ji ber ku em baş dizanin li ser çi diaxivin. Em baş dizanin behsa çi dikin. Dîroka civakî, jinê li derve dihêle yan jî dixwaze bihêle û pêş dikeve, ev yek jî bi çi hawî û çawa me seqet dike û çawa birîndar dike, em heta hestiyê xwe dizanin. Di ruh, dil û îro di her kêliya jiyanê de, em bi hezaran mohrê vê li ser xwe dibînin, bi xwe re digerînin. Ji bo van mohran paqij bikin, bimalin û dil û mêjiyê xwe, aqlê xwe azad bikin, ji bo bikevin dû rastiya vê lêkolînê, em dibêjin **Jineolojî**.

"Rêbaza lêkolîneke ji rastiya jinê bêpar" çi ye? Wisa be "rêbaza lêkolîneke ku rastiya jinê têde ye" çi ye? Bersiva mirovekî zanyar ê pozîtîvîst bide we zelal e: "Hin rêgez û rêzikên diyar ên rêbaza lêkolînê hene, tu têkiliya van bi jin an jî mêritiyê ve tüne ne, ji kerema xwe re em bi zanistî bifikirin!" Bi îhtimaleke mezin, çiqas neyne ziman jî bi liv û tevgerên rûyê xwe û bi dengê dilê xwe, wê vê pênaseyê biçûk bibîne, bi gotina herî sivik, wê bi derveyî zanistî bûnê sûcdar bike. Sedema hemû karesatên li ser sere mirovahiyê geriya ye, destê birçîbûn û xizaniyê ya bi qirika me girtiye, şewitandina me ya di şeran de, serobin buna me ya di karesatên ekolojik de û kambaxiyên din ên bê hejmar ewe ku di rastiya lêkolînê de nebûna rastiya jinê ye. Ji rastiya jinê bêparbûn, di lêkolînan de tene bi hebûn an tunebûna jinê re ne eleqedar e. Di lêkolînan de bêparbûna ji rastiya jinê, bi hesapnekirina jinê re, nirx û hebûna jinê, cihê wê yê di dîroka civakî de, hevbandoriya di têkiliyên jin û mêr de û ji gelek hêlan ve, bi tune hesibandina jinê re têkildar e. Di vî warî de destnîşankirina Rêber Abdullah Öcalan ku dibêje; "Rêbaza lêkolîneke ji rastiya jinê bêpar" çi ye, em baş dizanin. Nav, cî û demên berbiçav jî tên bîra me. Rahibên Sumerî û Mezopotamya, Platon û Yewnanîstan, Franscîs Bacon û Ewrûpa, Nêçîra Pîresêhran…

"Rêbaza lêkolîneke ku rastiya jinê digre nav xwe" di merhaleyeke dîrokê de hebû gelo? Li ku derê? Di kîjan mijaran de? Çi bûn? Divê em dest bi hejmar û qeyd bikin, divê yên  dane jibîrkirin bînin bîra xwe, li şûna yên hatine tunekirin em ên nû biafirînin. Di her mijara ku jiyan pêwîstî pê dibîne de, divê em rastiyên lêkolînên nû yên xwe dispêrin rastiya jinê îcad bikin. Di vê mijarê de, ji bo ku em bêyî bêzarbûnê lêkolîn bikin, ji bêdadiyên mezin ên di tevahiya dîroka şaristaniyê de hatine kirin re bersivan biafirînin, em dibêjin **Jineolojî**.

Her ekolên zanista civakî; hin yekeyên lêkolînê yên cuda esas digirin û dixwazin civaka dîrokî lêkolîn bikin. Hin nêzikahiyên ku dewlet, aborî û çîn, erka desthilatiyê, olê, civakê, kes û şaristaniyan esas digirin û lêkolîn dikin hene. Gelo kîjan e ya ku dîroka civakî bi tevahî û watedar bigire dest û lêkolîn bike? Civak, çawa ku bêyî yek ji vana nikare bibe civak; yekîneya bingehîn a lêkolîna civaka dîrokî jî divê bikaribe ew be. Civak, bêyî dewlet jî karîbûne hebûna xwe berdewam bikin. Beriya ku şaristaniyan ava bikin jî civak karîbûne bijîn. Civakên bê çîn û deshilatdarî jî dikarin hebin. Lê civak, bêyî exlaq û polîtîkayê hebûna xwe nikarin berdewam bikin. Exlaq weke karên rast, baş û bifeyde yên ji bo civak hebûn û jiyana xwe berdewam bikin pêwîst in. Polîtîkayê jî bi awayekî rast, tekûz û estetîk pêkanîna van karan em bigirin dest, em ê fêm bikin ku civak bêyî van nikare hebe. Wisa be li gorî ku civak bêyî van, ev jî bêyî jinê nabin, yekeya me ya lêkolîn û vekolanê ya ku rastiya jinê digire nav xwe exlaqî û polîtîk e. Di heman demê de em dibêjin; 'Civaka exlaqî û polîtîk a li derdora jinê tê honandin.'

Civakîbûn li derdora jinê hatiye honandin û ti faliyekete civakî tune ye ku jin têde cî negire. Di hemû faliyetên civakî yên rast, xweşik, baş û bifeyde de jin hene. Di şer, hilweşandin, qetilkirin û kuştinan de, li derveyî ku bûbin gorî, ji derveyî îstîsnayan jin têde cîh nagrin. Mebesta me, di lêkolînkirina dîroka civakî de, ger em civakê li gor esasên ku civakê dikin civak bigirin dest; şert e ku jin di vê de hebe. Wê ev, me ji kemîna destpêkê ya "rêbaza lêkolîneke ji rastiya jinê bêpar" dûr bixe. Bi vî awayî em ê dîroka civakî rast lêkolîn bikin û roja me rast dahûrînin. Tam jî di vê derê de ji me re Jineolojî pêwîst e; ji bo ku em bi nihêrtina dîrokê roja me ya îro rast bixwînin.

Dema em qadên weke dîroka civakî, roja îro, siyasetê, civakê, ekolojiyê, demografyayê, tendirustî, perwerde, aborî û hwd. lêkolîn bikin, em ê di çarçoveya jinê de lê binihêrin. Ev tê çi maneyê? Tê maneya; em ê di ferqa nêzikahiyên ku bi hezaran sal in jinê kêm dikin, tune dihesibînin, hindik dihesibînin, çeloxarî dikin û tevlî dîroka civakî dikin an jî ji dîroka civakî davêjin de bin û wisa binihêrin. Bi vê ferqkirinê em ê hebûna jinê bibînin û tevlî vegotina dîrokê bikin. Em ê hesab bikin û fêrî rastiya lêkolîn û vekolana ku xwe dispêre jinê bibin. Ev jî tê wê maneyê ku em ê ji alema zanistê re, li ser gelek qadan tezên Jineolojiyê biafirînin.

Weke mînak, derbarê aboriyê de tezên Jineolojiyê dikarin bên pêşxistin. Ev tez tenê bi qadekê re sînordar namînin. Di akademiyên jinan de bi hevpariya çavdêrî, ceribandin û tecrubeyên hemû jinên dinyayê ji hêla lîjneyekê ve dikare bên nivisandin û bi têkildarên aboriyê re bên parvekirin. Mînak, li ser demografyayê tez û teoriyên Jineolojiyê, li ser daneyên werin komkirin dikare pêş bikeve. Bi tevahiya jinên dinyayê re, bi awayekî were hevparîkirin û li ser navê jinên dinyayê, ji forumên têkildar û rêxistinên tendirustiyê re were pêşkêşkirin û çalakî dikarin werin rêxistinkirin.

Rêbaza lêkolînê ya bi rastiya jinê; wê hestên jinê, sehek û dilovaniya wê, merhamet û tevahiya taybetiyên wê yên xweş bigire nav xwe û ji pêwîstiyên lezgîn re çalakiyên lezgîn li dar bixe û pêş bikeve. Ji bo bîranîna bi sedhezaran 'pîresêhr'ên (cadûyên) ku bi mebesta dev ji zanyariya jinê bernedane hatine qetilkirin bijî, wê ev rêbaz vê ruhê zanyariyê zindî bike. Awayên zanînên jinê, rêbazên zanînê û teoriyên zanînê wê xwe bispêrin vê rêbaza lêkolînê.

Rastiya lêkolînê ya navend jin, wê kîjan rêbazan bikar bîne? Ev pirs ji kêliya nîqaşên derbarê jineolojiye de di rojeva me de ye. Diyardeyeke bersiva vê pirsê pênase û saziyên nêr in ku li ser jinê tên ferzkirin. Wê Jineolojî rêbazê ku karibe van beralî û deşifre bike, her wiha alternatîfa wan jî biafrîne, hilbijêre. Dîsa di lêgerîna rêbaz de bi her alî ve pêşxistina şîroveyan weke rêbaza dewlemendkirin û kurkirina hêza wateyê dinirxîne.Rêbazên ku dogmayan pûç dike, ji pirsgirêkan re hêza çareseriyê bi dest dixe û teşwîqê wêrekiya fikirandinê dike, keşif dike û pêşxistina vê asas digre.

Faktoreke din a bi bandor, pênaseya rêbaza ku 'rêya lêkolîn û vekolana tê zanîn' ku rêbazê qerisî û dogmatîk digre dest e. Emê li hember nêzikahiyên ku weke ' rêbazên nexweşokî' tên bi nav kirin jî lêkolînan pêş bixînin û encaman bi dest bixin.

Derbarê vê mijarê de tespîta Rêber Abdullah Öcalan ku dibêje; ‘Rêbaz weke peyv tê maneya usûl, rê û terîqetê. Di destpêkê de her çend erênî be, û bi kêra qabîliyeta fêhmkirinê bê jî demeke dirêj wexta mirov pêve girêdayî bimîne rê li ber dîktatoriyeke zêhnî ya temam vedike.’ wê di pêvajoya hilbijartina rêbazan de bibe pisûleya Jineolojiyê.

Jineolojî dema rêbazên xwe diyar dike; nêzî heqîqetê dahûrandina têkiliya mirov û civakê, bi civaka em têde dijîn re têkilî danînê, lêkolînkirina civaka mirov, xwezaya zîhniyeta mirov, pergala xebitandina wê, avahiya wê rast û bikûrahî naskirin û pênasekirinê, taybetiya mirov a xwedî karaktereka metafizîk e her tim li ber çav digire. Tu car ji bîr nake ku rêbazên hatine avakirin, bi giranî mohrên aqlê mêr ê serdest digirin. Li hember vê rastiyê, her tim pêşxistina şiyariya zîhnî weke prensîbên bingehîn qebûl dike.

Di tevahiya dîroka civakîbûnê de, kîjan rêbaz, ji aliyê kê ve, çawa, li ku derê hatin bikaranîn, li ser vê nêrîneke bi asoyên fireh, kûr û felsefîk afirandin, wê ji erkên destpêkê yên Jineolojiyê bin. Jineolojî, bi zanebûna “rêbaz paradîgmaya herî bingehîn a kapîtalîzmê ye”**(25)** û “ev pergal rêbazê dike heqîqet, heqîqetê dike rêbaz”**(26)**, ji bo vê hezar û yek kemînan datîne, wê rêbazên lêkolînê hilbijêre. Ev rastiya pergala kapîtalîst, herî zêde di mêtingehkirina hebûna jinê de tê bikaranîn. Bi vê zanebûnê, wê rêbazên lêkolîn û gihîştina heqîqetê pêş bixe. ‘Rêbazên lêgerîna li rastiyê yên zanistên civakî yên navend Ewrûpa, li gorî pêdiviya cewhera xwe, serwerperest (hegemonîst) in. Rêyên alternatîv ên rastiyê, bi du rêbazên bingehîn ve, hema hema negengaz (bêîmkan) dikin. A yekemîn nêzîkatiya gerdûnewer a monist (xweperest)e. Rastî (heqîqet) herdem tê daxistin ‘yek’ê. Ya duyemîn, modêla dîmanewer a bêsînor e. Dema dibêje ku rastiyeke herkesî, li gorî xwe, heye; di cewher de hewl dide derbibirre ku rastî tine ye. Ev tiştekî wisa ye mîna ku mirov bêje her tişt guheriye, ji bo mirov îdea bike ku ti tişt neguheriye. Eşkere ye ku herdu rêbaz jî di daxistkariyê de dibin yek. Hem ‘tekperestî’ya gerdûnewer û hem jî ‘tekanîtî’ya dîmanewer, bi daxistina rastiyê bo ‘tek’ê, karakterên xwe yên serwer bi eşkereyî diteyisînin.’ Jineolojî derbaskirina van metodên lêkolînê ku Rêber Abdullah Öcalan pênase dike, hedef digre û armanca Jineolojiyê dewlemendî û zêdehiya rêyên ku ber bi heqîqetê ve diçe nişan bide.

Jineolojî, di mijara rêbazê de xebitîna diyalektîkê di her mijarê de li ber çav digire. Ji ber ku hemû avabûnên di gerdûnê de, bi karakterîstîkî dualî ne. Jineolojî tevlî fikra ku dibêje; dualîte, dijîtî yan jî her du seriyên hevdu tune dikin, dînamîka avabûn û pêşketinê ji vê tunekirinê çêdibe, nabe. Di rêgezên gerdûn û xwezaya civakî de rêbaza tez, antîtez û sentezê guncawtir dibîne. Dualîteya di her pêkhatina gerdûnê de heye, têkilî û bandorbûna vana ya bi hev re dinirxîne û wisa wate dide guherîn û pêşketinan. Jineolojî dizane ku dikare vê rêbazê dema xwezaya civakî digire dest jî bi kar bîne û di azadkirina kes û civakê de jî weke rêbazeke girîng dinirxîne.

Dubendiyên weke gerdûnparêzî-îzafîtî, çerxwarî-li ser xetekê (xêzikî), kûrewîparêzî-heremparêzî bi narînî dest digre Jineolojî. Lê di wê ferqe de ye ku ev dubendî xeteriyên çawa dihewînin û li gorî vê zanebûnê wê nêzîk bibe. Jineolojî, di wê îdîayê de ye ku bibe zanista jiyana civakî. Ligorîxwebûnê, weke rê û rêbaza bi qasî hejmara mirovan li serikan şîrove nake. Aşkere ye ku gerdûnîparêziyê jî weke rêgezparêziya gerdûnî ya naguhere, pêşketina dûz-li ser xetekê nagire dest û berevajî nake. Ya girîng; gerdûnîtiyê û ligorîxwebûnê bêyî ku li qutbên dijber veguherîne, weke du rewşên rastiya civakî ya di nav hev de tên jiyankirin destgirtin e. Dizane ku ne pêşketina li ser xeteke rast, ne jî dubarebûna bêserûbinî, di ravekirina heqîqetê de bi tena serê xwe têr nakin. Watedayîneke rast a kêli’yê ku vê weke aliyê pêşketinê ya pêşketineke dubarebûnê dihesibîne, dîtina karakterê dubarebûnê ya pêşketinê, bandorbûna bêserûbinî û kêliyê û hiskirina ku hevdu dihewînin, di gihîştina heqîqetê de weke şêmûkên têgihîştinê yên girîng dinirxîne. Rêbaza diyalektîk bi qasî hebûna

mirovahiyê kevn e û ji awayên fikirîna çanda xwedavendîtiyê ye. Pêşxistina aliyê wê yê "*diyalektîka pêşdebir û avaker*"**(27)** hedef digire. Bi diyalektîkeke wiha, gihîştina nêzikahiyeke ku xwezaya civakî û xwezaya yekemîn bi aheng bigire dest esas digire.

Metafizîka ku "*'Rejîmên mêtinkar ên zîhnî' mîna afirînerekî ji derve li ser mêjiyê xwezaya civakî bi cî dike*."**(28)** rexne dike û hewl dide derbas bike. Lê metafizîka ku "*hebûnên di fikir û his de xuya dikin*"**(29)** jî dibîne û wate didê. Tevlî fikra;mirov bê metafizîk nabe, dibe. Hewl dide vê fikrê bi tevahî zîhniyetên pozîtîvîzmê ew xesandiye, ji nû ve bide qezenckirin. Mîtolojî, ol, felsefe û zanist, exlaq, her cure huner, polîtîka û teknîka hilberînê xwedî taybetiyên metafizîk in. Vê fikrê qebûl dike û di lêkolînên xwe de rêbazan pêş dixe. ' Li vê derê mijara ku pêwîst e were ronîkirin, ne dubendiya metafizîk û diyalektîkê ye, lê veqetînên di navbera afirandinên metafizîkên baş û xweş û metafizîkên xirab û kirêt de ne. Dîsa, ne dubendiyên ol-bêolî û felsefe-zanist, lê bawerî, heqîqet û rastiyên olî, felsefî û zanistî ne, ku jiyanê bêhtir rakêşer û dilkêş dikin.' (30) rêbazên pêkanîna lêgerên heqîqetê yên di vê tespîtê de tê destnîşankirin di afirîne. Ji bo texrîbatên pozîtîvîzmê di zîhnê mirov de afirandî biselihîne, baş bike; bi nezaniya wê re ya ku li ser navê neqebûlkirina metafizîkê, gelek nirxên girîng ên di manewiyata mirov de û danehevên pîroz tune dike, di gelek qadên zanistî de têdikoşe.

"*…Nêrîna dinyayê ya fizîka Kûantûm, bi nêrînên ku ji hêla kevneşopiyên mîstîk ve tên parastin, bi taybetî bi nêrînên mîstîsîzma (razdarî) Rojhilat re çi qas têkildar in… gelek fizîkvanên weke min ku di nav kevneşopiyeke ji tiştên nediyar, veşare û heta bibêjî ne zanistî re dibêjin qey mîstîsîzm in kamil bûne, dema fikrên xwe bi yên mîstîkan re dane ber hev hişê wan ji serê wan çûye. Şikir ev helwest îro diguhere. Birastî jî fikra Rojhilat êdî bala gelek mirovan dikşîne û êdî bi tinazî û fikar li wê nayê nihêrtin. Hebûna mîstîsîzmê, di nav alema zanistî de cidî tê girtin. Hejmareke zanyarên zêde, di wê zanînê de ne ku wê fikra mîstîk, ji bo felsefeyeke bi teoriyên zanista nûjen re hevgirtî û guncaw in bibe paşxaneyek. Ev, nêrîneke dinyayê ye ku keşfên zanistî yên mirovan, dikare bi hedefên wan ên manewî û baweriyên olî re di nav ahengeke bêqisûr de be."* Ev nirxandinên di pirtûka Frîtjof Capra ya bi navê 'Di Fikra Rojava de Xala Werçerxê' de her çend hin kêmasiyên xwe hebin jî (!) lê li ser navê zanistperestiya Rojava, ji devê fizîkvanekî; derbarê sûcê ku nirxên bingehîn ên manewiyata mirov tune hesibandin yan jî tinazê xwe kirinê de, li xwe mikur hatin û rexnedaneke girîng e.

Jineolojî, ji hev cudakirina obje û sûbjeyê ya mohra xwe li rêbazên zanistên pozîtîvîst xistiye bi rexneyî digire dest û rêbazên xwe dispêre zîhniyeteke ku ji vê jihevcudakirinê derbas dike. Ji hev cudakirina obje û sûbje ya dubendiya bingehîn a pergala şaristaniyê ye û li ser vê esasê ji hev cudakirinên weke em-yên din, jin-mêr, xweza-mirov, beden-ruh, xweda-qûl, mirî-zindî ku di fikra mirov de tên kûrkirin û weke dijberiyan tên cîbicîkirin, spartek û desteka bingehîn a modernîteya kapîtalîst e. Jineolojî, weke rêbazên wê di pêşxistina têgihîştina heqîqetê de bi kar bîne de, rêbaza Descartesvarî ya ku ji hev cudakirina obje û sûbje pêş dixe û dike felsefeya bingehîn, napejirîne. Fizîka kûantûmê îspat kiriye ku ji hev cudakirina obje û sûbje nayê mutlaqkirin. Jineolojî vê rastiyê esas digire. Di rêbazên xwe de ji hev cudakirina çavdêr û ya çavdêriya wê tê kirin bi kar nayne. Di dawiyê de bi zanebûna her du jî li beramberî hev di nav bandorbûnekê de ne esas e, rêbazên xwe hildibijêre. Li ser vê bingehê dizane ku heqîqeta wê derkeve holê îzafîtî ye. Ne materyalîzma ku tişt teqez dike ne jî îdealîzma ku kirde teqez dike bi tena serê xwe nagire dest. Her du diyardeyan jî li dijberî hev bi cî nake.

Ew lêgerîna zîhniyet û rêbaza ku ji hev cudakirina obje û sûbje mutlaq nake, bi zanebûna îzafîtiya wan pêş dikeve, têgihîştin û afirandina heqîqetê xurt dike diparêze. Jineolojî di wê baweriyê de ye ku felsefeya civak û dîrokê ya ji hev cudakirina obje û sûbje derbas dike, dikare mirovê azad ava bike. Bergeha hilweşandina hawirdorê ku modernîteya kapîtalîst rê li ber vekiriye, hilweşîn û xerabûna civakê, ji hev cudakirina obje û sûbje, têgînkirina gihîştiyê, bi hêza wate û pêkanînê re rasterast girêdayî ye. Jineolojî, weke zanista jiyan û jiyana civakî têkoşîn

dide ku di zanistên civakî de weke cudahiyeke zîhniyetê bi cî bibe; her wiha ji hev cudakirina obje û sûbjeyê mutlaq nake. “*Cihêkirina obje û sûbje, kilîta hegemonyaya zîhniyetê ye.”***(31)** hedefa Jineolojiyê ye ku kilîta di vê diyarkirinê de tê îfadekirin vebike.

Jineolojî di pêşxistina rêbazan de wê yek ji ramanên ku bibe palpişt ev be; bi pêşketina civakî re, rûdana qutbûyîna jîrekiya analitik û jîrekiya hestî qadên azadiya civakî û ferd brîndar û seqet kiriye. Ev qutbûyîn li ser navê mirovahiyê windahiyên mezin dane jiyankirin û mirovahiyê bi xeteriyên mezin re rû bi rû hiştiye.

Jinelojî, taybetiyên jîrekiya hestiyar ên aydî hemû zindiyan in; hêsan lê misogeriya ajoyî, avahiya wê ya bi îstikrar, zû bi zû neketina xeletiyê, sehekiya wê, bi jiyanê re têkiliya wê ya hişk, di mijarên jiyanî de refleksên bi lez û bilindiya qabîliyeta jîrekiya analîtîk ku zûtir dikare hilbijêre, yanê dikare biguherîne li ber çav digire. Di heman demê de dibîne ku jîrekiya hestiyar bi lez rola jîrekiya analîtîk naleyîze, ew cureyê jîrekiye ku ji bo jiyanê pêwîst e, şîrove dike û dide jiyankirin. Karakterê jîrekiya analîtîk a ji ber şîrovekirina zêde ji jirêderketinan re vekiriye û ji ber ku mîna makîneyekê dixebite, ji hestên weke êş, tirs û hezkirinê bêpar e, dema serbest dimîne xeterî dide, empatî û sempatiyê nas nake aşkera dike. Jîrekiya analîtîk ku lez dide pêşketina civakî, ger bi jîrekiya hestiyar re biaheng bixebite; di avakirina kes û civakên qabîliyeta wan a dahûrandinê pêşketî de wê bi roleke diyarker rabe, bi vê rastiyê tevdigere. Ji ber vê yekê Jineolojî, rêbazên xwe dispêrin xebitandina jîrekiya hestiyar a civaka xwezayî û jîrekiya analîtîk a pêvajoyên civaka çînî, bi şêweyekî biaheng, bihevseng û hevdu temam dikin esas digire.

Kûantûm; weke fizîka pêlan û perçikên jêratomê; derbarê têgihîştina gerdûna zindî, bisehekî, pergalên bi hilbijartina azad, di heman demê de bûna du tiştên cuda, rêzika nediyariyê tu car bi temamî nayê derbaskirinê û gelek asoyên nû li pêşberî me vekir. Jineolojî, wê di van asoyan re li diyardeyên lêdikole û vedikole binihêre. Dualîteya kûantûmê, yanê ger tu cihê diyardeyê bizanibî tu yê dema wê, ger tu dema wê bizanibî tu yê cihê wê nizanibî li ber çav bigire û tevahî çavdêrî û ezmûnên xwe wisa pêk bîne. Yanê çavdêrî û ezmûnan jî wê bi zanebûna vê dualîteyê şîrove bike. Vê dualîteyê wê bi tespîta; ‘ Di kêliya zanînê de tu ava dibî. Yanî zanîn û avabûn di heman kêliyê de pêk tên…*ev, dualîteyeke di sînorên makro û mîkro yên gerdûnê de çêdibe, diherike. Di pêkhatinên herî harîqa yên gerdûnê de xwe dide hiskirin.”***(32)** binirxîne û jiyanî bike.

Dema em li encamên fizîka kûantûmê derdixe holê dinihêrin, têkiliya çavdêr û ya tê çavdêrîkirin ji hev cuda dibe. Çavdêr bandorê li ser made, tişt dike, ya tê çavdêrîkirin jî di şertên labaratoarê de xwe weke xwe nîşanî çavdêr nade. Ev rewş jî heqîqetê tîne rewşeke guhêrbar û îzafî. Girîngiya dengê dilê mirov a hundirîn û çavdêriya hundirîn jî bihesibîne nîşan dide. Li ser vê rastiyê asta lêhûrbûna me, xurtkirina hêza me ya çavdêriyê, asta me ya têgihîştinê zêde dike. Jinelojî, bi zanebûna van taybetiyên mirov, nêzikî diyalektîka pêşketina tevahî gerdûn û xwezaya civakî dibe.

Pêşketinên di kozmos û fizîka kûantûmê de tên jiyankirin; di şîrovekirina pêşketinên xwezayî û civakî de, feraseta sedemîtiya hişk û li ser xeteke rast bênavber pêşketinê ku di fikra Rojava de hakim e, betal kiriye. Pêşketinên bi vî şêwazî, her çiqas di qadên diyar ên jiyanê de, di mekanên bisînor de ji bo demekê werin jiyankirin jî her tim mutleq nînin. Gelek faktorên ku bûyer û diyarde ji hev bandor dibin; ji gelek îhtimal û dibetiyan re derî vedike. Dibe ku gelek pêşketinên bi pirhêlî derkevin holê. Li gorî pêkhateya fikra kûantûmê ya esas; di diyalektîka pêşketinê de, di her diyardeyê de peydabûna ‘navbera kaos’ê ye.

Serfirazî û karakterê pergalên civakî yên wê di vê navbera kaosê de pêş bikeve, asta têkoşîna beşên civakî yên ku vê dijîn wê diyar bike. Jineolojî, dema weke feraseta zanista civakî ya bi navend jin ku wê têkoşîna azadiya jinê xwe bispêrê pêş dikeve, ev taybetiyên rêbaza kûantûmîk her tim li ber çav digire. Nermî, azadî, pirhêlî, dewlemendî, cudahîtî, curbecurî, potansiyel û îhtimalên guherîna xwezaya civakî dizane û di lêkolîn û vekolînê xwe de rêbaza kûantûmîk esas digire. Dizane ku eger

em jin bi vê rêbazê pirsgirêk û çareseriyên jiyana civakî bigirin dest, em ê ji rastiyên hatine mutleqkirin dûr bimînin, bi şêwazekî bi rêgeza çêbûna gerdûnî re biaheng, nêzî şekilgirtina zîhnî ya ji piralîtiya rastî û heqîqetê re vekirî bibin.

Jineolojî bi baweriya heke mîkro kozmos, yanê mirova/mirovê ku kurteyeke gerdûnê ye û li nava kozmosa kûantûmê disekine ger were dahûrandin, wê her du gerdûn jî (kûantûm-kozmos) werin fêmkirin rêbazên xwe ava dike. Dizane ku zîhniyeta ku ji mirov baş fêm bike wê ji gerdûnê jî fêm bike.

Jineolojî, pergala fikra anîmîzmê (candarîtî) ku fizîka kûantûmê ew derxistiye holê û beriya bi milyonan sal komên mirovan jî bi sehekî pê zanibûne û weke ol jiyane, feraseta xwezaya zindî esas digire û wisa nêzî xwezayê dibe. Bi vê nêzikahiya felsefî û hiskirina sehekî, hedef dike ku zanista ekolojiyê pêş bixe. Forma destpêkê ya komên mirovan, bi herikîna enerjiya xwezaya gerdûnê re ahengdar, li ser felsefeyeke rast, bi ekolojiyê şêweyên wan ê jiyanê lêkolîn dike. Bi ola wan koman û anîmîzma ku "zanista civakî ya beriya dîrokê"**(33)** ye, bi cewhera wan a azadîxwaz û wekhevîxwaz lêkolînên xwe yên civakî pêş dixe.

Jineolojî, van rêgezên bingehîn ên derbarê rêbaz de, bi jîrekiya jinê yê azad û sehekiya xas ê aydê jinê şîrove dike. Aliyên pozîtîf û negatif ên şêwaz û rêbazên fikirandinê yên mîtolojî, ol, felsefe û zanistê, bi hev re lêkolîn dike, dinirxîne. Bi qasî kes û civakên azad pêş bixe, ji van şêwazên ku mirovatî bi hezaran sal e yan di nav hev de an jî dijberî hev ev şêwaz bikaranîne, sûdê werdigre. Ti rêbazan bi aliyên wan ên tenê pozîtîf an jî tenê negatîf nake mîna pût an jî der nake. Jineolojî, bi qasî rêbazên olî, mîtolojîk, felsefî û zanistî, zîhniyeta ku çand-huner û edebiyatê têkilî hev dike; "*zîhniyeta armonîk*"**(34)** esas digire.

Bi van prensîbên bingehîn, emê destpêkê rêbaza mitolojik lêkolîn bikin ku dîroka mirovahiyê bi hezaran sal ev rêbaz asas girtiye. Emê weke rêbaza mîtolojiyê lêkolîn bikin ku ev rêbaz xwezayê zîndîwer digre dest, ferq û cewazî naxe navbera însên û xwezayê û her wiha qonaxa zarokatiyê ya zîhniyeta mirovahiyê ye. Mîtolojî bi hezaran sal di zihne mirovahiyê de bi bandor bû. Pişt re bi pêşketinên ol û zanistê xwestin ku ji bîra mirovahiyê paqij bikin. Lê îro jî mîtolojî di jiyan û rêbazên mirovahiyê de bi bandor e. Ji ber vê sedemê, Jineolojî di rêbazên lêkolîna xwe de, weke metoda ravekirina heqîqetê, wê ji mîtolojiyê sûd werbigire.
Zindîwer, gerdûnî û ruhê zaroktiyê ku taybetmendiyên mîtolojiyê ne , di afirandina feraseta rêbazê de wê best û îlhamê bide me. Di xwezayê de curbecurî, nermbûn, kaos, tevlihevî, pir-rengî, afirîneri û netemambûn di me de berdewam dike, ji ber vê yekê em 'jin û jiyan' in. Ji bo vê, mîtolojiya ku awayê fikra çaxên dayîka xwedavend hê dijî, di lêgerîna xwe ya rêbaz û lêkolînê de, em mîna xizneyeke bêserûbin dinirxînin. Ev rêbaza tê de sehek, jîrekiya hestiyarî û his bibandor in, bi nêrîneke afirîner dîtin û di dîtina rêbazên nû de mîna çavkaniyek jê feydegirtinê em esas digirin.

Jineolojî, di bergeha van rastiyên giştî de rêbaza mîtolojîk; bi qasî aliyên wê yên pozîtîf bibîne rexneyî jî digire dest. Mîtolojiyê weke jîrekiya analîtîk a destpêkê ji anîmîzmê ber bi derbasbûna lêgerîna zihniyeta xwedayên hukum dikin dinirxîne. Mîtolojiya ku di bîra mirov de şopên kûr hiştin ne tam çaxê şaristaniyê ye ne jî liderveyî wê ye. Ya rastî sêwiran û afirîneya destpêkê ya gelek têgîn, sazî û teoriyên dema derbasbûna şaristaniyê ye mîtolojî. Di mîtolojiyê de bandorên anîmîzmê heta bibêjî zêde ne. Lê, ya ku derewên despêkê yên desthilatdarî û yekdestdariyê li ser civaka xwezayî înşa kirine, berevajîkirinên wan û îxaneta wan a li gotin û wateyê, xwedavendîtiyê parçe parçe kirine û afirandine jî mîtolojî ye. Her çend zimanê wê helbestî be jî… Ev, rastiyeke ku zanistên civakî bi aşkerayî dikarin tespît bikin; mîtolojî û gotinên olên yekxwedayî ku wê di demên piştre de ji wan re bibe çavkanî, di avakirina desthilatdariyê de û di civakê de rewakirina wê de heta bibêjî bibandor in.

Mîtolojiyê, li dijî xwedavendan xwedayên firtoneyan afirand, erd û ezman tevlîhev kir, xwedavendan parçe parçe kir û bêqîmet hişt, xweda bilind kir asîmanan. Ji xwedayên dostê mirovan, xwedayên dûr, xerîb û bi tirs afirand. Mirovan ji pîsiya xwe afirand û qûltiyê weke fermana xweda di zîhnê mirovan de rewa kir. Û karakterê

mirov ê nerm keşif kir, şekil dayîn û kedxwariya wê keşif kir. Jineolojî, ji bo şopa “Jîrekiya mîtolojîk a bi kokên bavkanî û qalibên zîhnî yên bi çavkaniya wê”**(35)** di roja me de, di her qadê jiyanê de bigere û bikaribe biguherîne, veguherîne, wê bi narînî li ser vê rêbaza fikirandinê bisekine. Dîsa bi hayjêhebûna di dîroka jinan de şikestina cînsîtî ya yekem û di dîroka mirovahiyê de jî hemû endamên wekhev û azad ên civaka xwezayî veguherandina çîna qûl, avahiya fikrî ye ku şoreşên dijber pêş dixe, vê rêbazê digire dest. Rêbaza mîtolojîk, şerê di navbera xwedayan de digire dest û şer, hîle, tecawiz û gelek heqaretên li ser jinê rewa û pîroz dike. Jineolojî, vê realîteya forma fikrî ya yekem ku aqlê mêrê qurnaz û deshilatdar, civaka xwezayî û yekparebûna jin û mêr parçe dike analîz dike û wisa nêz dibe.

Dîsa rêbaza mîtolojiyê ye yê bingehên dewletîkirinê avêtî. Emê jibîr nekin bê yekemîn ew formê zanist û hişmendiyê ye ku xwedayên hikimdar, evdên wan yên ku wê birêve bibin û payeya nemiriniyê dide rêvebiran peyda kiriye jî mitolojiye. Her wiha wê her tim di bîra me de be ku yekem olê çîna serwer a ber bi pêdarê ve ye, newekhevî koledariyê ye jî. Mîtolojî, li beramberî stûxwariyê xelatan wad dike û bingeha fikrî ya  kolekirinê, afirandina utopyaya bihuşt û dojehê ya yekemîn e. Rastiyek e ku ji bo olên yekxwedayî çavkanîtiyê jî dike. Vê şêwaza ku bi hezar salan e bîra civakan dagir dike ji nedîtî ve nayê. Hewl dide wate bide mîtolojiya ku avahiya fikra demên destpêkê yên mirovahiyê ye. Vê yekê, weke divêtiya rast analîzkirina ol, edebiyat û hunerê jî pêş dixe.

Di afirandina feraseta rêbaza xwe de, ji rêbazên fikrê yê bingehîn ku em ê lêkolîn bikin û şîroveyên rexneyî li ser bikin; bi taybetî olên yekxwedayî ne. ‘Heyf û mixabin, nexweşbîniya ku weke taybetmendiyeke yekxwedayetiyê pêş ketiye, îro me ew çend pejirandiye, bi qasî ku li hemberî xwedayên din emê nebînin bê ev yek wê bibe helwesteke dijminane ya nû’ Ev nexweşbînî û pejirandina di vê tespîta di pirtûka Karen Armstrongê ya bi navê Dîroka Xwedayan de, di jiyanên me de berdêleke giran bi me daye, ev berdêl bi sedsalan pir giran bûye û hê jî dibe.  Ev ol bi aliyên xwe yên dogmatîk, qederparêz, determînîst, zenûn, rêzika hişk ku dibêje her tişt ji berê ve ji aliyê xwedê ve hatiye diyarkirin, di zîhnê mirov de texrîbatên giran çêkiriye. Beriya her tiştî, li ser fikra azad pir zêde sînor hatine danîn. Xwedayek heye ku li şuna însên li her tiştî fikiriye, qanûnên ku wî daniye hene. Ev rêbaz ne li gorî nermbûn, zindîwer û piraliya însên e.

Olên yekxwedayî ku li ser jinê **çanda şikestina cinsîtî ya mezin a duyem** pêş xistine, di serî de jin, divê her beşên bi zanistên civakî re eleqedar in derbarê vê mijarê de hûr û kûr lêkolîn bikin. Şoreşa dijber a şikestina cinsîtî ya yekem bi mîtolojiyê pêk hatiye, bi olên yekxwedayî jî dibe fermana xwedê ya di hikmê qanûn de. Ev ferman ku jinê bi çanda fedîkirin, reşkirin û nefretê dorpêç dike, afirandina rêbaza fikra olî ye. Yek ji wan mijaran e ku em ê bi rexneyî lê binihêrin. Dijminatiya felsefeyê, ji fikrên cuda yên şîrove û îtîrazan pêş dixin û ji berhemên wan re jî mijareke din ê rexneyî ye. Wisa ku di vê bergehê de şewitandina her zanyarekê, çerm gurandin, jêkirina ziman, dardekirin û tunekirina pirtûkên wan mîna fermana xweda bi rihetiyeke mezin bi cî tîne. Ev jî yek ji janên herî mezin ên di wicdana mirovahiyê de ye. Ji encamên vê yê herî bingehîn jî, zîhnê mirov ji fikra felsefî û zanistî ya pir hêja mehrûm maye.

‘’Bi dogmabûyîna mîtolojiyê re dîn pêk tê. *Olbûn bi dualî qiymet digire. Di mantiqê de rê li ber têgeha ‘fikra misoger’ vedike. Qanûna xwedayî her ku diçe bi qanûna xwezayê re dibe yek. Di xweza û civakê de fikra tevgerbûna diyalektîk, beriya derkeve wiha tê astengkirin, rêya fikirandina îdealîst vedibe. Fikir, heta bibêjî ji diyardeyan qut dibe û bi serê xwe, bêkontrol pêş dikeve. Fikra îdealîst, di nav xwe de dikeve serboriyeke bêserûbin, zîhniyeta civakî qatek din ji alema rastiyan dûr dixe. Pêşketina fikra olî, bi demê re di gelek qadên bingehîn ên mîna hiqûq, siyaset, aborî, exlaq û hunerê dibe dogmayên hişk.* Aliyê wê yê bi tenê erênî ew e ku di gavavêtina fikra neberçav de telşên mezin di nava civakê de vedike, zorê dide fikra felsefî û zanistî, û nebi-destê xwe ji wan re zemîn amade dike. Fikra zanist û felsefeyê bi fikra dînî re di nava pêwendiyeke diyalektîkî de pêş dikeve.’

Ev mijarên ku Rêber Abdullah Öcalan balê dikşîne ser, derbarê pêşketina fikra olî û bandorên wê yên di jiyana civakî de ji bo ku bi awayekî sosyolojîk analîz bên kirinê argumanên heta bibêjî girîng pêşkêş dike. Dogmayên olî, pêdarbûna çîna bi dewletî heta bibêjî hêsan kirine. Ji ber ku dewlet û rêveberên dewletê, bi rêzikên olî yên di hikmê qanûn de, siya xweda yê li ser rûyê erdê ne. Ji bo li ser navê xwedê civakê birêve bibin heta dawî hatine rayedarkirin. Eger fikra olî ev qas hatibe perestkirin, sedem ewe ku ji avahiya fikrî ya berjewendiyên şaristaniya deshilatparêz û dewletparêz re heta bibêjî guncaw e. Ya rastî, ji destê kesên erka rêvebirina vê şaristaniyê ji xwe re hedef girtine ve hatiye çêkirin. Yên vê forma fikra razber çêkirine, ji bo ku gel weke ku rastî be jê bawer bikin amûrên wê jî afirandine. Bi feraseta xwedayê ku civakê ditirsîne, ceza dike, li dinya wî alî di agir de dişewitîne yan jî bi bihuştê xelat dike, vê bi ser xistine.

Forma fikra olî, di dinyaya zîhnî ya mirov de, di manewiyat û jiyana madî de, di tevahiya dîrokê de û di roja me ya îro de jî şopên kûr afirandiye û heta bibêjî bi bandor e. Yek ji berpisiyariyên bingehîn ê Jineolojiya ku di îdîaya zanista jiyana civakî radibe ewe ku, watedarkirina vê formê ye û bi dahûrandin û şîroveyên sosyolojîk destgirtin e. Nêzikahiya Jineolojiyê ya ji bo fikra olî ku ji bo bîrewerî û hebûna civakî formekî bi rîşe ye, ne mîna redkirina pozîtîvîzmê, ne mîna nêzikahiya materyalîzma çor û ne jî mîna perestkirin û nelêpirsandina qerisî ya îdealîzmê ye. Diyardeya ol û bi maneya giştî teolojî ku di vê pirtûkê de di mijarên rêbaz û nêzikahiya hebûna jinê de me pir qismî girtiye dest; di pêvajoyên pêş me de wê bibe ji qadên ku Jineolojî bi lêkolîn û vekolanan bi berfirehî nêzik bibe. Jineolojî, rêbaza olî, ji aliyê watedarkirina xwezaya civakî, bîrewerî û dîroka wê ve bi girîngî digire dest.

Rêbaza olî, li gel ku rê li ber pêşketina fikra felsefe û zanistê vekiriye, aliyekî erênî yê din jî, di civakê de lez daye pêşketina diyardeya exlaqê. Kirinên mirov, di bergeha başî û xerabiyê de tên şîrovekirin û bi qanûnên exlaqî ve tên girêdan. Dema em rola exlaqê ya jêneger, di hebûn û pêşketina civakî de, difikirin, wateya ku ol ji vê diyardeyê re tevkariyên pozîtîf bike jî em dikarin bi kûrahî têbigihîjin. Jineolojî, di rêbazên wê pêş bixe de ji ber ku hebûna exlaqê ji bo azadiya civakî jêneger dibîne, hurmetkar nêzikî tevkariya olê ya vê qadê dibe. Dîsa dema dîroka olan bi merceka jinê hûr û kûr were lêkolînkirin, di vê qadê de tevlîbûn, bandor û rolên jinan jî wê weke cudahiyên girîng tevlî dahûrandina me ya sosyolojîk bibe.

Bi taybetî di kevneşopiya Rojhilata Navîn de, ev mijareke gelekî girîng e. Mirov tenê olên yekxwedayî yên ku bûne yan jî ew kirine olên fermî û mezhebên ew rewa dibînin lêkolîn bike, wê li ser navê civaka xwezayî windahiyeke mezin be. Li gel vekolandina van olan, pêwîst e mirov li ser baweriyên ku berhemên felsefeya fikirîn û jiyana gelan in jî bisekine û mane bidê. Weke mînak, tevgerên Manî û Mîtra ku di demên destpêkê yên Xiristiyaniyê de çalak bûne. Manî (P.Z. 216-276) bi sentezeke tevlîkirina Xiristiyanî, Zerduştî û Helenîzmê, li hember girêka kor a şer û zilma împaratoriyên Roma û Sasanî bi gelan didan jiyankirin, xwest derçûnekê pêş bixe. Bi destê muhafezekariya şaristaniya Sasanî ve hat qetilkirin. Piştî mirina wî, ji aliyê Xiristiyaniyê ve ku bi demê re bû ola fermî, bi tirs û nefreteke mezin hat destgirtin. Fikrên Manî ji fikreke olî bêtir , xwedî taybetiyên felsefe û hunerê bûn. Olên civakan ên beriya xwe înkar nedikir. Di vî warî de dikaribû li hember dogmatîzma olî û rastiya hişk a ev li ser civakê ferz dikin bibûya alternatîfek.

Disa li gorî vê bergehê, baweriyeke ku pêwist e mirov bigre dest, baweriya kevnare ya kurdan Mazdeîzm e. Di vê mijarê de argumanên ku Rêber Abdullah Öcalan di nirxandinên xwe de peşkeş dike hêjayê lêkolîn û vekolanan e; ‘Hiyerarşî û hevkartiya bi şaristaniyê re çiqasî pêşde çû, çanda qebîleyê ji hev parçe bû, di nava tevger û bîrbirina qebîleyê de bivênevê cihêbûna obje-sûbjeyê pêk hat. Li dijî vê tevgera bîrbirinê ku hegemonya îdeolojîk a Sumer nîşan dide, tevî çanda dayika xwendawend a ji rêûresmê (Çanda Xwedawend Starê) tevgera baweriyê ya nûjenxwaz a Mazdayê bi pêş ket. Sîstema baweriyê ya Mazdaîk xwe disipêre

dualîteya hêzên ronahî û tariyê. Ew bi xwe digihîje dualîteya diyalektîkê. Nîşan dide ku bîrewerî çêbûye di biwara tevgera diyalektîk tez-antîtezê de ya ku ji bo bûyînê hewce ye. Bi vî aliyê xwe, tevgerek e ku ji dualîteya xwedayê afirîner û evdê afirandî ya vedîtineke çor a mîtolojiya Sumer e, gelekî li pêştir e. Baweriya Mazdaîk bi xwe diyalektîka gerdûnî dike bingehê xwe. Bi îdeolojiya xwedayê afirîner û evdê afirandî evd-obje rastiya gerdûnî îfade nake û ji vê jî wêdetir di bîreweriya mirov de rê li ber berevajîkirinekê vekir ku sererastkirina wê gelekî zor e. Ev tevgera bîrbirinê ya mohra xwe li tevahiya dînan, nexasim jî li dînên yekxwedayî xistiye, bingehê tevgerên zêhniyetê yên xwe disipêrin cihêbûna obje-sûbje yên heta îro hatine, danîne. Tevî Taotiya li Çînê û hin şêweyên din ên li Hindistanê, şêweyê bîrbirinê yê Mazdaîk celebekî cuda yê zêhniyetê temsîl dike. Bi vê zêhniyetê li şûna dualîteya afirîner-afirandî, li pêşketina diyalektîkî ya xwe bi xwe pêk tîne, derî vedibe.'

Di sedsalên destpêkê yên pêşketina Îslamê de tevgerên tesewifê jî derketin, di Zuhd û Zahidiyê de ku ji yekem şaxên tesewifê bûn, hêjaye ku rola jinê bê lêkolînkirinê. Ji wan deman dest pê dike, heta sedsalên 11. û 12, tesewûfvanên jin ên gihane, di perwerdekirina tesewûfvanên jin û mêr de rola ku girtine, di demên piştre de di bergeha xizmeta civakî de dergahên saz kirine û bi rê ve birine û gelek seknên jinan ên di vê qadê de, şênber daneyên sosyolojîk in ku divê ji çavkaniyên wan bên lêkolînkirin. Û ev pêşketin di nav hevbandoriya bi Îslamê re û sentezkirina olên kevn ên gelan bi îslamê re hatine jiyankirin. Ji ber vê sedemê, rêbaza fikra olî, bi nêrînên seransere û pozîtîvîst-oryantalîst dest negirtin, di rêya ku diçe azadiya civakî û takekesî de ji bo serfiraziyê bivênevê ye.

Heke “Zanyariya ku bi qasî ol dîrokeke xwe ya kevn heye, mirov dikare mîna despêka felfeseyê bihesibîne.**(36)** ‘Pîşeyê zanyartî û felsefeyê bi xwe hunerê gera li heqîqeta civakî ye.’ (37) be di dîroka civakî de zanyarên destpêkê jin in. Wan, di demên herî bi zehmet ên civakîbûnê de, heqîqetên bingehîn ku bikaribin civakê biafirînin û berdewam bikin dîtine. Jineolojî di avakirina pêşxistina rêbaza xwe û rejîma heqîqetê de, rastiya zanyartiyê ku li ser navê felsefeye ji dest çûye, dide ber lêpirsînê. Di tevahiya dîroka civakî de, di pêşketina fikrî de aliyên erênî û neyînî yên felsefeyê di ber çav re derbas dike. Di lêgerîna rêbaz de, rêbaza felsefeyê grîng dibine ku ev pêkhateya rêbazê asoyên nû pêşkêşî mirovahiyê kiriye, li hemberî dogmayên olî û îdealîzmê bûye derçûneke nefesî û bi vî hawî jî şoreşeke mezin a fikrî ye. Felsefe, bi çavdêriya ya şênber û jîrekiya hestiyar girtiye nav xwe û hêza razberkirineke bilind afirandiye; forma fikrî ye ku tevkariya herî zêde daye zanistê. Hemû qadên jiyanê, tevahî qadên zanistê, giştî pêkhateyên zanînê, nivîsandina dîrokê, xwe dispêrin felsefeyê. Jineolojî tevlî vê nêrîna rojava nabe ku li gorî vê nêrînê, jiyan bê rêbazê felsefeye ne dibe û ne jî tê şîrovekirin û her wiha ev rêbaz li Yewnanîstanê dest pê kiriye. Bawer dike ku seretayîya zanatiya felsefeyê, ji kevneşopiya Rojhilata Navîn e û ji fikra dayika xwedawend despêka xwe digre. Jineolojî, merhaleyên derketin û pêşketina fikra felsefeyê ji çavkaniyên pirhêlî û cuda lêkolînkirinê esas digire. Bi qasî taybetmendiya wê ya ku di fikir de pêngav daye çêkirin jî, taybetiyên wê yên ku mirov ji derdorê, ji civakê xerîb dike, bijarte, elît dihêle û parçe dike jî dibîne.

Fikra felsefîk, her ku pêş ketiye yan li ser navê ol yan jî zanistê her tim rûmeta wê ji çav de hatiye xistin û ji jiyanê hatiye qutkirin, razberkirin û daxistine rêjeya jêr a mijûliya tebeqeyeke bijarte. Ji armancên bingehîn ê Jineolojiyê ye ku di lêgerîna rêbaz, wate û rejîma heqîqetê de qiymeta ku felsefe heq dike pê bide qezenckirin. ‘Tesfiyekirina felsefeyê weke zanista heqîqetê û bi vî awayî ji aliyê maneyê ve têkçûna wê, bi qasî qirkirinên maddî û fizîkî yên civakê rê li ber felaketan vedike. Civaka bê felsefe civaka tayê wê bi heqîqetê re qutbûyî ye. Ev jî tê wê maneyê ku civak bi tenê dibe lod û gidîşeke obje û tiştan. Civaka obje jî ew civak e ku bi tevahî qabîliyetên wê yên parastinê şikiyane, mîna gidîşeke alavan li her cure mêtinkariyê

vekiriye. Mirov nikare li felaketeke bi qasî civakeke qabîliyeta xweparastinê jidestdayî mezin bifikire.’ (38)

Naxwe bêfelsefebûyîn, bêparastinbûyîne. Yanê di asta ji gihayekî jî kêmtir de, di bêmanetiyeke di navbera hebûn û nebûnê de, mîna bêformiya enerjiyeke beredayî li dor xwe zivirîn e. Jineolojî weke zanisteke ku dixwaze felsefeya azadiyê esas bigire û pêş bikeve, hedef dike ku bi jinê, bê felsefebûna di jiyanê de derbas bike. Ew nêzikahiyên bi jinê re bihevrebûneke tenê ajoyî yan jî li gor zêdebûna fizîkî esas digirin, ji naskirin û pênasekirina etîk û estetîk, yekîtî û zêdebûna felsefîk dûr in, ji pêşxistina têkoşîn û keda bihevrebûneke wiha dûr in, dema jinê digirin dest, aşkera ye ku bê felsefebûyî ne. Bê felsefetî jî ji her cure kirêtiyê re vekirî ye. Birastî jî têkiliyên jin û mêr, îro li her welatên dinyayê, dubendiya yan mirin û kuştinê yan jî ji kirîn û firotinê derbas nakin. Têkilî bi giranî di asta dînîtiyê de ne. Di vê de para tunekirina felsefeya jiyanê diyarker e.

Jineolojî, dema rêbaza felsefîk lêkolîn dike û tevlî dewlemendiya rêbazê dike, lêkolînkirina zanyar û fîlozofên di tevahiya dîrokê de jiyane û ji wan hînbûyîna felsefeyê esas digire. Bi taybetî dikeve dû fîlozofên jin ku ji hela bizavên felsefeyên ku ketine xizmeta hêzên dewletparêz û desthilatparêz ve bi israr hatine tune kirin û jinedîtî ve hatine dîtin. Heke zanyartî; ‘ yekparebûna felsefe û sosyolojiyê û rewşa wan bi jiyanê re di zikhev de’ be, jin ji wan nasnameyên bingehîne ku li vê pênaseyê tê. Îro jî zanîn û diyalektîka jiyanê ya jin û bi taybetî dayîkan vê rastiyê îspat dike.Zanînên xwe yên ku li parzûnkê xistine, di jiyanê de di neqişînin. Ji ber vê sedema bingehîne yanî ji ber zanyartiya jinê ye ku civaka polîtîk û exlaqî li derdora jinê tê honandin. Jineolojî, di rêbazên xwe yên lêkolînê, amûr û mekanên xwe de xebitandin û neqişandina vê zanyartiyê esas digire.

Ji aliyê din ve felsefeya Hegel ku felsefeya desthilatiya modernîteya kapîtalîst e “*Hê jî wezîfeyeke bingehîn û rojane ya bîrdozî ye ku mirov Hegel fêm bike û ji Hegelparêziyê hesab bipirse. Tevî sûdwergirtina ji Nietzsche û ekola fransî, hewcedarî bi xebatên afirînertir ên felsefeyê hene.*”**(40)**divê bê lêkolînkirin. Li ser vê esasê lêkolînkirina wan, rola vê feraseta felsefîk a rê li ber rewşa jinê ya îro vekiriye dahûrandin û deşîfrekirin; ji bo xebatên felsefeya antî- Hegelparêziyê pêş bikevin alîkarî dayîn, di avakirina rêbazên lêkolîna nû de weke pîvan diyar dike.

Îdîaya zanistê ewe ku li hemberî mîtolojî, ol û felsefeyê hêzeke maneyê ya bilindtir e, lê di roja me ya îro de desthilatparêze û azadî û serbixwebûna xwe winda kiriye. Zanista ku xwe weke şîroveya wateyê ya herî pêşketî pênase dike, bi lez û bez bi deshilatiyê re çawa bûye yek, pêwîst e bê lêpirsînê. Zanisteke wiha, ne dikare îdîaya xwe ya ku dibêje ez şîroveya wateyê ya herî berfireh a xwezaya civakî me bîne ser ziman, ne jî bi layiqî dikare temsîl bike. Bi hezar salan civak bi anîmîzmê, di mîtolojiyan de bi xwedayan, bi felsefe û zanyartiyê hebûna xwe pîrozî kirin. Bîreweriyeke kûr a civakî afirandin. Îro li ser navê zanistîtiyê, di ser de bi pesindariya desthilatiyê ev bîrewerî nayê bêdengkirin.

Felsefe û fikra zanistî ya pozîtîvîst, ji salên 1970’yî ve êdî ketine ber lêpirsînê. Weke pêkhateyeke fikrî, zanista pozîtîvîst, ji desthilatparêz, desthilatparêziya mêr, cinsiyetparêz û nîjadparêziyê re palpiştiyê dike. Lêpirsînkirina vê, şansekî afirandiye ku em rûyê xwe bidin bêhejmar formên fikrî yên di xezîneya bîreweriya civakî de cihê xwe digrin, her wiha zanyartiyê û awayê zanînê jî. Bi me daye hiskirin ku bi lezgînî, bi qasî nan û avê pêwîstiya me bi vê heye. Êdî ew zanista ku li ser serê me mîna oleke nûjen, mîna şûrê Demokles me bi derzanistîtiyê, bêsûbjektivîtiyê sûcdar dike û êrîşî nirxên manewî yên kes û civakê dike ku aniye ber qedandinê, êdî tê darizandin. Bi hevpariya gelek sûcên li hember mirovahiyê yan jî bi nesekinandina van sûcan tê tawanbarkirin. Jineolojî, weke zanisteke nû ya jiyana civakî û jiyanê; bêyî ku aliyên fikra zanistî yên pêş dixîne, pêşketinê, jiyanê hêsan dike, derbarê azadî û wekheviyê de asoyan vedike û her du xwezayan bi çavdêrî û ezmûnan watedar dike înkar bike; ji eniya jinê ve wê tevlî vê hesabpirsînê bibe. Ji bo rêbazên lêkolînê zanistî bin bêguman wê baldar be, lê wê ev baldarî ne li gorî zanistperestiya pozîtîvîst be.

Taybetmendiyên rêbaza zanista pozîtîvîst ku li ser cudahiya serkirde û tişt e,

parçe dike, cudaker e, cinsparêz û netewparêz e, di lêgerîna rêbaza jineolojiyê de, ji rêbazên bingehîn e ku bi xetên giştî rexne lê digire. Rêbaza zanistê ku mîna rêbazeke ji mîtolojî û olê re alternatîf derketiye jî di eslê xwe de xwedî dogmayên hişk e. Bi taybetî li ser navê sûbje û objektîviyê de. Zanistperestî jî di rêbazên xwe de determînîst e. Lê jiyan herikbar e.

Feraseta zanista pozîtîvîst a modernîteya kapîtalîst, şaşî û nebesiyên ol û metafîzîkê bi kar tîne û xwe mîna oleke nû birêxistin dike, ji bo Jineolojiyê wê ev nebe ew rêbaza ku xwe bispêrê. Ji ber ku pozîtîvîzm, xwe dispêre 'qanûnên zanistî (!)' yên di hikmê qanûn de û xwe fermî û rewa îlan dike. Gelek dibistanên fikrî û bizavên bîrdozî yên felsefe û exlaqê yên dîroka civakî, bênirx dike. Yên pergala kapîtalîst napejirînîn û li alternatîfan digerin, awayê fikirandina wan a xweser û lêgerîn û pêşketinên wan ên pergalê pûç dike. Her wiha xwe sipartiye jihevcudakirina obje û sûbjeyê, qada zanistê li dîsîplînên pir zêde parve dike û parçekirinê pêşxistiye. Zanista pozîtîvîst ku di xizmeta pergala kapîtalîst de û weke jêravahiya wî ya fikrî pêş ketiye, armanca zanîn û zanebûnê û girêdana wê ya bi jiyan û civakîbûnê re qut kiriye. Di encam de zanînê ji civakê re, civakê jî ji zanînê re xerîb, biyanî kiriye.

Jineolojî, di lêgerîna rêbazên nû û di honandina rejîma heqîqet û zanînê de; fikir û zîhniyetan weke olî û li derveyî olê kategorîze nake. Hewl dide di warê civakî de bersiv û beramberiyên cureyên zanînên mîtolojîk, olî, felsefîk û zanistî watedar bike. Her yekê bi analîzên sosyolojîk digire dest. Hewl dide di dîroka xwezaya civakî de, di destgirtina xwezaya yekemîn de, dîsa di pêşketina xwezaya sêyem a wê li ser bingeha yekîtiya bi ahenga her duyan were pêşxistin de rola wan fêm bike. Di heman demê de armanc dike ku têkilî û nakokiyên wan ên bi hevdu re, bi çavkaniyên xwe dispêrinê rave bike. Di heman demê de bawer dike ku heke zimanê hevpar ê rêbazên mîtolojîk, olî, felsefî ku xîtabî pêwîstiyên cuda yên xwezaya mirov û civakê dikin pêş bikeve, ji bo krîz û aloziyên civak û kes bi dawî bibin wê bandorên heta bibêjî girîng li ser wan bike.

Jineolojî, li gel prensîb yan jî ferasetên rêbazên giştî ku diyar dike û sabît nagire dest, li gor xweseriyên her zanista di bergeha wê de wê di nav lêgerîna rêbazê de be. Girîngî dide zanistên xwezayê jî, ji nêz ve dişopîne û bi nêrîna jinê, di van zanistan de rexne û nêrînên xwe yên guherîn û veguherîna nêzikahî, rêbaz û paradîgmaya pêwîst e îfade dike. Lê bi rastîyên xwezayî yan jî bi rêbazên zanistên xwezayî, zanistên civakî nagire dest. Li dijî feraseta ku xwezaya civakî bi van rêgezan, bi şêwazekî reduksiyonîst, dadixîne, were dahûrandin, derdikeve. Nêzikahî, rêbaz û destgirtinên li gorî qada zanistên civakîne pêş dixe. Weke mînak, di lêkolîn û vekolanên dîrokê de prensîba Fernand Braudel a dibêje "Divê dîrok were sosyolojîkirin, sosyolojî were dîrokîkirin." esas digire.

Jineolojî, nêrîna dîrokê ya pozîtîvîst, determînîst a ku dewlet, çîn û zorê weke merhaleyên jêneger ên pêşketina pêşveçûna civakî dibîne, red dike. Destgirtina diyalektîk a ku dîrokê weke şaristaniya demokratîk û şaristaniya dewletparêz ku mîna du çemên sereke diherikin dipejirîne. Dîsa di vegotinên dîrokê de, rêbaza ku aliyê dem û mekanê jinedîtîve tê red dike. Dîroka civakî di nav yekparebûnekê de lêdikole. "*Rêbazên dîrokê yên mîkro pozîtîvîst ên tam ketine rola qetlîameke maneyê*"**(41)** bi tena serê xwe watedar nabîne. Girîngî dide yekparebûna vegotinên dîrokên tîkel ên bi vegotinên dîrokê yên gerdûnî re. Rexneyên berfireh li ser feraseta dîrokê ya bîrdoziya mêrê desthilatdar a fermî digre ku ev feraset ji bo dîroka jinê neyê nivîsîn serî li hezar û yek dek û dolaban dide. *"…dîrok niha ye, niha jî dîrok e*"**(42)** di bingeha vê felsefeya dîrokê de, şopa dîroka jinê û dîroka civakî di roja me ya îro de, şop û şîfreyên roja me ya îro jî di dîrokê de digere û hewl dide ji hev derxîne, çareser bike.

Dema Jineolojî rêbazên xwe yên lêkolînê pêş dixe, yek ji diyardeyên wê lê baldar be jî taybetiyên mekana lêkolînê ye. Mekanên destpêkê û pêşketinê yên Jineolojiyê, bi tena serê xwe, bi qasî ezberên giştî yên feraseta zanista klasîk, li ser têgihîştina mekana hînbûyî jî helwest û rexneyeke berfireh e. Jineolojî, weke di pêvajoyên ku zanist çawa bi dest û aqlê jinê çêbûye, hemû qadên jiyana civakî, ji bo pêşketinê weke mekanek dipejirîne û wisa pêş dikeve. Tenê zanîngeh, akademî û enstîtuyên

lêkolînê yên fermî, weke mekanên lêkolîna bingehîn nabîne. Ev mekan, mekanên ku zanist têde ji xwezaya civakî û dîsa ji xwezaya yekemîn qut û razber bûye, biyanî bûye, desthilat bûye û bi qasî ku cinawiriyên weke qetlîamên cihûyan, bombebaranên Hîroşîma û Nagazakiyê biafirîne wehşî û bêwicdan bûye, vê rastiyê her tim bibîr tîne û bi mesafe nêz dibe.

Yeqîn dike ku lêgerîn û pêşketin, azweriya zanistî, divê her tim xwedî ruhê amator û hewesdar be, bi gotineke din wicdanê hilgire. Ji bo zanist bi civaka exlaqî û polîtîk re, bi eşq û hezkirin, bi danehev û nirxên mirov, bi aliyê metafizîk ên mirov re û bi heqîqetê re girêdana xwe winda neke, ji feydeya civakê dûr nekeve, hilbijartina mekanên lêkolînê pir girîng in. Zanist, ji bo li ser civakê –weke di şerên cîhanê de û bi taybetî di pêvajoyên piştre de hatiye jiyankirin- di sazîbûna yekdestdariyên pêkutî û mêtingeriyê de neyê bikaranîn, divê azadî û nasnameya xwe biparêze û her tim pêş ve bibe. Divê prensîbên hilbijartin û pêşxistina mekanên lêkolînê, ji bo karakterê zanistê yê azad û ji feydeya civakê re pêş bixe, alîkar be, karê wê hêsan bike.

*“Karê me yê pêşî yê cidî divê em weke rêbaz bi cih bînin ew e ku em dev ji vê rejîma heqîqetê berdin. Ya rastî divê mirov helwesteke negatîf nîşan bide: divê mirov ji her alî ve negatîf nêzî rejîma heqîqetê ya pergalê bibe! Di vê derê de ez behsa helwesteke hişk û çor nakim. Ez dibêjim; divê mirov wê çareser bike. Ne tenê li dijî tevn û torên desthilatdaran, li dijî navendên mêtingeran jî helwest divê. Kengî ev navend li her deverê li hemberî xwe berxwedaneke manedar dîtin û ji bo avakirina koman xebat hatin meşandin, wê çaxê pergalê ji dûvikê xwe ve hatibe zeftkirin û êdî wê dest pê bike ji hev bikeve.”* Ji bo em vê ‘helwesta negatîf’ a ku Rêber Abdullah Öcalan diyar dike pêş bixin, Jineolojî wê her tim hesasiyeta hilbijartina rêbazên rast hilgire.

Li ser vê bingehê wê Jineolojî di hizra herikbarî, rengînî, piralî, nermbûn û guherbariya jiyanê de be û li gorî vê hizrê rêbazan pêk bîne. Disa Jineolojî rêbazên pêkhatî, yên ferq û cudakariyê nahesibîne, tevahî digre dest, yên ku jinan, bindestan, yên ku ji tecrubeyên aliyên civakî yên hêmanên modernîteya demokratik re girtî ne û rêbazên qalib in rexne û analiz dike. Û bi vê analîzê, rêbazên rast ku cî, dem, cîgayîtî, resentiyên bûyer û kesan û guhêrbarên hwd. digire ber çav û feraseta rêbazeke dînamîk qebûl dike. Di lêgerîna rêbazê de xala ku esas digire, ji kîjan pêwîstiya jiyanê re dibe bersiv û yek jî exlaqî ye yan na. Ji ber ku “her rêya diçe armancê mubah” nîne.

Rêbazên reseniya çaviyên civaka exlaqî û polîtîk a ku em dixwazin pêş bixin xera neke, mezin bike, saxlem bike û pêş bixe, berfireh bike wê bibin qebûlên Jineolojiyê. Karê Jineolojiyê rêbazên bi awayên fikrên ku jinan bi hezar salan civakîbûnê honane, parastine hatine afirandin dîtin e. Zîhnê mirov ê zindî, dînamîk û nerm, di sabitbûna rêbazekî de hepskirin, ji potansiyela jîrekiya mirov re neheqiyek e. Ji ber vê yekê, di lêgerîna rêbaza Jineolojiyê de, taybetiya ku xîtabî gerdûnê bike wê diyarker be. Jineolojî, divê ya cîgayî jî bibine û hizir bike.

Hemû cureyên wêjeyê, mîtolojiyê, hunerê, her qadên jiyanê divê vekole, lêkolîn bike. Di van qadan de, divê bikaribe enerjiya jinê ya herikbar biqefêle. Bi çîroka milyonan jinê  divê çîroka jinaniyê bihone. Weke mînak; tezek li ser jin û êşê heke were amadekirin, divê di dilên ku êşên cur be cur jiyan kirine de bibe xwîn û bavêje. Yeko yeko di demarên wê de bigere, lê ne tenê bi aliyekî. Divê têbigihîje, hîs bike, bi êşên nikarin werin nîşandan bihese, ji awiran dengên bêdengiyê bibihîze. Sosyolojîkbûn, bi sosyolojiyê nêrîn, ji bo Jineolojiyê wê hinek jî bi rêbaza lêkolîn û vekolîneke wiha mimkun be.

Di rêbaza lêkolîn û vekolînê de rastiya jinê girtin, hinek jî bi rastiyên dinyayê yên tên zanîn re wê li hev neke. Ruhekî lêkolîn û rêbaza vekolîneke li derveyî pergalê, bi meyla karakterên afirîner û jinûve avakar. Veqetîna kirde û tişt, tiştkirinê (objekirin), ji bo ku rêbazeke mêrê desthilatdar e û yekparebûnê, heqîqetê parçe dike, red dike Jineolojî. Dixwaze yekalîbûnê derbas bike ji ber ku jîrekiya hestiyar a jinê û kêrhatina wê ya empatiyê ji zanistê hatiye derxistin. Di wê baweriyê de ye ku, derbaskirina

Di jiyana civakî de divê em bikevin ferqa dinyayên tarî yên li ser jinê hatine afirandin û hilweşîna van dinyayên tarî. Li ser van mijarên ku wê êdî pêwîstiyên me bin û bêhejmar mijarên têkildarî van pêwistiyan bin, em ê pirsan bipirsin û lêkolînan bikin. Ji ber ku jin carekê qalibên xwe yên zihnî, girtîgehên xwe hilweşîne, wê êdî bi bask bibe û bifire. Ya ku wê bike jî ev e. Ji bo bifire tenê baskên wê derkevin têr nake. Divê ev bask mezin bibin, xurt bibin. Ji bo vê jî divê jin xwe perwerde bikin. Ji bo jin bikaribin lêkolîneke li ser jinê biafirînin em dibêjin **Jineolojî**.

Ji ber ku piştî dagirkirina dîrokê ji hêla aqil û ruhê mêr ê desthilatdar ve, rêbaza lêkolînê, armanc, amûr û encamên wê her tim û bipergal li dijî jinê hatine xebitandin. Alemeke zanistê îcad bûye ku piştgiriyê dane lêkolînên bi şêwazên mîtolojî, ol û felsefê ku dinyayên bê jin afirandine an jî dinyayên ku jinan qir kirine. Ji ber vê yekê jî hema bêje mirov nikare behsa rastiya lêkolîneke ji qenciya jinê re an jî zanista bêalî ku li ser vê bingehê ava bûye bike. Tam jî bi vê sedemê em dibêjin **Jineolojî**.

Divê rastiya lêkolîn û rêbaza zanisteke ku jin bi her awayî têde hebin, hebûna xwe pêş bixin û bidin hîskirin pêş bikeve. Mîna ku Rêber Abdullah Öcalan dibêje: 'Li gorî felsefeya me, têderxistina ji maneya di çavê hespekî de heta jihevderxistina maneya di dengê çivîkekê de jiyanê yekpare his dike. Felsefeya me ewçend mane barkirî ye, bi rêz û hurmeta ji zanyarê pîr re dest pê dike, hewl dide ji lêgerîna di çavê keçeke ciwan a mîna xezaleke bizdonekî de bersivê bibîne. Jixwe têgihiştineke seksualîteyê ya ji qirkirinê xirabtir heye. Di encama vê têgihiştinê de cehaleta mezin di çêkirina zarokan de heye. Felsefeya me zanisteke welê dike bingehê xwe ku sedemên vê cehaletê yên di mirov û sîstemên hegamonîk de hûrdikole û hewl dide xelekên beridandinê tevan di xwe de ji hev derxe û çareser bike.'

Feraseta zanisteke wiha em tenê dikarin bi rêbaza lêkolîneke di çarçoveya jinê de, rastiya jinê digire nav xwe û xwe dispêre wê pêş bixin. Ev rêbaza me ya lêkolînê, divê gelek mijarên bi hezaran sal in ji nezaniyê an jî bi zanebûn li derve hatine hiştin, tune hatin hesibandin bigire rojeva xwe. Dîsa gelek qadên zanistê yên ku pozîtîvîzmê wan bênirx kiriye, divê bigihîne ked, eleqe û girîngiya ku heq dikin. Jineolojî, hem ji bo exlaq û bergeha vê, hem jî ji bo rê û rêbazên vê ava bike pêwîst e. Gelek şaxên zanista civakî ku îdîa dikin heta niha civakê di bin navên cuda de ji hev veqetandine, bi nav kirine, eger di çareserkirina pirsgirêkên civakî de bi qasî misqalekê jî nekarîne rê bigirin, pirsgirêk di pênasekirinê de, di navlêkirinê de ye. Dane ser rêya şaş ku gaveke rast pêş nakeve. Pirsgirêk her ku diçe zêdetir û kûrtir dibin. Em herin ku dera dinyayê jiyan xitimiye, bi aloz e û di rewşeke nayê jiyankirinê de ye. Wisa be pirsgirêk binyadî û bikok e. Wê çaxê rê û lêgerîneke ku ji me re guherîneke esas bîne û derçûneke bi kok, bide kirin lazim e. Yek ji vana jî zanista jinê ya modernîteya demokratîk e. Ev jî Jineolojî ye.

Têkiliya jiyana bi kriz di lêkolînkirina pirsgirêkên civakî de bi nedaketina çavkaniyê re têkildar e. Heta ku em danekevin çavkaniya pirsgirêkê wê pirsgirêk her berdewam bibe, heta qat bi qat wê xwe zede jî bike. Çavkaniya pirsgirêkê ev 5000 hezar sal in tê nixûmandinê. Lê êdî ev pirsgirêk ne rapêçê, ne derewê û ne jî kirasekî din qebûl dike. Ev pirsgirêk çareseriyê ferz dike. Ji bo vê jî navdayîn û lêkolîna ku heq dike îcbar dike. Mafê xwe dixwaze.

Rêber Abdullah Öcalan vê rastiyê bi awayekî balkêş wiha vedibêje; *"dayîka pîroz, namûsa bingehîn, dest jê nayê berdan, hevsera bêyî wê nabe" derxe û mîna tevahiya kirde û tişt, kombûna têkiliya civakî vekole, lêkolîn bike. Ji objeyeke cinsî pir wêdetir, hem weke cewher hem jî weke torta civakê divê mirov derfetên ronîkirin û azadkirina jinê lêkolîn bike. Bêguman heman lêkolînê ne tenê di qadên zanistên pozîtîf ên bi paradîgmaya mêr hatine pêşxistin de, di qadên olî, hunerî û felsefî ku bi heman paradîgmayê hatine avakirin de jî kirin e. Korîtiya derbarê jinê de şikandin, ronîkirin, her wekî mîna parçekirina atomê ye. Şikandina ve koriyê, hewldaneke entelektuel a mezin û hilweşandina mêraniyê divê.*"

Her çend 'Korîtiya derbarê jinê de, bi qasî parçekirina atomê zehmet ' be jî divê em bişkênin. Yê ku atomê parçe kiribû jî mirov bû û ew mirov jî bêsînor piştgirî, aqil û hêza jinekê girt. Her çiqas li xwe mikur neyê jî. Yanê di parçekirina atomê de para me

jî heye. Wisa be em çima korîtiya li derdora jinê parçe nekin? Dîsa emê di pêşxistina lêkolînên jinê de, di ev qas kûrbûna wê koriyê de para xwe jî bibînin. Ji bo em bibînin, werin dîtin, werin xuyakirin, nîşanî çavên kor bidin em dibêjin **Jineolojî**.

### Ji Bo "Serhildana Mêtingeha Herî Kevn" Bigihînin Serfiraziyê

Sedemeke bingehîn ji bo pêşdeçûna Jineolojiyê ku mîna pêdiviyekê derketiye, ji xitimandin û pêdiviyên civakê re nebersivbûyîna tevgerên femînîst in. Ku ev tevger divê li hemberî pergalê bibûna tevgerên herî radîkal. Xitimandina femînîzmê; di têkoşîna li dijî pergalên dethilatparêz de, bêbandor mayîna çepereke girîng e. Bi taybetî di du sedsalên dawîn de femînîzm, di têkoşînên civakî de, di pêkhateyên zanînê û di şêwazê jiyana jinan de dînamîkeke girîng bû. Bi hemû nirx û potansiyela di hindirê xwe de dihewîne hê jî wisa ye. Ji ber vê sedemê, femînîzma ku serhildana jinên ku mêtingeriya sereta û dawî ne, ji bo ji etîketên modernîteya kapîtalîst were safîkirin û bigihê nirxên xwe yên dawî, em dibêjin Jineolojî.

Jineolojî beriya tevgerên jinê wê bi ser şaristanî û modernîteya kapîtalîst ve here û rexneyên xwe lê bigire, lêhûrbûn û nirxandinên xwe, lêkolînên xwe pêş bixîne ku dijminê esasîn ê jinê ew in. Rexneyên me yên li ser femînîzm û tevgerên jinê jî, ji ber lêgerîna me ya çareseriyên pirsgirêkan e ku em van pirsgirêkan yê xwe dibinin. Em çawa rexnedanên ezmûnên xwe didin û bawer dikin wê ev rexnedayîn derçûnekê bi jinê bide kirin, em bawerin ku bi rexnekirina femînîzmê jî, nûbûn û dînamîkên derçûnekê wê derkevin û pêvajoya nîqaşê wê destpêkeve. Bi lezgînî pêwîstî bi vê yekê heye. Nîqaş, lêgerîn û liv û tevgera fikrî ya me bi Jineolojiyê daye destpêkirin, weke derçûneke navxweyî ya em pêwîstî pê dibînin pênase dikin. Ji aliyê din ve em bawer dikin ku Jineolojî wê bibe zemînek ku tevgera me bi tevgerên jinê yên dinyayê re hîn xurt bigihên hev. Em dixwazin ezmûnên azadî û têkoşînên tevgerên jinê bi ezmûna xwe re bigihînin hev. Em dizanin wê ev dîdarî, me hemûyan nêzî derxistina heqîqeta jinê, çareserkirina pirsgirêka azadiya jinê û sekinandina qirkirina civakî ku hema bêje dinyaya me kiriye cihekî lê nayê jiyîn bike.

Mijareke grînge ku mirov Jineolojiyê bi têkiliya wê ya bi femînîzmê re bigire dest û nîqaş bike. Femînîzm, her çend derçûneke Rojavayî be jî, di hemû dinyayê de, bi taybetî du sed salên dawî, tevger û bîrdoziyeke girîng a derçûneke fikrî û bizavek e. Girîngiya tevgerên femînîst, tenê di berçavkirina pirsgirêka jinê de, rojevkirin, di çareserkirina vê pirsgirêkê de hin polîtîkayan pêşxistin û ji bo van jî pêkutiyek, zextek avakirin nîne. Di heman demê de nîqaşkirina pirsgirêka ekolojiyê, desthilatdarî, modernîte, zanista cinsparêz, awayên zanîna nêr, teoriyên xwe dispêrin feraseta Kartezyen, ferasetên dîrokê û di rexnekirina gelek mijarî de tevkarî û alîkariyên pir girîng ên tevgerên femînîst çêbûne.

Di paradîgmaya nû de Rêber Abdullah Öcalan, ji bo tevgera femînîst û rexnegir mîna "serhildana mêtingeriya herî kevn" pênase dike û dibêje "*modernîteya demokratîk ji bo bike hêmana xwe ya jêneger wê bixebite*" Yanê weke jênegereke (bivê nevê ya) modernîteyekê, paradîgmayekê û şaristaniya demokratîk dide nasîn. Femînîzm, di dîroka me ya nêz de di warê berxwedan û ronîbûnê de xelekeka pir hêja ye. Em baş dihizirin bê li hember kîjan zehmetiyan, çawa pêş ketiye, bi çi ked û êşên mezin hatiye afirandin. Li ruxmî ev qas ked, ev qas hevkariyên me, çima em hê jî ev qas parçeparçe ne? Ma ne xasûkiyên ew aqilê nêr ê serdest me ji hev kiribû? Ma ne ew heman şûrê baviksalarî bû yê me parçekirî? Ma ne em bi milyonan cadû bûn bi fermana heman Çakûcê Cadû (Malleus Maleficarum) hatibûn şewitandin? Ji dara zanyariyê ma ne em bûn ê heman sêvê hilkiriye? Ma ne em bûn bi heman fermana xweda ji heman bihuştê yê hatine qewitandinê? Ma ne em bûn ê bûn hevalbendên heman şeytanî? Ji bo em ji xwe, femînîstan û tevgerên jinan bipirsin; "tevî ev qas hevpariyan, çima ev qas bêrêxistinî?" em dibêjin Jineolojî.

Pozîtîvîzm, modernîteya kapîtalîst, lîberalîzm û zanista cinsparêz jixwe têra xwe em parçeparçe kirine. Me çima bi destê xwe ev qas epîstemoljiyên femînîst ava kir? Di destpêka pêşxistina Jineolojiyê de em têgehên "*ji femînîzmê jî wêdetir, a ji*

*femînîzmê derbas bike, femînîzmê jî bigire nav xwe, alîkariyê bide femînîzmê*" bi kar tînin. Sedema sereke ya bikar anîna van têgehan ewe ku em tevlî van epîstemolojiyên parçekirî nabin. Dibe ku îdîaya me jî epîstemolojiyek lê zede kiriye pêş bikeve. Li gorî ku em dibêjin zanista jinê, bêguman teoriyên em xwe dispêrinê wê hebin, weke mînak hevjiyana azad yek ji vana ye. Bêguman rêbazên lêkolînê, awayên zanînê yên rastiya jinê digirin nav xwe û li derdora jinê pêş dikevin em ê pêşniyar bikin. Di vir de peyvên 'derbaskirin', 'girtina nav xwe', ne di wê maneya rekabeta ku zîhniyeta mêr a desthilatdar empozeyî me kirî de ye.

Di vê mijarê de tespîta Rêber Abdullah Öcalan wiha ye: "*Têgeha femînîzmê, bi kurdî bi maneya jinparêzî ye. Ev, ji bo pênasekirineke tam a pirsgirêka jinê kêm e. Dijberî vê, ji ber ku weke mêrparêzî tê nasandin dikare ber bi bêsihûdiyê ve bibe. Maneyeke mîna jina bindest a mêrê serdest dide, diteyisîne. Halbûkî zanista jinê femînîzmê jî digire nav xwe. Tevgera azadî, wekhevî û demokratîk a jinê ku xwe dispêre vê zanistê, zelal e ku di çareseriya pirsgirêkan de wê bi rola sereke rabe.*" Peyva di vê nirxandinê de dibêje 'digire nav xwe' bi maneya; hevdu xwedîkirin, hevdu pêşvebirin hatiye bikaranîn. Ger ku îro em, li despêka nîqaşên Jineolojiyê bin, di vê de para hînkirinên kuliyata femînîst çi ye? Yan jî bi avakirina zanista jinê em ê kîjan nirxên jinê pêş ve bibin? Ji pêşvebirinê qesta me çi ye? Bersiva pozîtîf a hevpar a van pirsan; danehev û nirxên heta niha ezmûnên jinê ew afirandine, pêşveçûyînên bi Jineolojiyê û derbaskirina xitimandina heyî  ye. Her wiha li gor me, divê tevgerên jinê, derbaskirin, girtina bin banê xwe û bihurandinê nekin kompleks û pirsgirêk.

Pêwîstiya jinê ji hev dû û ezmûnên hev fêhmkirinê heye, bi bergehên hev de mayîn, ji hev derbas kirin û pêşveçûnê heye. Ger ku di nav gerdûnê de gerdûnên paralel hebin, zanînên jinê yên paralelên hev û hevdu xurt dikin çima pêş nekevin, çima di bergehên hev de nebin? Ne di maneya li derve hiştin, parçekirin, dijbertî û tunekirinê de. Di nav hev de û paralel. Ya girîng, pabend û dan û stendina bi hev re ye. Em bikaribin li hemberî fikir û pêkhateya baviksalarî hêza xwe hevparî bikin da ku têkoşîneke bi pirhêlî û serkeftî pêk bînin. Di vî warî de rexneyên em li ser hebûna epîstemolojiyên femînîst ên parçeyî digirin, ne berhemeke pêkhateya ku fikreke mîna hev dike. Berevajî vê, Jineolojî, weke zanista jiyanê, curbecurî û rengîniya gerdûn û jiyanê esas digire. Lê di heman demê de ji wê jîrekiya gerdûnî ya ku curbecuriyê di nav aheng û yekîtiyekê de dimeşîne jî bi bawer e. Bêguman me hay jê heye ku her yek ji epîstemolojiyên femînîst, dest dide êş, valahî û pirsgirêkên cuda yên jiyanê. Lê em pir baş dizanin ku ev taybetiya xweşik, bi tena serê xwe têr nekir ku em li hemberî dinya mezin a baviksalarî serkeftî bibin, têr nake û wê têr neke. Ji ber vê sedemê, li dijî pêwîstiyên bingehîn ên jiyanê û pirsgirêkên ku têkoşîneke rêxistinkirî hewce dikin, em divê vê rastiya ku weke parçeyî dixuyê û erka wê ya jiyanî pir bisînor e di ber çav re derbas bikin. Divê curbecurî û cudahiyên wê li parzûnka nirxên jinê û wateya azadiya civakî re derbas bibe û bi vî hawî bê parastin. Bi qasî vê em bikaribin di mijara têkoşîna azadiya jinê de zanînên jinê yên dikarin hevparî bibin, zanyarî û felsefeya zanînê jî pêş bixin.

Wisa xuya ye ku Jineolojî bikeve rojevê û were nîqaşkirin, wê pirsên gelek tevgerên jinê yên cuda jî çêbibin. Ev pirs û bersivdayîn jî wê di pêşxistina Jineolojiyê de bibe tevkariya tevgerên jinê. Ev di îdîa û xeyala me ya pêşxistina zanisteke jinê ku xîtabî hemû jinên dinyayê bike de, di pêkanîna van de ji aliyê pozîtîf ve wê me motîve bikin. Ya girîng ew e ku di hewldana hevûdû fêhmkirinê de, em nêzikahiyên ku sînoran çêdikin û bi pêşderazî digirin dest pêş nekevin. Epîstemolojiyên cuda yên di nav bizavên femînîst de li parzûnka rexneyê xistin, wê jiyanên jinan ên pir zehmet rihet, sivik û baş bike, bi hin aliyên xwe ve weke pêşwaziya şoreşên esasîn bê fikirandin, wê bi tevgerên jinê dînamîzm, hêza guherîn û veguherînê û tempoyeke pêşketinê ya pir xurt bide qezenckirin. Di vê mijarê de felsefeya zanînê ya alternatîf û projeyên li gor vê pêşkêş kirin jî wê vê tempoyê bigihîne rota, şêwaz û rêbazên rast. Wisa tê fêmkirin her ku Jineolojî bikeve rojevê û bibe mijara nîqaşan, hê gelek mijar û sînorên ku nîqaş li ser wan nabe her wiha nayê derbaskirin wê werin nîqaşkirin.

Divê jin jî vê gotina kur ku dibêje; ' Aqilekî qerisiye her deshilat û dewlet' bi kurahî

têbigihîjin. Bila aqlên me ne qerisin û nebin desthilatdarî. Bila aqlên me herikbar bin, potansiyelên me biherikin. Ya bi me re kom bûyî, bila dîsa ji bo me bikeve liv û tevgerê. Ev qas zanînên jinê, bilindkirina hişmendkirina jinê, ronîbûnên jinê ji bo avakirina çi ye? Ger ku em nikaribin mirinên jinan bidin sekinandin, gelek tundiyên rojane ku jin pêre rû bi rû dimînin bi dawî nekin, ji bo şer, birçîtî, xizaniya her roj li jinan dide û ber bi lîtava fihûşê ve dikşîne ranebin, em têkoşer nebin, ev qas kuliyat, ev qas lîteratur, ev qas epîstemolojî bila nebin baştir e! Qet nebe em ê bibêjin em nezan in, fêm nakin û bêtêkoşîniya xwe bi vî hawî rave bikin. Lê bi gurçûpêçkirina ev qas zanînê û em li ev qas trajediyê temaşa bikin, navê vê tiştekî din e.

Bi van rexneyên me yên derbarê teorî, pratîk û rêxistina femînîst de, bi dersên ezmûnên xwe, em xwedî îdîayekê ne ku di tevgera femînîst de jî vebûnekê çêbikin. Weke rêxistinbûna jinê ya bi dehan salan e di şertên herî giran de ji bo azadiya jinê şer dike, em dikarin zanistên civakî, zanist û sosyolojiya ev ezmûn heq dike yan jî hewcedarî dibîne diyar bikin, bi nav bikin û pêş bixin. Di halê heyî de li dijî moderníteya kapîtalîst û zanistên wê, şêwazên jiyan û fikrên wê, em nafikirin ku femînîzm di nav dijbertiyeke pergalê ya radîkal de ye. Sedema vê ya sereke, her çend teoriya femînîst, rexneyên girîng li ser moderníteya kapîtalîst pêş xistibe jî; bi qasî hewce dike ji feraseta pozîtîvîst û oryantalist derbas nekiriye . Yek ji xalên esasîn ku wê Jineolojî bi femînîzmê derçûnek bide kirin, pêş ve bibe û qadên nû lê vebike jî wê ev be.

Jineolojî tene bi Oryantalîzma di nav bizavên femînîst de cihê xwe digre re tênakoşe. Di serî de li Rojhilata Navîn, bi her fikir û avahiya ku bandora vê nêrînê li ser çêbûye re têdikoşe. Vê têkoşînê jî mîna pîvaneke bingehîn a têkoşîna azadiya jinê dinirxîne.  Li Rojhilata Navîn pirsgirêkên bingehîn ên gelan û bi taybetî yê jinan mîna nemodernbûn tê pênasekirin. Dînamîkên civaka exlaqî û polîtîk ên li Rojhilata Navîn nayên dîtin. Li ser vê ferasetê bandora oryantalist gelekî xwirt e. Dîsa di nedîtina astengiyên ku nahêlin xwe bigihînin dîroka xwe ya civakî de jî, bandoriya serweriya ev nêrîna Oryantalîst  e. Rojavayî û bi taybetî rewşenbîr, siyasetmedar, akademîsyen û femînîstên ji Rojhilata Navîn, ku bi vê nêrînê Rojhilata Navîn şîrove dikin, dibin sedem ku Rojhilata Navîn neyê fêmkirin. Bi nêrîna jinê çareserkirina pirsgirêkan, li hemberî polîtîkayên emperyalîst ên li ser Rojhilata Navîn tê ferzkirin bi awayê rast têkoşînkirinê de, bi dahurandina van sekin û helwestan divê bên guherandin û beralîkirin. Dema ku femînîzm li ser çandên xwecihî, resenî, zêdetir lêhûrbûn bike, aliyê azadîxwaz û dijberî pergalê zêdetir xurt bike, wê hem bandorên oryantalîst zelaltir were fêmkirin, hem jî wê bi vê nêrînê re têkoşîneke xurttir were kirin.

Jineolojî, mîna zanisteke civakî ku divê tevahî tevgerên jinê piştgiriyê bidinê pêş dikeve. Di ti qada zanistê de, heta niha şaxeke zanistê ku hebûna jinê girtibe dest û lêkolîn kiribe tune ye. Jineolojî, ji ber zanista jinê ye û di nav zanistên civakî, sosyolojiyê de pêş dikeve, femînîzm û tevahî tevgerên jinê yên bîrdozî, polîtîk û rêxistinkirî jî xwedî dike. Mirov bikaribe gotina Rêber Abdullah Öcalan ya dibêje "*Jineolojî tevkariye ji  femînîzmê re jî* " wiha fêm bike girîng e. Ji bo em qirkirina civakî ya îro tê jiyankirin fêm bikin, têgihîştina zanista civakî şert e. Ev, ji bo tevahî tevgerên ku pirsgirêkên civakî ji bo xwe kirine derd wiha ye. Ji bo tevgera femînîst jî. Ev gotinên Rêber Abdullah Öcalan ku ji bo partiya jinê destnîşan kiriye, ji bo her kes û tevgerên bi hesreta civakeke di nav demokrasî, azadî û aştiyê de ne û ji bo vê şer dikin hînker e: "*Zîhniyet, hêza wateyê ya partiyê ye. Aşkera ye ku divê zîhniyeta partiyê, zanista civakî pir baş têbigihîje. Lê ez behsa zanisteke civakî ya rastîn; desthilatdarî, şerê ku xwe dispêrê û rê li ber vedike û avabûnên civakî dadihûrîne dikim. Zanista civakî, hemû pêşketina zanistî digire nav xwe, weke temamkarê herî dawî ya zanistan, zanista civakî, hêza ronîker a civaka tê xwestin were veguhertin e… Bi zanistî têgihiştina civakê, hêzeke mezin dide. Di vî warî de her çend bi sînor be jî têgihîştina sosyolojiyê, aliyê herî xurt ê veguherîna civakî ye.*"

Jineolojî, zanista jinê ye ku tevgera azadiya jinê ya ku bi salan e ji bo guherîn û

nirxên têkoşînê de, di pêvajoya ji niha û şûn ve de, bi xurtî di pênasekirin û watedarkirina xwezaya civakî de, ji pirsgirêkên esas ên dertên re "*jina ku hem bi fizîkî, hem jî bi wateyî beşa herî mezin a xwezaya civakî pêk tîne*"**(44)** bi aqil, dest, etîk û estetîka xwe, di afirandina çareseriyên esasîn de, wê Jineolojî mîna çavkaniyeke me ya hêzê ya girîng pêş bikeve. Jineolojiya li ser vî esasî pêş bikeve, dikare derfetên derbaskirina asêbûnên femînîzmê yên ku heta îro derbas nekirine jî biafirîne. Bi me gelekî grîng e ku ev asêbûyînan bi wêrekî bibin mijara nîqaşan. Ji ber ku bersiveke binhehîn a pirsa; 'Çima Jineolojî?' ev e; beralîkirina hin asêbûyînên esasî yên femînîzmê ne ku demeke dirêje femînîzm ji van asêbûyînan nebihurandiye. Astengkirina gelek nirxên ku femînîzmê ew ava kirine û pêş xistine ji bo beredayî neçin, di kemînên moderníteya kapîtalîst de neyên lêdan e. Ev pêdivî di nav nîqaşên hindirîn ên bizava femînîst de an jî bizavên femînîzmê de heta astekî xwe der dike.

Femînîzm, marjînal dimîne, nikare bibe civakî û tevî zanînên bêhempa ên afirandine, di guherîn û veguherîna civakî de, bi lezgînî û bi bergeha ku pêwîstiya civakan pê heye, bi rol û berpirsiyariya xwe ranabe. Ji ber vê yekê jî bizavên femînîst, ne di çavên civakan de ne jî di çavên pergalên dewletparêz û desthilatparêz de mîna "bizava sereke ya alternatîf" nayên dîtin. Zêdetir mîna "tevgerên hêviyê" tên dîtin. Li gor baweriya civakê, encax "bizaveke sereke ya alternatîf" pêş bikeve, ew dikarin bibin destek. Li gel ew qas zanatî, çi heyf e ku femînîzm bi serê xwe di civakê de ne xwedî cihekî wiha be.

Hin bizav û tevgerên femînîst dibêjin "erka femînîzmê ne rêxistinkirin e, femînîzm fikir diafirîne, yên din dikarin pêk bînin". An jî rêxistinkirina civakê û serwextkirina civakê mîna awayek ji awayên muhendisiya civakê be dinirxînin. Piraniya mirovan baş hay jê hene ku em di nav dinyayeke rejîmên siyasî yên li ser hîmên desthilatparêz, dewletparêz û neheqiyan bilind dibin jiyan dikin. Heta di dinyayeke çeteyan de ku hevparê wan in, em dijîn. Ew dixwazin her tiştî; hiqûq, dad, jiyan û mirinê, diyar bikin. Dema vê dikin jî dixwazin civakê gêj û xêt bikin û ji heqîqetan dûr bixin û bixapînin. Dixwazin dinyayeke sanal, weke ya rastîn pêşkêş bikin. Ger mirov di civaka têde ye şahidiya van rastiyan bike û dengê xwe bilind neke, tenê zanîna aliye têkildar û aliyê ne têkildar biafirîne; mirov nikare vê weke dijberiya pergalê îfade bike. Lê femînîzm, ji ber taybetiya xwe, tevgereke dijberî pergalê ye. Heta li dijberî pergalê hêzek ji hêzên motîve ye. Ji ber ku femînîzm ji ber taybetiya xwe, antîmîlîtarîst e, antîdesthilatdarparêz e, antîcinsparêz e, antîfaşîst e. Tevgereke ku ev qas antî (dij)yan di nav xwe de dihewîne, rastiyên dijberî wan e, dema civaka ew têde ne ji qirkirinê derbas dibin, bi piranî di xema afirandina zanînê de be, kêm jî pratîka wê bike, bi taybetiyên wê, bi karakterê wê re nakok e.

"*Di hewldanên femînîstan de gelek hêmanên girîng hebin jî, hê jî nikarin asoyên demokrasiyên bi navend Rojava derbas bikin. Di bingeh de berde awayê jiyana ku kapîtalîzmê ava kiriye derbas bikin, mirov nikare bibêje tam fêm jî kirine. Rewşeke mîna feraseta Lenîn a şoreşa sosyalîst tîne bîra mirov. Tevî ew qas hewldanên mezin û gelek şerên eniyên hatine qezenckirin, di encam de Lenînîzm, nekariye xwe ji tevkarî dayîna kapîtalîzmê rizgar bike. Heman encam, dibe ku bi serê femînistan jî were. Ji bingeheke rêxistinî ya xurt bêparbûn, felsefeya xwe tam pêşnexistin, zoriyên derbarê mîlîtantiya jinê de, îdîaya wê lawaz dike. Heye ku nikaribin di bereya jinê de 'sosyalîzma reel' jî pêk bînin. Lê ji bo balê bikşîne ser pirsgirêkê, ya rast-tir mirov mîna gaveke cidî binirxîne*." Ev rexneyên ku Rêber Abdullah Öcalan li tevgerên femînîst digire, divê di platformên baş û hevpar de werin nîqaşkirin. Tevgerên femînîst, ji bo ev rexne û gelek rexneyên mîna vê tên pêşxistin derbas bikin, di serî de divê bikaribin xwe bi nêrîna nû ya zanistên civakî û sosyolojiyê bi xurtî analîz bikin. Em dibêjin wê ev nêrîn jineolojîk be. Em dibêjin wê zanistên civakî "bi zanista li derdora jinê pêş bikeve" wê nûbûneke esasîn, mudaxele û guherînê bijî. Di vê nûbûnê de, bêguman wê alîkariya kuliyata femînîst çêbibe. Lê nûbûnên em ê biafirînin û pêş bixin jî wê alîkarî û tevkarî bidin kuliyata femînîst.

Xitimandinên tevgerên femînîst, em di kîjan xalên bingehîn de dibînin em

Jineolojiyê, em ji xebatên hevpar re jî zemînek ava bikin. Beriya her tiştî, li ser femînîzmê pozîtîvîzma jinan bi cîhkirin û vê li ser hevudu ferzkirin wê bibe karesatek. Dîroka jinê ku xwedî kevneşopiya berxwedaneke bi hezaran salan e, lê femînîzm di du sed salên dawiya vê dîrokê de cîh digire. Ger em hemû nirxên jinê bi navê femînîzmê diyar bikin, wê ev ji bo dîroka jinê ya bi hezaran salî re neheqî be. Wê Jineolojî jî hewl bide ku bibe parçeyekî watedar ji vê dîrokê. Ev nav, dibe ku di dîroka me de mohra xwe li qonaxekê dabe. Di hin erdnîgariyan de dibe ku ev bizav pêşengiyê kiribe. Lê dinya mezin e û çand û gelên lê dijîn jî cur be cur in. Jinan, bi hezaran sal ezmûn û cêribandinên xwe li gor xwecihîtiyên xwe jiyane û bi nav kirine. Lê nirxên xwe yên hevpar jî bi awayekî bi nav kirine. Jinên ku hin nirxên bingehîn avakirine, rê li pêş hin pêvajoyên civakî vekirine. Gelek daneyên arkeolojîk û zanistî hene ku vê îspat dikin. Li gor baweriya me; hin bizavên femînîst, divê van bi nêrîneke zanistî jinûve lêkolîn û analîz bikin. Bi ya me ev xaleke pir girîng e.

Di roja me ya îro de jî cêribandinên jinan ên xwecihî piralî û li gor resentiya xwe berdewam dikin. Mirov tenê li aliyekî van şertên xweser ên cêribandinên jinan binihêre û bibêje femînîzma post-kolonyal, femînîzma rengîn, femînîzma kurd, femînîzma îslamî, gelo têkoşîna wan a bi hezar zehmetiyê pêş ketiye çiqas bi heqî îzah dike? Li gorî me divê femînîzm vê pirse bipirse. Ji ber ku beşeke girîng jinên ku van cêribandinan jiyane, di cî de nabînin bi van navan werin nasandin. Tevî vê jî, berdewamkirina van navlêkirinan, di lîteratura femînîzmê de, cî nedayîna navên ew li cêribandinên xwe dikin, kêmasiyeke girîng e ku divê femînîzm di ber çav re derbas bike. Hêzên şaristaniya demokratik ku heta niha bi pergal nebûne, lê nirxên civakî temsîl kirine û li dijî şaristaniya bi dewlet, her tim di nav berxwedanekê de bûne. Em bawerin ku divê bi feraseta zanisteke di çarçoveya jinê de, paradîgmayên xwe biafirînin. Her wiha, mirov ezmûnên jinên ku li her derê dinyayê têdikoşin, bala xwe bidê ka cêribandinên xwe çawa bi nav dikin, dikare alîkariyeke watedartir bide têkoşîna azadiya jinên cîhanê.

Rexneyeka me ya din a ku em li femînîzmê digirin eve ku; tevgerên femînîst, bi seknên xwe yên heyî nikarin ji lîberalîzmê qut bibin û bibin hêzên dijberî pergalê. Femînîzm, di dahûrandina şêwaz û hînbûyînên jiyan, fikir û hestan de heta bibêjî lîberal dimîne. Bi şaristaniyeke dijminê jinê re û bi modernîteya wê re, rojane di nav hev de jiyîn, mirov nikare mîna rewşeke sivik bigire dest. Femînîzm, ji ber ku pergala mêrê serdest derbas nekiriye, bi zîhniyeta dewletparêz re girêdayî ye, nêrîna oryantalist û pozîtîvîst a navend Ewrûpa li pey xwe nehiştiye, nikare wate bide rastiya jinên li Rojhilata Navîn û qadên din û hêza çareseriyê nîşan bide. Ji ber vê yekê jî di serhildana grîng a bi navê 'mêtîngeriya herî kevn; jin' de di marjînaltiyê de asêbûyîna femînîzmê tê fêhmkirin. Dahûrandina Femînîzmê, derbarê pabendên pirsgirêka jinê ya bi civakîbûnê re, di pozîsyoneke paşverû de ye. Civakê di şexsê kes de dinirxîne yan jî li derveyî civakê analîza mirov dike, bi vî awayî jî nikare sînorên modernîteya kapîtalîst derbas bike. Dibe ku pêdivî bi awayekî xweser destgirtina diyardeyên mîna çîn, cins, zîhniyet û hwd. hebin. Lê di gihîştina heqîqetên azadiyê yên bingehîn de, grîng e ku pirsgirêkên civakî bi yekpareyî bên destgirtin. Femînîzm, nikaribûye vê destgirtina yekpareyî bi ser bixe.

Di feraseta têkoşînê de femînîzm, analîzên akademîk pêş dixe û vê dike navenda têkoşînê. Ruxmî vê, di jiyanê de teng û di destgirtina pirsgirêka jinê de heta bibêjî parçekirî dimîne. Bêrêxistinî, bi piranî ji dest dayîna zemînên hevpariyê û ji her cure hevparî û rêxistinbûnê rev, pirsgirêkên dijwar ên femînîzmê ne. Ev pirsgirêk, ji wan mijaran in ku tevgerên femînîst, divê destpêkê bigirin rojeva xwe û bi biryardariya pêşxistina çareseriyên esasîn nîqaş bikin.

Her çend di lîteratura femînîst de analîzên rexneyî yên zîhniyeta mêr ê desthilatdar pêş ketibin jî çareserî tenê bi serwextkirin û zanakirina jinê re sînordar maye. Guherîn û veguherîna mêr, bi wan pêşxistina hişmendiya cins û azadiyê, bi qasî di azadiya civakî de rola xwe bilîzîn rêxistinkirina wan, di berpirsiyariya xwe de nedîtiye. Bi vê ve girêdayî, em difikirin ku di mijara hevjiyanên azad de jî valahî, xeletî û bêçareseriyên cidî yên femînîzmê hene. Li ser vê qadê, nîqaşên bi wêrekî,

rexneyên berfireh pêşketibin jî, di mijara hevjiyana azad de destkeftiyên femînîzmê, nebûye polîtîkayeke cinsîtiyê ku ya pergalê derbas bike. Azadiya cinsîtiyê takekesî destgirtin heye. Di encama vê de jî çanda cinsîtiyeke azad ku desthilatdarî û koletî di hindirê xwe de nahewîne nekariye pêşbixîne. Divê baş bê analîzkirin bê mêr û parvekirina cinsî ya bi wî re, bi fizîkî ji jiyana jinê derxistin û vê rolê dayîna hemcinsa xwe, derketineke bertekiyî ye yan azadî ye? Ev têkilî birastî, ji têkiliyên serdestî û koletiyê çiqas azad in? Di cinsîtiya hevzayend de jî têkiliyên serdestiyê ji nûve nayên danîn? Cinsîtiya azad birastî çawa tê jiyankirin? Di vê de rol û diyarkeriya jinê wê çawa ava bibe?

Dema bersivên van pirsên girîng tê dayîn ; meriv dibine ku femînîzmê polîtîkayeke cinsî ya azadîxwaz, bikaribe polîtîkaya cinsîtî ya baviksalarî derbas bike û jê re alternatîfek ava bike pêş nexistiye. Ji hevjiyanên bi krîz re nikaribûye hêvî an jî çareseriyekê biafirîne, ew bi xwe jî di tengaviyên cuda de fetisiye. Di vê de faktora bingehîn; di mijara hevjiyanê de jî femînîzm nikaribûye asoyên pergalê yên paradîgmatîk, bîrdozî, teorîk, civakî û siyasî derbas bike. Qutbûneke esasîn ji modernîzmê, dogmayên pergala kapîtalîst, hînbûyînên wê yên jiyan û têkiliyan re pêk neaniye. Femînîzmê polîtîkayên cinsîtiyê yên heyî di asta pergalê de nikaribûye derbas bike, ketiye rewşeke ku bi awayekî din li van zede dike. Dîsa di têkiliyên jin û mêr de, li derveyî qada cinsîtiyê, bi mêr re di qadên din de têkiliyeke çawa were danîn, di tarîfkirina vê de, di pêşkêşkirina teorî, çareseriya pratîk û nêzikahî de şaşîtî û valahiyên cidî yên femînîzmê hene. Rexnekirin, analîzkirina ya heyî û ya îdeal îfadekirin aliyekî mesele ye. Lê rastiyeke reel a jin û mêran a ku em dijîn jî heye. Li hemberî vê politikaya ku derketiye, ji bo jinan avakirina qad û çeperan e lê li beramberî vê jî mêr tune dihesibîne, wan di nav halê wan de dihêle, derketiye holê. Ev, bi rexneyên ku femînîzm li pergala baviksalarî digre re jî bi nakok e. Di vî warî de, guherîn û veguherîna cinsê serwer, afirandina mêrên ku hebûna jinê, daxwaz, îrade, hest û ramanên wê dibinin û cidî digrin, îdîa û têkoşîna femînîzmê kêm e. Ji îmajeke li ser bertek, red û tenê dijbertiyê esas digre, derbas nake. Ji ber vê yekê jî di mijara hevjiyanê de, ji rewşa bi krîz, qetlîam û bi kaosê re nikare bibe hêza çareseriyeke xwirt.

Femînîzm, di dîtina kêmasiyên xwe û pejirandina wan de, di vê merhaleyê de di nav muhafizakariyekê de ye. Ji hêla hin femînîstan ve tê gotin; "Femînîzm, ji serdestiyê re rexneyeke giran e". Bi awayekî giran rexnekirina serdestiyê, alternatîfbûyîna wê ye. Îro pergal ew qas zirav dixebite ku pêwîstiya muxalefetê ji holê radike û aliyên xwe yên ku divê rexne lê bên girtin jî, bi saziyên xwe dide rexnekirin. Êdî pirsgirêk di teorî, heta di asta paradîgmatîk de tenê rexnekirina pergalê nîne. Pirsgirêk di derbaskirina paradîgmaya pergalê de, di alternatîfbûyîna wê de ye.

Tam jî di vê xalê de yek ji rexneyên me yên bingehîn ku em li tevgerên femînîst dikin, nederketin û derbas nekirina ji pergalê ye. Di nav pergalê de mayîn an jî li derveyî pergalê mayîn, beriya her tiştî bi teoriyên zanînê yên ku pergalê afirandiye, gelo asoyên fikra me, rêgeha me diyar dikin an nakin re eleqedar e. Di warê fikir, hest, jiyan û pêhesînê de, ji bo maneya li derveyî pergalê mayîn were fêmkirin, carna rojek be jî divê mirov derkeve derveyî sînorên madî yên pergalê. Jiyan, ji bilî yên ku li bajêran pêşkêşî me tê kirin, gelekî dewlemend û bedew e. Li dinyayeke ku têde zarok, jin, jiyanên ciwan û dinya bi qîreqîr disojin, heke hûn ji rihetiya xwe nerihet nabin, naxwe di felsefeya we ya azadî û exlaqê de pirsigirêk heye.

Mirov ji bo azadiyê hizir bike, divê bûyera li derveyî pergalê ku bi dest tê girtin, bi çav tê dîtin û bi ruh tê jiyîn tecrube bike. Mirov pirsa; ' Tiştekî li derveyî pergalê mumkine gelo?' bi pirse lê rojane û bi kêliyan jî pergalê biceribîne, helbet encama derkeve dîsa pergalîbûyîne. Derveyî pergalê gelo çiqas mumkin e? Her çend ev bê gotin jî pêkneanîna lêgerên alternatif, şêlukirina vê têgehê, di lêgerîna derveyî pergalê de nîşaneya dilsoziyê ye jî. Bêguman tiştekî bi navê derveyî pergalê mumkin e. Bes bila ji bo ceribandinê ew wêrekiya me hebe. Ev ji bo jinan, nexasim jî ji bo femînîstên ku bi dehan sal in utopyaya jinê xeyal kirine, rewşeke ku divê bi lezgînî

têgihiştina wê pêş bikeve.

Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê; bi nirxên jinê û pirsgirêk û çareseriya jinê ku femînîzmê ev berbiçav kiriye, nirx, danehev û ceribandinên jinên Rojhilata Navîn, Efrîqya, Rojhilata Dûr, Emerîkaya Latîn û gelek çandên cûda lêkolîn dike. Bi analîzkirina ceribandinên xwe jî, wê Jineolojiyê mîna zanisteke avakirina hebûna jinê, pênase û berdewamkirina wê pêş bixîne. Hebûna jinê ji ber ku civakî ye, ev zanist wê di heman demê de zanista jiyana civakî jî bihone.Ev pêvajoya avakirinê, di heman demê de wê bibe pêvajoya ku femînîzm ji bandor û sînorên pergala serdestiyê rizgar bibe û sîstematîka azadiya jinê ya alternatîf jî bê avakirinê. Di vê wateyê de Jineolojî, derçûneke nû ye. Û her derçûn alternatîfek e. Zanista jinê ku ji aliyê berfirehî û cewher ve wê bibe bersiva vê sedsalê, di heman demê de wê mîna zanista civakî jî pêş bikeve. Bi vekirina demarên femînîzmê yên marjînal mayî û xitimîne, li derdora jinê ji bo azadiya civakî ava bibe û were rêxistinkirin em dibêjin **Jineolojî**!

Tevî ku femînîzmê rastiya jinê berbiçav kiribe jî, ji asoyên demokrasiyên navend Rojava derbas nekiriye. Di bingeha vê de tam tênegîhiştin û jê derbasnekirina awayê jiyana kapîtalîzmê, diyarker e. Têkoşîna jinê heke ji modernîteya kapîtalîzmê xwe qut nekiribe, wê nikaribe azadiyê pêş bixîne. Pêdiviya civakê bi aqlê jinê û xwezaya wê heye ku bikaribe kapîtalîzmê red bike û jê re alternatîfan biafirîne. Ji ber ku ya bikaribe xwezaya civakê ya zêde texrîb bûye û hatiye qirkirin ji nû ve biafirîne xwezaya jinê ye. Ji bo jiyanê bide vê xwezayê û bi wê re jî jiyanê ji xwezaya civakî re bîne em dibêjin **Jineolojî!**

'Divê tevgera femînîst bê gûman bibe tevgereke herî radîkal a dijberî sîstemê. Ji bo azadî û wekheviya jinê, ku ne tenê heyamên modernîteya fermî, lê tevahiya yên [heyamên] hiyerarşî û şaristaniyê wê di hemû tevnên civakî de di warên mejî (zihnî) û bedenî de kirine kole û wê bi awayê koletiya herî kûr dane xebitandin, xebatên teorîk ên demokrasiya wan pirr berfireh be, têkoşînên bîrdozî, xebatên bernameyî û rêxistinî û ya herî girîng jî çalakiyên xurt pêwîst dikin. Beyî vana femînîzm û xebatên li ser jinan, ti wateyek wernegirin, ji wêdetirî xebatên lîberal ên jinê ku hewl didin sîstemî rehet bikin.'

Ev xisûs û rexneyên ku Rêber Abdullah Öcalan balê dikşîne ser, em ji bo hemû jinên ji bo azadiya jinê dixebitin fêm dikin. Ji ber ku kemînên pergalê, zêdetir tevgerên jinê yên pêş dikevin mîna xetere dibîne û zêdetir lêdana jinan hedef digire. Heta ku têkoşîna pir berfireh neyê dayîn, tenê bi nêrîna rexneyî li ser pergalê, yan jî bi teorîkî dahûrandina pergalê ev kemîn nayên derbaskirin. Heta ev kemîn neyên derbaskirin jî azadiya jinan, heta ewlehiya jiyanê ya dinyaya me jî pêk nayê.

Jineolojî, di wê baweriyê de ye ku dînamîkên têkoşîna jinê yên gerdûnî û xwecihî hevdu bandor dikin. Di nav Têkoşîna Azadiya Jinên Kurdistanê de cîh dayîna têkoşîn û tevgerên jinê yên cîhanê, bi wan re dewlemendbûyînê weke rûmetê dihesibîne. Dîsa hemû berxwedanên di nav pergalê de jî dibîne û nirx dide wan. Di nav tevgerên civaka sivîl de, di nav malê de, li zeviyan, di fabrîkayan de, li partiyan, di tevgerên ekolojîk de, di qadên tendirustî û perwerdeyê de, di nav derdorên akademiyê de, wê çawa alîkarî bide têkoşîna jinên kedkar, her tim lêkolîn dike. Ji ber vê sedemê, li ser mîrata tevgerên jinê yên dinyayê û alîkarî û tevkariyên nû jê re peyda bike, ji bo di şexsê xwe de em xitimandina ku femînîzm û hemû tevgerên jinê dijîn derbas bikin; bi rêxistin û saziyên jinê yên dinyayê re dîdariyeke bi hêz deynin û ji bo pêngavek ber bi azadî û rizgariya jinê bidin avêtin em dibêjin **Jineolojî**!

Di jiyankirina vê kaosa ku di roja me ya îro de heyî, şansê guherîn û veguherîna gelek qadên bi pirsgirêk û bûyeran jî zêde dibe. Di vê rastiya kaosê de ger em tevgerên jinê, ronîbûn û rêxistinbûna pêwîste çêbikin, biafirînin; ji bo feydeya azadî, aştî û edaletê em ê pêngavên xurt bavêjin. Bi nirxên me yên ku bi hezaran salan, bi berxwedanî û têkoşînên zehmet kom kirine, em dikarin ji krîzên heyî şiyarî û rêxistinbûneke mezin, di asta bikaribe şoreşên jinê bi ser bixe ava bikin. Di her asta dîroka civakî de, di jiyana ku li dorhêla jinê de ye em dikarin dinyayeke nû biwelidînin.

Di roja me ya îro de, di jiyanê de ti şensê pêkhateya teorî û paradîgmayên ku

azadiya jinê nabînin û hurmetê nişan nadin, tune ye. Em bi dinyayeke ku azadî û berxwedana jinê nas dike re rû bi rû ne. Ji ber ku me hê tam bi ser nexistiye, bi deshilatdariya nêr re di nav şerekî bê aman de ne. Ji bo em qezenc bikin, divê em cinsê xwe ji nav lepên kapîtalîzma dike mal, paşverûtiya feodal û olî, rizgar bikin. Serkeftina me ji vî şertê bingehîn derbas dibe ku em dev ji exlaq, hezkirin û çanda zewaca mêrê serdest berdin. Ji bo temamkirina hemû erkên me yên nîvî mayî û bi ser xistina wan, bi tevgerên femînîst, bi jinên azadîxwaz ên di zemînên cuda de têkoşînê dimeşînin û tevgerên azadiya jinê yên gelên cûrbecûr re avakirina rêxistineke hevpar û ji bo "*bi çoş û raperîna mezin a jinê, qezenckirina doza bi rûmet a gelan*"**(45)** em dibêjin **Jineolojî**.

**Ji Bo Dijderketina Cinsperestiya Ku Bîrdoziyeke Desthilatiyê Ye Jineolojî…**

Rêber Abdullah Öcalan tespîta; "*Ji derketina hiyerarşiyê ve, mîna bîrdoziyeke desthilatiyê wate li cinsiyetparêziyê hatiye barkirin.*" dike, di heman demê de dibêje "*Jinelojî, dibe ku bibe derçûneke bingehîn*". Em van her du 'derçûn'an gelo weke dijbertiya diyalektîk û çareseriya diyalektîk dikarin bigrin dest? Yek jê, bûye bîrdoziyeke ku pênc hezar sal in ji hemû desthilatiyan re bûye xala derketinê. Bîrdoziyeke ku jinê bi her aliyî ve aniye ber deriyê tunekirinê. Bi bîrdozî jî aniye ber qeraxa qet tunebûnê. Ya din, derçûneke ku soz û qerara lêkolîna tevahî texrîbatên vê bîrdoziyê dide, li hember van texrîbatan azadî, aştî, hezkirin, dad, xweşikî û avakirina dinyaya jinê ya ku xwe dispêre gelek nirxan îdîa dike. Di sedsaleke ku cinsiyetparêzî tê de îflas kiriye, em dibêjin **Jineolojî**. Di serdema ku ew hetikiye de **'em dikarin bibin derçûneke bingehîn'.**

Bîrdoziya cinsiyetparêzî ji hemû mêran re ji bo jinê, mafê kuştinê jî tê de bêsînor mafan dide. Di vê rastiya sosyolojîk a dinyaya me de, em bi van mêran re ku van mafan bêsînor, her roj pêk tînin dijîn. Wê demê em dikarin behsa kîjan azadiyê û jiyanîkirina kîjan nirxên jinaniyê bikin? Di rastiya têkiliyên ku piraniya wê destdirêjî, destavêtin, êrîşkarî, heqaret, bêhurmetî ne, em ê hezkirin û evînê li ku derê û çawa bi cî bikin? Birastî jî şoreşeke jinê ku em li ser vê rastiyê ferz bikin tune ye? Bersiva me 'Heye!'

Ji bo cinsiyetparêziya civakî bi berfiherî were dahûrandin û derbaskirin, jiholê bê rakirin, ji bo em hesabgirtina pênc hezar salan bi ser bixin, em dibêjin **Jineolojî.** Di serdema me de, bi qasî ku di ti merhaleya dîrokê de nebûye, jin bi pirhêlî mîna amûra kedxwariyê tê bikaranîn; mîna 'mêtingeha destpêkê û ya dawî' di 'kêlî'yên pir zehmet de derbas dibe. Bi hezaran sal in jin bi *bîrdozî tê tunekirin,* di roja me ya îro de bi biyolojîkî bi awayekî bipergal tê tunekirin. Hebûneke ku were bêqîmetkirin, bi xwezayî, tu maneya wê ya ku hebûna xwe berdewam bike jî namîne. Ji bo hebûn û heyî kirinê, li hemberî tune hesibandina bîrdozî û tunekirina biyolojîk **Jineolojî!**

Bi bîrdozî tunekirin, weke pêvajoyeke encama bîrdoziya cinsparêziyê hat xebitandin û pêşxistin. Ev tunekirina bîrdozî, yek ji sûcên mirovahiyê ya herî mezin e ku li hember jinê hatiye kirin. Di heman demê de, yek ji sûcên fikrî yê herî mezin e, dîrokeke wê ya pênc hezar salan heye. Di afirandina vî sûcî de, bi dorê û di nav hev de, bi piştgiriya hev û li dû hev; mîtolojî, ol, felsefe û zanist hatin bikaranîn. Hemû mirovahiyê jî kirin hevparê vî sûcî. Di hişê tevahiya mirovahiyê de –piraniya jinan jî têde- gelek bawerî û fikrên şaş çêkirin ku jin, lawaz e, cinsê duyem e, heta nemirov e jî, ji zayînê ve gunehkar e, her tim divê bi tundî û pêkutiyê were terbiyekirin û hwd. Ev, di heman demê de sûcekî exlaq û wîcdanê ye ku mirov dixapîne. Niha ji bo em ji van sûcan hesab bipirsin û yên tevlî vî sûcî bûne paqij bikin em dibêjin **Jineolojî**.

Têkoşîna hebûn û avabûnê ya bîrdozî ku bi salan e em li dijî tunekirina bîrdozî didin, ji bo em tunekirina bîrdozî bi tevahî ji holê rakin, divê em pêşve bibin, berdewamî bikin. Ji ber vê sedemê jî divê em hesabê ji hemû hevkarên vî sûcê tunekirina bîrdozî bipirsin. Mîtolojî, bi kîjan argumanan û çawa me bi awayê îdeolojîk tune kir? Ol, vê tunekirinê çawa dewir girt û berdewam kir? Piştre felsefe, piştre zanist çawa dewam kirin? Îro, sûcên her çar qadan çawa ketine zik hev û qat bi qat

û ji wan hesab bipirsin. Ji bo ku li şûna vê, bi qasî nan û av pêwîstiya me bi awayê îdeolojîk xurtkirina hebûna xwe heye divê em **Jineolojiyê** pêş bixînin.

Xwe bi gurçûpêçkirin û rojane kirina hemû nirxên xwedavendiyê em dikarin ji mîtolojiyê hesap bipirsin. Hesapdîtina bi olan re ku jinê weke tiştekî nahesibînin, bi rêxistinkirina hêza îmana dilê jinan ên ku bê berjewendî bawer dikin, dikarin pêk bînin. Hesabdîtina bi felsefeyê re; bi derbaskirina aqlê desthilatdar ê mêr felsefeya Yewnan a ku dibêje 'jin, mêrekî ku kêm hatiye afirandin e' û li ser aqlê Rojava û dinyayê serwer e, em dikarin bikin. Hesapdîtina bi zanistê re em dikarin bi bawerî, wêrekî, zerafet û aqlê Hypatîayê xwe bixemilînin û bikin. Destnîşankirina Rêber Abdullah Öcalan ya ku dibêje; "*Mirov jinê, ji aliyê fizîkî, ruhî û zîhnî ve xurt bike, ev belkî jî hewldanên herî hêja yên şoreşger in. Di çanda Rojhilata Navîn, ku demekê ji çanda xwedavenda dayîk re navendî kiriye de, jinê dîsa gihandina hêza wê ya bi nirxên civakî yên pêşketî serbixwe biryardayîn û tercîhkirinê, tevkariyê dayîna vê, lehengiya azadiyeke rastîn pêwîst dike.*" wêrekiya me ya di vê mijarê de mezin dike.

Ji bo ku jinê, heta bibêjî bênirx, bêfeyde, bêaqil, bizirar û xeternak nîşan bidin û hemû civakê bi vê yekê bidin bawerkirin, bi hezaran salan e tundî û amûrên bîrdozî di nav hev de hatin bikaranîn. Di encam de vê veguherandin bawerî û çandekê. Rêber Abdullah Öcalan, ji vê pêvajoya ku di çanda Rojhilata Navîn de bi vegotinên mîtolojîk hatine pêşxistin re dibêje **şoreşa dijber a şikandina cinsî ya yekemîn**. Ji pêşketinên di dîroka olên yekxwedayî de, li derdora jinê hatine pêşxistin re jî dibêje; **çanda şikandina cinsî ya mezin a duyem.** Çanda şikandina di dema mîtolojîk de û şoreşa dijber, di rengê fermana xweda de dibe qanûn. Ev pêşketin hemû, bingeha xwe ji îdeolojiya cinsparêz a ku weke îdeolojiyeke desthilatiyê tê jiyîn digirin. Rêber Abdullah Öcalan bi gotina; "*Dirûşmeya me ya ji niha û pêve şikandina cinsî ya mezin a sêyem li dijberî mêr pêkanîn e. Bi şikandina cinsî ya mezin a sêyemîn, divê cî bide meşeke mezin a bi jinê re, ji qenciya jinê re, ku li dîroka wê tê. Rabûnên ketinên mezin jî mezin in. Li ser vî esasî, ger em weke mumînên oleke nû ya xwedavendê nêz bibin, em dikarin bigihên dayîktiya pîroz a hatiye heqkirin û jinaniya evînê.*" di heman demê de îfade dike ku armanceke din a Jineolojiyê, dijberî mêr avakirina şikandina cinsî ya sêyem e. Ji bo em şikandina cinsî ya mezin a yekem û duyem û tevahî bandorên wan, tiştên ji me birine û em ê wan çawa paşve bigirin û şikandina cinsî ya sêyem divê çawa ava bikin, nîqaş bikin û jiyanî bikin em dibêjin **Jineolojî!**

**Ji Bo Parastineke Cewherî Ya Têk Naçe**…

Ji bo xwirtkirina parastina cewherî û rewa ya jinê ku hatiye şikandin û lawazkirin her wiha ji bo kes nikaribe vê parastına cewherî têk bibe em dibêjin Jineolojî. Belkî jî beriya her tiştî, em Jineolojiyê weke zanista parastina cewherî û rewa fêm bikin, heye ku rasttir be. Di giştî xwezayê de mekanîzmayên parastina cewherî û hişmendiya wan jixweber e. Ev, di jinan de, tevî ku di despêka dîrokê de pir xurt bûye, her ku derbarê xwezaya wan de serwextiya wan hatiye lawazkirin, parastina wan a cewherî birînên xedar girtine. Ev pêvajo wisa bi xwezayî nebûn, jinan, jixweber û bi sernermî, bi koletî serî netewandin. Li gel şerên dijwar, bi amûrên zora bîrdozî û xapandinê hat pêşxistin. Jin êdî ne aydî xwe, ne aydî civaka xwe ne jî aydî xweza û gerdûnê bû, gav bi gav ji vana hate dûrxistin. Bi awayên cur be cur mehkûmî biyanîbûna jixwe hatin kirin. Biyanîbûna bixwe, jixwe hilweşandineke parastina cewherî ye, qirkirina wê ye. Her ku ev biyanîbûn zêde bû, kûr bû, jin jixwe dûr ketin. Bi înşakirina jina kole û teslîmbîyî, mêrê efendî û serwer, dewlet û deshilatdarî û li hemberî çekên van hemûyan, parastina wê gelekî lawaz û bêrêxistin ket. Di vê de aliyê herî li pêş, mêtina li ser jinê bû ku bi awayê zîhnî ev pêk dihat. Heman mîna gelan jin jî, bi kedxwariya zîhnî, yanê bi radestbûna îdeolojîk an jî bi têkçûnê, ji kedxwariyê re bê parastin diman.

Jin, xwedî potansiyel, serwextî û refleksên pir xurt ên parastina cewherî ne û vê ji xwezayê girtine. Kedxwariya zîhnî ji ber ku hemû van potansiyelan pûç kiriye, di jinê de, ji aliyê bîr û baweriya xwe bixwe ve lawazketineke mezin hatiye jiyankirin. Ev jî,

û rojane ve xalên şikestina parastina cewherî lêkolîn dike. Feraseta parastina cewherî û rewa ya jinê, refleks û ruhê wê, kengê, li ku derê û bi kîjan rêbazan hat şikandin? Ev şikestin, dinyaya civaka jin û mêr çawa birîndar kir? Gelo ev şikandin wê mîna çarenûsekê berdewam bike? Jin, wê feraset, refleks û ruhê parastina cewherî û rewa wê çawa jinûve bidest bixe? Jineolojî, di vî warî de wê bikeve dû gelek pirsên din.

Parastina cewherî, ji bo jinan pirsgirêkeke jiyanî û lezgînî ye. Eger ku di sedsala 21. de, me li bazaran weke koleyan dikrin û difroşin, koletiya sekse û fihûşê, ji aliyê mêr an jî malbatê ve kuştinê, di şeran de qetilkirinê, bi koçberî û bi birçûbûnê terbiyekirinê, bi erzanî xebitandinê û îşkenceyên ku li derveyî mirovbûnê ne ji bo me rewa tên dîtin, sedema vê ya herî bingehîn şikestina mekanîzmayên parastina cewherî ya jin û civakê ye. Ji bo ev mekanîzma jinûve û bi saxlemî werin înşakirin, hişmendiyeke xurt ya jinê girtin girîng e. Pêşxistina zanista jinê ya ku dîroka jin û civakê, rastiya civakê digire nav bergehê xwe girîng e.Li hemberî mîlîtarîzma şideta îdeolojiya deshilatdar, antîmîlîtarîzma li ser bingehê parastina cewherî pêwiste. Avakirina hişmendiya jinê û zanista jinê parastineke cewherî ye.

Ger hişmendiya cewherî ya jinan nehatibûya hilweşandin û ji kedxwariya zîhnî re ev qas vekirî nehatibûna hiştin; wê mekanîzmayên wan ên parastina cewherî ev qas lawaz nehatibûya kirin. Mirov vê rastiyê jî li ber çav bigire, beriya her tiştî divê jin, têgeh, teorî û saziyên xwe yên cehwerî yên fikrî ava bike. Parastina vana jî em divê di bin banê parastina cewherî de bibînin. Ne tenê di warê fizîkî de, di warê zanistî, fikrî de jî parastina cewherî pêwîst e. Rêber Abdullah Öcalan bi gotina; “*Felaketeke bi qasî windakirina parastina cewherî ya civakê mezin, nayê fikirandin. Dewleta netewî, civakê ji zanist, huner û heqîqetê dûr xistibe û bê parastina cewherî hiştibe, ev, yek ji faktorên herî bingehîn a pirsgirêka civakî ye.*” bi balkêşî îşaret li ser vê mijarê dike. Jin jî, di her qada ku bibînin civak û jin têde bêparastina cehwerî hatine hiştin, dikarin bi huner, heqîqet û dorfirehiya zanista jinê dest bavêjinê.Dikarin pêşbîniya karesatên ku li ser civakê tên ferzkirin bibinin. Felaketên li ser civakê tên ferzkirin êdî dikarin pêş de bibînin. Di nav hişmendiya parastina cewherî de Jineolojî, dikare bi ser hemû qadên ku civakê ji civakîbûnê derdixe ve biçe; derketinên alternatîf, çare û çareseriyên berfireh pêş bixe. Ji hemû nirxandin û lêkolînên di qada zanistê de hatine pêşxistin û ne bi nêrîna jinê re ne dikarin bersivan ava bikin. Zanista jinê were avakirin, bi qasî ku zanist exlaqî be û girêdayî heqîqetê be, ji aliyê ku zanist were demokratîk-kirin û demokratîk bimîne ve jî xebateke parastina rewa ye. Jineolojî, di civakê de wê bi akademiyên jinê, van xebatan rêxistin bike.

**Jêrnot:**

**(7)** Şaristaniya Kapîtalîst - Serdema Qralên
Tazî û Xwedayên Bêmaske / Abdullah Öcalan
**(8)** Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û
Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan
**(9)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(10)** Deklase; derveyî çîn, yên ew avêtine valahiyê, lexemê
**(11)** Li sînorên Çîn û Tîbetê, li herêma Yunnan, koma Mosuo
**(12)** Polîandre; Pirhevsertiya jinê
**(13)** Sureya Bakarayê, ayeta 223’yan
**(14)** Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî de –
Pirsgirêka Kurd û Çareseriya / Abdullah Öcalan
**(15)** Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî de –
Pirsgirêka Kurd û Çareseriya / Abdullah Öcalan
**(16)** Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî de –
Pirsgirêka Kurd û Çareseriya / Abdullah Öcalan
**(17)** Kürt Kızılbaş Edebiyatının Yasaklı Tarihi yazısı (nivîsa Dîroka Qedexe ya

**(18)** Kadın Krallığı (Kraliyeta Jinê) -Ricardo Goler
**(19)** Vîkîpedî Ansîklopediya Azad ji nivîsa Gelên Daykanî
**(20)** Zuhd-Zahidî; Tevgera tesewifî ya mînaka destpêkê ya di sedsalên 1. û 2. de pêş ketiye.
**(21)** Alevi-Bektaşi Kadın Dervişler (Derwêşên Elawî-Bektaşî yên Jin) Îbrahîm Bahadir
**(22)** Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî de –
Pirsgirêka Kurd û Çareseriya / Abdullah Öcalan
**(23)** Felsefe Sözlüğü (Ferhenga Felsefeyê) / Ahmet Cevizci
**(24)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(25)** Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî de –
Pirsgirêka Kurd û Çareseriya / Abdullah Öcalan
**(26)** Şaristanî - Serdema Qralên Piştperdeyê û Xwedayên bi Maske /
Abdullah Öcalan
**(27)** Şaristanî - Serdema Qralên Piştperdeyê û Xwedayên bi Maske /
Abdullah Öcalan
**(28)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(29)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(30)** Şaristaniya Kapîtalîst - Serdema Qralên
Tazî û Xwedayên Bêmaske / Abdullah Öcalan
**(31)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(32)** Şaristaniya Kapîtalîst - Serdema Qralên
Tazî û Xwedayên Bêmaske / Abdullah Öcalan
**(33)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(34)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(35)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(36)** Şaristaniya Kapîtalîst - Serdema Qralên
Tazî û Xwedayên Bêmaske / Abdullah Öcalan
**(37)** Şaristanî - Serdema Qralên Piştperdeyê û Xwedayên bi Maske /
Abdullah Öcalan
**(38)** Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û
Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan
**(39)** Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û
Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan
**(40)** Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û
Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan
**(41)** Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û
Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan
**(42)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(43)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(44)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
(45) Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan

## JIN ÇI YE? JINEOLOJÎ ÇI YE?

Ji bo fêhmkirin û çareseriya pirsgirêkên li dorhêla hebûnê, pênasekirina hebûnê, diyarker e. Ger ku pênaseya me baş nebe, her rêya ji bo famkirina hebûnê û çareserkirina pirsgirêkên wê, ji destpêkê ve wê şaş be. Pênaseya rast a derbarê hebûnê de, me digihîne heqîqetê. Bi taybetî jî heke zanista vê hebûnê bê kirin, pênaseya saxlem, baş, wê bê wateya hîmekî baş. Tiştekî pênaseya wê tune be, em nikarin zanista wê ava bikin. Ji bo Jineolojiyê jî ev rêzik wiha ye. Heya pênaseya '**Jin**'ê baş neyê kirin, '**Jineolojî'yeke** rast wê pêş nekeve.

Li dinyayê di bingeha krîzên esas de, bersivên ji vê pirsê re tên dayîn an nayên dayîn, yan jî bi şaşî, bi fikreke sabît û çelexwarî tên dayîn, bi roleke diyarker radibin. Hebûna jinê çi ye, çi nîne, jiyan û civak çi ne, çi nînin diyar dike.Ya rast pirsa; 'Jin çi

ye?’ tê wateya pirsên ‘Jiyan çi ye?’ û ‘Civak çi ye?’ Di dîroka mirovahiyê de, di jiyana civakî de rola jinê, hema bêje di beşeke ji sedî 98’an de di asta pêşengtiyê de diyarker bûye. Ev demeke wisa nîne ku bîra civakî bi hêsanî ji bîr bike, tune bihesibîne. Di roja me ya îro de jî têkiliyên jin, jiyan û civakê ew diyardene ku hevdu bandor dikin û diyarker in.Asta bandorkirina jinê li ser her du diyardeyan hewce nake ku nîqaş jî li ser bê kirin. Çi li ser esasê rast dibe , çi yê şaş. Çi bi vîna wê ya cewherî dibe, çi jî weke amûreke pergal bikar anîna wê. Di encam de jin, mîna hebûnekê, di jiyana civakî de di rola kilît de ye. Ê baş e “Jin çi ye?” “Bi Ontolojîkî çi îfade dike?” “Xwezayeke jinê heye?”. Ev pirs, ji demên zîhniyeta mêr a desthilatdar û bi destê saziyên vê deshilatdariyê ve ji dema têk birina jinê û heta îro pirsên herî dijwar û sotîner in.

Û, ji wê rojê ve “*hebûna ku mêr derbarê wê de herî zêde derewan li hev aniye jin e*”**(46)** Jin; di mîtolojî, ol, huner, felsefe û zanistan de ku aqlê mêr ê desthilatdar wan afirandiye her tim bûye hebûneke him xofê, him jî ruxmî jinê bi pênaseyên erzan ên bîrdozî hatiye nasandin. Heta nîqaşên heye yan tune ye, ruhekî wê heye yan na, mirov e yan na jî pêş ketine. Dema em hebûna jinê di nav Jineolojiyê de digirin dest, em di ferqê de ne ku pêwîstiya vê qadê bi lêkolîneke pir berfireh û cidî heye. Jineolojî, her ku bi hemû qadên xwe ve pêş bikeve, derbarê jinê de em ê bigihîjin agahiyên ontolojîk ên baştir. Bi etîmolojîkî vê mijarê ji peyva jinê bidin dest pê kirin û bi ontolojîkî jî maneya jinê bi lêkolîneke nazenînî, hûr û kûr destgirtin pêwîst e.

### Bi Zimanên Cuda Jin

Hebûna jinê ku tune tê hesibandin û di hêla wate û manewiyatê de daxwaza ji holê rakirin û înkara wê heye, em baş jê serwext in ku bi nav lê kirinê dest pê dike. Li gorî vê bergehê, di ferhengên Tirkî de jina ku mîna; ‘ji cinse mê ya kamilbûyî, dijbera mêr an zilam’ tê pênasekirin, em dikarin lê binerin bê di zimanên din de çawa hatiye bi nav kirin.

Di kurdî de; Jin, bi zimanê Hurî; Aşt, di zaravayê Dimilkî de Cin (piraniya wê cenî), bi zaravayê soranî Afrat, bi Sumerî Nîta, bi Farisî Zen, bi Ermenîkî Gin, bi Rumî Gyme, bi Elmankî Frau, bi Latînî Femîna, bi Erebî Mer’e (piraniya wê Nîsa), bi Frensî Femîna, bi Çînî Gyn, bi Yewnanî Gyno, bi Îbranî Îşşa, bi Tirkî Kadın (ji peyva Xwaten /hatun a gelê Soğdca ku bi kokên xwe Îranî ne.)

Di kurdî û hin zimanên din de koka peyva ‘jin’ ê û jiyan, xweza û azadî eynî ye. Bi kurdî jî, jîn, jiyan, şên, giyan, cîhan, cih ji heman kokê tên. Dîsa peyvên jîndar, jîndarî, jînde, zindî û peyvên jin û jiyan ji heman kokê tên. Peyva jiyanê di Sumerî de ti û tî ye. Bi Sumerî di maneya azadî de Amargî, tê maneya vegera dayîkê jî.

Bi Erebî jiyan ‘aîş’ e. Navê Ayşe ji vê kokê hatiye dariştin. Di maneya jiyanê de peyveke din; heyat jî dîsa peyveke mê ye û navek ji navên jina ye. Di Erebî de peyva ‘nîsa’ ku di maneya ‘jinan’ de ye û peyva ‘însan’ yanê mirov, balkêş e çiqas dişibin hev! Dîsa bi Îbranî dijberî zimanên din peyva ‘îşşa’ di maneya mêr de ji ‘îş’ê hatiye dariştin. Bi vê peyvê jî mirov dikare bibîne ku zîhniyeta mêr a desthilatdar, di ziman de çiqas bi sazî bûye. Bi Îspanî peyva ‘la vîta’ yanê jiyan jî peyveke mê ye. Bi Farisî peyva jiyan ‘zendegî’ û jin ‘zen’ ji heman kokê ne.

Bêguman girîng e mirov di gelek zimanan de vê lêkolînê pêş bixe. Lê bi qasî mirov bizanibe di her zimanî de peyva jinê ji kîjan kokî hatiye dariştin, ew qas jî bizanibe di merhaleyên cuda yên dîroka civakî de, nav û pênaseyên li jinê hatine kirin jî girîng e. Ji ber ku têgînkirin, nîşaneya, teyîsandina jiyanê ye û karekî gelekî grîng e. Jiyan çi be ziman wê nîşan dide. Her civak, di pêvajoyên beriya ku cinsparêziya civakî pêş bikeve de, ji bo hebûna jinê kîjan têgehan bi kar anîne û cudahiya di navberê de mirov lêkolîn bike, ji bo gihandina heqîqeta jinê wê gavên girîng bin.

### Rêwîtiya Ber Bi Xwe Ve

Li dinyaya ku em lê dijîn, hebûneke jinê heye ku bi şer, koçberî, fihûş, porno, xizanî, feqîrî, bêkarî, polîtîkayên perwerde û tendirustiyê yên saziyên baviksalarî, harbûna hevser, yar û hwd. bi qasî nayê jimartin bi gefxwarina xeteriyan re rû bi rû

ye. ‘ Jixwe rastiyeke hebûna wê bi îmhayê re rûbirû be, pirsgirêka wê ya pêşî azadî nîne, berê pêşî divê hebûna xwe biparêze û ev yek çiqasî pêkan be, ew û azadî wê di zikhev de pêk bên. Tişta nebe azadiya xwe jî nabe ango tişta hebûna wê tinebe azadiya wê jî nabe. Azadî bi tenê bi hebûnê mumkîn dibe.’ (47) Ev tespît, ji bo têkiliya di nav bera hebûn û azadiyê de pir girîng e. Îro pergaleke hegemonîk heye ku dixwaze hebûna jinan bi fizîkî û îdeolojîk tune bike. Nexwe li hemberî vê pergalê, em ê despêkê hîn bibin bi derfetên xwe hebûna xwe, biparêzin. Ji bo jinek bikaribe hebûna xwe biparêze, divê hebûna xwe nas bike û pênase bike. Divê çêbûyîn û hebûna xwe, bi têgîn û pênaseyên xwe bi nav bike û watedar bike.

Sîmone de Beaûvoîr a bizava femînîzma heyînê daye destpêkirin, di pirtûka bi navê Cinsa Duyemîn (1949) de çavkaniya pirsgirêkên civakî wiha îfade dike: “*Bi şêwazê destgirtina hebûna xwe ve girêdayî ye. …ji ber ku jin weke ya din, mêr jî weke ez hatiye sêwirandin, jin hetanî xwe di peywendiya xwe de pênase bikin, di têkiliya tiştê ne ew tişt in de, yanê weke ya din, çarenûsa wan ew e ku girêdayî mêr werin pênasekirin.*”

Ji bo em ji “bi çarenûsa pênasekirina weke ya din” rizgar bibin, divê pênaseya xwe em bixwe bikin. Ji ber ku ya xwe pênase neke, wê hinekên din wê pênase bikin. ‘Ji bo jiyaneke rast, ya bingeh ew e, divê mirov beriya her tiştî jinê terîf bike û rola wê ya di nava jiyana civakî de diyar bike. Em vî hukmê xwe ji bo xisletên biyolojîk û statuya civakî ya jinê nadin. Têgîna jinê weke hebûn girîng e. Mirov çiqasî jinê terîf bike, terîfkirina mêr jî ewqasî pêkan dibe.’ Ev tespîtên Rêber Abdullah Öcalan, ji bo girîngiya pênaseya jinê, diyarkirinên balkêş in.

Ji bo bi awayê rast nasîn û pênasekirina hebûna jinê, Jineolojî weke derçûneke bingehîn divê bi berfirehî ferasetên mîtolojî, ol, felsefe û zanistê lêkolîn û analiz bike ku nasîn, pênasekirin û lêkolîna van ferasetan  ne rast in. Di pênaseyên hebûna jinê de guhertina xeletiyên wan e. Xala derçûneke din; bi nêrîna mê xwe pênase kirin û ji her cure mêjiyên desthilatparêz ên ku li dijî me, me pênase dikin hesab xwestin e. Yanê redkirina pênaseyên şaş û jirêderketî yên li ser hebûna me ferz kirine û li ser esasê cêribandinên me yên cewherî, bi têgihiştinên cewherî, pêşdebirina pênaseyên xwe  ye. Di maneya rast de ruxmî şaş bi nav kirinên bi hezaran salan, wê ev bibe nîşaneyeke bi wate ku hê jî em tune nebûne. Navlêkirin taybetmendiyeke xas a xwedavenda ye. Dema me nav li xwe kir û bi nasnameya jinê ya dîroka civakî bi dema herî dirêj bi Xwedavendê re pêwendî danî; wê demê di pênasekirina hebûna xwe de em li ser rêya rast in, yanê li ser kokên xwe ne.

Jineolojî, ruxmî me, pênasekirina me û li gorî van pênaseyan hêl dayîna jiyanên me deşifre dike bê tundiyeke çawa bê rehme. Pênc hezar sal in, ev tundiya bêrehm, yanê weke gavên pêşîn ên tunekirina hebûna me, pênaseyên şaş, neheq û dijraberî cewhera me; êrîşeke berfireh a bîrdozî ye li ser nasnameya jinê. Em ê lêkolîn bikin bê ev êriş bi destê kîjan mêrê serwer û di kîjan tevnê de hatiye honandin. Ev rastî, di tevahiya dîrokê de, di jiyana civakî ya jinê de, tê çi maneyê? Weke bersiva vê pirsê, destpêkê divê em li têgihîştin û pênaseyên jinê yên di demên cuda de hatine pêşxistin binihêrin. Di mîtolojî, ol, felsefe û zanistê de jin çi ye? divê em vê pir baş fêm bikin. Ger ku em, ew pênaseyên wan li me kirine, jiyana me heps kirine, bedena me qetil kirine nizanibin û deşîfre nekin, emê derbarê xwe de nikaribin pênaseyên baş bibînin.

Ji femînîstên radîkal Mary Daly dibêje; ‘Rêwitiya jinan ji qadeke sexte ya ne resen, ber bi qada heqîqetê rêyekê dişopîne…Rêwî ji aliyekî ve divê navên baviksalar lê bikin, ji aliye din ve jî wê bibinin ku bi vî hawî înkara neyîniyan wê rê li pêş erêniyan veke. *Ew erênî, li derveyî xwebûn û dinyaya berê bi awayekî baviksalarî hatiye pênasekirin, ji mekana baviksalarî wêdetir, tevgereke diçe hebûneke nû û dinyaya çêbûnê, heyînê…*” Ji bo pêşxistina zanista me ya heyînê em dikarin vê rêwîtiyê pêk bînin.

Armanca sereke ya vê rêwîtiyê ewe ku ji hev bûyîna  jinê ji pênaseyên derbarê hebûna wê de ku bi hezaran salan bi awayê zexteke zede li ser hatiye ferzkirin e. Xwezayeke rast û azad a aîdê jinê heye. Her wiha xwezayeke din jî heye ku di bin

êrîşên pergala îdeolojîk a deshilatdar a ku jinê tune dihesibîne ava bûye. Lê her çend ev xweza ne îfadeya cewhera jinê be jî mîna ku ev yek hebûna jinê be xweza û nasname hene. Gelek sazî û kevneşopiyên pergala dewletparêz, desthilatparêz û cinsiyetparêz, bi zora îdeolojîk û zora aşkere ji bo jin hebûna xwe ya cewherî nejîn astengiyan derxistine.

Dema jin hebûna xwe pênase dikin, divê her tim vê rastiyê li ber çav bigirin. Em dikarin bi hêza aqil, his û hestên xwe, kîjan taybetiyên me aydî xwezaya me, hebûna me ne bibînin. Bi sehekên xwe em dikarin bê kîjan taybetmendiyên me estetîk, exlaq, civak û kesê azad xwedî dike keşif bikin. Mînak di cewherê xwe de tundî ne taybetmendiyeke jinê ye. Rastiya jinê ya ku hildiweşîne, dikuje ne serdest e. Ji bo vê, em jin divê hemû cil û bergên îdeolojîk, sosyolojîk, siyasî û cinsî hwd. ku li me kirine lê li bejna me nayên, me difetisînin, ji xwe bikin. Heta ku bigihîjin rastiya xwe ya rût û tazî, hebûna xwe ya cewherî. Em dikarin ji vê re bibêjin rêwîtiya ber bi xwe ve. Yan jî dikarin bibêjin ji hebûna kirine aydî me, rêwîtiya ber bi hebûna xwe ve.

Dema em “Hebûna jinê çi ye?” digirin dest, em dikarin li ser du rêyan bimeşin. Ya yekemîn; heyîna bi kedxwarî û pêkutiyeke pênc hezar sal in li ser jinan hatine ferzkirin, jinan jî bi giranî pejirandine bineqînin û pênase bikin. ‘ Diviyabû serwextbûna li tevahiya naverok û şêweyên asta koletiyê ya ku bi hezarê salan bi aqil û destê mêrê mêtinkar û zordest ketiye jiyana jinê, bibûya gava pêşî ya sosyolojiya rastiyan.’ (48) Bi gotineke din; divê em “gavên pêşîn” yên dereng mane bavêjin. Ji bo ev gav me bigihîne hebûna jinê ya cewherî û xwezayî û li ser vê esasê Jineolojiya wê, divê em li ser rêya duyemîn jî bimeşin. Divê em xweza, hebûn û heyîna rast a jinê keşif bikin. Di vê mijarê de xwedan dîrokeke me ya pir dirêj, avantaja me ye. Cêribandinên di rabirduyê de hatine jiyankirin, hebûna jinan di civakên xwezayî û Neolîtîkê de, ji wan pêvajoyane ku hêzê didin me.

Em ê di her du rêyan de jî bimeşin û bi keşfên li ser hebûna jinê, wate û wesfên rastîn ên hebûna jinê zelal bikin. Di meşa li ser vê rê yê de, em ê ti carî ji bîr nekin, çi li ser esasê azadiyê dibe, çi jî li ser koletiyê be, jin, diyardeya berdewamkara hebûna civakî ye. Heyîna jin û mêr, her wiha xwezaya civakî baş pênasekirin, bi têgihîştina vê rastiyê ve girêdayî ye. Pêvajoyên civaka xwezayî yên bi deh hezar salan hatin jiyankirin, di çarçoveya jinê de bû lê jina azad. Dema ev civak hatin hilweşandin û şaristaniyên dewletparêz li şûna wan hatin avakirin û rastiyên civakî yên wan ava kirin jî, ji berevajî ve di çarçoveya jinê de ne, yanê di çarçoveya jina hatiye kolekirin. Her çend hatibe kolekirin jî, biyaniya xwe bûbe jî, ger heyîna jinê nebe, ev şaristaniya dewletparêz a pênc hezar salan nikare berdewam bike. ‘Eger hûn jinê û malbatê, bi awayên wan ên heyî, ji bin sîstema şaristaniyê, her wisa ji bin desthilatî û dewletê bikişînin, wê bi navê pergalê li pey, pirr hindik tişt bimînin…*di kişandina barê Kapîtalîzmê de jinê xistine bin barê herî giran.* Lê, berdêla vê şêwaza heyî, şêwaza heyîna jinê ya biêş, hejar, ketî û têkçûyî, ya di bin rewşa şerê berdewamî yê di kûraniya kêm de ye, ku naqede.’ (49)

“*Jinanî bûyereke ne fizîkî, civakî ye… Erka herî esas a zanistên civakî; bi daketina çavkaniya wê, çelexwarîkirinên li ser vê bûyerê rakirin e.*” Ger Jineolojî şoreşa bi lezgînî pêwîstiya zanistên civakî pê heye pêk bîne, mîna ku Rêber Abdullah Öcalan diyar dike divê destpêkê vê “erka herî esasîn” bi cî bîne. Diyaroka jinaniyê, ne biyolojîk, weke diyarokeke sosyolojîk e, ger pênaseyên rast jêre neyên dîtin; berde çareseriya pirsgirêka azadiya jinê, em nikarin dahûrandinên wê jî bikin. Di vê mijarê de ya divê were serxistin; “*bi daketina çavkaniyên çelexwarîkirinên li ser jinê tên kirin, wan derxistina holê ye*”**(50)** Ji bo vê, heta em dakevin çavkaniya wê, divê em li ser rêya yekemîn a me li jor diyar kir bimeşin.

### Kolaneke Arkeolojîk: Di 9 hezar salan de 9 tebeqe

Em dikarin di vê rêwitiyê de ji vê îfadeya Rêber Abdullah Öcalan ku dibêje; ‘ jin ku divê arkeolojiya wê bê kirin’ û ji vê diyarkirina wî dikarin sûdê wergirin; “*Hûn dikarin şekilgirtina yekem a jinê lêkolîn bikin. Bi lêkolîna di 9 hezar salan de jina bi 9*

*tebeqeyî û dîroka xwe ya şexsî bidin ber hev.*" Ev pêşniyarên ku aliyekî Jineolojiyê îfade dikin, di mijara rê û rêbazê de wê ji me rêbertî bikin. Di vê maneyê de Jineolojî, ew zaniste ku wê arkeolojiya jinê bike. Çawa ku Nîetzsche bi têgîna secereya exlaqê, Foucault bi arkeolojiya zanînê, li heqîqetê digerin, em jin jî dikarin **têgînkirina arkeolojiya jinê** pêş bixin.

Qesta me bi vê têgînê; derbarê hebûna jinê, nasname, dîrok, roja wê ya îro, avahiya hest û fikra wê û hemû bûyerên têkildarî jinê de pêşxistina zanista kolanê ye. Ji bin kavilên pênc hezar salî derxistina hebûna jinê ye. Bi du ketina jiyana navend jinê ye, bajêr, gund û çanda dayiksalar e ku zemanekê bi deste jinê, bi aqil û bi hişmendiya hestî ya jinê hatibûn avakirin lê pişt re bi êrişên destê mêr ê serwer ve hilweşiya bûn. Ji bo vê derkirina dîrokê divê, kolana qalibên aqilê nêr ê serwer divê. Yanî li ser jinê bi rakirina axa li ser miriyan gihîştina heqîqetê ye. Ew çi heqîqet e ku jê re xwezaya jinê tê gotin lê weke razekê tê rapêçan? Di hebûna jinê de taybetmendiyên bingehîn çi ne? Ji bo bi awayekî objektif bersiva van û gelek pirsên din, dibe ku pêşxistina têgîna arkeolojiya jinê bibe rêbazeke di cîh de. Pêkanîna arkeolojiya jinê dibe ku ji bo pêşxistin û zanista jinê ya hebûnî rêgehek be. Û di vê mijarê de ji bo fêhmkirina hebûna me jinan de û bi azadî di jiyankirinê de dikare gelek rêgehên nû li pêşberî me veke.

Rastiya Mary Daly jêre dibêje "rêwî, ji aliyekî ve divê navên baviksalarî lê bikin" em bigirin dest. Bi vê gotinê qesta ku tê kirin, naskirin, analîzkirin û têgihiştina ew navên baviksalarî ku rûxmî me li me kirine. Yanê, aqlê mêr ê desthilardar, di mîtolojî, felsefe, ol û zanistê de kîjan navan li me kirin? Di merhaleyên diyar ên dîrokê de û di roja me ya îro de, pênaseyên ji bo jinê hatine kirin hene. Pir kêm ji vana balê dikşînin ser taybetiyên erênî. Gelek jê jî pênaseyên hebûna jinê ne ku pergala baviksalarî layiqî me dîtiye, bi baweriya ku di jinê de hene yan jî xweda me jinan wisa afirandiye. Gelek navên şaristaniya çînî ya dewletparêz li me kiriye hene. Sedemeke ku ev qas pênase li ser me ferz dikin; me bînin rewşeke wisa ku em heqîqeta xwe fêm nekin, nas nekin û neynin ser ziman. Nikaribin xwe pênase bikin. Dîsa jî girîng e em van navan bizanibin, ji ber ku wê bibin alîkar da ku em bi roja xwe, paşeroj û pêşeroja xwe re xwe pênase bikin.

'Çareserkirina pirsgirêkan, ji nêz ve bi rast terîfkirina wan ve girêdayî ye. Cudahiya hebûna bûye mijara pirsgirêkê û hebûna hatiye dahûrandin ango tişta bi pirsgirêk pêk tê vediguhere tişta analîzbûyî.' Ev destnîşankirina Rêber Abdullah Öcalan, zanebûn û analîzkirina van pênaseyên ku şaristaniyên dewletparêz, bi aqlê mêr ê deshilatdar li me kirine, wê alîkariyeke çawa bide me vedibêje. Destnîşankirina; 'hebûna bûye mijara pirsgirêkê' derbarê mijara hebûna jinê de teqabulê pirsgirêkên li derdora jinê dike. Yanê aliyekî pirsgirêkê li ser me pêkanîna tundiya şaristaniyê be, pênaseyên şaş ên ji bo vê tundiyê veşêrin û ximam, nefambar bikin jî aliyekî din e. Heye ku yek ji awayê tundiyên herî giran e. Ji ber vê sedemê "*hebûna mijara pirsgirêkê*" bi jinên hatine kolekirin û navlêkirinên şaş, veşartina kedxwariya li ser dinyaya jinê hatiye ferzkirin îfade dike. Her wiha mirov ew navên ku şaristanî li me kiriye bizanibe, ber bi "*hebûna hatiye dahûrandin*" ve pêşketin e. Ger em van navan analîz bikin, em dikarin koletiya li ser me hatiye ferzkirin ji hev derxin. Bi vê dahûrandinê em dikarin bigihên "ew tişt e ku niha yê ew bi awayekî erênî ava kiriye". Bi pênase û dahûrandina koletiya li ser me ferz kirine em ê cudahiya di navberê de ava bikin, bi hebûna me ya rastîn ve… Em ê ji tiştê bi pirsgirêk, veguherin tiştê hatiye dahûrandin û bi vî hawî jiyan bikin, yanê em ê serhildana "Em ne ev in!" bijîn. Bi vê serhildanê re di nav hev de, em ê hebûna xwe, nasnameya xwe û jiyanên xwe yên azad ava bikin.

Em hinek navên şaristaniya dewletparêz layiqî me dîtine û bûne sedema serhildana me ya "Em ne ev in!" rêz bikin wê bikaribe mijarê bêtir fêmbar û berbiçav bike: "*Şeytên, pîresêhr, efrît, ejdereke pirserî ya tirsnak, hêzeke tevlihevî û tarîtiyê diafirîne, hevala mar, ji parsûyê mêr hatiye afirandin, cariyeya qesrê, bi xweşikî û cinsîtiya xwe mêr ji rê derdixe û bêqîmet dike, ya ku tehrîk dike, 'pîreka mêrê xwe', bi cinsî sor dike, dekbaz, paşgotinî, fesad, hesûd, cinsa lewaz, cinsa duyem, mêrê qot,*

*zeviya mêr bi dilê xwe biçîne, tembûra bi dilê xwe lêbide, ya ku divê ji zikê wê cewrik kêm nemînin…"*

Sedema me ya rêzkirina ev qas navên ku dilê mirov reş dikin ewe ku, rêgeha rêwîtiya ber bixwe ve wiha ye. Weke gava duyem a vê rêwîtiyê, em ê "erêniya" bi gotinên Daly "*Ew erênî, li derveyî dinya û xwebûna berê bi awayekî baviksalarî hatiye pênasekirin, ji mekanê baviksalarî wêdetir, tevgereke ku diçe heyîneke nû û dinyaya çêbûnê*" diyar dike, yanê tevgerê bijîn. Înkara navên baviksalarî, yanê neyîniyan. Ji bo vê emê xwe bispêrin çi? Bêguman emê xwe bispêrin dîroka xwe û hişmendiya dîrokê. Emê xwe bispêrin civaka Neolîtîk a di navbera salên B.Z. 10.000 û 4.000 salan de di pêşengtiya dayîka xwedavend de gihîştiye asta xwe ya herî pêşketî. Em ê xwe bispêrin "*otorîteya civakî ya li derdora jinê bi organîkî hatiye pêkanîn*"**(51 )** ku di demeke pir dirêj a ji sedî 98'ê dîroka civakî de sereke bûye. Beriya ku baviksalarî û şaristaniya dewletparêz vê otorîteyê hilweşîne, di têgihîştina xwezaya civakî de em çi bûn? Çawa dihatin pênasekirin? Ji aliyê kê ve? Reng û navên hebûna jinê gelo dişibiyan ew wesfên ku dilê mirov reş dikin, ên me li jor rêz kirin? Em vana bizanibin, em ê bi navlêkirinên baviksalarî re bidin ber hev. Em cudahiya di navberê de bibînin, wê me bigihîne pênaseyên li gor dahûrandina me ya merhaleyên çêbûna hebûna me. Ji ber vê yekê, em li wan demên beriya ku aqlê mêr ê serdest "*otorîteya civakî ya li derdora jinê bi organîkî hatiye pêkanîn*" hê nehilweşandiye binihêrin.

**Sê Tebeqeyên Destpêkê: Serdema Xwedavendan**

Di xwezaya civakî de nasnemaya jinê ya sereke mîna xwedaventiyê rû daye. Di belgeyên ku heta roja me hatine de her wiha gelek bermahiyên ji wê demê mayî, hebûna jinê bi giranî bi nasnameya xwedaventiyê xuya dike. Di gelek mîtolojiyan de hebûna jinê, her tim bi xwedavendên cuda û pir xurt hatine îfadekirin. "*Ji ber ku jin; hêza sereke ya Neolîtîkê, şoreşa çandiniyê bûye, hemû xwedayên ji zayokiya wê hêz girtine bi şeklê jinê ne. Di demên destpêkê yên Sûmerî, Misrî û Hindiyan de, xwedayîtî, bi pêşqertafa mê tê binavkirin. Aliyê mêranî, wê pir paşê derkeve holê.*" **(52)** Ola xwedavendê bûye pîrozkirina civakîbûna di çarçoveya jinê de. "*Ola xwedavendê, ya rastî bilindbûneke mezin a zîhniyetê ye; pîrozîkirina hilberîneriya jinê ye. Hemû bermahiyên ji vê demê mane vê rastiyê rast derdixînin.*"**(53)** Tebeqeyên destpêkê yên "di 9000 salan de rastiya jina bi 9 tebeqeyî" çaxên xwedavendîtiyê ne. Ev çax ji 9 tebeqeyan sê yên destpêkê ne. Tebeqeya yekemîn; pêvajoya ku xwedavend bi tena serê xwe li lûtkeya hêza xwe ye. Ya duyemîn; demên ku li gel wê kur-hevser-bav û hwd. bi xwedayekî alîkar ê mêr re hêza xwe parve dike û bi têkoşîneke bêeman karibûye di hevsengiyê de bimîne.

Nasnameya dayik/jin, xwedavend ku di serdemên Nînhûrsag û berê wê de heyî ne, ji tebeqeyên 9000 sal an tebeqeya yekem e. Yanî ew nasnameyên jinê yên xwezayî ku pêşengtiyê ji jiyana civakî re dike û ji hemû pêdiviyên civakê re bersiva diafrîne. ' Kulta xwedaventiyê ya di serdema paleolîtîk de ku hilberîna xwedayî pêş diket, nişan dida bê ew bereketa ku jiyana însên vedugêhêse, pîroziye. Hunermendan, pêkerên wê yên weke jineke tazî û biheml sêwirandine ku arkeologan li tevahiya Ewrûpa, Rojhilata Navîn û Nîvgirava Hindê dîtin, verotin. Ev Dayîka Mezin,di hiş û xeyala mirov de girîngiya xwe bi sedsalan berdewam kir…"(54)

Di xwedaventiyê de ya rast meriv dikare ji bo serdema 6000 û 4000 B.Z re bêje serdema dayik/jin. Civakibûna li dorhêla jinê ku bi hezaran vedîtin pêk hatiye, tê pîrozîkirin. Ji vê xwedavendê re Sumerî, navê Nînhursag lê dikin, Babîlî jê re dibêjin Gula Bau, xwedavenda dayîk **Star** e ku li Mezopotamyaya Jorîn Kurd weke **Stêrk** ew bi nav dikin. Bi Sumerî Nîn= nasnava Xwedavendê ye, Hûr=çiya/gir, Sag=perçe, herêm e. Ji bo Mezopotamyaya Jêr çiya; Zagros û rêzeçiyayên wî ne, Navê Nînhûrsagê, weke delîlek e ku çanda xwedavendîtiyê ji çiyayan daketiye.

Nînhursag, dema xwedavenda herêma çiyayên Zagrosê bûye, di ser Enkî re ye.Lê pişt re bi xweda Enkîyê xasûk re ku ji bo Sumer weke sembola çîna serdest û şaristaniya dewletdar e, dibe ji yek her çar xwedayên xuliqdar.(An, Enlîl, Nînhûrsag,

Enkî) 'Temsîliyeta dayika malî
ya ku şaristaniya neolîtîkê pêşxistiye dike. Civaka ku li dorhêla dayikê berz dibe , bi remzê xwedayîtî bi dest xistina nasnameyê ye'(55) Dema em li vegotina mîtolojîkî ya Sumer dinihêrin, em dibînin jina ku nasnameya sereke ya serdema şoreşa çandiniyê ye, di şexsê Nînhursag û paşê Înanna de hatiye bintûte û tunekirin. "Di zimanê Aryen de beriya dakevin deştên Ferat û Dîcleyê, temsîla xwedavenda navê wê Star e (piştre bi Akadî Îştar), rastiya dîrokî ya di çavkaniya mîtolojiya Sumer de bi balkêşî datîne holê. Weke berhema şoreşa çandiniyê ya Neolîtîk a çanda xwedavendê, hêza wê û bi Sumerî çawa dane veguherandin bi zelalî tîne ziman."(56**)**

Gelek taybetmendiyên Nînhursagê hene: Dayîka xwedayan, destpêkera serdema hilberînê, çêkera amûran, ya di navenda gerdûnê de li bihuşta têde dara kozmîk heye dijî, weke xwedavendeke dayîk a afirîner miriyan zindî dike, hikmî çarenûsê dike, Xanima Derên Kûvî yên mîna Çol û Çiyayan, Xwedavendeke Darê ya dîtine bi maran re têkiliya wê ya nêz heye, Xanima War û Jiyanê, Xwedavenda Bereketê, hêza zayîn, şîfa û nemiriyê, heşt îlahên ku wê mirov ji wan hez bikin zaye, Periya Çiyayan, efendiya bajarê Keş, xwedavenda qadên çiyayî yên bakur û rojhilat, bi Enkî re her tim di nav şer û têkiliyê de ye, bi hêrs û nifirên xwe 8 nexweşînên xedar daye Xweda Enkî û ji bo başkirina her nexweşîneke wî, bi şertê xwedavendeka ku wê ew diyar bike, biafirîne.

Pêvajoya navbera salên 4000 û 2000 B.Z, serdemeke neqebê ye, ew serdeme ku hêza jin û mêr di hevsengiyekê de ye. Xwedavendên vê serdemê bi qasî xwedavendên beriya xwe li lûtkeya hêza xwe nebin jî, hê jî xwedî nasnameyên îfadeya jinên diyarker in. Ji neh tebeqeyan a duduyan e ev. Di vê serdemê de êdî remza xwedavendên ku bi tena serê xwe li textên xwe rûdinên zêde nayê dîtin. Piştî vê, li gel xwedavendan di statuya hevser-bav-kur-bira yan jî yar de wê xwedayekî mêr ava bibe. Cotên Afrodît-Adonîs, Îştar-Dûmûzî, Astarte-Baal, Hepat-Hepate, Kîbele-Attîs, Îsîs-Osîrîs ji van cotan mînakên herî baş tên zanîn in. Lê ev guherîn, rastiya dayîka xwedavend ku bi demdirêjî bi hêza xwe ya afirîner, çavkaniya sereke ya jiyanê ye naguherîne. Xwedayên mêr, dîsa bi sedsalan, weke rastiyeke "*bi sernermiya zarokan*"**(57)** tenê bi dayîka xwedavend bi mane dibin, dikarin xwebûna xwe ava bikin. Hin xwedavendên girîng ên di vê serdema neqebê de jiyane ev in:

**Di vê demê de navê sembol a herî xuya dike Înanna ye.** Di mîtolojiya Sumer de bi salên 3000'an B.Z re, xwedavenda yekemîn a Sumer Înanna, weke peyrewa Star a ku xwedavenda çiyayan a beriya xwe ye derdikeve ser dika dîrokê. Di şexsê xwedavenda afirîner a vê dema Neolîtîkê de jin, di şexsê Enkî de tê xwestin ku ji aliyê civaka bi serdestiya mêr ve were daqurtandin. "Lê Înanna, bi têkoşîna xwe ya biaqil, zû bi zû radest nabe, mirov heyranî xwe
dihêle."**(58)** Înanna, ya rastî nasname û hêza jinê ye ku li ba Sumeran bi mêr re di hevsengiyê de ye "*Înanna, di civaka Sumer de vî cihê xwe yê pir xurt,bi înyat ji berdewamkirina rola xwe ya sereke ya ji civaka Neolîtîkê digire.*"**(59)** Di mîtolojiya Înanna de Dumuziyê Şivan û Enkûmdiyê Cotkar, ji bo bibin alîkarê wê yê sereke dikevin pêşbirkê. Rola Înanna ya pêşengiyê ku hîna berdewam dike aşkere ye.

Sumeran wê weke xwedavenda parazvana bajarê Ûrûkê dipejirandin. Înanna di heman demê de xwedavenda eşqé ye; xwedavenda şer a destpêkê bivir hilgirtiye, rênîşanera zewacê ye, sembola firehî û bereketê, xweşikî, cazîbe, hêz û zanyariyê ye, dilovane, şaşîtiyan ceza dike, li dîwana xwedayan cihê wê ji mêr ne jêrtir e, nexweşîn û xerabiyan tune dike û mirin jî bi destê wê ye. Li dîwana xwedayan statuya Xwedavend Înannayê, ji mêr ne jêrtir e. Bi xwedayê xasûk Enkî re şerê 104 ME'yên ku amûrên pêşxistina şaristaniyê ne û hêza kontrolkirina pergala gerdûnê dide wê, her wiha vedîtinên wê bi xwe ne, (yanê teknolojiya serdema Neolîtîkê ya bi keda jinê hatiye afirandin) dimeşîne û di encama vê têkoşînê wan careke din bi dest dixe.

Di serdema hevsengiyê ya Sumeran de, parazvana edaleta civakî xwedavend Nanşe, erka wê hebûye ku salê carekê ji ber tevgerên baş û xerab mirovan bidarizîne, ceza li wan bibire. Nanşe, di kevalên Sumeran de xwedavenda "sêwî û

jinebiyan e, zilma ku mirov li mirov dike dizane, dayîka sêwiyan e, jinebiyan diparêze, mafê feqîran dizane, kî xwe bavêje bextê wê deriyê xwe lê vedike, keybanûya stara bêhêzan e. Dîsa xwedavend Nanşe tê gotin ku yên di rêya bêqanûn de digerin, kevneşopiyan pêk naynin, peymanan xera dikin, bi xwezilahî li ciyên xerab dinihêrin dizane. Di pîvanên giraniyê de yên li şûna  pîvana mezin  yên biçûk datînin, li şûna pîvana dirêj a kin bi kar tînin, yê neaydî xwe ye bixwe û nebêje “min xwar”, vexwaribe û nebêje “min vexwar” naecibîne tê pênasekirin.

Ev hevsengiya di civaka Sumer de heyî, bi demê re li dijî jinê xera dibe. Lê heta salên 2000 B.Z, têkoşîna di navbera xwedavend û xwedayan de di nav hinkûfiyekê de ye. Di pêşxistina arkeolojiya jinê de; em ê her serdemekê bi rengên wê yên xas lêkolîn bikin. Ev serdema ku nîv be nîv serdema  jinê ye, xwedî gelek taybetiyên xas e.

Yek ji nasnameyên jinê ya vê serdemê, di mîtolojiya Akad de xwedavend **Îştar** e. Ev xwedavend li ba Asûr û Babîliyan xwedavenda herî delal û guzîde ye. Îştar, esas xwedavendeke Neolîtîkê ya çiya û çandiniyê ye.Di mîtolojiya Sumeran de Înanna çi be, Îştar jî di mîtolojiya Akadan de ew e. **Îştar weke Stêrk, Star jî tê zanîn.** Xwedavenda şer û eşqé ya li asîmana ye. Hin sifetên wê yên tê zanîn; Keybanûya Xwedayan, Xwedavenda Bereketê, Xwedaya Hêza Cinsîtiyê ye. Ev gotinên ku B.Z 2000’an de ji bo Îştarê hatine gotin di jiyana civakî de wateya xwedavendê heta bibêjî zelal rave dikin; “Xwedavend! Cihê biryarê li ba wê ye; çarenûsa her tiştî di dest xwe de digire, ji awirên wê çêbûne kêf, coşa jiyanê, hişmet, hêza afirîner a di jin û mêr de.”**(60)**

Ji xwedavendên herî kevn a Aryenan Mîthra, ji wan xwedavendan e ku herî zêde hatiye perestin. Di pirtûka Zerduşt Zend Avestayê de, li ser Mîthrayê Yaşteke pir dirêj cî digire. Sifetên Mîthrayê wisa tên rêzkirin; Xwedavenda Rojê ye, peymanên di nav qebîle û koman de diparêze û yên bixwazin van peymanan xera bikin ceza dike, jiyanê dide, şerker e, maneya baş îfade dike, heval e, parêzvana aştiyê ye. Ewe ya ku her tiştî dibîne, parazvana rastiyê, dewar, debrê û avê ye.

Li gel Hûriyan Sauşga, xwedavenda şer bû ku bi bivir yan jî bi rimê dihat sêwirandin.

Dîsa Xwedavenda Kevnare ya Îranê yan jî Xwedavenda sereke ya dema baweriya Zerduşt; Ardvî Sura Anahîta ye ku dihat maneyên Bilind, Xurt, Nediyar an jî Rewaya Leheng a Nehatiye Qirêjkirin. Bi nasnameya xwe ya parazvan weke Ava Jiyanê, Dayîka Zêr a Herikîna Jiyanê dihat binavkirin. Xwedî girîngiyeke mezin bû. Xwedavenda ku leheng û rêveberan diparast, jiyan û serkeftinê dida, li seyareyeke bi çar hespên ku remzê ba, baran, ewr û zîpikê bûn siwar dibû. Têkiliya wê bi Dara Ezmanî re ya di nav Deryaya Vourakaşa de xwedî dibû hebû. Haomaya**(61)** çavkaniya jiyan û nemiriniya bêdawî ku ji vê darê dihat bidestxistin dida. Xwedavendê di heman demê de îlhama ruhî, hêz û serfiraziyê dida. Çend ji sembolên Ardvî Sura Anahîta ku nobedara Afirandinê ye; ga, meşale û agir e.

Li Hindistanê Xwedavenda Sarasvatî ku hevsera Xwedayê  Ruh û Cewhera Gerdûnê Brahma ye, Xwedavenda Gol û Avan e. Di heman demê de bi muzîkê re eleqedar e û zanyar e.

**Gula**, li ba Asûriyan xwedavenda şîfayê bûye. Mîna xwedavenda mirin û jinûve zayînê dihat hesibandin.

**Kîbele**: Bi taybetî li Anatolya Navîn û Behra Spî xwedavenda bereket û zayînê, îlaheya sereke, xwedavenda dayîk, ducinsî, bicazîbe, keybanûya heywanan, xwedavenda şer û aştiyê, sembola wesfa gerdûnî ya xweza, tevahî zindîbûn û berdariyê…

**Hathor**; li cihên herî kevn ên Misrê şopa wê tê dîtin. Ji ber vê yekê tê fikirîn ku ji xwedavendên herî kevn ên Misrê ye. Hetanî B.Z. 2700’an, di çarçoveya pîroziya çêlek û ga de, di dema kraliyeta 2. de, heta di dema Kralê Dûpişk de (Kîng Scorpîon- heta B.Z. 5000’î dikare here) tê texmînkirin ku perestin ji Hathorê re dikin. Hathor xwedavenda çolî ya sembola eşq, xweşikî, şerab, muzîk, cinsîtî, şer û hêzê ye. Di

heman demê de parazvana herêmên çolê ye. Xanima Mezin a bajarê Denderayê ye, çavê Ra ye, li ser tevahiya welêt digere, ewlehiyê digire, alîkara Ra ye.

Îsîsa keça Xwedavenda Asîman Nût û efendiyê gotinên îlahî Tot, tê gotin hîna tu tiştek nehatibûye afirandin jî hebûye**(62)** Xwedavenda herî mezin a Misrê ye. Di zimanê Misrî yê kevn de navên Îsîsê; Aset û Esî ye. Yewnaniyên kevnare navê Îsîsê lê kirine. Di nivîsa hiyeroglîf de îdeograma navê Îsîsê text e. Îsîs, hem afirîner, hem xwişk, hem hevsera xwedayê mêr Osîrîs e. Remz û parazvana dayiktî û saziya malbatê ye. Weke bavê xwe efendiya gotinên îlahî ye. Li ser hêzên xwezayê serwer e, wan birêve dibe, Efendiya Berhemên Şîn, sembola asîman e… Em ji mîtolojiyê fêr dibin ku zanîna tibê ya Îsîsê xurt bûye û bi kurê xwe Horus jî ev zanîn daye fêrkirin. Weke dayîkeke jiyanê dide, xureka mirinê, sêhrebaz û hezkirina wê ji bo hemû zindiyan e tê nasîn. Ya ku li ser ba, baran, çem û rûbaran, keştiyan hikim dike û hikumkara tevahiya avan e jî Îsîs e.

Xwedavenda dawîn a dema hevsengiyê **Tîamat** e ku remzê biçûk dîtin, reşkirin, bêfezîlet û xerab nîşandan nasnameya jinê ye. Bi navê wê yê din **Dayîka Hubur**. Xwedavenda deryayê Tîamat, beriya her tiştî hebûye, bi xwedayê ava şîrîn Apsû re digihên hev û xweda jî têde, her tiştî dizên. Dayîka ejdera pirserî ya tirsnak a dixwaze pergala gerdûnê xera bike, hêzeke tarî ya tevliheviyê çêdike, afirîner û dayîka her tiştê di gerdûnê de, erd û esman jî têde, xwedavend û hêza tevahiya gerdûnê afirandiye.

Di B.Z. 2000’an deTîamat, ji aliyê Mardûk ve tê kuştin. Bi vê kuştinê piştî serdema ku xwedavend bi tena serê xwe li lûtkeya hêza xwe bûn, ew serdema hevsengiyê jî ku xwedavendan bi têkoşînên mezin vê pêkanîbûn diqede. Piştî mirina Tîamatê, gav bi gav pêvajoya ku xwedayên mêr bi serê xwe li textê xwedavendîtiyê ya dayîkê rûdinên pêş dikeve. Êdî ne mumkin e mirov xwedavendê bi tena serê xwe bibîne. Ew êdî weke endameke panteonan li ba gelek xwedayên ku tên perestin cî digire, lê ji hêza xwe, xweşikahî, nav û maneyên xwe gelekî kêmkiriye. Li hember hewldanên sazkirina desthilatdariya monîst a xwedayên mêr, ji B.Z. 2000’an heta mîladê di 2000 salan de jin, pir zêde li ber xwe didin. Ev serdem îfadeya tebeqeya sêyem e. Ev serdeme ku bi desthilatiya nêr re di nav têkoşînek de ye û axirî jî ya bi qetilkirinê yan jî bi dûrxistina ji hêz û nasnameya xwe têk diçe.

Di roja me ya îro de pêvajoya înşakirina koletiya jinê ku mîna hebûna jinê be tê ferzkirin, ruxmî xweza û nasnameya rastîn a jinê daxwaza qebûlkirina vê koletiyê ku bi giranî vê dane qebûlkirin jî, di tebeqeya sêyem de pêk hatiye. Aşkereye ku arkeolojiya jinê divê bi hurgulî vê serdemê lêkolîn bike. Ji serdemên xwedaventiyê serdema axirîn e ev tebeqeya sêyem; destpêka hilweşîna nasnameya civakî ya li dorhêla jinê ye, her wiha dûrxistina ji xwezaya xwe ya cewherî û biyanîkirina xwe ye. Bi êrîşên bîrdozî zîhniyeta azad a civakê tê radestgirtin, paşê jî bi hemû saziyên xwe civak dîl tê girtin. Ji dest dayîna xwedavendîtiyê ku remza nasnameya jina azad bû û dest danîna ser nirxên jiyanê yên li derdora jinê di vê de bi rola sereke radibin.Civaka li ser hebûna jina bihêz û azad, bi avakirina civakî ya li ser nasnameya jina kole, hatiye dagirkirin. Hebûn û nasnameya jinê, ji ber ku ji çavkaniyê ve bi civakîbûnê re di zik hev de pêş ketiye bi hebûna jinê re hebûna civakê jî di nav bandoriyekê de hatiye guhertin.

Dîsa jî xwedavendên di van pêvajoyan de derketine û di jiyana civakî de heta bibêjî bibandor bûne hene. Her çiqas ji taybetiyên diyarker ên hêzên xwe hatibin dûrxistin jî, mehkûmî zewacên bêdilê xwe hatibin kirin jî, carna bibêçaretî xeyîdîbin û rondik barandibin jî û xwestibin nasnameya wan bi israr daxînin xweşikahiya wan a fizîkî, dayîktî û cînsîtiyê û kêm bikin jî; ev xwedavend, di jiyana civakî de heta bibêjî bibandor bûne. Hatin hezkirin û perestin ji wan re hat kirin. *“Di salên derdorî P.Z. 500’an de, heta împaratoriyên Xiristiyan ên Roma û Bîzans perestgehên dawîn ên Xwedavendan girtin jî, ev perestin bi temamî nehatibû çewisandin.*”**(63)** Bîreweriya civakî, bi hezkirina van xwedavendan xwest ku xwedî li dayika xwedavend derkeve.

**Demeter**, di mîtolojiya Yewnan de Xwedavenda çandinî, bereket, demsal û

hînkirin.
**Afrodît**, navendên kult ên herî kevnare yê Afrodîtê li parzemîna Yewnan nehatiye dîtin. Afrodît piştî nifşê destpêkê yê Zeûs derketiye holê. bi guman e ka Afrodît Yewnanî ye an na. Nêrîna kulta Afrodît, bi rêya Fenîkeyiyan weke barkirina kultên Îştar û Înanna ber bi şaristaniya Yewnan ve hîn bi mantiq e. Yanê îxtîmaleke xwirte ku Xwedavendeke Yewnan a bi eslê xwe rojhilatî be. Nêrîna ku dibêje xwedavenda Troyayiyane jî vê nêrînê erê dike. Jêre tê gotin; Xwedavenda eşq û xweşikiyê ya li qeraxên Qibrisê ji kefa avê çêbûye. Weke xwedavenda sewalên kûvî, li erd, asîman û deryayê hikum dike, li her dera gav davêjê li ser rêyên wê kulîlk vedibin, sedema yekemîn a bereketa nebatan jî tê binavkirin

Nînhursag, Înanna, Îştar, Tîamat, Gula, Kîbele, Îsîs, Hathor, Demeter, Afrodît, Astarte, Anahîta, Afrakete, Yemanja, Oyo, Mawu-Lisa, Olokun, El-uzza, Arîna, Hepat, Bendîs, Sarasvatî, Kalî, Tara, Kwan, Yîn… her yek jê rastiya azadî û xweşikiya jinê diteyisînin. Pergala gerdûnî, hêzên xwezayê, zêdebûn û hilberînê, zayîn, mirin û jinûvezayînê bi bedena xwe kontrol dikin. Zêde mimkun nîne em bûyera xwedavendîtiyê ku di tevahiya dîroka mirovahiyê de, di erdnîgarî û çandnên cuda de jiyan kiriye, weke sembola nasnameya jina bihêz û nirx û danehevên jinê afirandiye her wiha di bîra civakî de cihekî wê yê mayînde heye, li vê dere bi qîmê binirxînin.

Ew qas zêde xwedavend, her yek ew qas zêde nav û nasnavên wan hene ku, pir zehmet e em di vê derê de cî bidinê, pir pêwîst jî nîne. Lê nav û nasnavên ên herî diyar me bi xetên giştî da jî derbarê tevahiyan de wê fikrek bide. Bi îfadekirina vana armanca me; înkara me ya derbarê navlêkirinên bavkanî yên me li jor diyar kirin û ji neyîniyê pêşxistina erêniyê, pêkanîna asoyekê ye. Tevî wesf û sifatên, nav û nûçik û pênaseyên bêsînor, me daxistine wesfên bi hejmareke bisînor û nav û pênaseyên nakokin bi wesfên me re. Me xwest ku em nişan bidin bê ev çendîn zilmeke mezin e. Di heman demê de, hizirkirina qetilkirina dewlemendî, curbecurî û zindîtiyê ye. Her yek navên li xwedavendan tên kirin, taybetiyên jiyan, gerdûn û xwezaya civakî û wesfên têkiliya diyalektîk a di navbera van de ye. Kûrahî û rîşeyên têkiliya jiyan, civak û jinê nîşan dide. Çi girêdana vê rastiyê bi hebûn û nasnameya jinê re heye? Di rêwîtiya em ber bi hebûna rastîn a jinê dikin de cihê wê çi ye?

Di lêgerîn û hewldana pênaseya hebûna jinê de nasnameya xwedavendîtiyê girîng e. Ji ber ku çanda xwedavendîtiyê di demeke gelekî dirêj de, şekil daye hebûn û nasnameya jinê. Ji bo hebûna jinê bûye forma herî zêde dixuye. Heta îro ji bîra civakê derneketiye. “*Xwedavendîtî, esas tevahiya îfadeya taybetiyên jinê ye ku şoreşa Neolîtîkê bi ser xistiye. Zanyariya bingehîn a mirovahiyê di kûrahiyên Neolîtîkê de veşarî ye û ji wê derê derketiye û pêş ketiye… Ji bo derketina çanda dayîk û xwedavendê herêma herî esasîn e.”* **(64)** Nasnameya xwedavendê, nîşaneya wan demane ku di civakê de cihê jinê, xwe û civaka xwe çawa parastiye, zaye, xwedî kiriye, jiyanê heyî kiriye, sembola ber û berhemdariyê û hêza jinê ye vedibêje. “Profesor Henrî Frankfort di pirtûka xwe ya bi navê Kînship and The Gods a (Xizmayetiya Xwedayan) weşana wê di sala 1948’an de bûye dibêje; ‘Xwedavend li Mezopotamyayê hebûna herî li berz e’ û berdewam dike ‘Ji ber ku jin weke çavkaniya jiyanê dihat hesibandin. Her wiha xweda jî ji nîjada wê tê, weke kurê wê dihat pênasekirin. Di merasîmên zewacên pîroz de ji serî heta dawiyê pêşengî di deste Xwedavendê de ye. Di rewşa ku di gerdûnê de her tişt di nav tevliheviyê de ye jî Tîamata jin pêşeng e, Apsû jî temamkerê wê yê mêr e.’”**(65)**

Ji bo vê jî, dîroka jinê ya bi 9 tebeqeyî, ya ku xwestine wê di bin de bihêlin û bidin jibîrkirin, hatiye înkarkirin, derxistina nasnameya xwedavendîtiyê ya ku destpêka saxlem a dîroka jinaniyê ye, girîng e. Di pêşketina ber bi hebûn û nasnameya jina azad de çavkaniyeke me ya girîng e ku mirov bizanibe serdema xwedavendan ne efsaneyek e,. Di her sê tebeqeyên xwedavendan de jî azadî, berxwedan, trajedî û keda afirîner heye. Mirov dikare vê ji mîtolojiyê, ji pirtûkên pîroz ên olên yekxwedayî bixwîne. Her yek ji merhaleyên cuda yên nasnameya jinê, mijara lêkolîn û lêgerînên hûr û kûr in.

Ji salên B.Z. 2000’an ve çanda dana fedîkirin û reşkirina jinê berbelav dibe. “*Di*

*çanda Rojhilata Navîn de têkildarî jinê ev guherîna mezin a destpêkê* ***şoreşa dijber*** *a* ***şikandina cînsîtî ya mezin a yekem*** *e.*"**(66)** Di vê demê de di nasnameyên jinê de, şopên ku **şikandina cinsî ya yekem** ew afirandine hene. Piştî vê pêvajoyê, desthilatiya pir hişk a baviksalariyê, bi sembolkirina xwedayên mêr ên cuda re wê jinê bavêjin derveyî jiyan û her qadên civakî. "*Xweber nîne ku weke nav jî hemû texmînî di salên 2000'î B.Z de derketine holê. Ev yek ji çanda hevpar û kûr a di bingehê wan de ye. Bi şêweyê kirin sembol (aboriya malê ya jina dayik êdî ji aliyê mêrê zordar û xasûk ve hatiye desteserkirin), çanda mêrê serwer îlahî dikin. Dayika xwedawend a sereke ya bi Aryanî navê wê Star, bi Sumerî Înanna, bi Hîtîtî Kîbele, bi Semîtîkî Îştar, bi Hindî Kalî ye, her diçe navê wan vedimirin û xwedayên mêr ê navbuhurî mezin dibin. Di salên 2000'î B.Z de kengî jin di warê civakî de kişandin jêrzemînê têkçûn û piçûkxistina wê jî di warê çand û ziman de xwe da der. Di çanda madî û manewî ya şaristaniyê de ji koletiya mêr û qebîleyan pêştir, weke cins koletiya jinê tê. Ya rastî, weke koletiya li jêrzemînê civakê, koletiyeke hûrûkûr li ser jinê hatiye ferzkirin û mehkûmî statuyeke têkçûyî, piçûkxistî, bêhnlêçikandî, lanetlêkirî û mirdarî hatiye kirin."***(67)** Ev pêvajo, di şekilgirtina hebûna jinê de şopên kûr dihêle. Bi pêşxistina arkeolojiya jinê re, lêkolînkirina nasnameyên jinê yên vê pêvajoya 2000 salan yanê tebeqeya sêyemîn wê bibe pêwîstiyek.

**Tebeqeya Çaremîn: Lîlîth**

Di jiyankirina vê pêvajoya guherîna neyînî de, hewldanên sîstematîk ên olên yekxwedayî, ji bo civakîbûna li derdora jinê pêş ketiye bidin jibîrkirin pir bi bandor bûye. Wisa ku şop û sembolên ji wan deman mayî hatine berevajîkirin, çelexwarîkirin û xwestine ji kokê ve bimalêşin. Ev hewldan, di heman demê de texrîbkirina bîra civakî ye jî. Di encam de ya xwestine bi mirovahiyê bidin jibîrkirin, ew dem in ku jin têde bi qasî derbasî tebeqeya xwedavendîtiyê bibe bi hêz bûye. Di dîroka jinê de girîngiya pêvajoya olên yekxwedayî; piştî demekê, li derdora nasnameya jinê honandina çanda qedexe û şermkirin û reşkirinê ye. Nasnameya jinê bi serê xwe kirine mijara jê bê fedîkirin. Nasnameya jinaniyê kirine çavkaniya bingehîn a hemû êrîşên sîstematîk û îdeolojîk. Koletiya li ser jinê ferz kirine bi fermana xweda ve girê dane. Bi bîrdozî radestkirina jinê; di civakê de baweriya ku jin lawaz e, xerab û hevala şeytên e pêş xistin. Di vê de rola olên yekxwedayî pir girîng e.

Piştî hilweşandina ola Xwedavendê, derbarê jinê de bi çavkaniya olî di pêvajoya afirandina pêşderaziyan de du nasnameyên jinê yên diyar hene. Ev nasname, di heman demê de ji her 9 tebeqeyan, tebeqeyên çaremîn û pêncemîn îfade dikin. Ev her du nasname jî afirîneriyên aqlê mêr ê desthilatdar in. Di tebeqeya çaremin de ji van nasnameyan a destpêkê hatiye afirandin Lîlîth e. Yek ji nasnameyên jinê ye ku derbarê wê de herî zêde nivîs tên nivîsîn, şîrove tên kirin û dixwazin nepenî bikin ev nasname ye. Lîlîth, cara yekê di destana Gilgamêş de tê dîtin, ruheke xerab a serdestî şevê û dinyaya binerdê ye. Di mîtolojiyên Sumer, Babîl û Pers de bawer dikirin weke jina vampîr (xwînmij) , dawiya hemû bedenan, bûma (kund) dixwîne, mar û kûçik e. Li gor baweriya Sumeriyan Lîlîth, di demên destpêkê de destê çepê yê xwedavend Înannayê bû, erka wê, ji perestgeha xwedavendê re anîna meran bû. Piştre Lîlîth, di mîtolojiya Sumeran de vediguhere Lamaştûyê. Ev, efrîteke bi per û bask, afirîdeke tirsnak e. Pitikan, jinên nû zane dikuje, dike ku jinên ducanî ber bavêjin, xwîna mêran vedixwe, goştê wan dixwe. Cinawireke ku di koka dara Huluppu ya Înannayê de mala xwe çêkiriye, îfrît e, bi navê Lîllake jî derbas dibe, Gilgamêş tê mudaxeleya wê dike. Di 2400 B.Z de, di nav gelên Mezopotamyayê de weke xwedavenda bi navê Lîl a ba û bahozên hilweşîner, li gel Babîliyan ruhê bayê û demoneya şehwetê tê nasîn.

Bi taybetî li gor baweriya Cihû û Xiristiyanan jî Lîlîth, jina yekem e û bi Adem re wekhev hatiye afirandin. Mêyeke asî ye ji bo ku îdîa kiriye bi Adem re wekhev e, lewra xizmeta wî red kiriye yan ji bihûştê hatiye avêtin yan jî bi dilê xwe bihûştê terikandiye. Ew jine ku li ber Adem û Xweda serî ne daniye, bi şeytên re yekbûnê, şeytênbûnê tercih kiriye. Xweda, bi daxwaziya Adem , cardin Lîlîtê vedixwîne bihuştê,

heke neyê bi kuştina zarokên wê gef lê tê xwarin. Lê Lîlîth dev ji serhişkiyan bernade û Xweda zarokên wê dikuje. Lîlîth jî ji bo tola xwe hilîne Hewayê ji rê derdixe, fêkiya qedexe pê dide xwarin. Ji ber vê yekê Xweda dest û pêyên wê jêdike. Tola Lîlîth naqede, zarokên Adem û Hewa dixwe, zirarê dide jinên çileyî, mêran bi cinsî ji rê derdixe û piştre parçe dike.

Heta roja me ya îro jî Lîlîth, di gelek çandên cuda yên gelan de bi navên cûrbecûr cîh digre. Nasnameyeke jinê ye ku jê tê tirsîn û bi gelek şêweyan xwe jê diparêzin. Ev parastina herî bi bandor her çend sembolik be jî bi kar anîna madeyên hesinî ne, bi taybetî derzî. Hemû ev vegotin,nişan dide ku di serdema daxwaza hilweşandina baweriya xwedavendîtiyê de; Lîlîth xwedî taybetmendiyên herî xurt ên nasnameya jina xwedavend a berxwedêr e. Her wiha nîşaneya rastiya parastina nasnameya jinaniyê ye, li hember tehdît û êrîşên desthilatiya mêr ê serdest a bisazî bûye û xurt e serî natewîne, ji aliyê pergala baviksalariyê ve bi şeytankirinê hatiye lanetîkirin, bi nasnameyeke pir tirsnak li derveyî pergalê hatiye hiştin jî. Di rastiya xwe de Lîlîth, her çend lawaz be jî nasnameya sembola enerjiya mê ye û di roja me ya îro de jî heye. Taybetiyên nasnameya jinê ya asî, berxwedêr, di ferqa cinsîtiya xwe de ye û parastina xwe ya cewherî pêş xistiye. Sedema ku ev qas tirsnak tê nîşandan, bi qasî hevpariya desthilatiyê jî têde, redkirina pêşniyarên hêza mêr ê desthilatdar ê lihevkirinê ye, li derveyî pergalê mayînê, zarokên wê jî têde, berdêl dide lê tu car ji xwe tawîz nade, wêrek û birêgezbûna wê ye.

Baviksalarî, bi rêgehên mîtolojî, ol, huner û spekulasyonên cuda, bi afirandina karaktera Lîlîth, dixwazin ew peyama ku di bîra civakê de bi cî bikin aşkere ye; di pergala nû de, yan hûn ê di bin mêr de bimînin û weke cinsa duyem, kolebûnê tercîh bikin, bîranînên wan demên kevn ji hişê xwe bavêjin, yan jî hûn ê bibin şeytana vê pergalê. Pir balkêş e, bi yên roja me re çiqas dişibin hev. “Tu yan di pergalê de yî yan jî terorîst!” Koka vê zîhniyetê bingeha xwe ji şerê Xweda û Lîlîth digire. Ya rastî pirsgirêk di navbera Xweda û Lîlîth de ye. Lê êdî dewran guheriye, Xweda, yek jin û yek mêr du mirov afirandiye û li asîman, li payeyeke nayê gihandin rûniştiye. Mirovên ku yek bi yek fermana Xweda bi cî bînin jî, ji axê afirandiye. Ya rastî serhildana Lîlîth ji vê afirandinê re ye, ji Xwedayê serkirdeyê vê re ye. Ji ber ku ew, nasnameyeke jinê ya zindîtiya nasnameya xwedavendê diparêze. Bi qasî ku hebûna jinê, di bin şekildayîna fermana xwedayekî nêr de nepejirîne Xwedavend e. Jixwe beriya derketina olên yekxwedayî, di çandên cuda de xwedavenda ba û bahozên hilweşîner e. Lê Lîlîth di eslê xwe de, tevî têkçûna xwedavendê jî, sembola berxwedêriya jinê ye ku dixwaze hêza nasnameya jinê biparêze, naxwaze hebûna jinê bide fermana xwedayê sembola aqlê mêr ê deshilatdar.

Di serdemên ku hêza xwedavendê hatiye lawazkirin û xwedayên mêr afirandine û hevsengî hebûye de, aqlê mêr ê serwer hedef kiriye di nasnameya jinê de dijwarî, dubendiyê derxîne. Şopên vê destpêkê di mîtolojiyê de pêş dikevin. Xwedavend Înanna û xuşka wê Ereşkîgal, pêşengên cota Lîlîth û Hewa ne. Di mîtolojiya Sumer de Ereşkîgal xwedavenda destpêkê ye ku tê tecawizkirin û wê davêjin bin erdê. Taybetiyên wê û xuşka wê dayîka xwedavend Înanna dijberî hev bûn. Ereşkîgal başî, erdem an jî paqijiyê na, mirin û êşê birêve dibir. Di bin erdê de dijiya, tirsnak bû, kes jê hez nedikir, perestinê jê re nedikirin. Di van deman de Lîlîth destê Înanna yê çepê bû, piştre weke cinawir an jî cineke di koka dara wê de bi cû bûye tê pênasekirin û bi alîkariya mêrekî, ya Gilgamêş tê qewirandin. Cotên Înanna û Ereşkîgal, Înanna û Lîlîth, Lîlîth û Hewa, navên sembol ên pergala baviksalarî ne ku di demên cuda de bi stratejiyên piralî, li ser nasnameya jinê hatine ferz kirin. Ya rastî li ser esasên xerab nîşandana beden û cinsîtiya jinê, şikestinên cinsî yên li dijî jinê îfade dikin. Ya yekê ew demên ku mîtolojî hakim bû, ya duyem jî ew nasnameyên jinê ne ku bi derketina olên yekxwedayî ev şikestin derxistine holê. Lîlîth û Hewa, pêşhatiyên wan Înanna û Ereşkîgal. Ji ber ku Înanna bihêz bû, bi giranî tirs û xerabkirin di ser Ereşkîgal re pêş dikeve, piştre jî di ser Lîlîthê re.

Ev kesayeta jinê ku aqlê mêr ê desthilatdar ew afirandiye, di mîtolojiya gelek

kurdan de; Perî, pîrebok, Helika Gişkin, Elka Şevê, Pesewe, Lamîa, Leyla. Di mîtolojiyên Tirk, Altay, Tatar, Yakût û Moxolan de Al Ana, Kancolusu yan jî Gol Xwedavenda Xerabiyê ye. Albisên ku ruhên xerab in girêdayî wê ne. Di baweriya gel a Tirk de Al, remza xerabî, şewitandin, xapandin, dek û dolab û xirandinê îfade dike. Kokên wê heta dewranên beriya dîrokê diçe. Di çandên Slavyan de bi navê Ala (Hala), şeytaneka mê ye û bi birûsk û ewran, rez û zeviyan wêran dike derdikeve holê. Peyva Al, di çanda gelên Kafkas, Fars, Kurd û Rûsan de jî derdikeve pêşberî me. Bi Ermenkî Alk e, weke xeyaleteke hêrsok tê nasîn. Al, weke di baweriya gel a Anatolyayê de, di gelek mîtolojiyan de mîna heyîneke dibe sedema pirsgirêkên têkildarî zayînê tê nasandin. Ji bo pitik û jinên nû welidîne, ji wê bi parêzin derziyekê datînin ber serê wan.

Di gelek wêneyên ku Lîlîth tê de, beşeke bedena Lîlîthê weke mar tê nîşandan. Yan jî marekî mezin xwe li bedena wê pêçaye. Di mîtolojiyê de sembola gelek xwedavendan, piştre jî ya keybanûyan mar e. Em vê jî li ber çav bigirin, gelek arguman çêdibin bo bi me bide fikirandin ku têkiliya jin û mar xwedî wateyên cuda ne. Di vê mijarê de karaktereke girîng a em ê bigirin dest jî Şahmeran (Şaha maran) e. Di çanda kurd de Şahmaran semboleke pir girîng e. Jora bedena wê jin e, jêra wê jî mar e. Şaha tevahiya maran e. Karaktereke biaqil, xwêrxaz, sereka teba û mexlûqên derxwezayî ye ku qet pîr nabe. Wisa yeqîn dikin ku dema dimire ruhê wê derbasî keça wê dibe. Di gelek çîrokên kurd de sifetên wê yên zanyarî, şîfakar, hevsengiya xwezayê diparêze û bimerhemet li pêş in. Li her mala kurd wêneyeke Şahmaran heye, ev jî wateya ji bo wan îfade dike nîşan dide. Marê reş di baweriyên Elewîtî û Êzdiyatiya kurdan de pîroz e, dibe ku eleqeyeke vê pîrozkirinê bi Şahmaranê re hebe. Şahmaran ji pergala şaristaniyê, ji mirovê têkilî wê bûye dûr dijî. Bi îxaneta mirovê mêr ku zanyarî û razên xwe pêre parve kiriye tê kuştin. Pêwîstî heye ku ev lehenga mîtolojîk a kurd jî, bi Lîlîth re di nav pêwendiyê de, li ser esasê manedarkirina têkiliya jinê û mar, bi kûrahî were analîzkirin.

**Tebeqeya Pêncemîn: Xanima Parsûyê**

Lîlîth, weke nasnameya jina îflah nabe, radestî pergalê nabe dixuyê, loma jî Xweda li dijî Lîlîtha ku neyînî bersiv dide vexwendina vegera bihuştê, ji bo Adem bi tena serê xwe nemine, ji parsûya wî karaktera Hewa diafirîne. Xweda, serhildana Lîlîth,bi cezakirina wê û hemû mêyên weke jin bên afirandin bersivandiye . Jin "*Bi qasî ku ji Xweda neyê afirandin hatiye jibîrkirin*"**(68)** ne ji axê jî, ji parçeyekî bedena mêr, ji parsûya wî ya xwar hatiye afirandin. Piştî cêribandina Lîlîth a bi pirsgirêk, jinê ne tenê ji xweda, ji mêr jî jêrtir xistiye, kiriye mirova ji tebeqeya duyem ku bibe mêyeke biaheng û îtaetkar. Aqlê mêr ê serdest, di bin siya destnedayîniya fermana xweda de vê karaktera jinê îcad kiriye. Lê ev, weke tê zenkirin ne destpêka dîroka me ya jinaniyê ye, tebeqeya pêncemîn e.

Lîlîtha ku ruhê xwedavendîtiyê daye jiyankirin, dîsa jî rêyek dibîne û serhildana hemcinsa xwe li hemberî xweda pêk tîne. Bi şeytan re li hev dike û di kirasê mar de sêva qedexe dide xwarin. Ev jî dike ku Hewa û Adem ji dara zanatiyê bixwin û xwe û cinsîtiya xwe bizanibin. Ya rastî ev vegotin jî nîşan dide ku tevî hemû êrîşên bîrdozî û fizîkî, nasname û çanda dayîka xwedavend, li hember formên nasname, hebûn û afirandinên ku desthilatiya nêr li ser wê ferz kiriye, serî rakiriye. Dîsa di her keysa dibîne de bi sembol û nirxên xwe (mar û dar, sembola xwedavendîtiyê ne) bi cinsîtî û hêza aqlê xwe dixwaze jinûve çalak bibe. Xwedavend, ji xweda û baweriyên ji xwedavendîtiyê derketine û çêbûne re wisa zû bi zû serî danayne. Ji ber vê sedemê, aqlê mêr ê desthilatdar dibîne ku forma fikra mîtolojîk kêm dimîne, ji bo hebûna jinê bixe bin venêrîneke dijwar, bi her aliyî ve kedxwariya wê bike û wê diyar bike, fermanê xwedayê ku razber kiriye diafirîne. Ji bo vê jî encamên di her serhildana jinê de derdikevin holê ji xwe re dike bingeh. Jin bi aqlî û ruhî ji afirandinê ve lawaz e, her du şansê afirandinê ku xweda dayê baş bikar neaniye û mêr jî ji rê derxistiye, weke vegotina pîroz pêş dixe. Feraseta cinsa xerab li ser hîmên saxlem dide rûniştandin. Êdî jin, dema li

dijî vê derkevin wê bê wateya ku li dijî fermana xweda derketibin. Bi hezaran sal ev rewş, hem berxwedaniya jinê ya hundirîn bi tirsa li dijî xweda derketinê şikandiye, hem jî ji mêr re berdewamiya erkên bêsînor ên tirşe pêşkêş kiriye.

Ji ber vê yekê pêvajoyên olên yekxwedayî, pêvajoyeke ku divê em analîza hebûna jinê bi pir aliyan ve bigirin dest. Hema di hemû çîrokên olên yekxwedayî yên afirandin û ji bihuştê avêtinê de, bi sîstematîkî afirandina dijminatiya jinê heye. Di dîroka olan de bêhejmar mînak hene ku vê dijmaniyê pir balkêş nîşan didin. Yek ji van gotinên Thomasê Aquînasî ye; "N*abe ku jin bibe ji afirînendeyên despêkê… Ew mêreke ku bi xeta hatiye afirandin… Tu tiştekî bi xeta an jî bi qisûr hatiye afirandin nikare bibe ji afirînendeyên destpêkê. Xweda pêş de dizanibû ku wê jin gunehan bike. Jin, di encama xetayeke mezin yan jî bikaranîna amûra şaş de çêbûye.*" Yên din jî  pênaseya Ezîz Tertolyanê Xiristiyan e: "Jin, ji bo şeytên derbasî nefsa mirov be, deriye. Ewe ku qanûnên Xweda betal dike, mehlûqeke mekrûhe ku rûyê Xweda xera dike." Dîsa Saînt Paûl dibêje: "Serê her mêrekî Îsa bû, serê her jinekê jî mêr bû. Xweda jî serê Îsa bû. Mêr, şan û rûyê xweda ye. Lê şana mêr, jin e… Jin, li ser navê Mesîh divê xwe kole bihesibîne." Ezîzên Xiristiyan dibêjin; "Ji bilî dayîka Hz. Îsa, tevahiya jinan nikarin ji ezabê dojehê xilas bibin." Alimên Îslamê jî dema jinê pênase dikin ji Ezîzên Xiristiyan kêm namînin: Bûharî dibêje "Jin, ji aliyê ol û aqil ve kêm e". Muslîm Termizî dibêje "Jin bi sûretê şeytên tê û diçe" û Îmamê Xezalî jî dibêje "Jin, dişibe nefse, tu hefsarê wê sist bigirî serkêş dibe, wê te li dû xwe bikişkişîne, hişk bigirî tu yê bibî xwediyê wê". Bûdayê Hindistanî bi gotina "Ger min jinan ji ola xwe re qebûl nekiribana, Bûdîzm demeke pir dirêj bi şeklekî paqij wê berdewam bikira. Îro êdî ez zen nakim ev ol demeke dirêj bijî. Lewra jin ketiye vê olê."**(69)** tevlî pêşbirka biçûkxistina nasnameya jinê dibe. Cihûtî jî ku di serdemên xwedavendîtî her çend bi hêza xwe ya berê nebe jî hê jî pir xurt dihat jiyankirin de, weke ola yekxwedayî ya despêkê derketî, ji derketinê heta roja me ya îro, di destgirtina hebûna jinê de û di kolekirina wê de bi roleke pir neyînî rabûye. Baweriya xwedavendê qedexe kiriye, qadên baweriya xwedavend lê hene bi fizîkî tune kiriye, biçûkxistina hebûna jinê ji zimanê mêr veguherandiye diaya serê sibê "Xwedayê me yê heta bi hetayê, qralê kaînatê, hemd ji te re ji bo te ez jin neafirandime."

Nasnameya jinê ya Hewa ji van biçûkxistinan re bûye palpişt. Li gorî vê nasnameyê; jin, berpirsiyara hemû felaketên hatine serê mirovahiyê ye, bi gunehê destpêkê mirovahiyê ji bihuştê daye qewirandin, ew jine ku bawerî bi mar aniye û ji dara zanînê ku Xweda ew qedexe kiribû xwariye. Pirtûka pîroz bi vegotina vê çîrokê re nasnameyên xwedavendê, sembol û bajarên wê çawa bi erdê re kirine yek jî vedibêje. Ya rastî di zik hev de bi vegotina her duyan, ji jinan re peyama nemana pîroziyên jinan ku çavkaniya hêzê ne û Yehovayê "hesûd" tu carî tehemulî wan nake, tê dayîn. Birastî jî Cihûtî, bi giranî derb li xwedavendîtiya ku nasnameya herî xwirt a hebûna jinê ya xistiye. Ji ber vê yekê jî jin, êdî ji çavkaniya hêzê bêpar e, bêhêz û bêçare ye. Hemû sûc û gunehan dikarin bikin stûyê wê. Bi vê yekê wê bibin asteng ku jin hebûna xwe bi awayekî xwirt dernexe holê û wê nehêlin ku were bîra wê ku demekê li tebeqeya xwedavendan rûdinişt. Dîsa ji bo hemû taybetmendiyên jinê yên di çaxa xwedavendê de bên tunekirin; ev "guneha yekem" kiriye û zeafên jinê yên çavkaniya vê,  bûye hinceteke baş. Êdî dikarin hebûna jina ku çavkaniya guneh bixwe ye ceza bikin û têxin bin venêrînê. Pêre mar jî ku sembola hêza cinsî û zanyariya jinê ye. Hebûn û nasnameya jinê êdî ji siya vê çîroka pîroz wê xelas nebe, di avêtina her gavekê de wê bînin bîra jinê û jin bi mar û şeytan re bikin wekehev. Ev jî wê weke laneta xweda ya li ser jinê bihata binavkirin. Olên yekxwedayî, derbarê xwezaya jinê, cih û rola wê ya di civakê de, rêzikên xwe dispêrin fermana xweda ava kirine; di civakên çînî yên bavkanî ku têde pêş ketine û piştî demekê hatine pejirandin de li dijî jinê nirxên beriya wan pêş xistine wê dewir bigirtina.

**Tebeqeya Şeşemîn; Xwedavendên Bi Destê Mêr Hatine Çêkirin**

Her ku aqlê mêr ê serdest pêş dikeve û bisazî dibe, dixwazin gav bi gav nasnameya xwedavendê ya hemû taybetiyên civakî û jiyanî di şexsê xwe de digihîne hev, bi alîkariya afirandina gelek efsane û mîtolojiyan, tune bikin. Hemû nirx û taybetiyên xwedavenda dayîk tên parçekirin, her taybetiyeke wê, li xwedavendên cuda tên belavkirin. Êdî nasnameyên xwedavendên dayîka xwedayan ku hemû otorîteya civakî di xwe de dihewîne, tune ne. Di jiyanê de maneya vê; parçebûna hebûna jinê ye. Nasnameya jinê ya yekpareyî, bibawerî, wêrek, xweşik, têkoşer û hebûna diyalektîkî ya jinan hildigire, hatiye hilweşandin. "*Kîngê ji çaxê jinê derbasî çaxê mêr bûne, li dijberî jinê ji dest dayînên mezin hatine jiyankirin.*"**(70)**
Jin, di navbera kerxane û mala taybet de hatiye parvekirin. Hemû hêz û taybetiyên xwezaya civakî aydî mêr kirine, pir kêm jê –bi taybetî taybetmendiyên weke bêhêzî û zeaf tên fêmkirin- jî ji jinê re hatine "bexşandin". Vê rewşê, destpêkê bi rêgeha mîtolojiyan ku di zihne însên de forma herî kevn e, bi avakirina rastiya xwedavenda parçeyî û bi hev re di nav şerekî de ne, ji hev bêbawer in çêkirine.

Di mîtolojiyê de ji mînakên vê yê sereke; Înanna û Ereşkîgal in. Înanna piştî ku bi Dumuzî re dizewice, diçe serdana xuşka xwe xwedavenda bin erdê Ereşkîgalê. Ereşkîgal dibêje qey Înanna dixwaze bibe xwediya dinyaya binerdê û li gor rêzika binerdê wê dike cendekek. Înanna di heft deriyan re derbas dike û her carê semboleke hêz û xweşikahiya wê jê digire. Di vê navberê de ji bo hevserê xuşka xwe Dumuzî ji rû derxe keçekê dişîne ser rûyê erdê. Di vê derê de ya balkêş, tevî hemû niyeta baş a Înannayê, ya xerabiyê lê dike her jin in. Ereşkîgala ji serdana sersaxiyê ya Înanna bawer nake û dibêje "wê xulbûyî were ber textê min" û wê bi çavbirçîtiyê sûcdar bike û dike cendekek. Netî ya li ser navê Ereşkîgal, hêzên Înannayê jê digire. Nîntu ji bo hevserê Înanna Dumuzî ji rê derxe hatiye erkdarkirin. Lê yên Înanna rizgar dikin, ji bo wê şîn digirin xwedayên mêr in, bi taybetî bavê wê Enkî. Axirî Înanna Dumuziyê xiyanetê lê kiriye di şûna xwe de dişîne û ji bin erdê rizgar dibe. Lê ev bi hin berdêlan pêk tê. Înanna keça ku hevserê wê xapandiye, ji rê derxistiye dide kuştin. Dawiyê jî ji bo li şûna hevserê wê şeş mehan li bin erdê bimîne xwedavendeke din, Geştînannaya xuşka Dumuzî dişine.

Ev çîroka mîtolojiya Sumer ku nasnameya jinê parçe dike û van parçeyan jî dike dijminê hev û li dijberî hev bi cî dike, di olên yekxwedayî de dixwazin li derdora dubendiya Lîlîth û Hewa pêş bixin. Li dijberî jina "xerab" ku destpêkê tê afirandin lê ji Xweda re îsyan dike, karaktera Hewa tê afirandin. Lê weke tê payîn nabe û Hewa hem ji bihuştê tê qewirandin, hem jî mêr dide qewirandin.

Di mîtolojiya Yewnanan de ev çîrok li derdora Demeter tê honandin. Demeter, dema ku Hades keça wê Persphone direvîne, bi qasî ku Olympousê biterikîne wêrek e. Lê Zeûs dikeve navberê û Hades û Demeter li hev tîne. Ji ber dema ku Demeter şîn digire hemû xweza diçilmise, berhem hişk dibin, jiyan herwekî disekine. Lê Hades ji bo keçikê nede li ber xwe dide. Demetera naxwaze keça xwe bi tevahî ji dest bide razî dibe ku ew şeş mehan di bin erdê de bi Hades re, şeş mehan jî li ser erdê bijî. Dema keça wê derdikeve ser rûyê erdê bihar dest pê dike.

Cotên Lîlîth û Hewa, Înanna û Ereşkîgal, Demeter û Persphone, ew navên sembol in ku di cî û demên cuda de, aqlê mêr ê serdest, di jinê de bi tevahî diyalektîka hebûnê parçê kiriye û kiriye dijberî hev. Di heman demê de ev çîrokên destpêkê ne ku aqlê baviksalariyê, stratejiya lêdana jinê bi jinê çawa pêk aniye nîşan dide. Jin li jinê xiyanetê dike, jin jinê dikuje, jin ji jinê hesûdiyan dike. Ew dema jinan li hev tînin, serdema ku jin û mêr di hevsengiyekê de ne û jin û mêr xweda ne. Lê her ku hevsengiya hêzê li dijberî jinê xera dibe; erka lihevanîna xwedavendên zirarê didin hev yan jî mirovên jin, dikeve destê xwedayên mêr û mêrên temsîla wan a li ser rûyê erdê ne.

Em taybetî di mîtolojiya Yewnan dibînin, xwedavend jin bin jî paşgotiniyê dikin. Hesûd in, di komployan de cî digirin. Derewan dikin. Eziyetê li mirovan dikin. Bi çirtikî û meraqa zêde li ser serê mirovahiyê bela dibarînin. Li gel van taybetiyên negatîf, hin xwedavendên taybetiyên wan ên erênî jî hene, lê di navbera wan û yên din de şerekî heye. Ger em mîtolojiyê weke zîhniyeta herî demdirêj a bîra civakî bifikirin; em dikarin

rola zîhniyeta mirov ji koletiya jinê û li derdora wê ji koletiya mêr û civakê re vekirin, amadekirin û hînkirinê re baştir bi wate bikin. Em li gor nasnameya jinê ya bi 9 tebeqeyan bigirin dest, ev nasnameyên jinê bi destê mêr çêbûne û hevdu zeîf dikin; em dikarin mîna nasnameyên xwedavendên têk çûne lê hê jî li ber xwe didin û bi daxwaziya parastina xwe dişibin mêr û bi demê re bandora wan namîne bi nav bikin. Ev, **tebeqeya şeşemîn e**.

Di pêvajoya lawazkirina serdema xwedaventiyê de ku nasnameya jinê ketiye bin kontrola mêr û bi aqlê mêr ê serwer hatiye avakirin, derketina hin xwedavendan jî hene. Ji van mînakên herî diyar, **Athena** ye ku ji eniya Zeûs, yanê ji mêjiyê mêr hatiye afirandin. Xwedavenda hikmet û zanyariyê Metîs, hevsera yekem a Zeûs e. Metîs ducanî dibe. Zeûs ditirse ku zarokê wî kurik be û wî ji ser text bîne xwarê. Dema Metîs ducanî ye wê dadiqurtîne. Athena weke girêkekê di serê Zeûs de mezin dibe. Ji wê derê bi zirx û mertal derdikeve. Jîrekî taybetmendiya vê xwedavendê ye ku vê taybetmendiyê, li gorî ku tê gotin ji dayîka xwe girtiye. Di heman demê de xwedavenda huner, stratejî, îlham û aştiyê ye. Di pêvajoyên pêş de bi mertalê xwe wê bibe xwedavendeke şer û di şerê Trûvayê ye wê piştgiriyê bide Akhayiyan. Athena mertalekî taybet hildigire. Mertalê wê bi remzên cûrbecûr xemiliye û li ser vî mertalî wêneyê serê Medûsayê heye. Li pêşberî vê mertalê artêşên herî bihêz jî têk diçin. Yanê li hember Rojhilat Rojava. Taybetiyên wê yên bingehîn bi bajartiyê re têkildar e. Bajarê Atînayê navê xwe ji wê digire ku parazvan û xwedavenda sereke yê vî bajarî ye. Di şûna Aresê xwedayê şer ê di mîtolojiya Yewnan de ku aliyên wî yên çors û bihêz ê şer hene, Athena aliyê stratejî û jîriyê temsîl dike. Athena ji kesekî hez nekiriye û nezewiciye. Ji ber vê yekê jê re dibêjin Athenaya bakîre.

Xwedavendeke din a ku aqlê mêr ê serdest ew afirandiye; hevsera Zeûs ‘jina çêlek’, pitpitok û fesad, Hera ye. Hera, hem xuşka Zeûs hem jî hevsera wî ye. Weke serxwedavend û Keybanûya Zewacê tê naskirin. Li gor baweriya berê, zewacê û di dema welidandinê de jinan diparêze. Tevî ku dizane piştî Aphrodîte xwedavenda herî xweşik a duyem e jî mêrên evîndarî wê bûne her tim red kiriye, her xwe pêşkêşî Zeûs kiriye. Pir xasûk û kîndar e. Maîya ya ku têkiliya wê bi Zeûs re heye pir diqehirîne, Lamîa’ya yê dike cinawir. Semeleyê dike kemînê, zarokanîna Alkmeneyê bi derengî dixîne, Leto dişopîne û wê dixişikîne, Kallîsto dike hirç, mêşa hespê berî Îo dide. Ji ber ku Parîs wê weke xwedavenda herî xweşik nehilbijartiye, li hemberî Troyayiyan xwedî kîneke mezin e.

Yek ji xwedavendan ku aqlê mêr ê serdest ew afirandiye jî Artemîs e. Ev xwedavenda bi navên nêçîrvanî, xweza, xwedavenda heyvê, xweşik, bibejnûbal, bakîreya xwedayî, ya rûyê cidî, xwedavenda roniya saf tê pênasekirin, mêrên nêzî wê dibin dike sewalê nêçîrê. Bi tîra xwe jinên ku keçkaniya xwe didin jî dikuje. Ji ber ku ew sembola bakîretiyê ye. Di dinyaya mîtolojiyê de navê wê sembol e, ji ber ku li ser navê mêran fikra rastiya jina ji cinsîtiya xwe hatiye kirin, nişan daye. Tu dibêjî qey piştî bi sedan salan di pêşketina fikra Xiristiyanî de selefa rahibe yan jî ezîzeyên destgirtiyên Îsa ye. Wan jî bi tevahî cinsîtî û mêran ji jiyana xwe derxistine, lê ji hêza xwedavendê ya ku mêrê nêzî wan bibin veguherînin sewalên nêçîrê yan jî bi tîrên xwe jinan bikujin bêpar.

Pandoraya ku ne xwedavendek e, di mîtolojiya Yewnan de weke “şeytana xweşik” tê pênasekirin. Prometheûsê agir ji xwedayan diziye û daye mirovan, Zeûsî pir hêrs kiriye. Zeûs jî, weke “ji bo mêrekî cezayê herî şeytanî” Pandorayê diafirîne. Tevî ku Prometheûs berê şiyarî daye birayê xwe ku tu diyariyek ji xwedayan negire, birayê wî dikeve bin bandora Pandoraya xweşik û çirtik û pê re dizewice. Zeûs qutiyek daye Pandorayê ku hemû xerabî têde veşarî ne. Ji bo meraqa wê pêş bixîne, temîn dike ku qet veneke. Lê Pandoraya ku jineke meraqdar e, xwe nagire û qutîkê vedike. Her wiha hemû çîle û xerabiyên mirovahiyê, zehmetî û mirinê serbest dihêle û di qutiyê de tenê hêvî dimîne.

Li Yewnanîstanê afirandina mîtolojiya ku van xwedavendan afirandiye ne jixweber e; ne jixwebere ji ber ku bingeha felsefeya avahiya fikrî ya deshilatdariya mêr û feraseta zanistê ya pozîtîvîst a dinyaya rojava ya ku navenda kapîtalîzmê ye,

li Yewnanîstan hatiye avêtin. Pergala bi desthilatiya mêr ku hêza siyasî ya li pişt mîtolojiya Yewnan e, dibêje ger xwedavend bin jî mîsyona ku bidin jinan, herî zêde xweşikiya fizîkî, cazîbeya cinsî û dayîktî ye. Ev mîtolojî, piştgirî dide argumanên peyama çîroka olî ya Hewa û Adem a ku felaketan bi serê mirovahiyê de aniye, jina meraqdar, dilsozî gotina xwe nîne û li dijî fermana Xweda tê diafirîne. Dixwazin di fikra mirovan de baweriya ku ev taybetî, di xwezaya jinê de hene bidin rûniştandin.

Di vê tebeqeyê de tiştê em weke encam dibînin; nasnameyên jinê bi mêr re hêza desthilatiyê parve dikin û mêrane dibin. Di navbera nasnameyên jinên radestî hêza desthilatiya mêr bûne û bûne kole, ji aliyê mêr ve li dijberî hemcinsa xwe û mêrê dest ji azadiyê bernade û mirov tên bikaranîn û jinên li dijî hêza desthilatiya mêr şer dikin û dixwazin cewhera xwe biparêzin şerek heye. Xwedayên mêr êdî ew qas bihêz bûne ku, êdî pêwîst nabînin bi xwedavendan re yan jî bi jin û mêrên bawermendên wan in re, ew bixwe şer bikin. Bi heyînên ji mêjiyê xwe yan jî ji destê xwe afirandine jinê bi jinê, yan jî jinê bi mêrê ji civakîbûna xwedavend û mirovan bawer dikin re didin şerkirin. Li derdora vî şerî, yekparetiya hebûna jinê, estetîka wê û hebûna wê ya diyalektîk bi xwezaya mêr re didin windakirin.

### Tebeqeya Heftemîn: Demarên Berxwedêr ên Xwedavendê-Keybanû

Çanda xwedavendîtiyê û pergala civaka jina dayîk her çend têk çûbe jî, bandora wê bi hezaran salî berdewam kir. Ev bandor, di jiyana civakî de nasnameyên jinê jî diyar dikir. Jinan di dil de ji dayîka xwedavend û nirxên wê bawer dikirin û di her fersendê de jiyana li gorî baweriya wan ne di terikandin. Dîsa di kraliyetan de jinên dayik, hevser, keç û xwişkên qrêl, bi bandora berdewamiya pirxwedatiyê, ji nasnameya jinên bihêz re mînak bûn. Di dîrokê de mînakên herî zêde tên zanîn; Nefertîtî**(71)** , Kleopatraya VII.**(72)** , Puduhepa, Semîramîs, Belkis, Zenûbya, Dido**(73)** û jinên Amazon ên şervan in.**(74)** Ev keybanû û gelek keybanûyên em nikarin li vê derê navê wan rêz bikin, berdewamiya bawerî û çanda dayîka xwedavend in.

Nêrîna mêrê serdest ku di nivîsandina dîroka civakî de hakim in, xwestine van jinên bihêz di nav xumamiyekê de bihêlin. Lê çiqas xwestibin veşêrin û berevajî bikin jî ji bo em wan bibînin ji me re şopên saxlem hiştine. Em ê di vê rêgehê de bimeşin û ew nasnameyên jinên winda yan jî yên dane jibîrkirin em ê bibînin; em dikarin bibêjin ev, di nasnameya jinê ya bi 9 tebeqeyan de beramberî **tebeqeya heftemîn** tên. Em ê van nasnameyên jinên vê tebeqeyê, bi zanebûna ku feraseta dîroka baviksalarî, agahiyên derbarê van jinan de berevajî şîrove dikin, hin agahiyan jî parve nakin bigirin dest. Û dema em wan bixwînin, em ê ji berevajî ve xwendina rejîma agahiyên pergalê jî hîn bibin. Nasnameya jinên di her tebeqeyê de,emê li gorî xweseriyên dem û mekanê bigrin dest. Him çand û baweriyên mêrê serwer, him jî destên dema wan, ji bo van xwesertiyan ji holê rakin pir hewl dane, em ê vê heqîqetê jî her tim li ber çav bigirin…

**Pûdûhepa**, hevsera hikimdarê Hîtît Hattûşîliyê III. ê di sedsala B.Z 13an de jiyaye û keybanûya împaratoriya Hîtît e.**(75)** Bavê wê li Kîzzuvatnayê, Lawanzantiyayê (Elbîstanî) rahîbê perestgeha ÎŞTAR/Sauşga ye.**(76)** Pûdûhepa xwe mîna xizmetkara Xwedavenda Hûrrî Hepata didît. Di heman demê de xwe weke ya Xwedavenda Rojê Arînna jê hez dike jî bi nav dikir. Di Panteona Hîtît de vesazkirina wekheviya xwedavend û xwedayên her du çandan pêk aniye. Pûdûhepa, bi rola serrahîbe, bi nêrîneke nû, tevahî pêkanîn û kevneşopiyên olî yên Hîtît bi rêk û pêk kiriye. Serxwedavenda Hîtît, Xwedavenda Rojê Arînna, bi Xwedavenda Rojê ya Hûrriyan Hepat re wekehev hatiye kirin.

Di nav keybanûyên Hîtîtê de herî zêde Pûdûhepa tevlî jiyana polîtîk bûye. Ji nameyên hatine dîtin derketiye holê ku Pûdûhepa bi gelek qral û keybanûyên wê demê re nivîsarên fermî kiriye. Weke di tavanannayên beriya xwe de, di dema

navê qrêl navê Pûdûhepayê jî hebûne. Yek ji sifetên ku Pûdûhepa di şanenava xwe de bi kar dianî jî "Delala ber dilê Xwedavenda Rojê Arînnayê, xizmetkara Xwedavendê" ye. Pûdûhepa, piştî Hattuşîliyê III. di dema hikimdariya kurê xwe Tuthaliyayê IV. de jî bi nasnava tavananna, 'keybanûya dayîk' birêve biriye. Ji ber ku di hiqûqa Hîtît de tavanannatî, bi mirina qralê hevser bi dawî nabe. Mafe ku heta mirina tavananna jî her berdewam e. Bi serê xwe ev rêzika hiqûqê jî, nîşanî me dide ku di dema Pûdûhepa de bandora çanda xwedavenda dayîk, hîna pir xurt tê jiyîn.

Yek ji erkên Pûdûhepayê jî serokatiya heyeta dadgehê ye. Derbarê hinek karmendên payebilind de, ji ber ku ji qesra Hîtît heywan, madenên hêja û eşyayên din dizîne lêpirsîn kiriye. Ji belgeyên ji wê demê mane tê fêmkirin ku li dijî nelirêtiyên dema xwe têkoşiyaye. Pûdûhepa, di heman demê de xwedî zanîneke teolojiyê ya bilind û di qada dîplomasiyê de xwedî daneheveke xurt bû. Li ser nameyên ji qral û keybanûyên welatên biyanî re û di peymanan de şanenava xwe bi kar dianî. Li Hattî û welatê xwe Kîzzuwatnayê, hemû nivîstekên nivîskî yên heyî yên aydî ol û çanda Hûrrî daye kopîkirin, li Hattuşayê arşîveke taybet a Kîzzuwatnayê ava kiriye. Ev taybetiyên xurt, nîşan didin ku wê perwerdeyeke baş girtiye û xwedî daneheva çandeke dewlemend e.

Melîkeya Sabayê Belkis, derbarê ji navê wê bigire heta nasnameya wê, ji kîjan qewmê tê, baweriya wê, heta keseke wiha jiyan kiriye yan na de, nêrînên bi nakok û xwe dispêrin çavkaniyên cuda hene. Li gorî hin çavkaniyan ew Lîlîth e. Li gorî hinekan keybanûyeke ku keça wezîr û keybanûyekê ye. Li gorî hinekan dayîka wê cin e û ew bixwe jî sêhrbaz e. Tê gotin ku 40 sal li ser text maye, şeş sal bakîre maye û qet nezewiciye. Hebûn û jiyana wê di
pişt perdeyeke biraz de ye û mîna efsaneyekê ye. Nêrînên hevpar agahî didin ku li Etiyopya yan jî li Yemena îro hikum kiriye, reşik e, bi zanyarî birêve biriye. Di Quran û Tewratê de tê îdîakirin ku ew çûye serdana Hz. Silêman, ji wî bandor bûye û ola yekxwedayî pejirandiye, heta ji nijada Hz. Îbrahîm tê. Ev jî tîne bîra mirov ku Melîkeya Sabayê di serdema xwe de**(77)** sembola nasnameya jineke ku xwedî qadeke berfireh, dewlemendî û hêz di dest de ye û heta bibêjî bibandor e.

Tewrat, Quran û Incîla Xiristiyaniya Etiyopyayê Kebra Negast behsa wê kirine. Her çend di pirtûkên olên yekxwedayî de**(78)** û di hin çavkaniyên kevn de, were diyarkirin ku Belkis çûye serdana Hz. Silêman jî hin nêrîn hene dibêjin ev ne rast e.

Li gor Tewratê "Keybanûya Şebayê" ye. Nav û dengê Silêman dibihîze û dixwaze here ba wî. Armanca wê ew e ku vî qralê zanyar bi hin pirsên zehmet ezmûn bike. Melîke, dema rastî Silêman tê, "derbarê hemû tiştên di dilê xwe de bi wî re diaxive û bersiva tevahî pirsên xwe digire; wisa ku ji bo qrêl, tiştekî veşarî ku bersiv nedabe jinikê namîne."**(79)** Tê diyarkirin ku piştî ku Melîkeya Sabayê vedigere welatê xwe, xwedayê Îbranî, mîna xwedayê qanûnî bi gelê xwe dide pejirandin û bi dilê xwe dest ji baweriya xwe ya kevn berdide. Quran jî dibêje Melîke li hember gefên Silêman serî datîne û hebûna Xweda dipejirîne.

Li gorî Kebra-Negastê jî, ji bazirganekî cihû yê hatî welatê wê, nav û dengê Silêman dibihîze. Ev bazirgan, Makedayê (Belqîsê) vedixwîne welatê xwe. Keybanû diçe Qudsê û salekê li wê derê dimîne. Silêman ji keybanûyê bandor dibe lê keybanû naxwaze sonda xwe ya bekaretê xera bike. Silêman bi hîleyekê sonda wê pê dide xerakirin. Ji vê bihevrebûnê kurekî wê çêdibe. Kurê wê heta digihê 18 saliya xwe bavê xwe nizane. Piştî kurik hîn dibe kurê Silêman e jî li welatê dayîka xwe dimîne. Nijada qralên li Etîyopyayê ji vî zarokî tê.

Pêwîst e ev çîrok bi tevahî bi nazenînî bê lêkolînkirin û bi merceka jinê, ji nû ve werin destgirtin. Cihûtî, li cografya û di demeke ku civakîbûna dayîksalar û hakimiyeta dayîka xwedavend lê xurt bûye pêş ketiye. Dema em vê rastiyê li ber çav digirin; tê fêhmkirin bê çima xwestine van jinên xwirt û xwedî sulteya siyasî bi dest bixin, li ser wan bandorê ava bikin, heta bînin ser ola xwe û ji bo vê jî di pirtûkên xwe yên pîroz de bi vî hawî cîh bidin van karakteran.Belqîs, Makeda yan jî bi navekî din be jî ew, sembola nasnameya jina xurt a ji çanda xwedavenda dayîk a serdema xwe xwedî bûye tê.

Di lêkolînên dîroka jinê de, dema tebeqe tên dahûrandin, ev karakter jî xwedî wan taybetiyan e ku divê di nav tebeqeya xwe de bi narînî were destgirtin û fêmkirin. Em dikarin him Tewrat û Quranê, him Kebra Negastê, hem jî tevahî çavkaniyên li ser vê melîkeyê lêkolîn kirine di ber çav re derbas bikin û perdeya ji razan hilînin.

**Semîramîs**: Ev nav yek ji navên Îştar e. Ya rastî bi taybetiya reankarnasyona di mîtolojiyan de, bi guherîna nav, xweda û xwedavend her tim bi hev vediguherin. Li gorî vê Semîramîs, li Babîl, xwedavenda beriya Îştarê ye. Semîramîs, xwedavendeke keybanûya asîman û weke dayîka pîroz tê dîtin. Hevsera Nîmrod (dû re ya Mardûk-Baal) e. Li ser van axan di sedsalên 8. û 9. B.Z de zayîna keybanûyeke bi heman navî (li gorî Heredot B.Z. di
810'an de jiyaye) tê fêhmkirin. Jixwe di efsaneya zayîna Semîramîsê de Îştar diyarker e.**(80)** Manîdar e ku wateya Semîramîsê 'ya ji kevokê tê' ye û çivîka pîroz a Îştarê jî kevok e.

Tê gotin ku "Baxçeyên Mêwan ên Babîlê" yê di nav 7 harîqeyên dinyayê de cî digirin, ji aliyê keybanû Semîramîsa ku çil û du sal Împaratoriya Asûrê birêve biriye ve hatine çêkirin. Li gorî nêrîneke din jî; qralê Babîlê, ji bo hevsera wî Semîramîs, hesreta welatê xwe neke van baxçeyan daye çêkirin. Derbarê Semîramîsê de hê gelek efsane û vegotin hene. Lê hemû vegotin li ser hin xalan hevpar in yan jî ew fikra didin pesendkirin ev e; nasnameya jina bihêz, şerker, bedew, bawerî bixwe heye, aliyê wê yê civakî li pêş a ji serdema baweriya dayîka xwedavend e. Ji bo bedewiya welaté xwe şer dike, taybetmendiyên rêveberiya jinê ya xwedî otorîteya erenî ye, ji aliyê civaka xwe ve hatiye xwedavendîkirin û hezkirin. Misoger e ku neviya xwedavendîtiya hilweşiya ye lê bîranînên wan hê pir teze ne! Vegotinên li ser nijada wê, dîsa mirina wê ne mîna miroveke bimirinî, weke kevoka pîroz a çivîka xwedavendê ku firiyaye, gel wiha wê kiribe efsane, pejirandina vê rastiyê ye.

Eger mirov rastiyê bixwaze, Semîramîs, berevajî şîroveyên ku nêrîna baviksalarî wê mîna nexweşa desthilatiyê nîşan dide; pêşenga karaktera têkoşer e hewl dide tevahî taybetiyên bihêz ên nasnameya dayîka xwedavend di xwe de sentez bike û lehengiya jinê ya ji bo welatê xwe şer dike, dema hewce bike jin çawa dikarin bibin taktîsyenê şer îspat dike.**(81)**

Em dikarin ji bo Semîramîsê bibêjin; kesayeteke sembol e ya ji serdemên dema desthilatiya mêr ava dibe lê baweriya dayîka xwedavend jî ji bo tune nebe hê jî li ber xwe dide. Dema li dora wê hêrsa deshilatiyê pêş dikeve û kurê wê bi piştgiriya rahîban dixwaze wê bikuje, ji deshilatiyê dûr dikeve û dibe kevokek û ber bi warên azad ve, ber bi çolên jê hatiye ve difire. Ev rastî jî nîşan dide ku Semîramîs, sembola ruhê jinê û lêgerînên wê yên bêdawî ye ku deste wê ji civaka dayiksalarî nabe.

## ZENOBÎA

Zenobiya di navbera salên 240 û 274'an de jiyaye, keybanûya Împaratoriya Palmîrayê bû ku li Sûriyê hikum dikir. Li bajarê Palmîra (Tedmor)yê ji dayîk bûye û li wê mezin bûye. Tê gotin ku ew û keybanûya Misrê Kelopatraya VII. ji heman malbata qraliyetê ne. Zenobîa, bi xweşikî û jîriya xwe dihat nasîn. Tê gotin ku bi Yewnaniya Antîk, Aramî, Erebî û Latînî zanibûye û bala wê li ser dîrokê bûye.**(82)**

Zenobîa ku dema hevserê wê jiyan dikir piştgiriyeke mezin dide hevserê xwe. Di 267'an de piştî mirina hevser û kurê wê Haîran rêveberiyê ew bi xwe dike. Ji bo Tedmorê ji jêrdestiya Romayê derxîne qebîleyên Ereb digihîne hev. Ji ber ku bi leşkeran re siwariyê dikir û bi kîlometreyan dimeşiya, Zenobîa mîna "Keybanûya Şerker" hatiye binavkirin. Di demeke kin de qada desthilatiya Împaratoriya Palmîrayê berfireh dike. Sûrî, Lubnan, Filîstîn, Misir û herêmên başûr û rojhilatê Anatolyayê girtiye jêrdestiya xwe. Bi vî hawî tevahiya rêyên bazirganiyê ku di bin kontrola Împaratoriya Romayê de bûne girtiye dest û tevlî Împaratoriya xwe kiriye. Piştre di şerê bi Împaratorê Romayê Aurelîan de têk diçe. Li gorî hin çavkaniyan tê gotin ku ji aliyê Împaratorê Romayê Aûrelîan ve tevî kurê xwe dîl tê  girtin û di bajarê Tîbur (Tîvolî) ê Îtalyayê de bi darê zorê tê bicîkirin. Li gorî hinekan jî heman mîna

Kleopatrayê xwe jehrî kiriye.

Zenobîa, şaristaniyeke pêşketî li Palmîraya lê jiyaye ava kiriye. Her wisa ku Palmîra weke bajarê rewşenbîran hatiye zanîn. Şêwirmendên xwe ji feylesofan hilbijartiye û carna cî daye fikirdarên Romayî jî. Gelek Cihûyên di nav sînorên Împaratoriya wê de û gelên cuda, bi xweşbîniyekê birêve biriye.

Li gel ku bi sedsalan e baweriya xwedavendîtiyê hilweşiyabe jî, Zenobîa, ji şopdarên baweriya xwedavendîtiyê bûye. Alîgiriya wê ji bo Manî jî ku di serdema wê de jiya ye û xwedî bandoreke mezin bûye, derbarê Zenobîa de agahiyeke balkêş e. Peywendiya vê bi baweriya Manî heye ku ev bawerî bi xweşbînî nêzî baweriyên cuda dibe û dibêje mirov bêyî ku olên xwe yên berê biterikînin jî dikarin Manîgiriyê bipejirînin. Di heman demê de pêywendî bi hêza fikrî ya Zenobîaya yê ve jî heye ku hê dest ji baweriya xwedavendîtiyê bernedaye. Derbarê dilsozîya wê ya ji bo baweriya dayîka xwedavend de delîleke din; navê Wahballat yanê “Diyariya xwedavend”ê li kurekî xwe kiriye. Ev nav, navê kalikê hevserê qral ê Zenobîa Odaenathûs e. Mirov dikare vê ji bo Palmîrayê weke nîşaneya hê jî neterikandina baweriya xwedavendê jî binirxîne.

**Tebeqeya Heştemîn: Jina Hezret**

Di pêvajoyên piştî vê de windakirin û ketin berdewam kirin. Nasnameyên jinan ên di olên yekxwedayî de ji bo watedarkirina vê pêvajoya windakirinê, xwedî argumanên girîng in. Di ola destpêkê ya yekxwedayî Cihûtiyê de Hz. Brahîm û Sara, hinek din wekhev dixuyên. Lê her çend cotên wan xwedî heman hêzî bin jî, di cotikê Mûsa û Marîam de jina di şexsê xwişka Mûsa de, hinekî din ji hêzê dikeve. Jin, li gel Hz. Dawid û Hz. Silêman tenê tiştеke zewqa cinsî ya bi aliyekî û amûra berdewamiya nijadê ye. Ti otorîteyeke wê tune ye. Hin jinên weke Ester**(83)** û Dalîla**(84)** derketibin jî ji bilî ji desthilatiyê re bibin amûr wêdetir bi rolekê ranabin. Di cota Hz. Îsa û Meyrem de, Meyrem di bêdengiyeke kûr de ye. Weke ku bêdengiya wê bi pîrozîkirinê misoger kiribin.

Di vê serdemê de; Marîama li dijî Hz. Mûsa li ber xwe dide lê pişt re têk diçe û bêbandor dibe, Marîa Magdelenaya pêşî fahîşe paşê jina tobekar e, Dayîka Meyrem a her tim digirî û bêçare, Hz. Xetîceya yekemin hevsera Hz. Muhamed, hevsera wî ya din Eyşe, keça wî Fatma, weke mînak şexsiyetên jin ên hêjayî lêkolînê ne. Pêvajoya olên yekxwedayî ya di nasnameya jinê de şikestina çandî ya duyem dane jiyankirin, nasnameyên jinê yên di dîroka jinê ya bi 9 tebeqeyî de, pêvajoyeke ku divê bi kûrahî were lêkolînkirin. Nasnameyên jinên ên vê demê cur be cur in. Em dikarin van nasnameyan weke yên olan hema çavgirtî pejirandine, ji aliyekî ve tevlî bûne lê ji aliyê din ve di nav nakokiyan dane, li dijî van olan şer kirine, di navbera van olan û baweriya xwe ya rabirdûyê ê de hevsengiyekê ava kirine û di nav terîqet û baweriyan de cî girtine, kom bi kom bi awayekî çor ji hev veqetînin. Di her komê de bi hezaran nasnameyên jinê yên cuda ku reseniyeke wan heye, ên xwedî sekneke aydî xwe ne hene. Ev nirxên bêhempa yên Rojhilata Navîn heta niha bi layiqî nehatine pênasekirin û naskirin.

Hedefa Jineolojiyê ewe ku, li ser rêya lêkolîna dîroka şekilgirtina nasname û hebûna jinan, afirandina rê û rêbazên gihandina vê çavkaniyê ye. Ji ber ku îro çavkaniya hemû taybetmendiyên me yên berxwedêr, ev dewlemendî ye. Em dikarin nasnameyên jinên vê demê hinekî din şênber lêkolîn bikin. Weke mînak karaktera Hz. Xetîce pir girîng e. Di demên Hz. Muhamed hatiye dinê û mezin bûye de, em bifikirin eger li nîvgirava Erebîstanê li derdora El Uzza, El Manat û El Lat çandeke xwedavenda dayîk pir xurt hatibe jiyankirin, ne mimkun e Hz. Xetîce ji vana bandor nebûbe. Navê kurekî wê Abduzza (Ebdê Ûzza) ji îfadeyên vê yên şênber e. Di şert û mercên wê serdemê de, ger weke jineke dewlemend, bi xwe bawer û bi serê xwe bazirganiyê dike heyî bûbe, peywendiya vê misoger bi vê çandê re heye. Keseke ku serxwebûneke wê ya civakî û aborî heye. Piştî du zewacên berê kiriye, ew bixwe Muhamed jixwe re hevser hildibjêre. Hz. Muhamed heta ku Xetîce diçe ser dilovaniya xwe bi jineke din re nazewice.

Kareketereke ku pêxembertiya Hz. Muhamed mimkun dike, li gor dema xwe

çanda jinê ya xwedavendê temsîl dike, di asteke girîng de xwedî hêza madî û manewî ye. Lê Xetîce di heman demê de bazirganek e. Bi Muhamedê xizan re dizewice û wî derdixîne çîneke jor a burjûvaya navîn. Bi milên din ên arîstokrasiya eşîrên Kureyş ên wê demê re dikevin nav nakokiyên desthilatiyê. Bi Muhamed re şerê çîna navîn a bazirganiyê dide. Ev hemû, nakokî û şerên bi deshilatiya polîtîk ve girêdayî pêş dikevin. Hz. Xetîce hêza ji çanda dayîka xwedavend girtî di vî şerî de bi kar tîne. Her wiha, bi qasî taybetiyên erênî yên Hz. Xetîce, divê em bikaribin taybetiyên wê yên negatîf ên li gor desthilatiyê diguherin û nasnameya jinê lawaz dikin jî bibînin.

Karektereke girîng a vê demê jî Hz. Eyşe ye ku mîna "Dayîka Bawermendan" tê zanîn. Yek ji karekterên herî binîqaş ên dîroka Îslamiyetê ye. Xisûsiyetên wê yên heta bibêjî xurt hene. Hz. Eyşe ew jine ku ji pêxember re jî serî danayne. Ji bo îdîaya tawanbariya derbarê rêwîtiyeke çolê ya Hz. Eyşe de, ji Hz. Muhamed re, ayeteke taybet hatiye ku li gorî vê ayete ev îdîa ne rast in. Tê gotin ku li ser îlahiyat, tib û helbestê zanînên Hz. Eyşe pir xurt bûne. Bi taybetî piştî koça dawî ya Hz. Muhamed, tevlî şerê desthilatiyê yê di navbera xelîfeyan de dibe û wiha jî têk diçe. Bi êşeke mezin qiymeta jinaniyê hîn dibe û dibêje; "Ya Rebî, heta te ez jin çêkirim, te ez kiribûma kevirek". Ya rastî di olên yekxwedayî de hê di têkiliya Mûsa û Marîam de, serdestiya mêr kirine fermana xweda û zelal bûbû ku cihê jinê di desthilatiyê de tune ye. Hz. Eyşe, vê rastiyê bi cêribandinên xwe jiyaye û zirarê digihîne bandora xwe ya manewî ya di dinyaya Îslamê de. Gotina Hz. Eyşe ya "heta te ez jin çêkirim, te ez kiribûma kevirek" ne tenê li dijî zilma mêr, li dijî lîstokên siyasî yên wê demê dîtiye ye jî. Hevsera berdilê Pêxember be jî, di çax û civaka tê de dijî de zehmetiya jinbûnê heta hestiyê xwe ferq kiriye. Lê di dawiya dawî de weke vê tespîta dibêje "*Eyşeya zarok, li hemberî otorîteya Îslama feodal, gazinkareke mezin e.*"**(85)** li hember rastiya desthilatiyê 'zarok' maye. Lê li dijî sazîbûna zîhniyeta mêr a desthilatdar a di Îslamiyeta ku ola dawîn a olên yekxwedayî ye, jixwe tiştekî bikaribe bike nemaye.

Li hember vê zîhniyetê, her çend yek ji jinên xwedî taybetiyên girîng ên nasnameya jinê be jî lê di encam de bêbandor maye, keça Hz. Muhamed, hevsera Hz. Elî; Hz. Fatima ye. Mehra Hz. Elî bi Hz. Fatima re bi şert e. Hz. Fatima kîngê bixwaze mafê wê heye ku Hz. Elî berde. Dîsa Hz. Elî girtiye ser xwe ku heta Hz. Fatima hebe wê bi jineke din re nezewice.

Di dema Îslamiyetê de yek ji qadên têde nasnameyên jinên girîng pêş ketine tesawûf e. Yek ji vana jî Rabîa ye. Jê re gotinê; "*hemû erdem li serê mêran belav kirine, taca mêrxasî û miradê danîne ser serê wan, kembera kerametê li nava wan pêçane, tu jinek weke pêxember nehatiye şandin, rewş her ev e tu çawa dikarî di van mijaran de biaxivî?*" Wê jî wiha bersiv daye: "*Belê, gotinên we rast in, lê xwebûn, xwe ecibandin, peresandina xwe û jixwe re dan perestin, gotina 'ez Rebê we yê herî mezin im' jî bi bejna me jinan de neanîne* ". Felsefeyeke kûr a Rabîayê heye. Lê ev nasnameya jinê jî, li hember karekterê mêr ê deshilatdar û dogmayên di Îslamiyetê de bi cî bûne, xwedî bandoreke bi sînor bûye.

Di pêvajoya pêşketin û belavbûna Îslamê de, di civakên hê koçber bûne de, hurmeta ji bo jinê bêtir e. Lê bajar, weke ew qadên erka nêr lê bisazî bûne, koletiya herî kûr bi nasnameya jinê didin jiyankirin. Vê demê li dijî Îslamê di pêşketina gelek serhildanan de,ew jinên xwedî rolên bibandor in, ji wan civakane ku taybetiyên civaka xwezayî yanê çanda xwedavenda dayîk serwer e. Di vê mijarê de li Erebîstanê jî, li Îran û Kurdistanê jî mînakên vê yên xurt hene. Ev nasnameyên jinê, ji bo me diyardeyên grîng in ku divê em wan bibîr bînin, fêm bikin, yanê di honandina hebûna xwe de ji wan xwedî bibin. Di nav vana de ya herî diyar, Xurrema hevsera Mazdek e. Piştî Mazdek tê qetilkirin, Xurrem têkoşînê berdewam dike û tevgera Xurremî ava dike ku jin beşdarî vê tevgerê dibin. Lê bi hezaran jin hene ku navê wan tên zanîn an nayê zanîn û li derveyî qadên olê yên fermî, bi taybetî di xizmetên civakî, di tesewûfê de çalak cî girtine, di civakê de şopên girîng hiştine hene. Ev, nasnameya jinên berxwedêr in ku tevî şikandina cinsî ya duyem a olên yekxwedayî

tînin.

"*Çaxê xwedavendîtiyê, heta Meyrema dayîka Îsa bandora xwe berdewam dike'***(86)** *Di serdema Babîl de, piştî ku bermahiyên dawîn ên ji giraniya xwedavendên çanda Sumer hatine beralîkirin; xwedavenda kevn, edî jineke navmalî ye, sernerm û bi îfet û namûs e. Berde wekheviya wê ya bi xwedayan re, di rewşeke wisan de ye ku ne dikare dengê xwe derxe, ne jî rûyê xwe veke. Hêdî hêdî bi rûpoşê tê pêçan, weke harema mûtleq a mêrê bihêz tê dîlgirtin.*"**(87 )** Êdî jin ti carî nikare behsa xwedatiyê bike. Ji bilî bibe jina mala xwe nikare bi ti roleke civakî rabe. Bi Dayîka Meyrem re nasnameyên jinê yên serdest ku di pêvajoya baviksalarî de pêş ketin, weke nasnameya jina bêçare, nasnameya fahîşetiyê, xemla qesr û hareman, nasnameya jina ku dayîka xwedavend ji bîra xwe dernaxe û bi mirina xwe li ber xwe dide, jina dayîk, jina segvan, perî yan jî melek, ji rû derdixe yan jî cin a mê ku ditirsîne hatine binavkirin. Ji pîroziya "*Çaxê heqîqeteke mîtolojîk, olî û hunerî ya bi taybet li derdora jina dayîk pêş ketiye*"**(88)** ber bi çaxekî bi lanet; ji avahiya exlaqî û polîtîk a jiyana civakî ya li derdora jinê pêş ketiye, mîna em ketibin nav avahiyeke sexte û rizî. Ji bo mirov fêm bike nasnameyên jinê, hebûn û xwezaya jinê, di nav vê lanetî û rizîbûnê de çawa şekil girtine, divê zanista kolanê bi narînî li ser van deman bisekine.

**Tebeqeya Nehemîn: Keybanûya Metayan**

Di dîroka mirovahiyê de  ev sê sed salên dawî ji bo nasnameya jinê em dikarin weke tebeqeya nehemîn bigirin dest. Divê pêvajoyê de dijminê herî dijwar ê mirovahî û jinê kapîtalîzm pêş ketiye û li ser her çavîka jiyana me dershilatdariya xwe ava kiriye. Bi gotineke din; li ser serê mirovahiyê felaketa herî mezin qewimiye. Di felaketeke wiha de şekilgirtina hebûna jinê rewşeke çawa jiyaye? Her çend aliyê wê yê berxwedanê her tim hebe jî nasnameya jinê ya têk çûyî, radestkirî û bi hezar awayî di kesayeta wê de bi cîh kirina vê têkçûnê, bi kîjan şikestinan re rû bi rû maye?

Tebeqeya nehemîn, tebeqeya axirîn e, ya li herî jor û rûxsar e, ji ber vê herî hêsan meriv dikare vê tebeqeyê bibine, li ber çav e. Me bi xetên stûr her heşt tebeqeyên ku dibin hîmê vê tebeqeyê diyar kiribû. Êdî em dizanin, tebeqeya nehemîn, bi spartina van heşt tebeqeyan  xwe li ser lingan digre. Tebeqeya nehemîn nasnameyeke rastiya "*Dîroka şaristaniyê, di heman demê de dîroka têkçûn û windabûna jinê ye.*"**(89)** îfade dike û awayê hebûn an tunebûnê ye. Bi hilweşandina xwedavendîtiya dayîkê, di dîroka jinê de demarên berxwedanî û radestiyê, koletî û azadiyê di zik hev de dimeşin. Nasnameya jinê ya xwezayî û azadîxwaz û koletiya hatiye kûrkirin heta roja me ya îro bi hev re hatine. Nasnameya azadîxwaz, her çend xwestibin bi hezar dek û dolaban û bi zilmê tune bikin û bibirin jî, kokên qewîm ên nasnameya jinê ku demeke dirêj jiyan kirine, destûr nedane vê. Arkeolojiya jinê, ev taybetiyên cot ên heşt tebeqeyan çiqas li ber çav bigre, ewqas dikare pêkûteya tunekirinê ya li ser hebûn û heyîna jinê ya di tebeqeya nehemîn de, hêsantir dahûrîne. Lê pêşî ev tebeqeya nehemîn derbarê hebûna jinê de bi awayekî şênber çi aniye û kîjan nasnameyan digire nav xwe, divê em berfirehtir fêm bikin.

Şikestina cinsî ya duyem a bi destê olên yekxwedayî hatiye pêşxistin, di vê demê de bi qilif û rûpoşên cuda tê berdewamkirin. Ev şikestina ku heta vê demê hatî, di demên berî vê de dest pê dike û felsefe û zanist jî piştgiriyê didinê. Lê bi taybet di van sedsalan de jin ketiye rewşeke wisan ku; weke parçeyek ji makîneya xwezaya wehşî ye, muamele dîtiye. Feraseteke 'zanistî' serwer bûye ku li gorî baweriya vê ferasetê razên xweza û jinê dikarin bi zor û îşkenceyan bi dest bixin. Ji bo tiştinan ji vê parçeyî jêkin feraseta divê îşkence lê bikin hatiye parastin. Segvanê vê ferasetê Bacon bixwe dozgerê nêçîra pîresêhran e. Ji bo razên jinên pîresêhr hîn bibe êşkence li wan dike. Pir zêde jin tevlî Heretîkan dibin. Heretîk ji bo zilma li jinan tê kirin nepejirandine û rexne kirine, îdîa kirine ku Xiristiyaniya destpêkê ne wiha bûye, bi hev re jiyane û zarokan bi hev re mezin kirine û li dijî zewaca jin û mêr, jiyana bi hev re tercîh kirine, di çavê Xiristiyaniya bûye desthilatî de weke jirêderketî hatine dîtin û êrîşî wan kirine. Heke baş em bala xwe bidinê, ev taybetî taybetiyên

xwezayî ne ku Xiristiyantiyê nepejirandine. Di wê demê de komên pagan in ku heta wê demê jî di civakên Ewrûpayê de dijîn.

"Wexta ku kapîtalîzmê xwe kir sîstema serdest, 'pîresêhr' yên nûnerê dawî yê serdema xwedawendan bûn, şewitandin û modernîteya xwe ava kir. Ev bûyer, têra xwe mirov difikirîne û mirov hîn dike."**(90)** Di van pêvajoyan de zanista pozîtîvîst a bi pêşengiya R. Bacon û R. Descartes, xwe mîna heqîqeta yekane ya derbasdar pênase dike û mîtolojî, ol û felsefeyê bi tevahî li derve dihêle. Lê ew bawerî û pêşqebûlên ol û felsefeyê yên xwezaya jinê biçûk didîtin dewir girtin. Li gorî feraseta zanista nû, jin û xweza hov û biraz in û divê di bin kontrolê de bin û sembola ruhê mê bûn ku diviya bû bihatana fetihkirinê. Diviya hemûyan li ber aqlê mirov serî bitewandina. Ji aqlê mirov qesta wan aqlê mêr bû. Ji ber ku aqlê xwezayê, jinê, mirovên dinyaya sêyemîn û reşikan nedibû. Di van deman de, derbarê hebûna jinê de pênaseyên xwedî pêşdarazî û dijminane yên mîtolojî, felsefe û zanista berê pêş xistibûn, kirasekî 'zanistî' li wan kirin. Hemû navdarên wê çaxê derbarê xwezaya jinê de diaxivîn. "Jin çavkaniya bêpergaliyeke potansiyel in ku divê aqil ew kedî bike. Ti gel, ti carî ji şeraba zêde mehf nebûne û neçûne. Yên mehf bûne ji ber jin nehatine rêzikan mehf bûne." (Rousseau) "Pêvajoya mirovbûna xwezayê tenê ji bo mêran dixebite. Jin, ji ber ku nikare xwezaya xwe bide derve û ji yekîtiya malbatê derbas bike û xwe tevlî civaka sivîl, her wiha dewletê bike, li derveyî herikîna dîrokê dimîne." (Hegel) Hîn gelek fîlozof û zanyarên mêr ên din jî. Ev mantiq, ew feraseta 'zanistî' bû ku sê sed sal berdewamkirina nêçîrên 'pîresêhr'an, rewa didît.

Bi hezaran sal di bin êrîşa îdeolojîk û fîzîkî de di çanda xwedavenda dayik de, bi milyonan jin û cûr be cûr nasnameyên jina hebûn ku, li şuna radestbûna mêr, mirinê dipejirandin. Yek ji van nasnameyên jinê 'pîresêhrtî' bû. "Jinên Pîresêhr" jinên xwedî nasnameya azad bûn. Kapîtalîzm di wê qonaxa ku dixwest serdestiya xwe ava bike de ji yek nasnameyên civakî yên bingehîn bû ku dişewitand. Bi fizîkî şewitandina wan jinên berxwedêr û zanyar, parçeyeke avahiya civakî ya xurt hat tunekirin. "Jinên Pîresêhr" peyrewên dayîka xwedavend, "temsîlkarên dawî" bûn. Di navbera nêçîra pîresêhran a ku kapîtalîzmê pêş xist û hebûna jina kole ya îro de peywendiya heyî, Rêber Abdullah Öcalan wiha dinirxîne: "*Yek ji sêlingên distana modernîteyê, kapîtalîzm bi xwe wexta şensê sîstembûnê zeft kir, bi tesfiyekirina civakbûnên sereke yên pêşî û paşiyê dîrokê bûn, dest bi kar kir. Berê pêşî bi slogana 'nêçîra pîresêhran' hêza civakbûna jinê ya hewl dida li ser piyan bimîne, di nava agir de bi qirçeqirç şewitandin. Mirov nikare nêçîra pîresêhran ji sermayeyê serbixwe bifikire. Di avakirina hegemonya xwe li ser jinê de weke koletiyeke kûr, ev dîmenên şewitandinê heta dawiyê li hesabê wê hatin. Di roja me ya îro de bi vî awayî biçûkxistina jinê û ketina wê ya xizmeta pergalê, bi pêkanîna van şewitandinên di dema qonaxa derketina holê ya hegemonya kapîtalîst de ji nêz ve têkildar e. Bîranînên dehşet ên şewitandinê, jin li Ewrûpayê bi awayekî bêsînor xistiye xizmeta mêr.*"

Li ser vî esasî xwezaya hebûna jinê, di civakên roja me ya îro de, bi giranî ji hêla zîhniyeteke xerîb ve, bidest xistin û xalîkirina naveroka wê tê xwestin. Di vî warî de em dikarin nasnameyên jina tebeqeya nehemîn ku halê hebûneke dixwazin bikin aydî jinê yan jî navlêkirinên li ser sekna wan diyar bikin: 'Koleya karên malê, objeya cinsî, fahîşeya gerdûnî ya giştî bûye, amûra sermaye û desthilatiyê ya herî zêde hatiye pêşxistin, metaya bêqîmet û ya herî bi qîmet, ya zuriyetê çêdike, jina zayok a amûra bingehîn a berdewamkirina nîjadê, karkera bêheq, xwediya karên herî bi qehr, koleya herî sernerm, objeya berdewamî ya arezûya cinsîtiyê, amûra reklamê, keybanûya metayan, weke amûra tecawiza her timî, fabrîkeya ku desthilatiya mêr pêk tîne, berdewamkara manewî ya civaka bi serdestiya mêr, neteweya mêtingeh a civaka dîrokî, awayê koletiya herî bi xeter a hatî avakirin, mirova di zehmetiya herî giran de, dayîka malbata ku bingeha berdewamiya pergalê, karker û amûra xercdariya herî dawî, ya di dagirkerî û zêdekirina desthilatiyê de bi rola stratejîk radibe…

Her yek ji van pênaseyan; aliyekî zilma îro bîrdoziya desthilatiyê ku li ser

esasên cinsparêziyê bilind dibe, vedibêje. “*Di dîrokê de cinsparêzî herî zêde di serdema lîberalîzmê de weke hêmaneke bîrdozî hat pêşdebirin û bikaranîn. Lîberalîzma civaka cinsiyetparêz dewr girt, qîma xwe pê neanî bi tenê jinê weke karkera bêheqdest di malê de bixebitîne. Bêtir zêdegavî kir, ew weke objeyeke cinsî kir meta û ew pêşkêşî piyaseyê kir. Bi vî awayî hîn zêdetir bi dest xist. Li cem mêr bi tenê ked tê metakirin, lê ya jinê bixwe, hem tevahiya bedena wê û hem jî ruhê wê tê metakirin… Lê mirov bi tevahiya kesayeta xwe bibe meta, ev tê wê maneyê ku mirov ji koletiya dema fîrewnan xirabtir dibe kole. Li şûna mirov bibe koleyê kesekî an jî dewletekê, mirov bibe koleyê her kesî qatbiqat bi tehlûketir e. Xefika modernîteyê li pêşiya jinê daniye ev e. Bi awayê xuya dike jin li azadiyê vedibe, lê bi vî awayî jin dikeve statuya amûra herî rezîl ê îstîsmarê. Ji amûrbûna reklamê bigirin heta bi seks û pornoyê jin amûrê herî bingehîn a îstîsmarê ye.*”

Di vê destnîşankirina Rêber Abdullah Öcalan de di afirandina “*kemînên modernîteyê ji jinê re daniye*” de rola gelek aliyan heye. Nêrîna **Psîkanalîtîk** a dibêje cewhereke jinaniyê tune ye, wê weke ya ne aydî fallûsê ye pênase dike, jinaniyê jî “bi mumkin dîtina hêza mêr a ku watedar dike, sererast dike û dipejirîne” berpirsiyar e. Berpirsiyar **Freûd** e ku li gorî baweriya wî xwezaya jinê ji hundirîn ve mazoşîst e û dibêje “Jin li gor xwezaya xwe kole ye û ev rastîyeke ku naguhere” piştî vê gotinê jî bi pirsa “jin çi ye” dimire û diçe. **Marks** ê di nivîsên xwe yên demên zû de dibêje “jin, jixwede xwebûneke antropolojîk (entîty- hebûna tek û serbixwe, hebûnî, hêman) û kategoriyeke ontolojîk a heta bibêjî razber e” û rizgariya vê “kategoriya ontolojîk a razber” bi rizgariya proleteryayê ve girê dide, berpirsiyar e. **Serdema Vîktorya ya sedsala 19.** a ji bo mêran bikşîne, dilê wan xweş bike û bizewice stratejiya jinaniyê pêş dixîne û ji bo vê jî serî ji reçeteya xweşikiyê re ditewîne û pênase dike berpirsiyar e. Hemû saziyên fikrî û avahî yên sedsala 20. ku jinê bi karekî, pîşeyekî bi nasname dikin, kariyerê di ser gelek tiştan re dibînin, stratejiya mêraniyê dipejirînin û ji modela hêzbûna mêr ê desthilatdar re serî ditewînin, berpirsiyar in. Modernîteya Kapîtalîst, bi tevahî ji hebûna jinê ya kirine halekî nenas, ji ew rastiya koletiya jinê ku bi qasî şaneyek jî nehêle kirine meta, veguherandina koletiyeke pazarê ya hatiye kûrkirin, nêzikahiya ji jinê re yan magazînel-çêkirî yan jî kevneşopîtî, weke ferzkirina forma hebûnê berpirsiyar e. Ji krîza nasnameyên jinan ên di roja me ya îro de hatine afirandin û ji qetilkirina wê ya di her kêli’yê de modernîteya kapîtalîst berpirsiyar e. Di merhaleya îro em gihanê de jin, bi destdirêjiyên ku aqil û çanda mêr pêşxistiye, bi destxistinên di encama zor û êrîşan, bi xespkirinan , dixwazin ku di nav çandeke cinsîtiyê ya di bin serweriya mêr de bihêlin.

Modernîteya kapîtalîst dema ku vê diafirîne, kevneşopiya sedaqetê ya ji aliyekî ve dixwazin bikin parçeyekî ji ontolojiya jinê, bi hezar salan bi saxî bi mêrê mirî re binerdkirin an jî şewitandina hevser û cariyeyan pîrozî dike. Ji aliyê din ve azadiya kes, di çarçoveya azadiya cinsîtiyê de ava dike û propagandaya vê 24 saetan empozeyî civakê dike. Li gelek deverên dinyayê kevneşopiyên hê jî derbasdar in û watebûyîn û pêkhatina hebûna jinê di tevahiya emrê xwe de sadiqî mêrekî bimîne ve girê didin sor dike. Li hemberî raman û diyardeyên sazîbûnê ya feraseta ku dibêje jin milkê mêr e, piştî melîk mir nirxeke wê tune ye, cidî şer nake. Ji aliyê din ve jî pesnê modela jina modern-azad dide. Di vê rewşê de jin kîjanî bipejirîne bila bipejirîne ew dizane, çarenûsa wê şewitandin e. Di navberê de çend hezar sal jî hebin bila hebin, feraseta ku her du propaganda jî xwe dispêrinê eynî ne, ji fabrîkeya îdeolojiya cinsparêziyê derketine. Ev îdeolojî ji bo jinê tenê azadiya hilbijartina awayê şewitandin û parçekirinê, êş kişandinê dide, carna wê jî nade. Derbarê nasnameyên vê tebeqeya nehemîn a ku em derbarê şekilgirtin, krîzên wê û kî, çawa jê berpirsiyar in de xwedî gelek argumana ne; gelek taybetiyên xurt û bêhêz ên heşt tebeqeyên din jî di hewza xwe ya genetîk de digire. Pir bêhêz hatibin kirin jî, demarên, serhildêr, berxwedêr, miriyê civakîbûn û azadiya xwe ne ku ev gen li serê diyarker in, hê jî zindî ne.

Ev demar, di tevahiya van sê sed salan de ku xwestin nasnameyên jinê yên

bênav jibîr bikin, em dikarin li ser hin nasnameyên tên zanîn bisekinin. Olympe de Gougesa di şoreşa Frensî de ji ber mafê siyasetkirina jinê parastiye û berdêla vê di giyotînê de bi serê xwe daye, Rosa Luksembûrga û Clara Zetkîn li dijî faşîzma Elman bi lehengî şer kirine, di şoreşa Rûs de jinên pêşeng; Aleksandra Kolontay, Krupskaya, li Spanyayê Dolores Îbarrurî, li Komara Domînîkê Xuşkên Mîrabel (Pepûleyan), jinên şoreşger ên di têkoşînên rizgariya neteweyî, ji dawiya sedsala 19. dest pê kirine û di tevahiya sedsala 20. de berdewam kirine, li Cezayîrê Cemîle Boûhîred û Cemîle Boûpacha, li Filîstînê Senâ Heyderî, li Fasê Delal Maxrib, li Sûrî Hamîde Tahîr, li Kurdistanê Besê, Zarîfe, Dayê Gulnaz, Leyla Qasim, Rindêxan, Qadem Xêr, Keça Nexedeyî, Besê Anûş, Dîcle Kobanê, Xanim Yawerkaya, Ezîme Demîrtaş, Sakîne Kirmizitaş, Binevş Egal, Gulnaz Karataş, Zeynep Erdem, Zeynep Kinaci, Sema Yuce, Sakîne Cansiz, Arîn Mîrkan, li Tirkiyeyê Nezîhe Mûhîttîn, Fatma Aliye, li Emerîkayê Emma Goldman, Angela Davîs, li Brîtanyayê Alîce Paûl, Lûcî Burns, Emîly Davîson, li Almanyayê Ulrîke Meînhof, li Efxanistanê Meena Keshwar Kamal… bi hezaran jinên di têkoşînên gerîla de cî girtine,


femînîstên li dijî cinsparêziya civakî, mîlîtarîzm, şer û hilweşandina ekolojîk têkoşiyane, li gel hemû ferzkirinên bi tundiya kapîtalîzmê dayîkên ku ji çand, civak û nirxên xwe qut nebûne… û bêhejmar nasnameyên jinên berxwedêr ku em nikarin li vê derê bijmêrin.

Tevî kavilên bi hezar salan e em di bin de hiştine, ger îro em hê jî dikarin têkoşîna azadiya jinê bidin û îdîaya xwe ya ku em hêza jiyanê ya herî bingehîn in tînin ser zimên, bi saya van damarên berxwedêr e. Ev demar in ku ji bo hebûna jinê, tu carî dev ji herikînê bernedane. Ev demarên berxwedêr, mohra xwe li hebûna me dixin ku hê jî "*Jin, ew qabîliyeta dîtinê ye ku hemû aliyên jiyanê, ji durûtiyan dûr, bi awayê saf û sade dibîne.*"**(91)** Ev nasnameyên jinê yên berxwedêr, di pêşxistina Jineolojî û arkeolojiya jinê de yek ji wan xalan e ku hêvî dide me. Bi vê hêviyê em dikarin ji rêya yekemîn a rêwîtiya hebûna xwe derbasî rêya duyem bibin. Di maneyekê de ev, li ser daneyên em bi arkeolojiya jinê gihîştinê, pênaseya zanista jinê, zanista hebûna jinê bikin û bikevin ser rêya pêşxistinê, rêwîtiya wê. Jineolojî, di avakirina hebûna jinê de bi tevahî van tiştên em hîn bûne wê çawa binirxîne, ji bo vê fikir, proje afirandin, xeyal kirin û pêkanîn e.

"*Hewldanên entelektuel û xebatên li ser zanîn û zanistê divê bêne pêşvebirin di çarçoveya civaka exlaqî û polîtîk de ya awayê hebûna bingehîn a xwezaya civakî ye. Tevahiya dîroka şaristaniyê ji vê rastiya civakî mirovatî hatiye qutkirin û ev rastî hatiye rizandin, bi serdema modern a kapîtalîzmê mohra xwe lê xistî ev rastiya civakî hatiye parçekirin, bi rizînê re rû bi rû hatiye hiştin û anîne ber tunebûnê. Wê wextê berê pêşî divê ev hewldanên entelektuel, xebatên li ser zanîn û zanistê armanca xwe rawestandina vê rêveçûnê be. Ji ber ku tiştekî hatibe tunekirin zanista wî nabe. Belkî bîranîna wî bibe, lê bîranîn jî zanist nîne. Zanist, bi ya heyî bi ya dijî re têkildar e. Civaka di vê rewşê de eger naxwaze bi tevahî tune bibe, divê li dijî modernîteya kapîtalîst tevî hemû hêmanên xwe li ber xwe bide. Berxwedan, êdî bi hebûnê re li ser heman rê ye û wekhev e.*" Ev destnîşankirinên Rêber Abdullah Öcalan nîşan dide kare me bê çi qas zor e. Em jin, ew beşa civakî ne ku hebûna wan herî zêde di nîqaşê de ye û di bin gefên giran de ne. Ji ber vê yekê Jineolojî îdîayeke mezin e. Li hember polîtîka û pêkanînên pergalê yên me li ser xeteke tunebûn û hebûnê dibe tîne, berxwedaneke bi piralî, jiyaneke bi berdewamî, bilindkirina zanatiya hebûna xwe û pêşxistina zanista wê, erkeke pir zor lê jiyanî ye. Erkeke ew qas jî birûmet e.

**Bi Jineolojiyê 'Xwebûn'**

Jineolojî, dema li ser rêya duyem a rêwîtiya ber bixwe ve, yanê di rêya emê bixwe navê xwe lixwe bikin dimeşe; tiştê destpêkê wê bike; li hemberî hebûna ew jina ji xwebûnê hatiye derxistin, belavkirin û dişibe dijberî xwe, refleksa nepejirandina

xwezayî  wê nişan bide. Nasnameyên dixwazin bikin aydî me û em çiqas li ber xwe bidin jî nasnameyek e ku me bi giranî pejirandiye. Gavên em ê destpêkê bavêjin; mirov bizanibe ev nexwezayî ye û li gor vê ji vê nasnameyê xelas bibe û hebûna jinê pêş bixe. Ji bo van gavan divê em argumanên xwe yên bîrdozî saxlem biafirînin. Emê bi zanebûna di çavkaniya pirsgirêkên hebûna me de, dîrokeke qirase heye tevbigerin. Emê bikevin ferqê ku her pirsgirêkek, di nav pêvajoyeke dîrokî de hatine avakirin.

Di rêwitiya li ser vê rêya duyem de, em ê bi pîvana zêrîn a dibêje; “ya bi destê mirov hatiye avakirin, bi destê mirov jî dikare were guhertin” tevbigerin. Em ê bi şikandina radestiya îdeolojîk ya li ser jinê hatiye ferzkirin dest bi guhertina ya hatiye avakirin bikin. Ger em vê radestiya hatiye avakirin bizanibin êdî em dikarin vê biguherînin û hilweşînin. Em ê ji navlêkirinên şaş ên êrîş û tundiyeke bîrdozî ya cidî ku li me hatine kirin xwe rizgar bikin û navên xwe li xwe bikin, her wiha dest bi guhertinê bikin. Dîsa çanda şermkirin, erz birin, qedexekirin û tunekirina li derdora nasnameya jinê hatiye pêşxistin, êrîşeke îdeolojîk ya berfireh û demdirêjî ye ku li ser hebûna me kirine. Em dikarin operasyonên van êrişan ên li ser nasnameyên me fêm bikin, bi baweriyeke bi xwe ya mezin, parastina hebûna xwe ya cewherî pêş bixin. Em dikarin, di serî de li ser cinsîtiya me, hêza beden û hestên me, ferzkirinên biçûkxistin, metakirin û bazarîkirinê bidin sekinandin. Vê hêzê bi dest bixin. Teoriyên beden û aqlê jinê, ruh û dilê wê ji hev vediqetînin, parçe dikin û dijberî hev dikin birizînin. Dualîzma ku jin û mêr weke cotên diyalektîk ên xwezaya civakî wêdetir dibîne, zêdetir dijberî hev dike û li hember hev bi cî dike, em dikarin derbas bikin.

Hebûneke civakî ya baş, ji hebûneke baş a jinê derbas dibe. Eger em di rêya duyemîn a rêwîtiya ber bi xwe ve de, pênaseyên derbarê hebûna xwe de rast bikin, em dikarin derçûnekê bi civakîbûna xwe jî bidin kirin. Divê em bizanibin ku di vê xalê de, hêza dayîka me ya xwedavend di genên her yek ji me de dijî. Beriya her tiştî divê em pê bawer bin ku girîng e di roja me ya îro de jî ev çand were jiyankirin. Divê em bizanibin îro jî bi xwezayî em xwedî wan  qabîliyetên xwe yên serdema Neolîtîkê ne ku  civakê têr dikirin, diparastin û berdewamiyê pêk dianîn. “*Tevî hemû hewldanên qedandin û qelandinê yên li ser hatin meşandin, jin xwedî potansiyel e ku bi wêrekî, têkoşerî û rûmetî mînakên jiyanê nîşan û raber bike. Tevî hewldanan hemûyan jî bîrdoziya civaka cinsiyetparêz … bi sazî nebûye. Di avakirina civaka demokratîk de ku wekhevî (bi cudahiya xwe) û azadiya jinê pîvana bingehîn e, ev taybetiyên çandî yên dewlemend di nava hev de dijîn, potansiyeleke mezin di nava xwe de dihewînin.*” **(92)** Ev potansiyela bêhempa, tenê bi baweriyeke xwe bixwe ya saxlem dikare were çalakkirin. Ji ber ku ji bo jinan çavkaniya hêzê ya herî girîng, beriya her tiştî hêza wê ya hundirîn e. Eger ev tune be yan jî gav bi gav neyê afirandin, wê hemû baweriyên pê heye vala derkevin. Di çavkaniya çanda dayîka xwedavend û seknên jinên xurt ên di pêvajoya dîrokî de jiyane, baweriyeke cewherî ya saxlem heye. Afirîneriyeke xurt a ji vê baweriyê xwedî dibe heye. Di rêwitiya ber bi hebûna me ve, çavkaniya me ya herî xwirt ku wê ji bo me bibe palpişt divê ev baweriya bi xwe be.

Di afirandina çanda dayîka xwedavend a bi baweriya cewherî de, li derdora beden û cinsîtiya jinê pîroziyek heye. Jin û bedena wê yekpare ye, zayokiya bedena wê, xweşikî û cinsîtiya wê ya çavkaniya bereketê hatiye dîtin û pîrozkirin, ji nirxên sereke yên nasnameya jinê ya wê demê hatibûn afirandinê. Ne bedena jinê, ne jî ya mêr biçûk nedihat dîtin, cinsîtî tabû yan jî guneh nebû. Pişt re aqlê mêr ê desthilatdar pêş ket û tevahiya serdestiyê yekalî girt destê xwe, tam jî di vê xalê de êrîşî ser hebûna jinê kir. Jin û bedena wê, dijberî hev û dijmin pênase kir, li ser hebûna jinê parçebûneke esas ferz kir. Eger jin bêbeden û cinsîtî bimaya tenê wê çaxê dikaribû dûrî gunehan bimaya. Xweşikiya wê bela serê wê, cinsîtiya wê bi qasî mêr ji karên wî yên cidî û girîng qut bike xapînok bû. Ji bo ku hemû bedena wê mêrekî kêm bû, jina qot û seqet, eger di bin venêrîna mêrê ku temsîliyeta xweda yê li ser rûyê erdê ye nebe, wê xeteriyeke mezin be. Hin taybetiyên bingehîn ên hêz û nasnameya jinê, di lêdana jinê de hatin bikaranîn. Çanda baviksalarî, bi demê re li derdora jinê çandeke

weke hebûneke mirov jê şerm bike hat lansekirin. Bi demê re fermana xweda ya olên yekxwedayî pîroziya pêwîst temîn kirin. Ev rewşa kolekirin, biçûkdîtin û ji her cure êrîşê re vekirî hiştin, li ser jinê weke awayê hebûneke sexte hat ferzkirin. Bi her awayê kiryarên dûrxistina ji xwebûnê re rû bi rû hat hiştin, objekirin, ji aliyê destên bi rêvebirina aqlê mêr ê serdest, li eniya wê mîna çarenûs hat nivîsîn. Nasnameya li derdora wê pîrozî pêş ketin, anîn rewşa girêka kor a qedexe, guneh û eyibandinê.

Ontolojî, weke "Zanista li ser cewhera ya heyî" tê pênasekirin. Eger ontolojiya jinê pêş bikeve, destpêkê divê van girêkan ji hev veke. Ger mirov pêşî heyî dibe, piştre pênaseya xwe dike û cewhera xwe diafirîne, wê jin, pênaseya hebûna xwe ya biyolojîk û xwe bike û ji van girêkên kor dest bi afirandina cewhera xwe bike. Wê dakeve çavkaniya her girêkeke kor a bi hezaran sal berê. Arkeolojiya jinê jî, ji bo van girêkên kor veke wê were pêşxistin. Jin, "*ji bo hebûn bibe heyîn, weke heyîneke nasname û azadiya xwe bi dest xistî divê wate îfade bike*"**(93)** Jin jî mîna hebûnên din, heta ku dijî her tim di nav pêkhatinê de ye. Derbarê hebûna xwe de bigihîje agahiyên nû, serwext bibe, diyardeyên nû bigire nav bergeha xwe. Wê ber bi hebûna xwe ve, gav bi gav wê dest bi honandina pêvajoyekê bike. Wê bihizire bê ne objeyeke ku ji hebûnê hatiye derxistin, parçekirin, biçûkdîtin, şermkirin û mêtingehkirin. Wê xwedî îdîa, rê, etîk û rêbaza pêşxistina kirdewariya kolektîf û nasnameya xwe be. Bi vî hawî wê qabîliyeta xwe îfadekirin, parastin, jiyankirineke bi azadî pêş de bibe. Bi demê re êdî pênaseyên sexte yên li bejna wê kirine wê ji xwe bike û rastiya wê ji aliyê civakî ve wê bibe hebûnek. Jin, di pêvajoya afirandina hebûna nasname û jiyana xwe ya azad de wê dîsa pêrgî hin zehmetiyan bê. Lê bi hişmendiya hebûna xwe, wê hîn bibe xwe ava bike, bibe heyînekê û parastina hebûna xwe bike. Bi kurtasî, hebûna xwe ji nû ve, wê li gor dinyaya zîhniyetê ya bi dest bixe sererast bike û derbas bike. Di vê bidestxistinê de Jineolojî, berendam e ku bi roleke girîng rabe.

Ji bo jin û mêran zîhniyeteke nû pêwîst e. Ji ber ku zîhniyeta hemû fikir û avahiyên xwe dispêrinê, berpirsiyarê esas ê trajediyên civakî ne. "*Zanistên civakî yên heyî, di şexsê jinê de civakê anîn ber kaosekê. Li şûna ku wê mîna endama civakîbûnê daye destpêkirin pênase bikin, mîna endama herî lawaz, bêhêz a civakê pênase kiriye. Di vê çarçoveyê de, di civakên roja me de jin, weke çavkaniya pirsgirêkê hatiye dîtin, wê kirine bin tecrîdeke giran. Di pirsgirêkên jin di civakên roja me de dijî de, ger zanistên civakî bi rola hêza çareseriyê ranabin, ev pirsgirêkeke bingehîn e.*" Ev tespîtên sade yên Rêber Abdullah Öcalan, îfadeya Jineolojiya wê zîhniyeteke nû pêş bixe çi ye yan jî divê çi be jî dike. Zanisteke ku pênaseyên jinê yên şaş ên di bingeha pirsgirêkên civakê de red dike! Wê Jineolojî, bi zanistî şaşiyên van deyne holê û pênaseyên ku civak û jinê ber bi heqîqetê ve bibin pêş bixe. Heqîqeta jiyan, civak û jinê wê deyne holê ku nabe ji hev bên veqetandin. Wê koletiya kûr a weke forma hebûnekê li ser jinê tê ferzkirin û pêvajoyên bingehîn ên vê ferzkirinê deşîfre bike. Di heman demê de wê rê û rêbazên pêşxistina nasnameya jina azad û serbixwe û erdemên xwedavendê, li gor cêribandinên jinê lêkolîn bike. Pênaseya hebûna jinê, dîrok, civakîbûn û azadiya wê, wê bi nêrîna jinê bike. Bêyî ku ji jiyan, civak û jinê qut bibe, ji bo jin û civakan, bi jin û civakan re, wê fikra zanistî hilberîne. Dê akademiyên civakî ava bike. Zanista hebûna jinê jî li ser vê zemînê wê baş nîqaş bike. Hemû daneyên heta îro li ser jin û civakîbûna jinê wê kom bike û analîz bike. Dema li ser pirsgirêkên rojane bisekine û çareseriyên wê lêkolîn bike, wê paşxaneya dîrokî her tim li ber çav bigire.

Heta niha pênaseyên jinê yên ku bi çîrokên hebûna jinê derketibûn me girte dest. Li gorî pênaseya jinê ku em ê nasnameyên jinê jî li ber çav bigirin û ava bikin, em ê zanista xwe ya jinê pêşde bibin. Yanê pênaseya me ya jinê çi be em ê zanista xwe jî li gorî wê pêş bixin. Me di rêya yekemîn a rêwîtiya xwe de zelal kir ku em ê pênaseya xwe ya jinê li gor kîjan zîhniyet û têgihîştinê ava nekin. Tê maneya ku emê van nav û nasnameyan ji xwe bikin. Em ê di ser kîjan têgihîştin, taybetî û nirxan de pênaseya xwe ya jinê, hebûna wê pêş bixin, me gotibû wê bibe rêya me ya duyemîn. Di vî warî de Jieolojî, zanisteke wê her du rêwîtiyan jî bigihîne hev.

**Zanista Jinê: Jineolojî**

**Jineolojî**, têgeheke resen, orjînal e. Ji pêkhateya peyva JIN a bi kurdî û ji LOJÎ ya di latînî de tê wateya zanistê hatiye dariştin. Sê peyvên dişibin Jineolojiyê hene ku carna tên tevlihevkirin; **Jinekoloji**, J**eneolojî** û **gyn-ecology**.

**Jinekolojî**; di wateya **zanista jinê** de ye. Bi yewnanî gynaîka (gyne) jin, lojî jî tê wateya zanistê. Jinekolojî şaxeke zanistê ye ku bi lebatên, organên zêdebûnê yên jinê re eleqedar dibe. (Bi ingilîzî: *gynaecology* an jî *gynecology* e.) Jinekolojî bi kurdî weke "nexweşînên jinan" tê bikaranîn. Dijberî Jinekolojiyê, Androlojî şaxeke zanistê ye ku bi lebatên, organên zêdebûnê yên mêr re eleqedar dibe.

**JENEOLOJÎ:** (Geneologî: gens (nîjad)) Wateya peyvê *secere* ye. Bi giştî û bi rêgezî bi Nîetzsche re girêdayî tê destgirtin. Şopandina çavkaniya bûyer an jî diyardeyekê îşaret dike. Nîetzsche pratîka jeneolojiyê di pirtûka Secereya Exlaqê de digire dest. Jeneolojiya ku Nîetzsche çêkiriye li ser pirsên; ez kî me, ez çawa gihîştim rewşa xwe ya niha, ez ji rewşa heyî dikarim derbasî kîjan rewşê bibim, hewl dide ku ji bo mirov ka çi ye, çawa hatiye rewşa xwe ya heyî û kokên wê/wî yên rastîn nîşan bide.

Yekane çavkaniya rêbaza jeneolojîk a Foucault, Nîetzscehe ye. Derbarê mijara zanîn û deshilatdariyê de weke rêbaza herî guncaw ya M. Foucault ew pêş xistiye tê pênasekirin. Foucault, esas jeneolojiyê weke rêbaza analîzkirina cewher û pêşketina formên desthilatdariya modern bi kar tîne. Foucault, dîrokê weke çîroka tehakum û tabîkirinê (girêdayînê) dibîne. Di nav projeya jeneolojiyê de kes, weke encamên desthilatî û zanîna modern; bi awayê obje (tişt) û subje (kirde) çawa hatine avakirin an jî sazkirin lêdikole.

**GYN-ECOLOGY**: Di 1978'an de ji aliyê femînîsta radîkal Mary Daly ve hatiye bikaranîn. Bi navê "Jin-Ekolojî: Etîk û Metaya Femînîzma Radîkal" hatiye nivîsîn. Di lîteratura femînîst de, Daly vê têgînê çawa bi kar aniye wiha tê ravekirin: "Daly, nêrîna ekolojîk/jin, weke rêsandina ta, li ser metaforên ji çalakiyên yên jinan hatine girtin ava dike. Rêsandina ta; vediguhere metaforeke rêwîtiya avahî bişivîner/ avaker. Zanîna rêsandina ta ne sabît e; bi guherîn û herikbariyê berdewam dike. Li wê derê, vê derê, di navbera beşên rastiya ne girêdayî hev in de, ta û benikan çêdike. Torên nû ava dike, girêdanên nû yên ne li gorî şêwazên akademîk ên kevneşopî ne ava dike. Li gorî ku tayê jin/ekolojî li derdorê, paşerojê û li qadên bi cîwarbûyî vedzelîne, dikşîne, tabût/sindoqên ku 'zanîn' tê de tê parastin, jinûve tê parastin/veşartin, jinûve tê de ye/tê girtin vedike, wateya wê, wê ji notirvanên gorê yên kevneşopê were veşartin."

**JINEOLOJÎ**: Bi nêrîna jinê, li ser zanîn û rêbazên gihandina zanînê û çavkaniya zanînê disekine. Di jiyana civakî de, bi hedefa takekesbûn û civakîbûna azad, qadên zanistê ava dike. Zanînên derbarê jinê de, bi perspektîfa jinê ji nû ve, civak, gerdûn û tevahiya jiyanê şîrove dike. Di pêşxistina van şîroveyan de, ji têgînên dişibin hev û me li jor anî ziman, rêbaz û zanistan jî feyde digire. Her wiha ji gelek dîsîplînên zanistê jî, ji kuliyata femînîst jî, ji cêribandinên devkî û nivîskî yên gelek jinên şerê gel ê şoreşgerî dane jî. Zanistperestiya ku di fikir, zîhniyeta mirov û qada zanistî de parçebûnê pêş dixe red dike. Ferzkirinên tevgerên jinê yên teorîk ku xwe navend û epîstemolojiya bê nîqaş a hemû jinan îlan dikin jî napejirîne. Di heman demê de teoriyên bijarteker (eklektîk), dogmatîk, biserve û razber red dike. Di avahiya fikrê de xwezayên jin û mêr, xwezaya civakî, bêyî ku girêdana wan bi cêribandinên dîrokî û rojane qut bike, analîzkirinê hedef digire.

Di roja me ya îro de halê hebûna dixwazin bikin aydî jinê; nasnameya jinê ya di navbera ferzkirinên aqlê mêr û berxwedêriya hebûna jinê de, hebûna bi kriz û vezelandiye. Jineolojî, li ser esasê bi kûrahî lêkolînkirina van pêvajoyan, "ji vê hebûna

jinê ya bi krîz, hebûn û nasnameya jina azad çawa çêdibe?" teorî, nîqaş û lêgerînên wê pêş dixe. Derbarê pirsên hebûna jinê, cewhera jinê de, jin û tevgerên jinan, xwedî gelek bersivên cuda ne. Ji 'xwezayeke jinê ya sabît nabe' bigire heta 'xwezayeke jinê heye' nêrînên pir cuda hene. Hinekên ji me dibêjin xwezayeke cuda ya jinê heye, hinek ji me dibêjin tune ye. Hinek ji me bêcinsîtiyê diparêzin. Hinek bizavên femînîst dibêjin di dîroka jinê de serdemeke bi nîjada dayîkê (dayîksalar) heye, hinek jî dibêjin ev dem nehatiye îspatkirin û ev feraseta dîrokeke romantîk e. Bizavên femînîst li hev dikin ku li holê pirsgirêkek heye, lê derbarê sedema pirsgirêkê de jî nêzikahiyên cuda raber dikin. Hinek bizavên femînîst, bingeha pirsgirêkê kapîtalîzm, hin jê baviksalarî, hin jî olan dibînin. Akademîsyenên jin, tevgerên jinên ji kevneşopiyên cuda, jinên di nav tevgerên sosyalîst de û hîn gelek jinên ji beşên cuda, derbarê xwezaya jinê de di hin aliyan de li hev bikin jî ev nêrîn heta bibêjî parçeyî ne. Ji aliye din ve jî dema ew nasnameyên jinê, taybetiyên dikin aydî hebûna me ku pergal li ser me ferz dike dikeve nav, ev parçeyîbûn kûrtir û tevlihevtir dibe.

Bandorên parçebûna vê tevliheviyê, li ser serboriya hebûna jinê, li dijî fikir û jiyana rêxistinkirî ya bîrdoziya baviksalarî, li ser sekna îdeolojîk ya jinê, em divê bi nêrîneke hestiyar û gihaştî bidin ber lêpirsînê. Giraniya kavilên bi hezar salan in hin deman jiyana me ya biheybet, dîroka me, aborî û hunera me bûn û bi ser me de hilweşiyane li ser me ye. Bêyî li zanînên lîberalîzmê afirandiye bieliqin, divê em bikaribin rêyên dakevin bin her tebeqeya vê keşif bikin. Em beşa civakî ya herî bingehîn in ku di ser dîroka îro de tên diyarkirin. Ji ber vê yekê em nikarin pirsgirêkên hebûna xwe, bi rojaneyî teng, serveyî nîqaş bikin û zîhniyeta xwe bêhnteng bikin. Bi zelalî û rastiya zîhnî divê em li ser dîroka hebûna xwe bisekinin. Di pênaseya hebûna xwe de, bigihîjin hevpariyan. Ji bo vê divê em neynikekê li hebûna xwe ya heyî bigirin.

Jineolojî neynikeke ji hindirê me re. Guh dayîna van pirsên sade ne ku ji wê neynikê ve dixuyên: 'Gava ku xwe li hebûna jinê digirim, ez çi me?', 'Ez li ku dera nasnameya jinaniyê me?', 'Ez di kîjan kêliya têkoşîna heyîkirina me, xwezaya jinê, nasnameya jina azad de me?', 'Jineolojî kîjan merhaleya çîroka hebûna min a jinbûnê ye?', ' Jineolojî beramberî kîjan merhaleya têkoşîna me ya Azadiya jinê tê?', 'Çima divê em niha zanista jinê pêş bixin?', Jineolojî, ji van pirsan re bersivên jiyanî dayîn e. Mînakeke ji bo honandina dinyaya zîhniyeta nû ku divê jin pêş bixin.

Weke rêbazeke bingehîn a bidestxistina vê dinyaya zîhniyeta nû; di rêwîtiya honandina hebûna xwe de, derbarê xwezaya jinê de, divê em xwendinên pozîtîf û komkirinan zêde bikin. Ji bo vê, em dikarin ji anatomiya jinê, yanê ji aliyê bedenî yê hebûnê dest pê bikin. Aqlê mêr ê desthilardar bi hezaran sal in li ser bedena me difikire û teoriyan ava dike. Bi van teoriyan, operasyonên qirkirin û kolekirinê pêş dixe. Di bin van şertan de, destpêkê divê em bikaribin bigihîjin heqîqeta bedena xwe. Ew bedena me ya mêjiyê wê her tim biçûk tê dîtin, bi cinsîtî her tim tê xwestin û di parçekirina hebûna me de li dijî me tê bikaranîn. Polîtîkayên bedenê yên pergalên desthilatdar jî bixwînin û rastiya bedenî ya hebûna xwe nas bikin heta bibêjî girîng e. Taybetiyên bingehîn ên anatomî û biyolojiya jinê, di hebûna jinê de cihê wê, di diyarkirina nasname û xwezaya jinê de bandorên wê çi ne? Yek ji mijarên sereke ya ontolojiya me bersiva vê pirsê ye. Mijara divê em xwendinên pozîtîv zêdetir xurt bikin jî ev e. Îro di gelek qadên zanistê de jinên xwedî nêrîna jinê jî cî digirin. Û lêkolînên zanistî dihêlin em anatomiya jinê hîn berfireh nas bikin. Bi nirxandina avantajên weke vê, bi berfirehî lêkolînkirina kuliyata femînîst, em dikarin danehevek biafirînin û sîstematîze bikin.

Teoriyên derbarê bedena jinê de, ji mîtolojiyê dest pê kirine heta zanistê, di dîroka fikrî de bûne cebilxaneya esas a êrîşên li ser hebûna jinê. Merhaleya em têde ne,hemû avantaj di deste me de ne û em dikarin dawî li lêdanên aqlê mêr ê deshilatdar ên li ser bedena me bînin. Enerjiya pozîtîf a jixwe di bedena me de heye, divê em bikaribin di şêwazê fikirandina vê qadê de jî biteyisînin. Ne di wateya xwe xapandinê de, na. Ji bo li hember enerjiya negatîf a nêr ku 24 saetên rojê empozeyî

xwezaya jinê, em dikarin di mijara xwe naskirinê de xurt bibin.

Margaret Fuller dibêje; di jinê de weke qabiliyeteke taybet, xwezayeke bi elektrîk, tîrbûneke elektrîkî heye. Mêr ne xwedî vê ye û pergala mêr nahêle ev derkeve holê. Kî dizane bedena jinê ya bi hezaran sal biçûk hatiye dîtin çendîn hêjayî keşifkirinê ye ku hê çiqas taybetiyên cuda, xurt û aydî mêtiyê tê de hene. Ev taybetî ger pergala dayîka xwedavend ava kiribin, şertên dijwar ên deh hezar salan derbas kiribin û civakîbûnê dabin destpêkirin, îro jî dikarin di rêya rizgariya jinê de bibin çavkaniya hêzeke bingehîn. Bi destpêkirina fikirandina bi vî hawî tê wateya ku êdî em li ser rêya rêwîtiya hebûna xwe ne. Di meşa vê rêyê de; em hêza xwe ya empatiyê û qabîliyetên xwe yên ahengê yên muazem keşif dikin. Bi hûrguliyên herî biçûk ên jiyanê, ji kesera di awirên mirovan de bigire, heta bi sehekên xwe yên ku em li dorhêla xwe nîşaneyên hêrsdarî û firehiyê dibînin û bi gelek taybetiyên xwe yên wiha xweşik, yanî zanyariyên xwe jinûve nas dikin. Dîsa têgîhîştina mêjiyê me ku ji mêjiyê mêr ê “zêdetir li ser analîz û keşfê’ rêyeke ‘sîstematîk’ digire” cudatir, xwedî “karakterekî ‘empatîk’ e jî hîn dibin ku ev mêjî  ji ruhê yên li derdora xwe fêm dike. Bi saya vê cudahiyê, em ferq dikin ku em dikarin ji gelek aliyan ve li mijarekê temaşe bikin. Ajoyên me yên bi hezar salan in dibin çavkaniya biçûkdîtina me, em fêm dikin ku şêwazê xebitandina daneyên mêjiyê me ne, bi pênc sehekên xwe ji derdorê digire û bi asta hormona me ya ostrojenê pêş dikeve. Her wiha em digihîjin wê zanebûnê ku xwînîbûnên me yên mehane “pabendên me yê nazik in ku  ji xwezayê qut nabe”.

Gelek encamên zanista biyolojiyê derbarê xwezaya jinê de daniye holê, îspat dike; fizîka jinê, mêr dixe nav bergeha xwe lê fizîka mêr  jinê nagire nav bergeha xwe. Berovajiyê gotina mîtolojî û pirtûkên pîroz, jin ji fizîka mêr nayê. Ya rastî mirovahî bi deh hezaran sal, bi vê zanînê jiya. Îro zanist, bi gelek pêşketinên nû îspat dike ku ev jiyana bi sedan sal biçûk didît xwedî felsefeyeke bêtir rast e. Daneyên zanistê yên nû derketine nîşan didin ku xwezaya jinê navend e û mêr, ew hebûneke ku ji jinê diwelide û di tevahiya jiyanê de girêdanên xwe yên bi jinê re nikare qut bike.

Li gorî lêkolînên zanistî yên dawî; pêşiyên kromozomên X û Y heman yek in û ji cotek otozomên bi aheng beridîne. Mirovên zanyar diyar dikin ku beşeke girîng ji DNA ya ku kromozoma Y’yê pêk tîne, ji DNA’ya nayê bikaranîn pêk tê. Ev herêma ku ji sedî 95’ê kromozoma Y’yê pêk tîne, di kromozoma X’ê de hevserên xwe heye. Ev jî ji bo Y bi eslê xwe ji X’ê ye weke îspatek tê qebûlkirin. Kromozoma X’ê bi genetîkî dewlemendtir e; li gorî lêkolînên zanistî datînin holê jî ji korîtiya renk, çêbûna masûlke û ji dusedî zêdetir fonksiyonên zîhnî berpirsiyar e. Di vê rewşê de tê fikirîn ku kromozoma X xwedî wan genan e ku fonksiyonên zîhnî bandor dikin û jîrekî, zeka ji dê derbasî zarok dibe.

Yek ji encamên lêkolînên di vê mijarê de gihîştinê jî; kromozoma Y, bi binyadî ji X’ê biçûktir e û ji genên ku X hildigire 2000 û 3000’î kêmtir gen hildigire. Encameke din jî; kromozoma X’ê weke otozomên din gelek gen hildigire, lê kromozoma Y’yê tevî ku di
ser 60 milyonî de nukleotîd di nav xwe de dihewîne jî, li gorî kromozomên din kromozoma ku hejmara genên wê herî kêm e. Lê tê diyarkirin ku geneke li ser Y’yê gelekî girîng e. Ev jî SRY ye. Gena SRY di tayînkirina cinsiyetê de di asta yekemîn de rol digire. Yanê em dikarin bibêjin ku kromozoma Y, weke diyarkera genetîk a taybetiyên karakterîstîk ên mêr rol digire. Bi hestiyariyeke mezin lêkolîn û vedîtinên biyolojî û gelek zanistên derbarê jinê de şopandin û ji bo zanista hebûna jinê veguherandina bingehekî saxlem, ji erkên Jineolojiyê ne.

Sîmone de Beauvoîr dibêje “kes, weke jin nawelide lê dibe jin”. Sîmon de Beauvoîr, bi vê tespîta di pirtûka xwe ya bi sê cildan a bi navê Cinsa Duyem de, boçûn û şekilgirtina tevgera femînîst pir bandor dike. Mirova weke cinsa mê çêbûye, bi demê re çawa tê perwerdekirin û dibe ‘jin’ vedibêje. Di pirtûka xwe de cî dide zanîn û cêribandinên ku îspat dikin; rolên cinsiyetê nexwezayî ne, hatine fêrkirin. Bi vê teoriya xwe, dibe sedem ku têgînên cinsiyeta (seks) xwezayî û ya bi zayînê tê diyarkirin û cinsiyeta civakî (gender) a piştî zayînê bi bandora malbat û civakê şekil digire derkevin holê. Ev tevkariya ku Sîmone kiriye hê jî girîng e. Lê ji aliyê jinan û

tevgerên jinan ve têgihîştinên cuda yên vê tespîtê jî pêş ketin. Di vê derê de ya em ê bi vê tespîtê bigirin dest, jinanî yan jî aliyê pozîtîf ê jinbûnê ye. Yanê bi vîna xwe ya cewherî fêhmkirin û pênasekirina nasnameya jinê ya cinsiyeta jinê ya bi zayînê tê diyarkirin û dixwaze bibe jineke çawa, bi her hêlî ve zanîn û têgihiştina dîroka jinaniyê û li gorî wê karibe biryar bide. Bi zanîn û hizirkirina nasnameyên jinê yên cinsparêziya civakî ava kirî û bi têgihiştina ku ti nasnameya jinê li derveyî civakîbûnê nikare heyî bibe, em ji xwe dipirsin “Mirov çawa dibe jin?” Em jinên bi dehan sal in di Tevgera Azadiya Kurdistanê de têdikoşîn, dizanin ku mirov bi kedeke pir mezin dibe jina azad. Em dizanin heta bi tevahî hêzên desthilatparêz, dewletparêz, mêtinger û bavkanî re têkoşîneke dijwar neyê dayîn jinbûnî nemimkun e. Cêribandinên me yên jiyanê bi me dan hînkirin ku jinanî nasnameyeke civakî ye û jinbûn jî bi pêvajoya pêşketineke civakî mimkun e. Jinanî, pêvajoyeke avakirinê ya civakî ye wê bi jinê û bi pêşengiya wê dest pê bike û bidome. Nasnameya jinê, ji destpêka dîroka civakî ve wiha şekil girtiye. Ya vê şekilgirtinê diyar dike, xwezaya jinê ye, taybetiyên hebûna jinê ne.

Jineolojî, wê taybetiyên erênî yên di nasnameya jinê de, tenê bi çaxê xwedavendîtiyê ya li paşerojê maye negire dest. Enerjiya herikbar a pozîtîf ku bawer dike di xwezaya jinê de heye û taybetiyên din wê bide xuyakirin. Ev, ji rêbazên esas in ên şikandina êrîşa bîrdozî û radestiya li ser jinê ferz dikin. Jineolojî, di pêşxistina vê rêbazê de wê bizanibe ji tevahî zanyarî û jiyankirin û teoriyên hatine hilberandin ên derbarê xwezaya jinê de pozîtîf difikirin feyde bigire. Weke mînak ji zanyariya Rêber Abdullah Öcalan ya ku dibêje “Jin, di xwezayê de parçeya hestiyar a herî dixebite… Her forma madeyê para xwe ya enerjiyê cuda ye. Jixwe ev cudahiya enerjiyê cudahiya form û avahiyên madî diyar dike. Enerjiya di form û madeya jinê de ji enerjiya di madeya mêr de cuda ye. Enerjiya jin hildigire hem zêde ye, hem jî taybetiya enerjiya wê cuda ye. Forma jinê rê li ber vê cudabûnê vedike. Di xwezaya civakî de enerjiya mêr a vediguhere mekanîzmayên desthilatdariyê, bi form û şêweyên madî bi gewde dibe. Şêwe di tevahiya gerdûnê de weke enerjiya cemidî muhafezekar in. Di civakê de serwerbûna mêr, şêweyê desthilatdariyê ye. Di vê rewşê de enerjiya hildigire bi giranî bûye xwedî form. Enerjiya venaguhere formê gelekî kêm e û li cem kêm kesayetan pêk tê. Enerjiya li cem jinê bi giranî nabe form û şêwe nagire. Enerjiya wê di rewşa xwe ya herikînê de dimîne. Di form û qefesa mêr de neyê girtin wê weke enerjiya jiyanê herikîna xwe dewam bike. Jêhatîbûna manedanê, helbestwarîtî û xweşiktiya jinê ya nehatiye cemidandin û hişk-kirin, bi vê rewşa enerjiyê ya giraniya xwe heye, ji nêz ve têkildar e.”, ji pêşbîniya kûr a di fikrên Rosa Luxembûrgê de ku dibêje; ”heta civaka ne kapîtalîst e nebe, kapîtalîzm, komkirina sermayeyê û yekdestîparêzî nabe”, ji biryardariya Zeynep Kinaci ya ku dibêje “Ez dixwazim bibim xwediyê jiyaneke watedar” û fedaîtiya lêgerînê pêk aniye, ji baweriya xwe bixwe ya Mary Daly dibêje; “madeya bisêhr a pêkhatina jinê çêdike, “jinenerjî” yanê enerjiya jinê ye”, ji hêza xwezanînê ya Rabîa Adeviye ya ku dibêje; “xwebûn, xwe ecibandin, peresandina xwe û jixwe re dan perestin, gotina ‘ez Rebê we yê herî mezin im’ jî bi bejna me jinan de neanîne”, ji nêrîna

Margaret Fuller a dibêje; “Sehekên jinan bileztir û hîn rast in. Bi giştî em dibînin jinên normal çawa bi van hemûyan pêdihesin, didin ber hev, têdigihîjin û tesewir dikin. Mêrên pir biaqil, li beramberî guherînên derdora xwe bi tevahî gêj bibin û girêdanên şêwazê jiyana li derdora wan bi hev ve girê didin nikarin ferq bikin.”, ji bangewaziya Varîs Darî ya tundiya herî bêrehm û dijwar a li ser bedena jinê; suneta jinê bûye; “ji bo qenciya me hemûyan, werin em maneya jinbûniyê biguherînin.”, ji hêviya Sema Yuce ya ku dibêje, “jin wê ji ariya xwe ji nû ve çêbibin û derkevin”…

Jineolojî, li ser ontolojiya jinê ya tevgera Azadiya Jinê ya KURDİSTANê ku di nav şert û mercên şer ê giran ê nêzî çil salan de û li deverên cuda yên têkoşîna azadiya civakî ya bi ser hev de hatiye, bi cêribandinên pir dewlemend û cur be cur ên kom kirine û bi çavdêrî û daneyên piralî derketine holê jî wê lêhûrbûnê bike. Derbarê vê mijarê de bi zanîn û daneheveke xwe naspêre teoriyên baviksalarî, dewletparêz,

zanistperest, pozîtîvîs û ezberên oldar û razber wê lêkolîn bike. Danehevên muazem ên dîroka me ya jinaniyê, wê hewl bide bi danehev û cêribandina xwe ya resen bibîne. Cêribandina xwe ya resen jî bi vê daneheva dîrokî ya muazem bixwîne û hê bi kûranî wate bidê. Bi taybetî weke hebûn jin çi ye? Hebûna jinê çawa hatiye şekilkirin? Kîjan awayên fikirînê bandoreke çawa li jinê kirine? Tevgera me xwedî şansekî wisa ye di pêvajo û kêliyên dijwar ên têkoşînê de çavderiya van pirsan û gelek pirsen din jî kiriye. Di vî warî de rêbaza dahûrandina kesayetê ya bi salan in em pêk tînin, li ser hebûn, nasname û xwezaya jinê, dîsa li ser nasname, hebûn û xwezaya mêr, rastiyek e ku daneyên bihêz, xurt û lêhûrbûneke girîng jî afirandiye. Ji sala 1987'an û vir ve, di serî de li rastiya Kurdistan û Rojhilata Navîn, derbarê hemû jinan de kulliyateke gelekî grîng a Rêber Abdullah Öcalan heye. Divê kulliyatê de dahûrandinên jinê yên pir girîng hene. Ev, bi qasî keda pir mezin a Rêberekî ye ku dibêje; "Min dixwest hem mêr hem jî bi taybetî jinê bi hebûna wê ya mirovahî ya rastîn û azadkirina wê re bidim nasîn." Û him jî xezîneyeke mezin a me jinan e jî. Li hemberî pirsên 'Bi jinê re çawa tê jiyankirin?" û "Bi jinê re çawa nayê jiyankirin?" ceribandinên gelekî grîng di hindirê xwe de dihewîne. Di van cêribandin û dahûrandinan de; di têkoşînê de cêribandina jinê, di şoreşên dinyayê de rewşa jinan, jin û mêrên di civakîbûna kurd de çêbûne, têkiliya jin û mêr, malbatê û hema bêje tîpolojiya jin û mêr a her herêmê girtiye dest. Jin û mêrên dahûrandina wan kiriye, di xebatên rêxistinkirina gel de, di artêşê de, di gund û bajaran de, di qadên çand, çapemenî, huner, dîplomasî û aboriyê de ezmûn kiriye. Daneyên ji van ezmûnan derketine dîsa di ber çav re derbas kiriye, dahûrandinên xwe yên sosyolojîk li ser vî esasî pêş xistiye. Di her mêr û jinê de nakokî û şekilgirtinên esas qefaltiye, dîtiye, li wan qadên ku wê van nakokiyên xwe bixwe ferq bikin û çareser bikin bi cî kiriye. Serfirazî û neserketinên wan ên li ser vî esasî, bi qasî diyalogên takekesî, bi nirxandinên kolektîf jî civakî kiriye.

Rêber Abdullah Öcalan bi palpiştiya ev qas cêribandin û analîzan, dibêje; *"Di dinyayê de tu kes nikare ji min baştir sosyolojiya jinê bike. Divê mirov jinê bihêz bike. Tevî ku ez xwedayîtiya jinê balkêş û rakêşer dibînim, ez di ferqê de me ku ev kar lehengiyek dixwaze û bûyereke pêkanîna wê zehmet e. Lê temenekî hîn aştiyane, xweşik, hestyar, her wiha hêjayî jiyankirinê, heta xwe nespêre azadiya jinê, hêza wê ya ku vê mimkun dike, ez bawer nakim were jiyankirin."* Ya ku Rêber Abdullah Öcalan ji gelek fîlozof, ji serokên şoreşger, sosyolog, mirovên zanyarên din ên mêr cuda dike, yekîtiya jiyan û teoriya wî ye, bi awayekî palpiştiya hev kirine. Ji ber vê sedemê, em jinên di şoreşa Azadiya Kurdistanê de cî digirin, keda hevpar a xwe dispêre kuliyata dahûrandinan a Rêber Abdullah Öcalan yê Jineolojiyê ji bo me pêşniyar kir û jin û mêrên şoreşger ên di têkoşîna azadiyê de cî digirin û cêribandinên hatine jiyîn, di pêşxistina zanista hebûna jinê û arkeolojiya jinê de, weke çavkaniyeke bingehîn digirin dest.

Jineolojî, ji van danehev û çavkaniyan derdikeve rê, dikare derbarê ontolojiya jinê de xebatên girîng bike û bi tevgerên jinê û tevahî jinên civakê re parve bike. Aqil, hest, beden, his a jinê û taybetmendî û dinyaya wê ya di gelek qadan de, bi zanistî digire dest û bi vî hawî digihîje îfadeya çavkaniyê ku hêza hebûna jinê xwe dispêrê. Di vê mijarê de şopandina daneyên ku zanistên civakî datînin holê û van daneyan bi zanista jinê destgirtin, di avakirina nasnameya jina azad de nirxandin girîng e.

"*Di jinê de pênasekirina diyalektîka xwezayî ya hebûnê, ji beralîkirina dualîzma paradîgmaya serdest a hişk û kujer pêwîst dike.*Cewhera diyalektîkê ya pozîtîf û avaker em dikarin bejin ku herî zede di hebûna jinê de dikare bê pênasekirin."**(94)** Jineolojî, di vî warî de nîqaşên xwe, bi zanebûna xwezaya jin û mêr xwezayên ji hev cuda ne dike. Dîroka me ya biyolojîk û sosyolojîk wiha şekil daye vê. Pêwîst e mirov van cudahiyan analîz bike û di nav diyalektîka xwezayî ya hebûnê de binirxîne. Di navbera jin û mêr de ti cudahiyeke ji vana, ji bo têkiliya xwe dispêre serweriyê bingeh ava nake. Yek li ser a/ê din serdest nake. Curbecuriya xwezayê, ya ku weke potansiyela azadiyê pêş dixe mê ye; di roja me ya îro de jî jin, pêwistiya ku vê cudahiyê, li ser bingehê azadiyê hizir bike, pênase bike dibîne. Em divê jinaniyê jî

mêraniyê jî weke diyardeyên hatine avakirin bikaribin bixwînin. Lê di heman demê de weke xweza û nasnameyên di destpêka civakîbûnê de hebûne û hevdu temam kirine, tevahî kirine û dewlemend kirine lê serwext bibin. Felaketa îro tê jiyankirin, dijberî hev kirin û biyanîkirin, xwezayên jin û mêr, di dîroka civakî de bi mudaxeleyên bîrdozî û zorê yên berfireh hatine pêkanîn. Elîsabeth Badînter di pirtûka xwe ya bi navê 'Yek a Din e' de, vê rastiyê wiha şîrove dike: "Mîtosa androjîntiyê (rewşa hem mê û hem nêrbûnê) a Arîstofanes vê yekê pir xweş vedibêje: Mirovahî di despêka xwe de, ji coteke ji bo di nav hev de dihele, tevahîbûna herî xweşik a bê bîra mirov ava dikir, pêk dihat. Ev yekparebûn wisa bi hêz, wisa xweşik bû ku, xwedayên hesûd, tehemûl nekirin û di nîvî de kirin du parçeyên wekhev û par ve kirin. Ji wê çaxê şûnde, yekane daxwaziya jin û mêrên ji hevdu cuda ketin ewe ku jinûve bigihên hev û di nav hev de bihelin. Weke du cins ji hev veqetîn, ne fikra hevpariyê, ne jî xwestina ya/ê din û hezkirina wê/î red dike. Maf û taybetiyên yekê ji yê din cuda bin, yek bikaribe tiştên ê din nikare, bike, ne dijbertî ye, divê weke danûstendineke beramberî hev a nirxa yekê/î li gor a/ê din bandor nake, bê dîtin. Mîtosa Androjîntî tîne bîra mirovan; dema bibin yek wê bigihên yekparebûnê, yek ji ya/ê din dûr, cuda bikeve, wê her yek birîndar û bêkêr bimîne. Lê çi feyde, ev ders, ji aliyê bîrdoziya bavkanî ya di şûna 'sîmetrî'ya di nav cinsan de, bi cîh kirina asîmetriyeke mûtleq ve nehatiye fêmkirin. Dibe ku bîrdoziya baviksalarî, bi giraniya fikara hêza xwe bi cî bike, her wiha nabîne ku tovên mirina xwe jî davêje, nikaribû bi awayekî din rabe."

Ev rastiya ku Badînter şîrove dike, di gelek mîtolojiyan de bi awayên cuda cî digire. Heta di hin şîroveyên pirtûkên pîroz de; "Kîngê tîpên navên Adem hatin daxistin' jin û mêr di nav yekparebûneke tam de, bi hev re bûn. Heta ku xweda wî xiste nav xeweka giran. Adem, li cihê Perestgeha jêr radiza. Û Xwedayê mezin ê pîroz, a mê ji wî veqetand."**(95)** Li gor van gotinan; hermafrodît, bihevrebûna Adem û Lîlîth, awayê destpêkê yê mirovahiyê ye. Şîroveya Lîlîth nîvê din ê Adem e tê kirin. Dîsa di mîtolojiyê de gelek xwedayên bereketê yên kozmîk hermafrodît in, yan jî salekê mê, salek jî nêr in. Gelek xwedayên nebatan (mînak; Attîs, Adonîs, Dîonsos, Nana-Buluku, Mawu-Lisa) û Xwedavendên Mezin (mîna Kîbele) bi cot cinsiyetan in. Li gorî gelek baweriyan, forma hebûna destpêkê ya mirov, hermafrodît e. Û guherînên mîtolojîk ên piştre, behsa "cotên seretayî" dikin. Ev forma sereta, di gelek fikir û baweriyan de, weke şertê bûna mirova/ê tekûz tê pejirandin. Aliyê di van şîroveyan de balê dikşîne, bi gelemperî cot cinsiyetiya xwedayên nebatan e. Yanê di bedenekê de hebûna her du cinsan. Di beridandina gerdûnê de jî ev wiha ye. Di mîtolojiyan de jî ku yekem formê fikirînê yên mirov e normal e wiha xuya bike.

Peyama esas divê em ji van mîtolojiyan derxin ewe ku, pêwîst e her du cins bibin temamkerên hev. *"Li gorî ku jiyaneke bê jin nabe (bêyî mêr jî jiyan dibe lê wê çaxê dibe jiyaneke bi koletî), rizgarkirina jiyanê rizgarkirina jinê mecbûr dike. Şoreşeke jinê ya bi kok, bêyî pêkanîna gûherankariya zîhnîyet û jiyana mêr, rizgariya jiyanê ne mûmkin e. Ji ber ku bêyî rizgariya jinê ku hêmanê esas ê jiyanê ye, jiyan her tim wê mîna serabekê bê jiyankirin. Heta ku mêr bi jiyanê re û jiyan jî bi jinê re li hev neye, şadî wê tene xeyaleka vala be.* " Ev, divêtiyeke diyalektîka pêşketina gerdûnê ye û ev tespîta Rêber Abdullah Öcalan vê divêtiyê pir balkêş datîne holê. Di mîtolojiyan de hesûdiya xwedayên hesûd, ji vê zindiya/ê hermafrodît, dema ku mirov bi îdeolojîk lê binihêre, ya rastî rast e. Heke jin û mêr wê hevdu temam bikin û bi awayekî yekpare bijîn, wê hêzeke xwedayî derxînin holê. Yan jî li hember vê hêzê wê xweda jî hesûd bibin. Em dikarin bibêjin Rêber Abdullah Öcalan jî xwezaya jin û mêr li ser vî esasî digire dest. Vê yekê di nirxandina xwe de wiha îfade dike: *"Min her tim hûrûkûr manedarkirina jiyanê ya du cotên herî harîqa (bi qasî tê zanîn) yên di gerdûnê de his kiribû. Min cesaret kir ku berê bi jinê re bifikirim û li pêşiya hemû têkiliyên xwe, li ku, kîngê û çiqas xirabî hebin, pêre guftûgo bikim û ji holê rakim. Bi tenê jina bihêz, difikire, qenc, bedew û rast biryarê dide, bi vî awayî jî wexta ji min dibihure min heyranî xwe dike û dikare bibe muxatabê min, bêguman di gera min a felsefî de kevirê çarqozî ye ango serê quncikê ye. Min timî bawer kir ku razên jiyanê yên di vê gerdûnê de diherikin herî baş, bedew û rast wê bi vê jinê re manedar bibin.*"

Şaristaniya desthilatparêz, tam jî ji bo “herikîna jiyanê ya di gerdûnê de” qut bike û xweza jî têde li ser hemû zindiyan serwer bibe û kedxwariyê bike, bi hezaran sal kendalên mezin di navbera jin û mêr de ava kir û biyanîbûnê kûr û berfireh kir. Dîsa kendalên mezin xist nav mirov û xwezaya yekemîn. Jixwe fikra jin û mêr hevdu temam dikin, ya rastî xwe dispêre fikra mirov û xweza hevdu temam dikin. Îdeolojiya baviksalarî, dijminahî û cudakirinê di navbera jin û mêr, mirov û xweza-gerdûnê de afirandiye. Dîroka vê rewşê, mijareke ku ji hêla têkoşerên jin û mêr ên têkoşîna azadiyê dimeşînin ve divê taybet bê destgirtin û lêkolînkirin. Di dîroka çêbûna heyîna jinê de û di gihîştina nasnameyên jinê yên roja me ya îro de aşkera ye ku faktoreke pir girîng e. Mîtolojî, ol, felsefe û zanist, tenê bi biçûkkirina jinê cinsperestiya civakî û baviksalariyê neafirandine. Mêr jî ji rastiya xwezayî, civakî û daxwaza azadiyê qut kiriye, bi qasî kesayeta xwe bide windakirin ji desthilatiyê pay û bertîl dayê. Ev rastî despêkê di mîtolojiyan de tê dîtin. Di mîtolojiyan de rastiya xweda û xwedavendên bi mirovan re di têkiliyan de ne, di mîtolojiya Sumer de diguhere; êdî xweda mirovan ji pîsiya xwe diafirîne. Xwedayên xwe ji asîman, ronî, av, heyv, roj, agir û hewayê diafirînin; ji pîsiya xwe afirandina mirovan fikarê nakin.Di olên yekxwedayî de ev awayê afirandinê, vediguhere afirandina ji ritamê. Di vê afirandinê de jî dîsa hiyerarşiyek tê pêşxistin. Mêr ji ritamê, jin ji parsûya xwar a mêr tê afirandin. Ya rastî di nav bera jin û mêr de cudahiya afirandinê, ji hin mîtolojiyan û olên yekxwedayî dest pê dike. Bi vî hawî dema ku mêr dengê xwe ji vê cudahiya afirandinê re dernaxe, dibe hevparê sûcê hêzên desthilatiyê. Carekê bi cinsê serdest û avantajên wê tamijiye. Hem jî piştî baweriya dayîka xwedavend a pir dirêj dewam kiriye. Gav bi gav mêr dikin hevkarekî saxlem ê xwedayan. Xelata li hemberî vê jî li ser jinê xwedatî kirine. Ev awayê têkiliyê, heta roja me ya îro jî bê guherîn tê. Lê di serdema 2 hezar salî ya ku jin û mêr tê de di hevsengiyekê de bûn, xwedayên jin û mêr her tim weke cot dihatin bibîr anîn. Ew cot temamkerê hev in, zewacên pîroz dikin û dema digihên hev bihar û kêfxweşiyê tînin dinyayê. Mîna karakterên Astarte û Baal, Îştar û Dumuzî, Hepat û Hepate, Kîbele û Attîs, Îsîs û Osîrîs, Afrodît û Adonîs. Piştre ev jî xera dibe. Dîsa di mîtolojiyê de kesayeta Prometheus balkêş e. Him ji ber ku agir ji xwedayan diziye û diyarî mirovan kiriye, him jî ji bo diyarî û bertîlên Xwedayan nepejirandiye. Di vê mijarê de şiyarî dide birayê xwe jî; “Xweda çi diyarî bidin te bila bidin , nebî tu qebûl bikî!”

Dema em têkiliyên jin û mêr, bi taybetî ji aliyê hebûna jinê ve pênase dikin, em dikarin van karekteran esas bigirin. Em dikarin Prometheus û xwedayên ku xwedavendê temam dikin, bi wê re di nav yekparebûnekê de gelek feydeyan didin civakê, bi berfirehî lêkolîn bikin. Ji bo perwerdekirin, guherandin û veguherandina mêr, em dikarin cêribandinên dîroka jinê analîz bikin. Dîsa ev mêraniya ku hatiye avakirin him li ser mêr û him jî li ser jinê çi texrîbatan çêkirine divê em lêkolîn bikin û pêvajoya avakirina her du cinsan a hebûna xwe ya cewherî pêş bixin. Ev hemû qadên berpirsiyariyê û hedefên Jineolojiyê ne. *“ Di navbera jin û mêr de xwedayetiya ku divê hebe,pêwiste bê fêmkirinê . Ji xwedayîtiyê qesta me, çîroka gerdûnî ya mirov a (li gor daneyên zanistî) bîst milyar salan, hêza watedariyê ye ku di jîrekiya mirov a hestiyar û analîtîk de xwe ferq dike, heyecaneke mezin dide. Xwezaya dikeve ferqa xwe ye. Jin ji mêr zêdetir di zayîneke nêzî vê de ye. Daneyên zanistî vê nîşan didin. Wexta ez dibêjim jin gerdûnî û xwedayî ye qesta min ev wate ye. Ev wateya carna di dinyaya huner, siyaset, zanist û şoreşan de xwe dide hiskirin, dema di têkiliyên jin û mêr de xuya dibe, mirov dikare behsa xwedayîtiya têkiliyê bike. Pêwîst e wisa be. Olan, vê rewşê ferq kirine. Lê ji ber ku nasnameyên civakî û bîrdozi yên wan bi giraniya mêr in, dema jinê li derve hiştine, ya rastî zirareke mezin dane vê xwedayîtiya îdîa dikin jî. Hewldana me, di navbera her du cinsan de, bi awayekî hevseng, demokratîk, azad û wekhevîxwaz vê xwedayîtiyê derxistina holê ye.*” Di bingeha van tespîtên Rêber Abdullah Öcalan de, erka Jineolojiyê, bê ev “xwedayîtî” kîngê û bi kîjan rêbazan hatiye hilweşandin û wê çawa jinûve bê avakirin, pêşxistina lêgerîn, lêkolîn û hewldanan e. Van hewldanan bi hêza maneyê, bi nêzikahiya bi

ji zen-dîn yanê ji peyva li ser ola jinê bûnê tê. Pergala baviksalarî li ser ola jinê bûyînê zindiqî yanê jirêderketin, dibîne. Di vê pergalê de yekparebûna jin û mêr avakirin erkeke şoreşger e ku wêrekiya herî mezin hewce dike. Lê beriya her tiştî, divêtiya mirovê tekûz an jî temambûyî ye. Jin û mêrên ku wê vê wêrekiyê nîşan bidin, divê xwe bigihînin hêza zîhnî ya muazem û enerjiya jiyanê. Lê beriya her tiştî divê mirov ji dil bi vê bawer be û di vê rêgehê de xwedî helwesteke hevgirtî be. Ji bo hebûna jinê baş were pênasekirin, bi xurtî pejirandin û jiyanîkirina vê mijarê jiyanî ye.

Weke Rêber Abdullah Öcalan di nirxandina xwe de diyar dike: “*Dad, azadî û wekhevî di xwezaya jinê de pêşketinên bûyerî ne ku pir berfireh tên jiyîn. Ya rasttir, cewhera civakîbûna jinê, li ser dad, azadî û wekheviyê ye. Dîsa heta bibêjî aştîxwaz e. Bi tevahî di ferqê de ye ku jiyaneke watedar, tenê bi van têgînên bingehîn pêş bikeve. Di têgîna bedewiyê de jî hestiyar û raser e. Di hilbijartinên xwe de şer û pêkutiyê, newekheviyê ferz bike, dîsa dijberî xwezaya wê û şêwazê civakîkirina wê ye. Fêmkirina tevahiya van xisûsan, girêdayî derfetên bi awayekî azadî bi liv û tevgera jinê ve girêdayî ye. Bikaribe çiqas azad tevbigere wê ew qas tercîhên bedew, adil û wekhev pêş bixe. Her wiha di civakê de jiyanîkirina têgînên xweşikî, dad û wekheviyê başebaş di azadkirina jinê re derbas dibe.*” Xwezaya jinê, tenê di derdoreke azad a civakî de derdikeve holê, lê azadiya civakî jî bi azadbûna jinê pêş dikeve. Ev têkiliya diyalektîk, ji bo fêhmkirin, pênasekirin û derbaskirina pirsgirêkên hebûna jinê de bi rola kilîlê radibe. Nasnameya jinê, weke di serdema xwedavenda dayîk de, bi civakî ava dibe. Jin, bi taybetiyên xwe yên pir xurt, civakîbûna xwe pêş dixe. Pergala mêrê serdest a pênc hezar salan, di her qad û kêliyên jiyanê de, hebûna jinê bi sîstematîka venêrîneke pir hûrûkûr, kolekirin û mêtingeriyê ve ev qas girê dabe, ji ber vê girêdana xurt a di navbera jin û civakîbûnê de ye. Ev girêdan, karakterê bingehîn ê rêwîtiya me ya xwebûnê ava dike, em bi vê zanebûnê divê bikaribin pêş bikevin. Li ser vî esasî, yek ji rêgezên Jineolojî ewe ku di pêşxistina bingeha azadiya hebûna jinê de, ew taybetiyên xwedavenda dayîk ên xurt ku hatine belavkirin û dixwazin tune bikin, di nasnameya jinê de jinûve sentezkirin e. Ji bo em bikaribin di têkoşîna azadiya jinê de bi israr û biryar pêş bikevin, nasnameyên jinê yên di tevahiya dîrokê de bi taybetiyên cuda pêş ketine û taybetiyên bedew, di kesayetên xwe de sentez bikin. Her wiha em dikarin senteza jineke hemû erdemên xwedavendîtiyê, safîtiya melek û ezîzeyan a qirêjiyên vê dinyayê negirtine, azwerî û xweşikiya Afrodîtê, di nasnameya xwe de bînin ba hev û pêş bixin. Em dikarin gelek taybetiyên jinê yên dîrokî û xurt li vê sentezê zêde bikin û dewlemend bikin. Li dijî mulkkirin, metakirin yan jî qetilkirina li ser nasnameya jinê hatiye ferzkirin, têkoşîn jî pêwîst e. Em dikarin ruh û feraseta wan çaxên ku tê de nasnameya jinê esîl, serhildêr, azad û hêza çareseriyê bûye, di rastiya xwe ya civakî de rojane bikin. Rêber Abdullah Öcalan, ji aliyê nasnameya xwedavendê ve, vê rojanekirinê wiha pênase dike: “*Xwedavend, jina ku li gerdûnîbûna xwe serwext e, di hevsenga hêza demokratîk de tam li cihê xwe rûdine, azad e û wekheviyê di têkiliyên xwe yên civakî de dimeşîne îfade dike. Aşkera ye ku wê mêr newêribe vê jinê bike pîrek û li ser wê serdestiyê bike, wê tenê bikaribe hezkirin û hurmeta xwe nîşan bide, bi darê zorê ji wê hêviya hezkirin, hurmet, hele têkiliya cinsparêz wê neke.*” Hemû taybetiyên bedew, aliyên xurt ên di tevahiya dîroka jinaniyê de ava kirî em zindî bikin em dikarin vê sekna jinê nîşan bidin. Em dikarin nirxên xwe yên erênî, xurt û azadîxwaz ên di dîroka me ya hezar salan de me dîtiye kom bikin.

Yek bi yek ew mafên me yên ji dest me çûyî û taybetiyên xwe, em ê bi arkeolojiya jinê ya di kavilên rabirdûya me de ji nû ve keşif bikin û bi dest bixin. Em ê nasnameya jinê, bi gelek nirxên xurt ên jinê û erdeman ji nû ve sentez bikin. Ne bi feraseta bedewiya modernîteya kapîtalîst bi me daye qezenckirin, li gor daxwazî û pêwîstiyên xwe em ê şekil bidin hebûna xwe. Hebûneke jinê ya li ser vê esasê bê afirandin, wê çanda mêrê serdest jî ji hevde bixe û bike ku mêr li hember jinê hîn bi hezkirin û hurmet nêzik bibe. Bi qasî pênasekirina hebûna jinê, afirandina wê jî wê şekil bide jiyana civakî û xwezayê, em vê dikarin careke din wiha bicêribînin. Wê ev, avahiya civakî ya ji gelek aliyan ve bi erozyonê re rû bi rû maye jî saz bike û baştir

bike. Em dikarin çanda li ser jinê ya dike kole wiha derbas bikin.

Berê jin ti carî muhtacî mêr nebûne û pêve girêdayî nemane. Îro di dinayayê de bi milyonan jin, bêyî destûra bavê xwe an jî hevserê xwe, nikarin bi serê xwe derkevin rêwîtiyekê. Jin berê derbarê beden, civakîbûn, zarokên xwe û bi tevahî jiyana xwe de xwedî gotin û bi vîn bûn. Îro piraniya jinan van mafên xwe û hêza vîna xwe winda kirine.

Zanîneke bingehîn a biyolojiye ye, bedena mêr, ne xwedî taybetiya zayînê ye. Enerjiya mê ya gerdûnê û nasnameya jinê ye ku ev enerjî di însên de şênber bûye, çi bedenî, çi jî zîhnî hilberîner e. Tu nasnameyeke jinê, ji bo hebûna xwe muhtacî aqil, mêjî û bedena mêr nîne. Hebûna jinê ya ku hatiye berbendîkirin û bi bêhêzkirinê jinê kirine koleya mêr û pergalê divê bê beralîkirin. Bi vê beralîkirinê ji bo weke hebûneke azad jinaniyê divê em Xwebûnê bi ser bixin. Ev mijareke etîkê ye. Em ê bêjin ‘ Ez, ez im’ Yanê em ê bibin ya xwe, yanê Xwebûn! Ji bo mirov bikaribe li dijî ferzkirina feraseta çandî ya li ser jinê ya ku dibêje ‘tu yê bibî milkê mûtleq’, pêşxistina berxwedan û têkoşîna bingehîn û ji pirsgirêkên hebûnê yên bi krîz re çareser bûyîn, bi Xwebûnê mimkun e. Di her kêliya jiyanê de vê têgînê, wate û pêwîstiyên wê bi bîr anîn, hêza tevgera serbixwe, bi baweriya cewherî û wêrek pêşxistin, ji wan gavan in divê em destpêkê bavêjin.

Ji bo berdewamiya van gavan, yek ji seknên em ê analîz bikin û rexne lê bigirin jî jinên xwezilahiya xwe bi mêr tînin û dişibin wî. Ev jin, ji bo xwezaya jinê, herî kêm bi qasî mêrê serdest tehdîtek e. Redkirina rola cinsparêziya civakî, li ser navê vîn û fikra azad, jina ku cinsparêziyê berevajî pêk tîne nayê qebûlkirin. Li ser navê azadiya takekesî jî nabe rewşeke ku divê were parastin. Ji ber ku nasname û seknek bibe hebûna jinê; divê ji dubendiya serdest û bindest derbas bike. Ji ber ku ev dubendî dijberî xwezaya civakî ye. Dijraberî rêgezên azadî, mirovbûnê, civakeke exlaqî û polîtîk û demokrasiyê ye. Jinanî, nabe ku tenê mîna bûyereke fizîkî were destgirtin. Jineka ku bi bedenî mê, lê bi ruh, çand û fikrî nêr be, ev tê wateya lûtkeya biyanîbûnê. Jina ku biyanîbûna ji xwe re weke nasname bijî û biparêze jî feydeyeke wê ji civakîbûna wê re nabe. Li gor vê feraseta bingehîn, Jinelojî, mêranîbûna jinê, şibandina wê ya mêr, redkirina wê ya xwezaya jinê red dike.

Li dijî pêkhateyên fikrên desthilatparêz ên baviksalariyê, bi pêşxistina “*zîhniyeta xwezayî ya azadîxwaz a jinê*”**(96)**, em dikarin di qada îdeolojîk û polîtîk de şoreşên jinê pêk bînin. Li ser esasên hebûn û nasnameyeke jinê ya em ê tekûz pêş bixin, em dikarin Peymana xwe ya Civakî ava bikin. Ev peyman, di heman demê de em civakeke çawa dixwazin, di jiyana civakî de pergala aboriyeke çawa, bi xwezayê re têkiliyeke çawa, di mijara malbat û zarokan de em çi dixwazin, di parvekirin û têkiliyên bi mêr re pîvan û rêgezên em dixwazin bidin rûniştandin çi ne, di çarçoveyekê de datîne holê. Her ku me hebûna xwe bi palpiştên saxlem pêş xist ku bi vî hawî em ê civaka xwe jî xurt bikin, em ê vê peymanê ji nîqaşa beşên civakê re jî vekin. Ev peyman wê bibe peymaneke ku li dijî kuştinên jinan, suneta jinê, tecawiz, xizaniya li ser jinan, bêkarî, zilma aborî ya weke hêza kar a erzan şênber dibe, malbat, hiqûq û hwd. hemûyan re têkoşîn bikin, wê eyankirina vîna me be.

Dîsa em dikarin pergala xwe ya konfederal, komunên xwe, pêwîstî hebe gund û bajarên jinê, li van mekanên jiyanê, em pêşbîniya pergaleke çawa dibînin, bi awayekî kolektîf nîqaş bikin. Ji bo hebûna me şertê yekemîn civakîbûn e. Civakîbûn tune be nasname û hebûnên jinê jî tune ne. Ev qas lêgerîn û nirxandinên me yên li ser hebûna jinê, tenê di nav civakîbûnê de watedar e. Ji ber vê yekê, her nîqaşa li ser nasname û hebûna me, em ê bi jiyana civakî re çawa têkildar bikin, em ê destkeftiyên xwe, encamên em gihanê çawa kolektîf bikin û li ser van hemûyan pergala civakeke çawa ava bikin; mijareke bi pirsgirêkên hebûna jinê û çareseriyên wê ve girêdayî ye. Bi vê zanebûnê destgirtin û nîqaşkirin, wê bibe yek ji faktorên bingehîn ê di rêwîtiya em derketinê de me pêş ve bibe.

Em dikarin di Peymana me ya Civakî de, derbarê mêr de jî şertên xwe bi cîh bikin; di mijarên “bi jinê re jiyaneke bi dewlemendî çawa dibe, çawa dikare hevpar

bersivên wan bixwazin. Dîsa jin jî mêrekî çawa dixwaze, bi mêr re dikare çawa jiyaneke hevpar bijî , di siyaset, jiyana civakî û hunerê de dikare çi bike? Derbarê van mijaran de dikare çarçoveyekê diyar bike. Dikare cî bide pêwistî û wateya “berdana heta bi hetayî” a ji mêr û  ji bo mêr û jinê jî, “berdana heta bi hetayî” ya ji desthilatiyê. Li ser esasê vê peymanê Jineolojî; bi nasnameyên jin û mêr ên li gor sekna desthilatparêz a mêr hatine avakirin re bi paradîgmaya zanistî û hêza fikrî ya moderníteya demokratîk têdikoşe. Bi lêkolîn û analîzan xurt dinirxîne bê ev nasname, afirandinên aqlê baviksalarî û dewletparêz in û xwezaya civakî texrîb dikin. Ji bo jinê ji eniya Zeûs heyîbûna Atheneyê, yanê ji mêjiyê mêr afirandin kêmxistineke. Versiyona çîroka Hewaya ji parsûyê xwar a Adem hatiye afirandin a Yewnan e. Zeûsbûn jî ji bo mêr kêmxistinek e. Ew jî versiyona Ademê ku ji parsûyê wî jin hatiye afirandin e. Mêrek çawa dikare bi jineke ji parsûyî wî hatiye afirandin re bijî? Ger em li roja me bînin, mêrek, bi kopyaya xwe, bi jina şibiyaye mêr re çawa dikare bijî?

Pergala bi desthilatiya mêr, mîtolojî, ol, felsefe û zanistê jî bi kar tînin û di jiyana civakî de nasnameya jinê ya diyarker e berevajî dikin. Me dît ku jinê weke ji mêr çêbûye û bedena jinê ji ya mêr kêmtir e nîşan dide. Lê tevahî daneyên zanistî ji zûve îspat kirine ku nasnameya mê destpêkê pêş ketiye û mêr ji bedena jinê çêbûye. Tevî vê, înada aqlê mêrê serdest ê bipêşdarazî di neguherandina mijara jinê û baweriyên bêbinî de,  bi tevahî bi sekna bîrdozîyê ve girêdayî ye. Muhafezakariya tirsa windakirina desthilatiya xwe ye. Jineolojî, bi gelek awayan, bi felsefî, hunerî, edebî û hwd. bi vê muhafezekariyê re wê têbikoşe. Ji bo ev helwesta îdeolojîk ya aqlê mêr ê desthilatdar hilweşîne û di ser pejirandinên rast, adil û exlaqî re xwezaya jinê pênase bike wê bixebite. Spartekên wê yên bingehîn; nasnameyên jinan ên di pratîkên xwe yên jiyanî de datînin holê, daneheva zanîna li ser ontolojiya jinê hatiye pêşxistin û wê lêgerîna azadîxwaz a derbarê hebûna jinê de be.

Bi seknên mêr ên li pêşiya hebûna jinê ya azad, bi zanebûn an jî bi şekilgirtina çandî dibe asteng re têkoşîneke bi awayekî çalak, zane û her timî esas e. Heke mêrek, ji xurtbûna jinê xweşbîn nabe, tercîh bike nasnameya jina kole dewam bike û ew bixwe jî weke serdest bimîne, ev li ser hebûna me xetereyek e. Berxwedana zîhniyeta mêre ku naguhere. Dîsa mêrek di gotinê de azadîxwaz lê di jiyanê de serdest be, ev jî xerakirina nirxên azadiyê ye. Mijareke divê were analîzkirin û li hemberê helwest bê girtin. Eger mêrek, bi qurnaziya mêr a hezaran sal jinê bixapîne û her tim reng biguherîne, ev xala herî binî ya bêqîmetiyê ye. Li hember vê rewşê jin, dikarin helwest bigirin, pêwîst bike çalakî li dar bixin. Mêrek, eger li hember azadiya jinê bi hurmet û hezkirin be lê nezan be têkiliya vê jî ne bi azadiyê re, ne estetîk û ne jî bi etîkê re heye. Pirsgirêka perwerdeyeke berfireh heye. Lê mêrê bi azadiya jin û mêr re eleqedar, dixwaze dubendiya kole û serdest derbas bike, di vê mijarê de ji bo xwe perwerde bike hewl bide, di rêya rêhevaltiya jinê de ye. Dikare hevpar tevbigere û mirov dikare piştgiriyê bidê. Mirov dikare van mînakan zêde bike. Pîvan û rêgezên di vê mijarê de jî dikare di peymana civakî ya jinê de cî bigire. Ya girîng, pirsgirêkên ku mêr dijîn û bi awayên nerasterast an jî dîrek bi me didin jiyankirin, seknên wan, ji pirsgirêkên me yên hebûnê cuda, serbixwe û dûr destnegirtina me ye. Hestiyariya me ya di vê mijarê de, li gor xweseriya pirsgirêkan dikare biguhere, lê divê biryardariya me kêm nebe. Beralîkirina mêrê ku pergala baviksalarî û bîrdoziyê şekil danê zehmet e. Lê heke jin di vê mijarê de bikaribe hîn perwerdekar û veguherîner be, ev ne ew zehmetiyeke ku beralî nebe.

Yek ji rêbazên bingehîn ê derbaskirina vê zehmetiyê jî ewe ku mirov xweza û ontolojiya mêr bigire bin lêkolîn û vekolînê. Ev mijar ew mijareke ku pêşî divê mêr li ser bisekinin û di lêgerîna azadiyê û bergeha hevjiyana azad de parvebikin. Lê di têgihîştina mêr de derbarê zanebûna pirsgirêka wî ya azadiyê de, pirsgirêk û zehmetiyên cidî hene. Ev pirsgirêk  jî ji dîroka mêraniya îro ya ku hebûna wî di navbera koletî û desthilatiyê de parçe bûye û dirindetiyê dijî qut û serbixwe nîne. Her jina ku di lêgerîna azadiyê de ye, herî kêm bi qasî ku derbarê xwezaya jinê, pirsgirêkên wê yên ontolojîk û rastiya wê de zana dibe, divê derbarê xwezaya mêr û ontolojiya wî, pirsgirêkên wî û hebûna mêrê azad de jî lêkolîn û lêhûrbûn bike, li ser

esasên guherîn û veguherînê têkoşer be. Di vê mijarê de jî Jineolojî hewl dide bigihê nîqaş, lêgerîn û hewldanên jin û mêr ên him li tevahiya dinyayê û bi wan re hevpariyê bike, him jî cêribandina xwe, encam û daneyên derketine bi wan re parve dike. Xwezaya mêr, pirsgirêkên wî yên hebûnê û mijara rêgezên çêbûna hebûna mêrê azad ku di bergeha vê pirtûkê de, di nav mijarên diyar de em li serê sekinîn destgirtineke xweser, weke pêdiviyeke pêwîst xwe ferz dike. Di vê mijarê de jî wê xebatên Jineolojiyê hebin. Ji ber ku ji destpêkê ve cêribandina me ya azadiya jinê, têkoşîna avakirina hem mêrê azad hem jina azad bû. Dîsa bi hişmendî û çalakvaniyeke azadîxwaz a her duyan, hev temamkirin û bandorkirin, civaka azad hedef girt û hedef digire. Mirov ji ber van sedeman û rastiyên ku jiyana me tehdît dikin, rastiyên mêr ên desthilatdar û wehşî bide ser rê, Jineolojî wê di pêvajoyên pêş de xwezaya mêr wekîdin jî bigire dest. Derbarê merhaleyên çêbûna dîrokî, roja me ya îro û pêkhateya li ser bingeha azadiyê de wê nêrîna xwe xurttir parve bike.

Piraniya nasnameyên jinaniya hatiye avakirin, destpêkê li gor daxwaziyên pergalên deshilatparêz û dewletparêz, piştre li gor daxwaziyên mêr hatine avakirin. Xwezaya pergala baviksalarî, bi koletiya jinê xwedî dibe. Ji bo berdewamiya hebûna xwe, pergal bêgav naçare ku koletiya jinê hilberîne. Ji bo vê jî ji çand û hunerê bigire heta hemû qadên medyayê, ji aboriyê heta siyasetê hemû pergal, ji bo vê koletiyê xwedî bike dixebite. Ji ber ku hemû olên yekxwedayî li ser hilweşandina xwedavendîtiya jinê pêş ketine, jixwe bi hezaran sal in propaganda dikin ku koletiya jinê nasnameyeke xwezayî ye. Ji bo civak bi awayekî din nefikire û lêpirsîn neke, ev baweriya ku ji xwe xwezaya hebûna jinê ev e, her tim tê kûrkirin. Dema civak qadên bi azadî fikirandin û jiyanê bi dest bixe, jixwe bi cêribandinên xwe dizane ev ne wiha ye. Jinên di têkoşînên gerîla yên bi taybetî di sedsala 20. de cî digirin, di siyasetê de pêşengiyê dikin, di encama têkoşîneke mezin de di her qadên zanistê de dixebitin, hemû pêwîstiyên civakê bi kedeke mezin hildiberînin; vê bawerî û propagandayê ji binî ve dihejînin. Lê ev hê destpêka kar îfade dike.

Jin û ew mêrên ku têkoşîna azadiya jinê fêm dikin, piştgirî didin; ji bo pêvajoya avabûna bi azadî hebûn û nasnameya jinê, divê têkoşîneke piralî û berdewamî, perwerde û jinûve avabûnê pêş bixin. Divê di jiyanê de deynin holê ku nasname û xwezayên ne li ser esasê dijberî û serdestiyên hev ên xwezayên jin û mêr, diyalektîka xwezayî ya xwezaya civakî û hevdu temam bikin bidin jiyankirin. Ev, beriya her tiştî karê gurçûpêçiyeke mezin a etîk û estetîk û têkoşînê ye. Xwezaya jin û mêr ên çanda baviksalarî ew kirêt kiriye û biyanî kiriye, divê baweriya xweşikbûn encax bi azadbûnê û ev jî bi ked û têkoşîneke mezin dikare were afirandin ava bike û vê her pêş bixîne. Wê ev, bibe tolhildana herî mezin a ji aqlê mêr ê bi hezaran sal jinê weke ‘cinsa kole’, mêr jî weke ‘cinsê serdest’ di cendereyê de hiştiye were girtin. Ji bo vê jî divê em her tim bi bîr bînin ku di çaxê xwedavendan de jin jî, mêr jî hebûnên azad ên wan demên helbestwarî bûn û em zarokên wan deman ên ku wekhev dijîn.

Şensê pêkhatina hesretên me, pêkhatina dinyaya me ya ‘xwezaya me ya bi elektrîk’ a di nêzikahiya civak û her cure têkiliyê de em nîşan didin, ji her demê zêdetir e, curbecur e û dewlemend e. Rêber Abdullah Öcalan yek ji van derfetan bi van gotinan îfade dike: “*Modernîteya Demokratîk, xwezaya jinê û tevgera azadiyê, divê yek ji hêzên xwe yên bingehîn bizane û hem ji bo pêşxistin, hem jî hevgirtinê ji erkên xwe bibîne û di xebatên jinûve avakirinê de binirxîne.*” Yek ji pênaseyên Jineolojiyê jî; zanista modernîteya demokratîk e. Bêyî ku bibêje xwezaya jinê heye yan tune ye vê xwezayê nas bike û nêzikahiya vê xwezayê weke hêzên hevgirtina bingehîn a paradîgmaya xwe diyar bike; baweriya muazem a ji zanîna kûr a xwezaya jinê û hêza jinê hildigire. Ji bo ferzkirina qetlîamên jinê yên li ser serdema me bidin sekinandin, ji bo nasnameya jinê li ser esasên azadî, eşq û hezkirinê bê pêşxistin, bi jîndarîkirina vê xwezayê mimkun e. Pêşxistina Jineolojiyê, di vê mijarê de wê bibe merhaleyeke grîng.

**Jêrnot:**
**(46)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(47)** Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî de – Pirsgirêka Kurd û Çareseriya / Abdullah Öcalan
**(48)** Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî de – Pirsgirêka Kurd û Çareseriya / Abdullah Öcalan
**(49)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(50)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(51)** Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan

**(52)** Ji Dewleta Sumer a Rahiban Ber bi Civaka Demokratîk I /Abdullah Öcalan
**(53)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(54)** Tanrinin Tarîhî (Dîroka Xweda) Karen Armstrong
**(55)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(56)** Ji Dewleta Sumer a Rahiban Ber bi Civaka Demokratîk I /Abdullah Öcalan
**(57)** Ji Dewleta Sumer a Rahiban Ber bi Civaka Demokratîk I /Abdullah Öcalan
**(58)** Ji Dewleta Sumer a Rahiban Ber bi Civaka Demokratîk II /Abdullah Öcalan
**(59)** Ji Dewleta Sumer a Rahiban Ber bi Civaka Demokratîk I /Abdullah Öcalan
**(60)** Tek Tanrili Dînler Karşisinda Kadin (Li Hemberî Olên Yekxwedayî Jin) / Fatmagûl Berktay
**(61)** Homa, îro di Dimilkiya li herêmên Amed, Çewlik û Elezîzê tê axaftin de di maneya xweda de tê bikaranîn
**(62)** Tanrilar Kadinken (Dema Xweda Jin Bûn) Merlîn Stone
**(63)** Tanrilar Kadinken (Dema Xweda Jin Bûn) Merlîn Stone
**(64)** Ji Dewleta Sumer a Rahiban Ber bi Civaka Demokratîk II /Abdullah Öcalan
**(65)** Tanrilar Kadinken (Dema Xweda Jin Bûn) Merlîn Stone
**(66)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(67)** Şaristaniya Kapîtalîst - Serdema Qralên Tazî û Xwedayên Bêmaske- / Abdullah Öcalan
**(68)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(69)** Edyanû'l Hind 72
**(70)** Ji Dewleta Sumer a Rahiban Ber bi Civaka Demokratîk I /Abdullah Öcalan
**(71)** Keybanûya Misrê ya di B.Z. sedsala 14. de jiyaye. Bi Amenhotepê (Akhenaton) IV. ê Fîrewnê Misrê ku hevserê wê ye re li ser text maye. Di dîroka Misrê de jina yekem e ku bûye Fîrewn. Qanûnek derdixe ku keçik jî bikaribin bibin fîrewn. Bi Akahenaton re, ji bo xwestine li şûna xwedayên Misrê, baweriya xwedayê tek Aton (xwedayê rojê) pêş bixin pir bertek dibînin. Jixwe di lêkolîna li ser hestiyên Nefertîtî yên hatine dîtin de xuya dibe ku li serê wê dane û wisa hatiye kuştin.
**(72)** Keybanûya Misrê ya B.Z. di navbera 69 û 30 de jiyaye. Ji bo welatê xwe biparêze û birêve bibe bi Sezar re hevkariyê dike. Piştre jî bi fermandarê Romayê Antonîuos re. Kleopatra 9 zimanan dizane û gelek jîrek e. Dema ji bo welatê xwe şer dike çawa li dijî Romayê têk diçe bi jehra tûlemar (kobra) xwe jehrî dike.
**(73)** Navê Elîssa ya keybanûya bajarê Sûra paytexta Fenîkeyiyan. Navê Dîdo ku di maneya gerok de ye dîroknivîsên Latîn lê kirine. Damezrînera bajarê Kartacayê. Efrîkaya Bakur B.Z. di sedsala 9. de
**(74)** Neteweyeke ji şervanên jin pêk tê, wisa tê zenkirin ku bi îhtimaleke mezin li Sarmatyayê jiyane. Ji keybanûyên wan ên navdartirîn; Penthesîleaya di Şerên Trûvayê de cî girtiye û xuşka wê Hîppolyta ye. Her çiqas derbarê hebûna wan, cihên lê jiyane û jiyana wan de agahiyên pir cuda hebin jî, şervanên jin, li gel Sarmatyayiyan ku pêşiyên Amazonan in, rastiyek e. Rastiya herî bingehîn ku vê erê dike, di kolanên arkeolojîk de, bi taybetî di gorên jinan ên Sarmatyayê de bi rêjeyek ji sedî bîst û pênc çek derketine. Di Îskîtiyan de jî ku tê yeqînkirin ji Amazonan hatine

**(75)** Tavananna yanê keybanûya serwer.
**(76)** Li ba Hûrriyan Şauşga, xwedavenda şer bû ku bi bivir an jî rimê dihat sêwirandin. Ya rastî ji xwedavendên destpêkê yên Aryenan versiyona Starê ya li ba Hûrriyan e.
**(77)** Weke B.Z. sedsala 10. tê diyarkirin, li gor Kabra Negast, keybanûya navê wê Makeda ye B.Z. di 1020'an de li Ofirê çêbûye
**(78)** Di Quranê de sûreya Neml 22-44, di Tewratê de Kralên 1. 10:1-13 û dîrokên 2. 9:1-12, Kralên 1. 10:10, Gotinên Silêman, di Mattaya Incîlê de “Keybanûya Cenûpê, roja hikmê wê bi vê nifşê re rabe û wî mehkûm bike; ji ber ku ew, ji bo guhdariya hikmeta Silêman ji aliyên din ê dinyayê hat û vaye, yê ji Silêman mezintire li vê derê ye”-12:42, di Incîla Lûkayê de Îsa, diyar dike ku wê Keybanûya Saba û Nînovayî wê hemdemiyên ku ew red kirine, bidarizînin.
**(79)** I. Qral 10:3
**(80)** Xwedavend Dercetoya keça deryayê ku li Aşkelonê dijî, Îştarê hêrs dike. Îştar weke ceza lê bibire, wê aşiqî yekî bi mirinî dike. Ji vê eşqê keçek çêdibe. Derceto hevserê xwe dikuje û keça xwe jî davêje çolê. Îştar, ji bo vê keçikê xwedî bike kevokan dişîne. Piştre şivan vê zarokê dibînin.
**(81)** Bi kîjan welatî re şer dike wan têk dibe, tenê li dijî Hindistanê zorahî dikşîne ku di şer de fîlan bikar tînin. Semîramîs, li hember vê çermê bi sedan gamêşan digurîne û li deva dike û mîna fîl dide xuyakirin. Kelekan çêdike û çem û rûbarên pêşketinê asteng dikin derbas dike. Bi tektîkên dewlemend û afirîner, di şer de serkeftineke girîng bi dest dixe.
**(82)** Malbata Kraliyetê Emesa.
**(83)** Qehremana Cihûyan e, Cihûyan ji qetlîameke mezin rizgar kiriye, tê texmînkirin ku di B.Z. di sedsala 4. an jî 3. de di dema Împaratoriya Pers de jiyaye. Li gor agahiyên dîrokî, di pirtûka Cihûyan Esterê de behsa hevserê Esterê, Ahaşveroşê ji Împaratorên Pers tê kirin, ev di rastî de Artaserhasê I. e. Tê gotin ku Ester jî, cariyeya împarator ya Babîlî, dayîka Darîusê II. Kosmartîdene ye. Di vê mijarê de şîroveyên cuda jî hene. Ester, jineke bihêz e ku bi bandora xwe ya li ser împarator gelê xwe ji qetlîamê rizgar kiriye.
**(84)** Li gorî efsaneya di Tewratê de; Îsraîliyekî bi navê Manoah qet zarokên wî çênabin. Di dawiyê de Xweda Şîmşon dide wî.  Mîsyona wî di dahatuyê de bi Pelîştîliyan re şerkirine ku Pelîştîlî hikûm li ser Îsraliyan dikin. Weke şert jî dibêje divê tu car porên wî neyên jêkirin. Ji ber ku hêza xwe ji porên xwe digire. Dalîla jî hezkiriya Şîmşon e. Pelîştîlî wê dikirin, raza hêza Şîmşon fêr dibin û dibe sedem ku ew Îsraîliyan têk bibin. Her çiqas çîrok wiha were vegotin jî, em divê karakterê Dalîla jî, aqlê pergalên dewletparêz ji berevajî ve bixwînin û nas bikin.
**(85)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(86)** Li Rolhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan**(87)** Ji Dewleta Rahip a Sumer Ber Bi Şaristaniya Demokratîk I / Abdullah Öcalan
**(88)** Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan
**(89)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(90)** Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan
**(91)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(92)** Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan
**(93)** Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî de – Pirsgirêka Kurd û Çareseriya / Abdullah Öcalan
**(94)** Giştîname Jineolojiyê-2011
**(95)** Zohar 1:34 b. Zohar; pirtûkeke di sedsala 13. de hatiye nivîsîn û berhema sereke ya Kabala tê hesibandin
**(96)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan

**JINEOLOJIYA KU JI CÊRIBANDINA ME YA LÊGERÎNA JIYANA WATEDAR DIHERIKE**

Jineolojî têgînkirineke nû ye. Lê bi wateyî, diyardeyeke ku hemû jinên cîhanê yên di tevahî qadên jiyanê de, di qadên têkoşîna siyasî de, di cêribandinên têkoşînên gerîla de, di berxwedanan de bi hezaran salî kom bûye. Xwedî daneheveke têkoşîna dem dirêj e. Hin têgîn hene tên afirandin û serpêhatiya xwe dijîn, hin têgîn jî bi serpêhatiyên xwe tên afirandin. Jineolojî, têgîneke ji cureyê duyem e.

Ji wê dema ku çanda dayîka xwedavend û jiyana civaka xwezayî bi hilweşandinê re rû bi rû mane, di rastiya xwe de berxwedana jinan ti carî neqediya ye. Di navbera salên B.Z. 4000 û 2000'an de her çend berxwedanên bêhempa yên jinan parçe bûbe û hatibe dabeşbûn, jin di malên taybet de hatibin hepskîrîn jî, ya rastî tu car bi dawî nebû. Jinê, têkçûn, kolekirin, ji dehan xwedavendên dayîk dûr xistinê û serî tewandina tene ji xwedayekî re, tu car hezim nekir. Ji ber vê yekê jî kîngê keysa xwe lê anî, ji bo bi hebûna xwe, yanê bi nasnameya jina azad bijî têkoşînê kir. Meyla wê ya xwezayî û hundirîn, xwe dispêre rêgeza azadiya gerdûnî. Yanê rêgeza enerjiya azadiyê ya herikbar, naqerise, nayê hepskirin û di qaliban de bi cî nabe. Ev enerjî, her çend bê hepskirin jî, her carî rêyeke herikînê dibîne û bi xweza, jiyan û jiyana civakî re digihê hev, yanê xwe digihîne xwezaya xwe. Dîroka civakî bi mînakên bêhejmar bi vê yekê dagirtiye.

Em jinên kurd, me îro Jineolojiyê ji nîqaşê re vekiriye û em daxwaz û bangewazî dikin ku bi hemû jinên cîhanê re hevpar pêş bixin. Em jinên Kurdistanî, ji bêhejmar mînakên me li jor dayî xwedî dibin, hêz digirin û bi hedefa wan zêdetir bikin, nêzî çil salan e di têkoşîna Azadiya Kurdistanê de cî digirin. Me bi gerîlatî şer kir, li çiyayên me yên bi xof ji bo pêşanetiya jiyaneke di çarçoveya jinê de biafirînin em ji ezmûna cêribandinên dijwar derbas bûn. Di qada civakî de bi gelê me yê azadîxwaz re me serî rakir, pêşengtiyê kir û di serhildanan de em hatin gulebarankirin. Di gelek qadên jiyanî yên weke perwerde, çand û huner, edebiyat, çapemenî, dîplomasî, aborî, ekolojî, dad û parastina cewherî de em xebitîn û me ked da. Me cêribandinên xwe yên xweser bi pêvajoyên jandar kom kir. Û me van hemûyan, bi demê re bêtir bi serwextiya dîroka me ya jinaniyê û bi xwedîbûna ji nasnameya hemû jinên ku dest ji jiyankirina bi azadî û rûmet bernedan me bi ser xist. Me bi desteka xurt, perspektîf û alîkariyên rêheval û rêberê me Rêber Abdullah Öcalan ku azadiya jinê û ji jinên azad re rê vekirinê, weke rêgezeke rûmet û azadiyê jiyan dike, bi ser xist.

Di nav pênc hezar salan de aqlê serdest ê mêr, xwe di bingeha desthilatparêz û dewletparêz de biavahî û bi pergal kir. Di vê demê de bêhejmar lehengiya jinan, berxwedaniya wan, her tim ji bo me bû bingeheke saxlem a cêribandina me. Di her gava me avêtî de me hîs kir ku cografyaya em tevlî şoreşê bûne niştimana dayîka xwedavend e û dîsa bi lîstokên mêraniya serdest, ew li heman derê hatiye qetilkirin. Dîsa di hêla cografî de her çend dûrî me be jî, me berxwedanên jinên şoreşa Rûsya û lehengên wan ji romanan û perwerdeyên îdeolojîk nas kir. Şoreşgerên jin ên di serkeftina şoreşa Wîetnamê û şoreşa Kubayê de rol leyîstine jî. Bi edebiyatê, bi perwerdeya îdeolojîk, bi fîliman û bi Parêznameyên Îmraliyê ku Rêber Abdullah Öcalan bi hişmendiyeke bilind a dîrokî nivîsandiye, me nasnameyên cuda yên dîroka xwe ya berxwedanê nas kir. Di tevahiya têkoşîna xwe de, me tevgera femînîst a mohra xwe li du sed salên dawîn xistiye, jinên pêşeng ên di her astê de bi çalakî di muxalefetên civakî de cî girtine, nasnameyên xurt ê jinan ên kevneşopiya anarşîst nas kir. Me jinên gerîla, fedaî yên tevlî şerê rizgariya neteweyî bûne û li welatê xwe têkoşiyane, jinên zanyar û berxwedêr ên mezin ku di dîroka Rojhilata Navîn û Kurdistanê de û di bîra civakî de şopên kûr hiştine û şekil dane çûndina dîrokê nas

kirin. Me berxwedêriya wan, serhildêrî û jîrekiya wan a leşkerî, siyasî, taktîkî û rêxistinî, li zindanan li dijî îşkenceyên herî giran berxwedêriya wan a biwêrekî li nasnameyên xwe neqişand. Me hewl da tiştên wan ji me re bi pirtûkan, bi rojnivîsan, bi helbest û bîranînan hiştin em jiyanî bikin. Tevî ew qas navberên dirêj ku ketin navbera me, bi dehan, bi sedsalan jî em hewl didin ji wan hîn bibin. Me navên wan li xwe kirin, me xwest em taybetiyên wan bigirin.  Beriya her tiştî, me bi wan re peymana nasname û jiyana azad a jinê ku jiyana xwe fedayî vê rê kirine û bi dil û can şer kirine şanenav kir. Dema em di hucreyeke zindanê de bi tena serê xwe diman, di mewziyeke çiya de heta guleya dawîn me şer dikir û bombeyê di xwe de diteqand ew li ber me, bi me re bûn. Dema aqlê mêr ê serdest bi qurnaziyên zirav me di qorziyekê de asê dikir, bi çanda desthilatiyê ya bi hezaran sal xwestin heta hestiyê me kedxwariyê li ser me ferz bikin, ew di diruşma me ya nefesa dawîn de bûn. Dengê qêrîna me bûn dema me digot îşkence sûcê mirovahiyê ye. Dema em bi ser diketin, me serkeftinan bi dest dixistin, kemînên zîhniyeta mêrê serdest ku me dorpêç dikirin pê derdixist, di kêfxweşiya me de, di kenê me de bûn. Di hêvî û xemgîniya awirên dayîkên me de bûn ku tu car em tenê nehiştin. Bi me re bûn, em bûn; em bi wan re bûn, em ew bûn.

Ji bo cografyaya Kurdistanê, gelê wê û bi taybetî jinên Kurdistanî, van xezîneyên mirovahiyê yên bêhempa nas nekin, bi hezaran astengî hatine afirandin. Dîroka gelên din, hînbûna berxwedana jinên li cografyayên din û  ji wan xwedîbûnê deyne aliyekî; kêm mabû berxwedanên du, sê nifş berê hatine jiyîn jî bidana jibîrkirin. Me di bin êrîş û qetlîameke dijwar de, ji her tiştî xerabtir jî  bi tirs û xofeke mezin jiyan dikir. Ya rastî di nav man û nemanê de, em li erafê mabûn. Tevgera Azadiya Kurdistanê, di merhaleyeke wiha de derçûnekê pêk anî û ji destpêkê ve bû tevgereke ku bi wate û fizîkî hebûna jinê jî digire nav xwe.

Şoreşa Kurdistanê, di mijara azadiya jinê de destpêkeke wiha kiribe û şoreşeke bi karekterê jinê esas girtibe; ne tenê ji bo me jinên kurd, her wiha ji bo Kurdistanê, dewleta Tirkiyê ku em li dijî wê têdikoşin, ji bo Rojhilata Navîn û bi demê re ji bo hemû dinyayê encamên wê yên piralî derketine holê. Hêjayî lêkolîn û vekolanê bêhejmar daneyên sosyolojîk derxistiye holê. Bi hezaran çîrokên jinê afirandiye ku bibin mijara edebiyat û hunerê. Derbarê nasnameya jina azad çawa dikare were afirandin de, gelek cêribandinên dewlemend pêş xistiye. Beriya cêribandina me jî cêribandina şoreşên hatine jiyîn, pêvajoyên têkoşîna rizgariya neteweyî hene. Di van cêribandinan de tevlîbûna jinê pir xurt e. Lê piştî tevahiya van şoreşan a ku hatî jiyîn; jin vegeriyane rola xwe ya kevneşopî ya beriya şoreşê. Yan jî şibiyane mêr ku karîbûne li hin qadên xebatê bimînin. Ji cêribandina me re ku di pêvajoya cêribandinên van şoreşan de û bi dersên ji wan hatine derxistin dest pê kiriye, ev avantajeke girîng e.

Şoreşên ku şibiyane dewletên li dijberê têkoşîn dane, bi taybetî di mijara azadiya jinê de şibiyabin, aşkera ye ku ji aqlê mêr ê serdest derbas nekirine. Ya rastî niyet ne ev be jî, di encam de şerê hatî jiyankirin wekî ku pargirtina ji desthilatiyê hatiye kirin. Li hember vê, qadên jiyana civakî yên divê esas şoreş di wan deran de pêş bikeve û kûr bibe, têkiliyên jin û mêr û pirsgirêka azadiya jinê bindoşek kirin, tabloyeke wiha derket pêşberî me. Bi taybetî bêhejmar beşên şoreşger, anarşîst, gundî, karker, li dijî faşîzmê bi berxwedaneke bêhempa Şoreşa Rûsyayê afirandin. Weke pîvana sosyalîstbûnê bi pergala kapîtalîst re hevrikiya aborî û çekdariyê bilind kirin ku di encam de bereya şoreşger wendahiyên mezin da. Jêravahiya fikrî ya vê windakirinê; ji sînor û qalibên zîhnî yên modernîteya kapîtalîst nederbaskirina şoreşê bû, neketibû ferqa vê û lêpirsîn nekiribû. Potansiyela dewlemend a şoreş û azadiyê di bin navê sosyalîzmê de bi bîrdoziya dewletparêz xerc kiribûn. Di koka vê şaşîtiyê de, di bingeh de nedaketina sedemên koka pirsgirêka azadiyê, yanê koletiya jinê heye. Jinên di nav partiyê de rexnegir bûne, bi demê re hatine bêdengkirin û bêbandorkirin. Jin û mêrên anarşîst ên di şoreşê de bi çalakî cî girtine, bi paranoyayeke bêmane, weke dijberî şoreşê bin hatine cezakirin. Hemû deng û lêgerînên cuda –ku piranî yên şoreşê li dar xistibûn- hatibûn bêdengkirin yan jî ew avêtibûn hemêza modernîteya

kapîtalîst. Netewparêzî, cinsiyetparêzî, zanistparêzî û olparêzî ku ya rastî şaneyên kok ên desthilatiyê ne di pratîka vê şoreşê de ne hatine dahûrandin, ne jî derbaskirin. Ji aliyê jinê ve maneya vê; kolekirina jinê ku bi hezaran salî hatiye rewakirin û ser hatiye girtin, di bin navên cuda de berdewamkirine. Ji xwe jihevdeketina pergalên sosyalîzma reel de derket holê ku di encam de ya hatî jiyankirin ev e.

Dema Şoreşa Azadiya Kurdistanê di serê 1970'yan de dest bi pêşketinê kir, tevgerên sosyalîst ên reel, li hemû ew welatên ku desthilatdar in û têkoşîn dimeşînin, di nav tengaviyeke kûr de bi xitimandinê re rû bi rû bûn. Ew potansiyela bibin alternatîfek û cewhera vê, pir neyînî nirxandibûn û bi milyaran mirovên ku baweriya wan bi sosyalîzmê hebû xeyalşikestî bibûn. Vê rewşê, tengaviyên şaristaniya dewletparêz jî zede kiribû ku alternatîfeke xwe ya din jî di asoya xwe ya zîhnî de fetisandibû. Ji aliyê din ve nermî û curbecuriya xwezaya civakî xwe amade dikir ku ji nav dilê xwe alternatîfên nû derxîne. Ev dem, di heman demê de çaxên ku tevgerên femînîst, tevgerên ekolojik, tevgerên demokrasiyê û ya girîngtir jî tevgerên ciwanan yên cewhera sosyalîzmê diparastin, bilind dibûn. Ji bo ev bilindbûna fikrî û ruhî li Kurdistana ku mêtingeha mêtingeran bû bandora xwe neke, tedbîrên pir hişk hatibûn girtin. Lê xwezaya herikbar a enerjiya azadiyê, astengî nas nekir û li Kurdistanê jî, bi giştî dinyayê re tevgera azadiyê pêş ket, berbelav bû û rîşeyên xwe berda. Ev, di heman demê de amadekirina pêvajoyên civakî bûn ku wê tevgera me ya azadiya jinê jî li ser pêş biketa.

Tevgera Azadiya Kurdistanê, bi rêxistinî, îdeolojîk û pratîkî nekete şaşiyên pratikên sosyalîzma reel û gelek tevgerên rizgariya netewî yên bi bindora wê pêşketine. Yanî ew şaşiya ku pirsgirêka jinê taloqî pişt şoreşê dike. Pirsgirêka azadiya jinê û di nav girêdaneke diyalektîkî de pirsgirêka azadiya mêr, weke şoreşa di nav şoreşê de watedar kiriye û li gor vê cêribandinên teorîk, rêxistinî û pratîk jiyaye. Ji ber pirsgirêkên cuda yên di encama vê pirsgirêkê de zêdekariyek li têkoşînê kirine, paş ve gav neavêtiye. Her tim bi nêzikahiya analîzên sosyolojîk, dahûrandin û çareserkirina diyardeyê, pêş de çûyînê , bi şoreşê çareserkirina girêka kor a hezaran salî esas girtiye. Serî ne ji adet û kevneşopiyên feodal ên civakê re, ne jî di nav kurdan de ji nêzikahiya kûrkirina feraseta namûsê ya dewletê û radest girtinê re netewandiye. Di refên têkoşînê de mantiqa 'jin nikare şer bike' ya ku feraseta mêrê serdest û paşverû ferz kiriye, taybetiyên jina kole û paşverû, bi tevahî pirsgirêkên giran ên vê rastiyê ku di têkoşînê de xuya bûne, di pêşketina têkoşîna azadiya jinê de weke asteng nepejirandiye. Tevahiya van rastiyan, bi perspektîfa azadiyê, bi sosyolojîkî pênase kiriye, dahûrandiye û kiriye proje.

Dema di navbera salên 1976 û 87'an de, derbarê jinan, bandoriyên jin û mêr û têkiliyên wan de, di şoreş û civakê de xuyakirina wan û derbarê bandoriyên polîtîkayên dewletê de, ji bo avakirina bingehekê pêvajoyeke girîng e û di vê pêvajoyê de daneyên girîng kom bûne. Di vê pêvajoyê de nirxên feodal bi polîtîkayên dewletê hatine kûrkirin. Di beşeke girîng a Kurdistanê de qada azadiyê ya jinê, qadên jiyan û hebûnê heta bibêjî hatibûn sînorkirin. Feraseta namûsê ya hişk serwer bû. Di şert û mercên wiha de avakirina partiyeke siyasî ku jin û mêr têde bi hevre tevgeriyane, li çiyayan bi hevre mane û şev û roj bi hevre têkoşiyane, di pirsgirêka azadiya jinê de, pêkanîna di nav şoreşê de şoreş bû, yekema şoreşan bû. Di merhaleya îro de, gelek rewşên ji rêzê tên dîtin, di wan deman de bi qasî tevlîbûna têkoşînê diyar bike, astengiyeke mezin bû. Ya ku ji destpêkê ve kesayetek û çarçoveyek daye têkoşîna azadiya Kurdistanê jî, pêkanîna têkoşîneke rast, bibandor û bi israr a bi van astengiyan re bû.

Di vê têkoşînê de jiyan û feraseta azadiyê ya Rêber Abdullah Öcalan mîna ku îfade dike; "*Di xebatên jinê de, min rastiyê, girîngiya heqîqeta dîrokî û civakî zêdetir ferq dikir. Jin, ji bo min cewhera xebatên sosyolojîk bûn. Kurt û cewherî ez gihîştim vê encamê: bedewî, başî û rastiya di jinê de biqefêlê û pêre bijî*." Felsefeya nêzikahiya jinê di asta stratejîk de diyarker e. Şoreşa Kurdistanê, tevî zehmetiyên mezin û rastiya daxwaza berdêlên giran, ji destpêkê ve heke jinan kişandibe û jin herikîbin şoreşê, ji ber vê feraseta azadî û jiyanê ye ku heta bibêjî bibandor e. Di 1977'an de

Rêber Abdullah Öcalan di gera xwe ya Kurdistanê de diçe mala kalekî. Li malê keçeke ciwan heye, dibêje qey neviya wî ye, piştre fêm dike ku hevsera wî ye, di dilê xwe de dibêje; “Va Kurdistan jî, eynî mîna vê keça ciwan bi zorê hatiye bidestxistin. Divê em Kurdistanê jî mîna vê keça ciwan azad bikin.” Ev bûyer, îfadeya hîskirina şoreşa Kurdistanê, bi statuya civakî ya jinê re çiqas têkildar e nişan dide. Ev hiskirina Rêber Abdullah Öcalan, bêtir kûr û berfireh bû û domand. Ne tenê jinên Kurdistanî, jinên ji gelên din jî kişand nav şoreşê.

Eger heta sala 1987’an di teoriya vê tevgerê de, bi sîstematîkî analîzên jinê nehatibin kirin, nayê wê wateyê ku pratîka pir zehmet, watedar û berxwedêr a bi sedan jinên beriya wê demê tevlî şoreşê bûne tune tê hesibandin. Yanê ew nirxên di wan salan de bi azweriya azadiyê kombûyî yên wan jinên şoreşger ên wêrek û kedkar, ji bo dahûrandinên sosyolojik ên jin û malbatê yên di sala 1987’an de dest pê kirine, çavkaniyên herî bingehîn in. Li Kurdistanê, bi taybetî di wan şertan de derketina jinan a ji malê, di beşeke civakî ya pir fireh de liv û tevgerekê çêdikir. Malbatên jinan, hevalên wan ên dibistanê, têkiliyên xizim û cîranên nêzî wan, heta têkiliyên eşîrî yên ku wê demê hê pir hişk bûn bandor dikir. Wekîdin jî, ji hêla dewletê ve bandora tevlîbûna jinan hebû. PKK, avabûneke nû bû û biryar dabû yek ji şoreşên herî zehmet a dinyayê bi ser bixe. Mêrên di nav PKK’ê de cara yekem bi jinan re, li derveyî girêdanên dayîk-keçik, xuşk-hevser û hwd. bi girêdanên îdeolojîk, rêxistinî û siyasî têkilî danîbûn. Serobinbûneke vê hebû. Dîsa di nav partiyeke siyasî de, di têkiliyên bi hev re de ku jinan cara yekê dicêribandin, serobinbûneke guherînê ya girîng hebû. Şoreşa civakî jixwe tam jî ev bû.

Heta digihê sala 1987’an, di zindanên derbeya faşîst a 12’ê Îlonê de, şoreşger bi pêkanînên dijmirovî re rû bi rû diman. Dema mirov şert û mercên wê demê tîne ber çavê xwe, di nav wan de hejmareke girîng şoreşgerên jin hebûn. Ev jin, di şexsê hevala Sakîne Cansiz de, berxwedaniyên dîrokî yên ku hêzên faşîst şok kirin nîşan dan. Di dîroka Kurdistanê de zindan, her çend ne cêribandineke nû jî be, di vê berfirehiyê de û di vê astê de tevlîbûna jinan, yekem bû. Cêribandinên di van deran de derdiketin holê jî ji bo jinan daneyên gelekî girîng pêşkêş dikirin. Jinên di wan salan de tevlî şoreşê dibûn yek bi yek bi malbatan re eleqedar dibûn, sedema jiyana mêtinger a ew têde ne vedigotin, faliyetên perwerde û rêxistinê bi çalakî dimeşandin. Ev jî, yek ji cêribandinên nû bû ku avahiya civakî ya Kurdistanê dijî û dibû şahidê wê. Dîsa di serî de dayîkên şoreşgerên ku tevlî şoreşê dibûn, serboriyên malbatên wan, weke komeke cuda divê ji aliyê sosyolojîkî ve werin analîzkirin. Ev jî bi civaka Kurd, cêribandineke cuda û nû dida jiyankirin. Di nirxên kurdan ên jin û mêr, jiyan, rûmet, namûs, hezkirin, girêdan de guherînên esasîn ên muazem dihatin jiyankirin. Ev hemû, şoreşên civakî bûn.

Em dikarin kombûnên di bereya jinan de, bi xetên giştî wiha îfade bikin; Derbarê civaka Kurdistanê de çavdêriyên demdirêj ên Rêber Abdullah Öcalan, dema weke rêberê şoreşê, bi kombûna li gel wî re digihîşt hev, ji bo jin û mêrên kurd, analîzên sosyolojîk ên rêyeke nû vedikirin, pêş ketin. Ev, di pêşketina zanebûna azadiya jinê, di çêbûna têgihîştina nasnameya jina azad de, merhaleya despêkê bû. Analîza vê merhaleyê ya cêribandinên jinê û civaka kurd a çavkaniya vê ye, li derdora pirsgirêka jinê; bi taybetî li ser jinên di şoreşê de, li ser xwendekarên Kurdistanê û metropolên Tirkiyeyê pir bandor kir.

Di van dahûrandinên sosyolojîk de kûrahiyeke girîng heye. Têkiliyên jin û mêr, di bin mêtingeriyê de çawa ji cewhera xwe hatine dûrxistin û rewşa mêtingehkirina Kurdistanê çawa xwedî dikin, bi berfirehî hatiye nirxandin. Bi qasî koletiya jinê, feraseta namûsê ya mêr a eşq û hezkirinê ya sexte jî hatiye deşîfrekirin. Rêgezên feraseta hezkirina jinê û namûsa rast hatine diyarkirin. Di vê asta dahûrandinan de; bandorên serboriyan û asta li ser esasên berdêlên giran gihîştinê hebû. Dîsa dersên cêribandina zewaca Rêber Abdullah Öcalan a bi Kesîre re jî hebûn. Rêber Abdullah Öcalan vê têkiliyê û girêdana wê ya bi pirsgirêka jinê re wiha îfade dike: “*Tu zanîn û hêviya min nebû ku wê nasnameyeke jinê ya wiha hebe. Weke mêgurekê jinik li pêşberî min bû. Bi vî halê wê, tam deh sal, heta dema havîna sala 1987’an bi vîna*

*xwe ji tevgerê qut bû, ez bawer nakim awayekî sebra ku min nîşan da di navbera du mirovên din de hatibe cêribandin. Cêribandineke gelekî zehmet bû. Ji vê têkiliyê sax xelas bûnê, divê mirov weke mûcîze bihesibîne. Zehmetî çavkaniya xwe ji ku digire; li Rojhilata Navîn li hemberî pêşketinên ku statuya jinê serobino dike, min kesayeta xwe li ser piya hişt. Şer û pevçûn, berdan, nedibûn çareserî. Rewşa xwe ya li hemberî vê kesê, ji ber vê sedemê, min bi tengaviya li dijî fikarên derbarê hebûna Xweda re jiya, wekehev didît. Diviyabû min bi îdeolojîk û siyasî vê têkiliyê ji hev derxista. Dîsa heta ku dahûrandinên jinê neyên pêşxistin, çareseriya îdeolojîk û siyasî jî tam çênedibû. Di vê demê de hêza min a dahûrandina jinê pêş neketibû. Min ê ev, encax piştî 1987'an pêş bixista.*"

Dahûrandinên tên gotin ku di 1987'an de hatin pêşxistin, di civak û avahiya rêxistinê de rê li ber tevger û bandorbûnên fikrî yên girîng vekirin. Di heman salê de li Ewrûpayê YJWK (Yekîtiya Jinên Welatparêz ên Kurdistanê) ava bû. Di pêvajoya şoreşê de ev, rêxistina me ya xweser a destpêkê bû. Di qada civakî de ji hêla rêxistinîbûn û bidestxistina cêribandinan ji bo jinên ku tevlî şoreşê dibin heta bibêjî girîng bû. Encama herî diyarker a van gavan; di dawiya 1980'yan û serê 1990'an de tevlîbûna pir zêde ya ciwanan bû. Bi hezaran ciwan ber bi şoreşa Kurdistanê ve diherikîn. Di vê herîkînê de bi qasî doza rizgariya neteweyî, lêgerîna azadî, hezkirin û civakeke nû jî faktorên girîng bûn. Bi vê ve girêdayî, him profîla tevlîbûna jinê ya di nav şoreşê de dewlemend dibû, him jî nifşê jinê yê sêyemîn a şoreşê çêdibû. Heta digihê salên 1990'î, PKK tevî konsepta tunekirinê ya navneteweyî ya li serê dihat ferzkirin; di şer de, di qadên cuda yên têkoşînê û pirsgirêkên azadiya jinê de cêribandinên zehmet jiyabû, danehevên girîng ava kiribû. Lê paşverûtiyên di nav partiyê de xwe ferz dikirin; li pêş gihandina van danehev û kombûnan, bi civak û qadên pir girîng ên têkoşîna azadiyê re dibûn asteng û paş ve dikişandin. Yek ji van qadên azadiyê jî, azadiya jinê bû. Di salên 1990'î de di nav rêxistinê de tevlîbûnên jinan ji sedan bihurîbû, gihîştibû hezaran. Tevî vê, ji ber ku zîhniyeta serdest a paşverû û nêzikahiyên feodal nehatibûn derbaskirin, dîsa tevlîbûnên jinan, îdeolojiya azadiyê baş nepejirandibûn, bi vê ve girêdayî, pêşderaziyek li hemberî jinan hebû. Difikirîn ku wê jin nikaribin şer bikin, di şerên zehmet ên çiya de wê nikaribin li ber xwe bidin.

Lê jin pêl bi pêl diherikîn çiyayan û ev feraset nikaribû pêşiya wan bigire an jî asteng bike. Şoreşek dihat jiyankirin û tu niyeta jinên ciwan tune bû ku li derveyî vê, jiyaneke ji rêzê hilbijêrin. Wiha tevlîbûnên zêde yên jinê, di nav têkoşînê de wê rê li ber nîqaşên hema bêje rojeva yekem bûn vebikirina. Di van nîqaşên de ku mêr diyarker bûn, gelek pirs di rojevê de bûn. Gelo jin dikarin di şoreşê de bikin? Jin dikarin şer bikin? Gelo rast e bê ew qas jin tevlî refan bibe? Kotayek were diyarkirin yan jî di şer de qadên ku jin têde cî bigirin hebin ne baştir e? Di bingeha van pirsan de, nîqaşên xwe dispêrin ferasetên "Jin, tempoya şer giran dikin, jin nazik in, kulîlk in" û hwd. zêde dibûn. Li hemberî van nîqaşan mîna inyadekê tevlîbûnên jinan, her tim li xwe zêdekirinê domand. Jin bi biryar bûn tevlî şoreşê bibin, têde bimînin û şer bikin.

Hin fermandarên tesfîyekar ên mêr ku berfirehiya şoreşê û xeta azadiyê fêm nedikirin, hin jinên hatine şoreşê paşve şandin. Lê ev paşve şandin jî nikaribûn herikîna jinê ya şoreşê bidin sekinandin. Ev mijar û gelek texrîbatên tesfiyekariyê ku bi têkoşîna azadiya jinê dan jiyankirin, weke mijara analîzeke sosyolojîk wê di nav bergeha Jineolojiyê de be.

Ev daneheva ku bi berxwedaneke bêeman hat pêşxistin, bi şehadeta Gulnaz Karataş gihîşt îfadeya xwe ya wateyî. Li ser şer bandora vê şehadetê û ji aliyê Rêber Abdullah Öcalan ve bi layiqî nirxandina wê, xala dawîn danîbû nîqaşên "jin bar in, nikarin bimeşin". Rêber Abdullah Öcalan, vê şehadetê û şehadetên jinan ên heta wê demê, têkoşîna wan, bi pêşxistina dahûrandinên artêşbûna jinê yên di mijdara 1993'yan de, veguherand rêxistinbûna jinê û biwate kir. Perspektîfa artêşbûna jinê ya bi 4-5 cildan pêşkêş kir. Bi vê perspektîfê, analîza sosyolojîk a artêşbûna jinê û bingeha îdeolojîk ava kir. Rêber Abdullah Öcalan bi tespîta; *"… Di nav gerîla û faliyetên siyasî de, rêxistinbûna jinê, taybetiyên artêşbûna wê, xweseriya wê, rûdana*

*bi daxwaziya jinê xwe bigire ewlehiyê gelekî girîng e. Ger em wiha nekin, di derekê de azadiya jinê wê vala derkeve. Nêzikahiya "çawa be wê şoreş çêbibe, her kes wê mafê xwe bigire" tê nîşandan, divê wiha neyê gotin. Gelek şoreş vê wiha gotine, lê derketiye holê ku jin jixweber rizgar jî nebûye. Her wiha, weke di pirsgirêka neteweyî de, di pirsgirêka jinê de jî, rizgariyê, aşkera ye ku jin bi fikra xwe, bi rêxistina xwe, bi çalakiya xwe wê pêk bîne. Di vê mijarê de girîngiyeke mezin e ku jin hêza xwe ya cewherî derxe holê û bide axaftin."* pir zelal daniye holê ku ev gav ne tenê ji bo ji pêwîstiyên rojane re yan jî ji ferzkirinan re bersiv biafirîne, ji bo ji pirsgirêka dîrokî, civakî ya bikok re bersivan pêş bixe hatiye avêtin.

Ev dahûrandin ji bo roja me ya îro jî derbasdar in. Di van dahûrandinan de, analîzên jin û mêr, dahûrandinên têkiliyên jin û mêr, analîza sosyolojîk a jinên diherikin refan cî digirtin. Dîsa pirsgirêkên ku di refan de derxistine û rêyên çareserkirina wan, wateya artêşbûna jinê û bi mêran re di şertên wekhev û azad de çawa dikarin bijîn, dê çawa bikaribin berpirsiyariyên şoreşê pêk bînin û di asta têkiliyên civakî sosyal de wekhev û azad bijîn û pêkanîna têkiliyan hebûn. Derbarê van de pîvanên hatibûn diyarkirin hebûn. Komîteyên Azadî û Wekheviyê hatin avakirin. Ya rastî mirov dikare van komîteyan wekî despêka pergala hevserokatiyê jî bihesibîne. Armanca van; di rêveberiyan de di asteke wekhev de bi cî kirina jin û mêr û ji holê rakirina şertên bêdadî û newekheviyê bû ku jin bi van re rû bi rû diman.

Rêber Abdullah Öcalan bersiveke berfireh dabû bi hezaran jinên ku bi wêrekî, welatparêzî û azweriya azadiyê diherikîn refan. Bi gava artêşbûna jinê, di serî de di nav partiye de zîhnîyeta mêrê serdest, hedef digirt. "*Têgîneke bi navê artêşa wekheviyê tune ye. Li cihê ku lê wehkevî heye, artêş li wê derê nabin. Li cihên newekhevî lê hebin, artêş li wê derê derdikevin holê. Yek artêşa bindestan e, ya din artêşa serdestan e û li derekî her tim artêşa mêran hebe, li wê derê çewisandineke tam a jinê heye. Her wiha jiyan jî vê yekê piştrast dike. Wisa be di wateyeke pir giştî de, ev tespît jî ji bo wekheviya artêşbûna jinê nirxeke bingehîn îfade dike. Divê em vê bibînin û bizanibin. Dema bipirsin 'Çima artêşbûna jinê'; wê bersiva me ev be; 'ji ber ku amûra herî bingehîn a wekheviyê ye, loma."* Bêhejmar destnîşankirin û nirxandinên weke vê yên Rêber Abdullah Öcalan, ji bo jin hêza xwe ya cewherî nas bikin û derxînin holê hêzeke xurt daye bi hezaran gerîlayên jin.

Rêber Abdullah Öcalan, dijberî zîhniyeta mêrê paşverû yê feodal ê li hember jinê bêbawer e, ji bo me bi baweriyeke bêsînor, piştgirî, derbarê em ê rastiyê çawa bibînin de perspektîf û rexne pêş xistiye. Ev jî, di afirandina hêza têkoşîna li hember hezar zehmetiyên jiyana li çiyayan de, bûye hêza me ya esasîn. Pêvajoya artêşbûna jinê, li ser esasê cêribandinên me yên jiyanî yên girîng pêş ketibin jî, me di van cêribandinan de bi giştî bi mêran re heman zemînên jiyanê parve dikir. Di yekemin sala ku artêşbûna jinê pêş ket de; cara ewil bû ku yekîneyên jinan di şertên zivistanê de xweser yanê bi serê xwe diman. Bi vê cêribandinê me dît ku; dema jin azad dimînin, dikarin potansiyala xwe ya bêhempa derxînin holê. Di şer de, di rêxistinkirina jiyana xwe de, di çand û hunerê de, di wêje û hê gelek mijarên din de dikarin qabiliyetên xwe pêş ve bibin. Dema ji pêkutiya mêr dûr dimînin hevdu baştir nas dikin û baştir fam dikin. Hin utopyayên femînîstan yên beriya bi dehan salan hatine nivîsîn hene. Em jinên Kurdistanê, ji pêvajoya artêşbûna jinê ve, bi biryargehên jinê, mekanên jinê û çiyayên jinê, van utopyayan dijîn.

Di hemû bûyer û diyardeyên ku dest û dilê jinê pê bûne, bi jiyankirina afirandina cudahiyan, me baweriyên xwe bixwe kom kirin. Me ferq kir ku jin ji xweza, ji civakîbûna xwe û ji yekparebûna diyalektîka bi mêr re hatiye qutkirin û çawa ji hêza xwe ya cewherî re biyanî maye. Ya herî girîng jî, ji ber pêşderaziyên li ser me hatine ferzkirin, bê çawa bedenên me şermok mane. Çiyayên azad, bi bedenî, ruhî û hestiyarî me jî azad dikirin. Di vê demê de ji bo rêxistinbûna jinê peyva artêşîbûnê hatibe bikaranîn jî, nayê wê maneyê ku ev cêribandin tenê leşkerî ye, jixwe wisa nebû. Beriya her tiştî, li çiyayan di yekîneyan de jinên bi hejmareke kêm û belave diman, bi nêzikahiyên paşverû û feodal ên mêr re rû bi rû diman, pêşiya vê hat girtin. Dîsa bingeha avahiyên rêxistinî û bîrdozî yên dahûrandina hînbûyînên jinê ku ji

pergala paşverû û kevneşopî bi xwe re aniye û di jiyana gerîla de teyîsandina wê dike,hat avêtin. Ji bo hebûna jinê di her qadê de bikeve ferqa xwe, xwe derxîne holê û vê birêxistin bike, zemîneke pir xurt hat afirandin. Li ba jin, mêr û civakê baweriya ku jin li çiyayan, di şertên herî bêrehm ên şer de dikarin li ber xwe bidin û şer bikin nexwe di her qada jiyanê de dikarin biserkevin pêş ket. Ji jina ku koletî ew nexweşik kiriye, rêyên ku ber bi jina bedew ve diçin hatin keşifkirin.

Cêribandina artêşbûna jinê, li çiyayên Kurdistanê, derbarê hebûna jinê, sosyolojiya wê û azweriya azadiyê de daneyên pir girîng derxist holê. Derbarê tevlîbûna jinê ya li ser cî û rola wê ya di şer de nêrîna heyî serobin bû, ezberên heyî xera bûn. Derket holê ku koletiya li ser jinan hatiye ferzkirin û hatiye pejirandin, diyardeyeke avakiriye û bê guman derbaskirin, guhertin û azadkirin jî mûmkin e. Bedena jinê, ji bo kolekirina jinê, wê bikin cinsê duyemîn û baweriya xwe bixwe pê bidin windakirin, kirine zemîn. Ji bo şikandina vê pêşderaziyê çavdêriyên cur be cur, dewlemend û cêribandin hatin jiyankirin. Têgihîştina bedena jinê ya ku cinsparêziya civakî ew afirandiye hat hilweşandin. Ji bo bedena xwe nas bikin, bi nav bikin û bi kar bînin qabîliyetên wan pêş ketin. Di vê cêribandinê de carna di astên diyar de rewşên bişaşîtî yên şibandina mêr, xwezilahiya xwe bi mêr anîn, bi mêr re ketina pêşbirkê yan jî dan ber hev jî hatin jiyankirin.

Di derbaskirina van de, bi dahûrandin û perspektîfan mudaxeleyên Rêber Abdullah Öcalan yên di cî û demê de diyarker bûn. Di heman demê de cêribandinên jinê di perwerdeyên xwe yên xweser de nirxandin û analîzkirin jî ji bo cêribandina hînker bingehekê ava kir. Her wiha bi artêşbûna jinê, qalibên li ser fikra jinan, beden û dinyaya wan hatine ferzkirin di van ceribandinan de hatin pênasekirin, ev qalip hatin şikandin û nîqaşên ‘li şûna van wê çi were avakirin’ pêş ketin. Ev cêribandina xwe spartiye bingeheke îdeolojîk û teorîk a girîng; li dijî sekna mêran a di feraseta serdestiyê de berxwedêr û bibiryar kete nav têkoşîneke berfireh. Cêribandina me ya artêşbûnê, di feraseta paşverû ya mêr a dibêje “jin di şer de nikare, li çiyayan bar e” de gêdûkên girîng vekirin. Ev cêribandin, ji aliyê encamên derxistiye holê û şikandina cinsparêziya civakî ve ji ber ku cêribandineke xweser e; bi serê xwe mijara dahûrandineke sosyolojîk û tezan e.

Artêşbûna jinê, di çareseriya pirsgirêka azadiya jinê û bi kûrahî nîqaşkirina wê de, rê li ber aso û pêngavên cuda vekir. Yek ji van gavan, avakirina YAJK’ê (Yekîtiya Azadiya Jinên Kurdistanê) bû. Kongreya yekemin a jinê di adara 1995an de YAJKê ava kir. Di dahûrandinên jinê yên wê demê hatin pêşxistin de Rêber Abdullah Öcalan bi van gotinan rave dike ka ev gav çima pêwîstiyek e; “*Di demên dawî de di bin navê YAJK’ê de pêşxistina asta azadiya jinên li Kurdistanê, em fikirîn weke çareseriyeke esas em dikarin biqefêlin. Hem bi zanistî, hem weke nirxa moral, dahûrandinên YAJK’ê jiyanî ne. Bi qasî xitimandina di asta siyasî û leşkerî û lawaziya zanînê de derbas bikin, ji bo bêparbûna ji vîn, azwerî û asoyê derbas bikin jî, em hewl didin çeka jêre YAJK dibêjin pêş bixin… Li vê derê wê şoreşeke rastîn were lidarxistin*.”

YAJK, di nav şoreşan de weke şoreşek hat avakirin û li ser pênc rêgezên bingehîn bilind bû. Ya yekemîn; heta dawî bi rêgeza welatparêziyê ve girêdan bû. Ya duyemîn; hêmaneke jêneger a rastiya şer, şerê çînî yê nav partiyê û şerê cins di nav hev de meşandin bû. Yanî têkoşînerî bû. Ya sêyemîn; weke hêza partî ya herî rêxistinkirî, bi rêgeza partiyê, rêgeza rêxistinkirina partiyê re ji her kesî zêdetir girêdan bû. Ya çaremîn; pêşxistina fikra azad, vîna azad bû. Ya pêncemîn; rêgeza estetîk-bedewiyê di jiyan, şer û her gava têkoşînê de başebaş bi serxistin bû. Li gel van rêgezên bingehîn, YAJK amûra eşq, tolhildan û serkeftinê bû.

YAJK, pêşxistina rêxistina jinê bû ku ceribandinên li çiyayan û li qadên civakî yên heta sala 1995’an li ber çav digirt. Lê azadbûna jinê, di guherîn û veguherîna civakî de wê diyarker bûya. Ya ku zêdetir diyarker û bandorker bû Rêber Abdullah Öcalan jî, ji bo veguherînê hêza azadiyê ya bingehîn rêxistin kir. Pirsgirêkên esasîn ên vê rêxistinê hebûn ku divê çareser bikira. Pêşketina fikrî zêdekirin, gihîştina hêza îfadekirina xwe, şerkirina bi kirêtiyên kesayeta jina kevneşop re û derxistina bedewiya xwezaya jinê diviya. Di heman demê de hedefên jinan, pîvanên wan ên pejirandin û

redkirinê, nirxandinên bedewî û kirêtiyê, ferasetên wekhevî û azadiyê, bi heza xwe ya cewherî li ser piyan sekinandin û pêşxistin hebû.
Li kêleka vê, rastiya mêr a divê bi têkoşînê were guherandin û veguherandin hebû. Rêber Abdullah Öcalan ji bo mêr jî di mijara nêzikahiya YAJK'ê de rêgez diyar kirin. Yek; mêrek, bi hêza raye, fermandarî yan jî mêraniya xwe wê nikaribe jinê bi kar bîne. Dudo; wê bizanibe, xwestina jinê, karê welatparêzî û şer e û divê bizanibe ku şer jî karê azadî û serkeftinê dixwaze. Mêrê ku serkeftina wî nebe, bi jinê re jiyaneke wî jî nabe. Yê vê rêzikê pêk neyne wê êdî ji aliyê hêzên YAJK'ê ve weke dijmin were dîtin û wisa pêre têkoşîn were dayîn.

Di pêvajoya YAJK'ê de dahûrandinên hatin pêşxistin, li welêt li ser şerê nav partiyê, têkiliyên jin û mêr, şer û pevçûnên di navbera wan de, bandoreke mezin çêkir. Mirov dikare wiha jî bibêje, paşverûtiyên di vê mijarê de her ku hatin rojeva Rêber Abdullah Öcalan, analîzên sosyolojîk hatin kirin. Asta bandorbûna ji van analîzan ji bo jinan cuda, ji bo mêran cuda bû. Demeke dirêj mêr û jinan ji van analîzan heman tiştî fêm nekirin, yan jî mêran nexwestin fêm bikin. Vê jî bi xwe re pêvajoyên bi pirsgirêk û zehmet derxist holê. Jinan, bi salan axlebî redkariya qaba, çor derbas nekirin. Li hemberî têkoşîna azadiya jinê, zîhniyeta paşverû ya mêr baş nehat şikênandin. Rêber Abdullah Öcalan, her çend bi afirîneriya hewce dikir, rêbaz û taktîkên di asta îdeolojîk û sosyolojîk de, di dema wê de digihand muxatabên wan jî, her çend li qada xwe faliyeteke perwerdehiyê ya pir xurt meşandibe jî ev rastî demekê berdewam kir û li ser têkoşînê bandorên wê çêbûn.

Ji aliyê din ve YAJK cêribandineke bêhempa bû. Jinên di qada leşkerî de serweriyekê bi dest xistin, di mijarên perwerde, afirandina atmosferên xwe yên xweser û bidestxistina ruhê yekîtiyê yê jinê yê pir xurt, pêşketinên bi coş afirand. Li ba meran, gav bi gav têgihîştineke wiha pêş ket; êdî divê jinê û Rêber Abdullah Öcalan zêdetir fêm bikin, ger nêzikahiyên klasîk nîşanî jinê bidin wê artêşeke jinê li hemberî xwe bibînin. Ceribandina me, têgînên ***zanatiya cins***, ***têkoşîna cins û hezkirina cins*** li lîteratura azadiya jinê zêde kir, di wê demê de ketin rojeva me. Bi van têgîn û hemû dahûrandinan, armanc ew bû ku jin, di serî de bixwe û hemcinsên xwe re, bigihên nirxên xwe yên cewherî. Di vê mijarê de gavên cidî yên pêşketinê hatin avêtin. Her ku jinê van gavan pêş xist, li ser esasê dijderketina li hemberî paşverûtiyên mêr û dayîne têkoşîna bîrdoziyê, têkoşîna cins jî pêş ket.

Merhaleya YAJK'ê, bi hezaran mîlîtanên şehîd ketî, di nav rêxistinê de rûdana erdhej û serobinbûna sosyolojîk û bi nirxên jinê û azadiyê yên van afirandiye, cêribandineke ku lêkolîneke sosyolojîk a berfireh heq dike. Rêber Abdullah Öcalan di dahûrandinên 8'ê adara 1998'an de hê di pêş de ev îfade dikir; "*Weke berhemeke xweşik a şoreşa me pêşketin derdikeve holê. Ez bawer im gavên tên avêtin heta bibêjî balê dikşînin û îlhamê didin her kesê/î. Lê mirov divê zêdetir li hêviya encamên vana jî bisekine. Ez bawer dikim hikmên misoger, hem ji aliyê mêr hem ji aliyê jinê ve, bi demê re ji aliyê hêzên eleqedar ên derdora me ve were dayîn wê rast-tir be. Em hê jî xebata labaratuarî ya vî karî dikin. Berhemên wê hê tam derneketine holê. Lê encamên wê yên destpêkê girîng e, balkêş e û erênî ye.*" Di roja me ya îro de jî ev pêwîstî hê heye û yek ji sedemên pêşketina Jineolojiyê pêk tîne.

Yek ji teoriyên di cêribandina YAJK'ê de esas hat girtin jî Teoriya Qutbûnê bû ku Rêber Abdullah Öcalan di sala 1996'an de ev teori pêş xistibû. Pêşaneya Berdana Heta bi Hetayî ya di salên 2000'an de wê biketa lîteratura me bû. Teoriya Qutbûnê, ya rastî diyardeyeke di salên berê de me cêribandibû. Lê me nikaribû bi sîstematîkî binirxînin. Di razberkirin û teorîkirina cêribandinên xwe de jêravahiya me ya pêwîst hê pêş neketibû. Di artêşbûna jinê de bi fizîkî em qut bûbûn. Piştre jî di vê mijarê de gavên girîng hatin avêtin. Lê ya girîng pêşxistina qutbûna ji fikir, hest û hînbûyînên jiyanê yên desthilatiya mêr dabû qezenckirin bû. Ev, ya herî zehmet bû, ji ber ku li ser nirxên azadiyê xwe jinûve avakirina jinê û guherîneke bi kok, kedeke pir giran, sebir û vînê pêwîst dikir. Teoriya Qutbûnê, teoriyeke beriya her tiştî naskirin û pênasekirina çavkanî, amûr û pêkanînên kolekirina li ser jinê hatiye ferzkirin pêwîst dike. Bi bandor û taybetiyên vê yên li ser şexsiyetê re, pêşxistina têkoşîneke hundirîn hewce dike. Li

gor vê teoriyê her jinek, xwe bi nêrîna azadiyê digire dest û bi awira hundirîn lêpirsîn dike. Li gor pirsên “Ez çiqas ez im? Ez çiqas aydî xwe me? Malbata ez têde çêbûme û mezin bûme, dibistanên ez çûmê, têkiliyên min jiyaye, çiqas li gorî azadiyê, çiqas li gor îdeolojiya cinsiyetparêz şekil dane min?” nexşeya şekilgirtina zîhnî, hestiyarî û ruhî ya di xwe de derdixe. Li gor vê destpêkên cêribandina azadiyê û têkoşîna divê bide diyar dike. Ji bo di vê têkoşînê de serkeftî be, diyardeyên divê jê qut bibe tespît dike. Ev diyarde, dibe ku mekanî û demî bin, dibe ku hin hînbûyînên hundirîn ên hiskirin yan jî fikrî bin. Weke mînak; eger jinek ferq dike ku mekanên nav pergalê û şêwazê jiyana vê, wê ji azadiyê qut dikin, dikare derbasî mekanên cuda bibe û têkoşîna azadiyê xurt bike. Mînak; di cêribandina me de, di pêvajoya artêşbûna jinê de dezavantajên mayîna bi gerîlayên mêr re di heman mekanê de, ji avantajên wan zêdetir bûn. Ji ber vê yekê jî bi fizîkî jî em ji wan qut bûn û li mekanên xweser ên bi tevahî jin lê dimînin man. Ev bû cêribandineke fêrker a bêhempa. Eger jinek li hember mêr pirsgirêka baweriya xwe bixwe dijî, divê ji vê bêbaweriyê, ji hemû faktorên wê diafirînin qut bibe. Lê ti jina ku ya heyî baş analîz neke, nikare teoriya qutbûnê xurt bi ser bixe. Kesên nizanibin qutbûnê ji çi, bi kîjan armanc û amûran, kîngê û çawa pêk bînin û bi azadiyê re têkiliyeke baş çawa bi ser bixin, wê pêrgî rewşên bi xeletî werin. Birastî jî ev şaşîtî di cêribandina me de di asteke girîng de û demeke dirêj hat jiyankirin. Seknên me yên ku qutbûnê tenê mîna qutbûna fizîkî fêm kirin û qutbûna ji îdeolojiya serdest a mêr di jinan de hundirîn kiribûn ji nedîtî ve hatin û ji ber vê sedemê jî nikaribûn têkoşîneke cins a serkeftî bidin, pir pêş ketin. Hin pratîkên me jî çêbûn ku bi nêrîna bandorbûna ji sosyalîzma reel nêzî têkoşîna cins bûn, pirsgirêkên ku divê di kêliyê de, di deme de û bi lezgînî werin çareserkirin hiştina piştî şoreşê hakim bû. Analîzkirina tevahiya van pratîkan û ders jê derxistin, ji bo me şansekî mezin bû. Me her çend ji destpêkê ve wate û pêwîstiya teoriya qutbûnê ferq nekiribe jî, di nav salan de em ji cêribandinên xwe hîn bûn ku; di afirandin û jiyankirina nasnameya jina azad de ji bo jinê teoriyeke jêneger e. Jiyanê bi bandorî fêrî me kir ku ji diyardeyên pêwist e çima divê em qutbûnê pêk bînin. Ji ber vê sedemê, hê jî weke teoriyeke bingehîn a azadiyê ya Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê tê destgirtin.

Di sala 1996’an de derbarê wateya teoriya qutbûnê de hê nîqaş û hewldanên me yên fêmkirinê berdewam dikirin, weke pratîka lûtkeyê ya vê teoriyê, di 30’yê hezîrana 1996’an de çalakiya fedaî ya hevala Zeynep Kinaci (Zîlan) pêk hat. Zîlan nîşanî me da ku li hemberî hêzên dewletê yên di nava şerekî de ye, ji bo afirandina nasnameya Kurdê azad pêwiste qutbûyîneke esas pêk were û ji bo vê heke pêwist bike taybetiyên ku divê werin teqandinê jî danî holê. Di nav partiye de derbarê mijarên şer, rêxistinkirin, têkoşîna îdeolojîk û afirandina kesa/ê azad de xitimandina tê jiyîn ji bo werin derbaskirin, taybetiyên paşverû yên divê em ji wan qut bibin nîşan da. Ji ber vê yekê jî di asta jor de bû têgihîştin û pêkanîna teoriya qutbûnê. Jinek, eger ji hemû girêdanên xwe yên ku paşve dikşîne qut bibe, wê azadiyê li lûtkeyan bijî. Hevala Zîlan, mêr û jinên di nav partiyê de hejand û ber bi lêpirsîneke kûr ve bir. Bû rêbereka ku hem ji aliyê azadiya jinê, hem ji aliyê têkoşîna me ve aso û rêyên nû da qezenckirin.

Rêber Abdullah Öcalan, di 8’ê adara 1998’an de ji bo jinan weke diyariya 8’ê adarê Bîrdoziya Rizgariya Jinê îlan kir. Heman rojê hevala Sema di zindana Çeneqqaleyê de li dijî lîberalîzekirina têkoşîna azadiyê ya ku mêr dike, nav pergalîkirinê, ferzkirinên îdeolojîk ên rê li ber radestbûnê vedikin û paşverûtiya revîze dike bi gotina ‘Ez dixwazim bibim pirek di navbera 8’ê adarê û 21’ê adarê de’ çalakiya xwe pêk anî. Raporên li pey xwe hiştî di warê felsefîk û îdeolojîk de pir kûr bûn. Ji bo hemû avahiya partiyê û bi taybet ya jinan, di asta lêpirsîna xwe û lêgerîna wate dayîna partîbûyîna jinê de her tim bû mînakek. Piştî şehadeta hevala Sema ya 17’ê hezîranê, hevalê Fikrî Baygeldî jî bi gotina “Rêhevala Sema fermandara min e!” Hevala Sema û çalakiya wê bi çalakiyekê pêşwazî kir. Milîtanê PKK’ê hevalê Fikrî Baygeldî jî di nêzikahiya azadîxwaz a mêr ji bo jinê de, bû sembola rêhevaltiyê.

Rêber Abdullah Öcalan û Tevgera Jinê van şehadetan bi berfirehî dahûrandin.

Îlana Îdeolojiya Rizgariya Jinê, peyamên şehadetan, di eniya jinê de heyecaneke mezin çêkirin lê di pêşxistina bersivên divê yên di deme de kêm û kuriyên cidî rûdan. Lê gavên azadiya jinê weke şoreşekê bi pêş ketibûn û Rêber Abdullah Öcalan tevî pêkutiyên giran ên pêvajoya kompleyê, di payîza 1998'an de pêvajoya Partîbûna Jinê bi van nirxandinan da destpêkirin. "*Çawa ku partiya sosyalîzmê heye, divê partiya jinan jî hebe. Partiya Jinan a Şoreşger a Kurdistanê heye ku bibe pêşketineke cidî. Nakokiyeke mezin tenê bi partiyeke mezin dikare were derbaskirin. Pirsgirêkên we giran in. Bibin partî! Divê hûn xwe bi rêxistin bikin. Tevî ku ez xwedî fikreke ev qas alîgirê jinê me, dibe ku aliyê min ê mêr ên zextê dike hîn bi giranî be… her wisa, divê hûn rizgariya xwe bixwe pêş bixin… Ji tevahiya nêzikahiyên mêran re, li ser navê rêxistina jinan wê balkêş be bersiv bê dayîn. Hemû planên we, çiqas xeyalên jinê hebin, hemû bi rêxistinê dikare were pêkanîn newisa? Him rengarenr bifikirin, him gavên pratik ên qiymeta wan hebin bavêjin. Ez van wekî sempatîzanekî jinê dibêjim. Wisa pir niyeta min tune ye ez bibim rêberê rizgariya jinê. Hûn dikarin min weke alîgirekî bi kar bînin. Ez ji partiyeke rizgariya jinê re alîgir û piştevan im. Heta hûn dikarin hin mêran jî bigirin nav. Yanê rêxistineke ne tenê ya cinsek. Hûn dikarin mêrê ku şertên jinê tam dipejirîne bigirin. Mesela mêrekî mîna Fîkrî Baygeldî dikare bibe endamê vê partiye.*"

Di cêribandina me ya azadiyê de Îdeolojiya Azadiya Jinê û Partîbûna Jinê dihat çi maneyê? Ji bo rizgariya jinê îdeolojiyek û partiyek çima pêwîst bû? Diyardeyên jinan ên divê xwe jê rizgar bikin çi bûn? Çareseriya nakokiya cins çima partîbûnê pêwîst dikir? Ji bo em vê gava şoreşî ku hatiye avêtin watedar bikin em dikarin gelek pirsên din bipirsin. Partîbûna jinê; ji modela rêxistinbûnê wêdetir, ji bo ku cidiyeta armancên dixwaze bi ser bixe, bigihîne teorî, bername, rêzikname û ekîbeke sererkan îfade dike girîng e. Cewhera wê ev e. Îfadeya asta rojevkirina pirsgirêka azadiya jinê, israra di lêgerîna çareseriyê de û rêgezên wê, strateji, taktik û têkoşîna wê ye ku jin wê bi biryardariyên xwe yên cewherî van bikin . Di jiyana civakî de jin bixwazin kîjan pirsgirêkê çareser bikin wê bi rêxistinî nêzî wê pirsgirêkê bibin, bi rêxistinî nîqaş bikin û çareseriyên rêxistinî pêş bixin. Partîbûyîna jinê, li dijî feraseta serdest a mêr ku jinan hem di şexsiyetê de parçe dike hem jî weke cins parçe dike û li dijî hev bi cî dike helwestek e. Bêguman her jinek xwedî xweseriyeke takekesî, sekna xwe, azadî û karakterekî xas aydî xwe heye û wê vê pêş jî bixe. Lê dema mijar dibe pirsgirêkên jinan ên azadiya hevpar, pirsgirêkên jiyan û têkoşînê, ev aqil, biryardarî û tevgerandineke hevpar pêwîst dike. Di vî warî de partîbûna jinê, aqilê hevpar ê jinan e, dezgeha biryardarî û çalakbûnê ye. Ji hêla din ti pirsgirêkeke takekesî ya ku jin dijî, ji operasyonên kolekirinê yên aqlê mêr ê serdest li ser jinan ferz dikin qut nîne. Ji ber vê sedemê, îdeolojiya rizgariya jinê, sedemên bingehîn ên koletiya jinan diyar dike. Li hember van sedeman avahiyên fikrî yên alternatîf diyar dike, partiya jinê jî perwerde, têkoşîna hevpar, seknên alternatîf û çalakiyên vana pêş dixe. Bi vê rêgehê, cêribandina azadbûna her jinekê jî pêş dixe û qadên azad ên civakî berfireh dike.

Lê mixabin ev gava şoreşî, bi komplo û îxaneta dîrokî ya ku serî Emerîka dikşîne, Îngîltere bixwe plan dike, hêzên hegemonîk ên navneteweyî, Tirkiye, Îsraîl û hêzên herêmî û cîgayî, Yewnanîstan û Rûsya jî di organîzasyona wê de cî digirin, di şexsê Rêber Abdullah Öcalan de li ser gelê kurd û jinan pêk anîn xistin dewrê. Xwestin ku şoreşa me ya azadiyê tesfiye bikin. Rêber Abdullah Öcalan, ji sala 1999'an ve li girava Îmraliyê ya Tirkiyeyê di girtîgeheke yek-kesî de, di bin tecrîdeke giran de dimîne. Di dema vê kompleyê de, di jiyankirina bêhntengiya pirsgirêkên rêxistinî yên giran de, cêrîbandîna me ya partîbûyîna jinê, pratîkbûna heq kirî, wê çend sal bi derengî biketa. Lê fikra wê û nîqaşên da destpêkirin jî jinan xist nava liv û tevger û lêhûrbûnekê. Di 1999'an de PJKK (Partiya Jinên Karker ên Kurdistanê), di 2000'î de PJA (Partiya Jinên Azad), di 2004'an de bi navê PAJK'ê (Partiya Azadiya Jinên Kurdistanê) rêxistinbûna partiyê hat çêkirin. Di cêribandina azadiya jinê de rê li ber gavên pir mezin vekir. Derbarê pergala baviksalarî, şekilgirtina jin û mêr a ku afirandiye û bi vana re wê çawa têkoşîn were dayîn de, bi teorîkî û pratîkî

daneheveke pir xurt hat çêkirin. Bi serobinbûna kesayetan, bi têkoşîna hundirîn, asta guhertineke girîng hat jiyankirin.

Di sala 2001'an de Rêber Abdullah Öcalan ji bo me pêşniyar kir da ku em bi navê Peymana Jinê ya bi Civakê re xebatekê bikin. Weke partiya jinê me vê Peymanê xiste rojevê. Ev xebat bi nîqaşên hevpar ên hem di navxweyî de, hem jî bi jinên li welatên cuda yên dinyayê re, bi danûstendina nêrînan hat meşandin. Pênaseyeke wiha jî heyecanekê da tevahiya jinan. Xebatên derbarê peymana civakî ya gihîştî asteke girîng de, hê jî berdewam dikin. Dîsa di sala 2002'yan de zewaca Talip- Zerduştî ên neviyên xwedavendan, di sala 2004'an de nirxandinên Xwedavendbûn-Afrodîtbûn-Melekbûnê, tevî bandorên giran ên komployê, di meşandina têkoşîna azadiyê û derbaskirina pirsgirêkên pir giran ên jinan de, asoyên nû vekirin. Ev gav, ji bo zîhniyeta bi paradîgmaya kevn şekil girtî, ji guherînê re vekirî hiştin bûn. Ji aliyên cuda ve nihêrtin, têgihîştina maneya têkiliya azadî û nermî, dahûrandina şekilgirtina sosyolojîk û psîkolojîk a rastiya demdirêj a şoreşê afirandî û çareserî dîtin û hê di gelek mijaran de dînamîzmeke girîng bi nîqaşa van rojevan pêş ket.

Di vê pêvajoyê de qadeke girîng ku serboriyên dewlemend û ezmûn têde kom bûne jî qada xebata siyasî bû. Ev cêribandin, li her aliyên Kurdistanê bi taybetiyên aydî xwe pêş ketin. Lê xala hevpar; reng û nasnameya jinê di polîtîkayê de xuya bû û meyl da. Di vê mijarê de xwedî destpêkên girîng in. Di qadên perwerde, aborî, çand, huner û wêje, dîplomasî û çapemeniyê de rêxistinên xweser hatin pêşxistin. Di qada civakî de li gor pêwîstiyên jinan û ji bo pirsgirêkên wan, rêxistinên cuda hatin avakirin. Di 2005'an de bi partiya jinê re, sazkirina KJB'ê (Koma Jinên Bilind) ku cêribandina pergala konfederal a jinê bû, ji gavên şoreşî yên din bû. KJB, weke pergala rêxistina banî; PAJK, weke partiya serkan a pêşeng a îdeolojîk a jinê, hêza parastina rewa ya jinê YJA Star (Yekîtiya Jinên Azad a Star), weke rêxistina qada civakî û siyasî ya jinê YJA (Yekîtiya Jinên Azad), dînamîzma bingehîn a têkoşînê Komaleyên Jinên Ciwan, xwe di ser van pêkhateyan re biavahî kirin. Tevahî pêşketinên me diyar kirin, ji sala 2005'an ve bi KJB, 2014'an re, di bin banê KJK'ê (Komaleyên Jinên Kurdistanê) de hatin meşandin.

Aliyê xweser ê tevahî cêribandininên me yên di van salan de, di nav şertên esareta Rêber Abdullah Öcalan de hatin jiyankirin. Bi salan em her tim bi piştgirî û perspektîfên wî yên rojane meşiyabûn. Û me perspektîf û pêşniyarên wî yên beriya salan me ji demên wiha re amade dikir, di demê de fêm nekiribû. Me kêmasiya dostanî û rêhevaltiya bi jinê re kêlî bi kêlî diafirand û dijiya, di demên komployê de heta hestiyên xwe jiyan kir. Lê me tu car dev ji têkoşîna azadiya jinê berneda ku digot '*projeya min a nîvco mayî*' ye. Cêribandinên di vê pêvajoyê de hatin jiyankirin, ji bo jinan yekem bûn. Her çend gelek kêmasiyên xwe hebin jî, îspat kir ku keda giran a Rêber Abdullah Öcalan da hêza bingehîn a azadiyê vala neçû. Rêber Abdullah Öcalan, di şertên Îmraliyê de jî, ji jinan re proje û pêşniyarên her tim hêz didin ragihand. Ev, di tevgera me de her tim dînamîzma vebûn, guherîn-veguherîn, firehbûn û kûrbûn û pratîkbûnê pêş xist.

Bi gavên ku di pêvajoya cêribandinên me yên artêşbûna jinê, YAJK, partîbûn, Projeya guhertina mêr û jiyana azad, Peymana Civakî, Konfederalîzma Jinê de pêş ketin, mijareke din a girîng ku em lê serwext bûn; rastiya mêr bû. Rêhevalên me yên gelek mêrxas ku bi nirxên bingehîn ên jiyan û azadiyê ve girêdayî man û şer kirin jî hebûn. Li hember jina rêxistinkirî û azadîxwaz yên bi hurmet û piştgiriyê didan jî. Di cêribandina têkoşîna me de mêrên ku azadiya jinê weke xeterî didîtin û bi paşverûtiya mêr zorê didanê, ji jina bi hêz ditirsiyan jî. Lê encama herî girîng a me derxist; jina rêxistinkirî û bi vîn, ya bikaribe di hemû qadên jiyanê de nerm û estetîk be û xwe perwerde bike û hêza fikrê qezenc bike, di veguherandina mêr de misoger dikare diyarker be. Di nêzikahiya guherîn û veguherîna mêr de hin cêribandin hebin jî, bi gelemperî, me redkariya çors û îsyankariyê pir derbas nekir.Ev qad, bi sosyolojîkî û psîkolojîkî, di nav pêşketina cuda û dîrokî de, mijareke ku divê were

veguherîn çêbûn. Êdî bi mêran re jî têgihîştineke wisa pêş dikeve ku pirsgirêka jinê mîna pirsgirêkeke azadiyê ya civakê bibîne û her wiha pirsgirêka azadiya mêr jî heye.

Di vê qadê de Rêber Abdullah Öcalan, di sala 1998'an de, bi YAJK'ê re rastênhev (paralel) xwest YAZK'ê (Yekîtiya Azadiya Zilamên Kurdistanê) pêş bixe. "*Pirsgirêk ne ewe ku we tenê di armanc, şênberî û hevrebûna YAJK'ê de meşandin, şerkirin e. Di vê mijarê de me têgîneke din weke YAJK'ê pêş xist, ji vê re jî got YAZK. Çawa ku em dibêjin Yekîtiya Azadiya Jinên Kurdistanê, ya rastî Yekîtiya Azadiya Zilamên Kurdistanê jî têgînek e. Belkî jî ji jinê zêdetir pêwîst e mêr werin azadkirin. Asta azadbûna mêr, belkî jî ji ya jinê zehmettir e. Em niha girîngiya vê bi awayekî kûrtir dibînin. Di jinê de bûyera koletiyê tê derbaskirin, di mêr de koletî û kolekirin bi înadeke mezin tê berdewamkirin û pir bi muhafazekarî tevgerandin heye. Di jinê de jihevketin hîn hêsantir pêk tê, daxwazî û arezûya ber bi azadiyê ve xurt e; bi mêr re jî derstneberdana ji vê hakimiyetê, muhafazekarî, her tim ferzkirineke li gorî xwe, bi israr berdewam dike… Mêrê amade yan jî jina amade nabe, ev bi şoreşê tên afirandin. Ev, di şoreşê de jî bi şêwazê serfiraziyê tê bidestxistin.*"**(97)** lê ev gava heta bibêjî girîng; di bin siya komployê de ma. Di heman salê de **Projeya Guhertina Mêr** kete rojevê; piştî pratîkên redkar ên çor, ji aliyê Rêber Abdullah Öcalan ve hat rojevkirin. Di vê bergehê de, di navbera salên 2000 û 2003'yan de perwerdeya mêr a di bin banê PJA'yê de dest pê kir. Ev jî cêribandineke cuda û girîng bû. Bi hemû aliyên derxistin holê ve, pêvajoyeke ku analîzkirineke berfirehtir heq dikir. Herî dawî Rêber Abdullah Öcalan di parêznameyên xwe de Hevjiyana Azad girt dest. Ev jî nîşan dide ku Rêbertî xwezayên jin û mêr û pirsgirêkên wan ên azadiyê çiqas diyalektîk digire dest, keda heta îro di vê qadê de daye, bi biryardarî û narîniyeke çawa xwedî lê derdikeve. Prensîbên di teoriya Hevjiyana Azad de tên îfadekirin, îfadeya bawerî û divêtiya pêşxistina jina azad û mêrê azad e. Ev qad jî parçeyeke girîng a tevgerên azadiya jinêye ku bi berpirsiyariyeke divê hê jî bi girîngî li ser bê sekinandin. Bi analîzeke rast a serboriyan, em dikarin rewşa îro tê jiyîn baştir analîz bikin. Yek ji xalên Jineolojiyê dike pêwîstî jî; di vê mijarê de li danehevên cêribandinên me derxistiye holê bi sosyolojîkî, jinûve nihêrtin û pêwîstiya niqaşê ye. Di heman demê de xalên pêşketin têde xitimîne û pirsgirêka di niha de tê jiyîn, li gor vê analîzê jî dest girtin û lêkolînkirin e. Bi zanistên civakî, derbarê têkiliya îdeolojîk û partiyên îdeolojîk de zanatiya me bi dest xistiye, ew qade ku em ê zêdetir têde bidin xuyakirin.

Ji bo zanistên civakî, çand û lîteratura şoreşger û sosyalîst, tevkariyeke pir girîng a cêribandina Têkoşîna Azadiya Jinên Kurdistanê û bi tevahî cêribandinên şoreşa Kurdistanê çêbû. Di cografyayeke ku zihniyeta feodal û kapîtalîst di nav lihevkirineke kûr de ne, di şerê tunekirina azadiyên civakî û azadiyên takekesî de, jin, çil salan di nav cêribandina têkoşînekê de bi çalakî û bandorî cî girtin. Ev bixwe jî ji bo zanistên civakî bi salan bigirin dest û lêkolîn bikin avakirina dewlemendiyeke materyalan e. Jixwe cêribandina me carekê, li ser mêjiyên him zanistên civakî him jiberên, ezberên çepgir, sosyalîst û şoreşger ku zenûnî kirine bû mudaxaleyek. Em weke jinên ji gelên din û ji çandên din di Têkoşîna Azadiya Kurdistanê de me cî girtiye, me îspat kir ku jiyan li gor ezberan pêş nakeve û azweriya azadiyê tu car nayê astengkirin. Me ezbera dibêje pirsgirêka jinê di nav şoreşê de nayê çareserkirin xera kir. Di vê mijarê de ceribandina me xwedî taybetiyên cuda ye ku him jin û him jî mêr weke nasnameyên pêdivî bi azadiyê heye wekhev hesiband. Cêribandina me, têkoşîna bi jina kevneşopî û mêrê desthilatdar re, weke divêtiya azadiyekê, tenê neda li ser milên jinan. Ji bo mêran jî hem li dijî paşverûtiya jinê hem jî li dijî serdestiya mêr, berpisiyariya xwe perwerdekirin, xwe avakirin û azadkirinê hate dayîn. Û êdî nifşeke mêrên ku sekna xwe ya li hember azadî û têkoşîna jinê weke yek ji kevirên qorziyê yê felsefeya jiyaneke watedar û azad digirin dest û lêpirsîn dikin pêş ket. Di heman demê de jin çawa şerkirina bi hînbûyînên jinê yên koletî yên di şexsiyetên xwe de weke kedeke azadiyê dinirxand, di vê mijarê de mêr jî bi perspektîfa kuştina mêr a di zîhniyeta xwe, di hînbûyînên jiyana xwe, di tevger û zimanê xwe de,pênasekirin û pêşxistina têkoşîna xwe ya hundirîn pêş ket. Ev, çend ji

tevkariyên bingehîn in ku cêribandina me, li sosyolojiyê û kevneşopiya têkoşîna civakî zêde kirin. Di têkoşîna me de navê şêwaza têkoşîna bi mêr re tenê weke şerkirina dijbertiyê û jiyîn û ferzkirina duserîbûnê, redkariya çors e. Ev jî naveke ku me li lîteraturê zêde kiriye. Di heman demê de cudahiya zîhniyetê ye ku me di têkoşîna cins de bi cî kiriye. Dem bi dem perspektîfa çawalêhato ya em têkoşîna cins bidin lê çawa dibe ew dizane di pratîkê de li gel me were jiyankirin jî, perspektîfa me ya îdeolojîk her tim derbarê çawayetî, amûr û rêbazên vê têkoşînê de lêhûrbûnekê pêk anî. Yek ji hedefên bingehîn ê vê lêhûrbûnê jî; bi azadiya jinê re, afirandina guherîn, veguherîn û azadbûna mêr ku her tim bikaribe destekê bide wê bû. Di têkoşîna dijwar a li vê qadê tê dayîn de, wê bibe ji mijarên bingehîn ku Jineolojî bi perspektîfa dîrokê bigire dest. Lê teyîsandina encamên derxistiye holê, nîşan dide ku ji cêribandinên têkoşîna civakî û çanda sosyalîst re tevkariyeke şoreşî ye. Yek ji mijarên bingehîn ê lêkolîn û vekolanê ya Jineolojiyê ewe ku; him di têkoşîna Azadiya Jinên Kurdistanê de encamên derketine holê, him jî encamên ku cêribandinên têkoşînên jinan ên li welatên cuda derxistine holê, ji bo zanistên civakî û têkoşînên civakî tevkariyên wan be.

Weke pêngaveke nû ya şoreşê Jineolojî, wê lezekê bide vê cêribandina me ya ku merhaleyên heta îro hatine, me xwest bi xetên sereke îfade bikin. Nêzî heft salan e Jineolojî di rojeva me de ye. Sê salên destpêkê, mirov dikare bibêje pêvajoya lêkolîneke diyar û avakirina danehevê bû. Çar salên dawîn jî hîmeke girîng bi dest xist. Jineolojî çima weke pêwîstiyek derket? Di nav ev qas cêribandinên me de beramberî ku derê tê? Bi cêribandina me ya bi dehan sal, em ê wateyeke çawa bidin Jineolojiyê? Jineolojî wê bi kîjan gavan tevkariyekê li cêribandina me ya bi dehan salan bike? Li ser vî esasî, ji bo valahiyên mezin ên heyî ji holê rake, pêwîstiya Tevgera me bi avakirina perspektîfeke nû heye. Em dikarin vê pêwîstiyê ji rexne û şiyariyên Rêber Abdullah Öcalan jî bixwînin. "*Jin her tim di civakê de winda dike. Eger bixwazin rast binihêrin, divê bizanibin ku jin di civakê de her tim winda dike û pêşketina dîrokî ya vê derxînin holê. Bila berê xwe bidin xebatên ku rê li ber nîqaşên bingeha azadbûna jinê vedikin. Bila têkoşîna ji bo jinan, kûrkirina fikra azadiya jinê esas bigirin. Bila dev ji şêwazê îsyankar berdin û çareserker bin. Di mijarên hawirdor, ekolojî, femînîzm, aborî û hwd. de valahiyên mezin hene, bila van tije bikin.*"

Sedema pêşxistina Jineolojiyê, tam jî di vê xalé de bi îdîaya ku ji van pirsgirêkan re avakirina çareseriyê ve girêdayî bû. Jineolojiya di 2008'an de weke perspektîfeke Rêbertî pêş ket, ji cêribandina sî salan a têkoşîna me ava kirî dadiwerive. Wê mîna zanisteke civakî ya ji bo sazîbûna jinê bibe destek pêş bikeve. Em bi cêribandina têkoşîna xwe digihên zanînê û cêribandin, zanîn, hêza hest û fikir a bi ezmûnên pir zehmet ava dikin. Jineolojî jî di ser vê hêzê re îdîaya me ya pêşketinê ye. Di têkoşîna me ya azadiyê de rêbaza cêribandina bi perspektîfeke bîrdozî ya diyar, cêriban, ezmûn, daneyên pratîkê derxistî holê bi zanebûneke dîrokî, di qada sosyolojîk, îdeolojîk û psîkolojîk de, dayîna ber analîza takekesî û kolektîf, parvekirin û jinûve rûbirû mayîna bi jiyanê re hakim bû. Jineolojî, encamên bi van rêbazan derketine holê, merhaleya em gihanê û aliyên em têde xitimîne, ketine dubareyan, pêş ketine û paş ketine wê derxe holê. Di heman demê de li gor xweseriyên dem û mekan, rê û rêbazên nû divê çi bin, derbarê wan de pêşî vekirinê wê hedef bigire. "*Potansiyela azadî û wekheviyê ya mezin ku di bereya jinê de kom bûne, bi nirxên ETÎK û ESTETÎK tevlî pêşketina civaka demokratîk bikin wê wateyeke mezin îfade bike. Di vê hêlê de xitimandinek heye. Çareserkirin û pratîzekirin, xwedî girîngiyeke mezin e. Ev, ji bo pêşengiya hem neteweyî hem jî herêmî pêwîst e*." Ev perspektîfa Rêber Abdullah Öcalan, qadên divê Jineolojî gav bavêje jî, qadên divê bi afirînerî tevlîbûn çêke jî zelal kiriye.

Em zanistên civakî yên ku heta niha zanisteke jinê nefikirîne, bi şekilgirtina aqlê mêr rexne dikin û berê xwe didin asoya Jineolojiyê. Em divê di ferqa giraniya vê rexneya xwe de bin û nêzikahiyên xwe biafirînin. " Nîşandana t*êgihîştin û tevlîbûna rast,ne pirsgirêkeke şexsî,pirsgirêkeke civakî ye."* Ev tespîta Rêber Abdullah Öcalan dibe ku herî bi kûrahî em ji bo Jineolojiyê bihizirin û watedar bikin. Ji ber ku weke

zanista jiyana civakî ji Jineolojiyê fêmkirin an jî nefêmkirin, li gor vê gav avêtin yan jî neavêtin, pirsgirêkeke civakî ya ji ya tê zanîn berfirehtir û piralîtir e. Zanista jinê, ya wêrek, adil û afirîner e. Vebûn û alternatîfbûn hê ji destpêkê ve heke wateyên li zanista jinê tên barkirin bin; di ku derê û çi yê ya heyî de xitimî ye, tespîta wê kirin jî elîfbaya vê ye.

Her deverên Kurdistanê ku demekê pel lê nedileqiyan, îro bi dînamîkên pir rengîn û dewlemend ên civakî serobin dibin. Serobinbûna her kêliya jiyanê, bi reng û ruhê jinê ye. Di şer, rêxistinbûnên civakî, akademî, qada çand û huner, wêje, weşan û çapemenî, bi kedê afirandina her kêliya jiyanê de, ew 'xwezaya bielektrîk' a jinê li ser kar e. Li erdnîgariyeke ku weke jin zayîn lanetî tê dîtin, jinbûn tê biçûkxistin, Rêber Abdullah Öcalan û Tevgera Azadiya Jinê ya Kurdistanê, jinên zayîna xwe ya weke jinekê û jinbûnê mîna bextewarî û rûmetê dibînin xwedî kirin, gihandin. Di merhaleyeke ku ev guherîn û veguherîna di her kêliya wê de ked, berdêl, qehremanî, berxwedanî û ronîbûn hat jiyankirin û hat afirandin de, bibe xwedî avahiyeke saxlem a fikrî û pergaleke civakî di girîngiyeke jiyanî de ye, Jineolojî ket rojeva me.

Li Kurdistan û gelek welatên dinyayê, gel û rêberên wan, pêşengên wan mînakên berxwedanên pir mezin pêşan kirin. Têkoşîneke bi heybet dan. Lê ji bo ku nikaribûn şaristaniya dewletparêz û desthilatparêz û avahiya zîhniyeta wê derbas bikin, ev kedên mezin bi layiqî nehatin bi pergalîkirin. Ji nêrîna baviksalarî rizgar nebûn. Piştî şoreşê ya bi desxistin dubarebûn, kopya û carna jî tenê teqlîdeke xirab a pergalê bû. Weke Tevgera Azadiya Kurdistanê ji bo em jî vê encamê nejîn, ji destpêkê ve karaktera jinê ya şoreşa me hebû. Lê di merhaleya em gihanê de, divê ev karakter xwe bispêrin bingehên hîn saxlem. Ji zanîna zanistî, felsefe, metafîzîk, mîtolojî, her qada jiyanê, her diyardeya wê re divê nêzikahiyeke hîn gihaştî, rûniştî û avakirina prensîbên xwe pêwist e.

Tevahî nirxên em heta îro di pêjavoyên giran de derbas bûne û me afirandiye, ji bo di lîberalîzma kapîtalîzmê de nefetisin, ji aliyê zîhnî ve jî divê em xwe bi kesayeta jinê ava bikin. Hemû taybetiyên zîhnê bi karaktera jinê, em divê bi dest bixin. Rastiya parçeyî ya gotina wê mê, çalakiya wê nêr, di her qada jiyanê de, bi awayên cuda tê jiyankirin. Dem û xebatên gotin û çalakî mê ne jî hene. Lê di merhaleya niha de, em divê her kêliya xwe wiha bijîn. Ji ber ku modernîteya kapîtalîst, bi tevahî rêxistinbûna xwe, li ser gelê Kurd û hemû gelên din ên berxwe didin di her kêliya jiyanê de di pozîsyona êrîşê de ye. Carna kêliyek, çalakiyek yan jî gavek, dikare çarenûsê diyar bike. Girîngiya Jineolojiyê jî di merhaleyeke wiha de derdikeve holê. Divê nêrîna jinê, bi analîza sosyolojîk a ku cêribandinên me heta niha dîtî jinûve were pêşxistin û her kêliya jiyanê bi vê nêrînê bê jiyîn. Bêyî ku bikevin cudahiya mezin a di navbera teorî û jiyan, zanist û civakê de. Di asta zanebûna me de bilindbûn, vebûn û kûrbûn çiqas be, di her kêliya jiyana xwe de bi vê bilindbûn, vebûn û kûrbûnê jiyankirin girîng e. Ji bo, avantajên ku Rêber Abdullah Öcalan di nirxandina xwe ya jêr de diyar dike em pratîk bikin wê asta azadiya jiyanê bilind bike: "…Mesafeya di navbera îdeolojî û sosyololîyê de kurt bûye. Mesafeya di navbera sosyoloji û sosyalîzma zanistî de jî kurt bûye. *Cudahiya di navbera sosyolojî û sosyalîzma zanistî de jî kêm bûye. Danûstendina di navbera fikra îdeolojîk, sosyolojîk û sosyalîzma zanistî de yekparebûnek girtiye, her ku diçe, ber bi zanisteke civakî ya hevgirtî re diberide. Divê mijarê de PKK di nav partiyên bi îdeal de di sere de tê. Esas hêza partiyeke sosyalîst, bi meyldariya wê ya ber bi zanista civakî ve tê pîvan. Hêza wê ya diyarker, ji girêdana wê ya bi zanista civakî çavkaniya xwe digire. Di kapasîteya wê ya îdeolojîk û sosyolojîk de payeya zanistiyê çi qas pêş bikeve, di rola pêşengiyê de jî wê, ew çend pêşketin bi dest bixe.*"

Ji bo rola pêşengiyê ya Tevgera Jinê ya di guherîn û veguherînên civakî de serkeftî bi cî bînin û vê pêvajoya têkoşînê, di nav cudahiyên demokratîk de, bi avakirina civakeke wekhev û azad tacîdar bikin, em ê "payeya zanistî"yê bi Jineolojiyê ava bikin.

**Jêrnot:**
**(97)** Perspektîfa ji Konferansa Partî-Enî re hatiye pêşkêşkirin 28'ê nîsana 1998'an / Abdullah Öcalan

**RÊNÎŞÊN ÇALAKIYÊN JINEOLOJIYÊ**

*"Ne bi tenê di dema modernîteya fermî de, di tevahiya demên hiyerarşîk û şaristaniyan de jin di hemû çaviyên civakî de ji aliyê zîhnî û bedenî ve dîl hate girtin û bi koletiyeke pir kûr hate xebitandin. Ji bo azadî, wekhevî û demokrasiya vê jinê hewcedarî bi xebatên teorîk ên berfireh, têkoşîna bîrdozî, xebatên programatîk û rêxistinî, ji van jî girîngtir pêdivî bi çalakiyên bi hêz heye. Bêyî van, xebatên jinê û femînîzmê wê ji xebatên jinê yên lîberal ên ber dile sîstemê xweş dikin wêdetir, tu maneyê îfade nekin."***(98)**

Aborî, etîk, estetîk, ekolojî, demografya û polîtîka, weke qadên Jineolojiyê hatibin diyarkirin, tam jî ji ber vê sedemê ye. Ji bo azadî, wekhevî û demokrasiya jinê.

Rêber Abdullah Öcalan dema di sala 1993'yan de xebatên artêşbûna jinê weke rêxistinbûna jinê pêş xist, gotibû; "*Cihê lê wekhevî hebe li wê derê artêş nabin*". Di roja me ya îro de em hê jî li gêrestêrkeka ku bi deste artêşên giraniya wan mêr in tê şewitandin û hilweşandin dijîn. Him jî ev artêşên ku giraniya wan mêr in ne tenê di qada leşkerî de ne. Zanista aboriyê ji aliyê artêşa mêran ve di bin dagirkeriyê de ye. Derbarê me de biryarên aborî yên jiyana me weke perê hûr xerc dikin digirin. Fabrîkayên artêşa mêran, tesîsên wan ên nukleerî, atolyeyên wan û hwd. hemû qirêj û gemara xwe vedireşînin, tif dikin nav ekolojiya me. Artêşeke mêran, mîna marîfetekê bi çorsiya xwe, ji bo feraseta etîk û estetîka me diyar bike şev û roj dixebite. Modayê hildiberîne, kozmetîkê hildiberîne, heta axaftin, ken, awayê tevgerê hildiberîne. Artêşeke mêran, ji bo tevahiya dinya û her welatî, li ser navê polîtîkayê, biryarên şer û hilweşandinê digirin. Artêşeke mêran, dixwazin diyar bikin em ê kîngê û çend zarok bînin.

Ger artêşeke mêran bi dizî ketibe her qada jiyana me, wê azadî, wekhevî û demokrasiya jinê çawa pêş bikeve? Jineolojî, ji bo bersiva vê pirsê ya jiyanî ava bike, destpêkê di pênc qadên bingehîn de wê bi rêxistin bibe. Aborî, ekoloji, etîk û estetîk, demografya û polîtîka. Bêguman em dikarin perwerde, tendirustî, dîrok, felsefe û teolojiyê jî li van qadan zêde bikin. Zanisteke jinê heke bi van qadên xebatê re ku ev qad bi bingeha jiyanê re têkildarin, nikare azadiya jinê bi dest bixe. Pêşketina zanista jinê; divê were maneya çareseriya pirsgirêkan. Ger zanista jinê bikaribe pisgirêkên bingehîn ên jiyanê çareser bike wê çaxê li ser rêgeheke rast dimeşe. Ji ber vê sedemê, Jineolojî li ser qadên digire bin banê xwe, divê bikaribe perspektîfên îdeolojîk, rêxistinî û çalakwarî hilberîne ku karakterê demokratîk ê civak û jiyanê pêş bikeve. Ku artêşa mêran a jiyanê dagir kirine paş ve bikişin.

Hemû qadên em weke qadên Jineolojiyê îfade dikin jiyanî ne. Li dinyayê êdî tevahî lîstokên desthilatiyê, çarenûsên civakan di ser van qadan re tên diyarkirin. Weke zanista jin û jiyanê Jineolojî jî wê van qadan bi nêrîna jinê bigire dest. Tevlîbûna xwezaya jinê û tevgera azadiya jinê wê ji bo pêvajoya modernîteya demokratîk bide çêkirin. Zanisteke jinê ku bikaribe bibe alternatîf, her beşê alîgirên demokratîkbûn û azadbûna civakê tevlî bike û van tevlîbûnan veguherîne vîna demokratîk û çalakiyê; di kêlî û qadên ku hewcetiyên jiyana civakî pêwîst dikin de zanisteke jinê ya bikaribe xwe nû bike; dikare zext û kedxwariya li ser civakê kêm bike, bide sekinandin. Bêyî ku zanistperestiyê bike, dikare zanistê weke aqil, faliyet û wicdana hevpar a civakê pêş bixe.

Yek ji sedema ku di bin banê Jineolojiyê de qadên me diyar kir bi hev re cî bigirin jî, derbaskirina parçebûna ku zanistperestiyê di navbera dîsîplînên nav

destpêkê dema çêdibe civakî ye, vedîtina jinê ye, cinsparêz nîn e. Qet ne bêruh e. Bi vedîtin û keşfên ji bo feydeya civakê tije ne. Di navbera civak û zanistê de weke îro çiyayên ji qeşayê yên ji razberiyan hatine afirandin tune ne. Jineolojî bi hedefa bigihîje vê cewhera despêka zanistê, wê di nav girêdan û bandorbûna civak û jiyanê de zanistê bigire dest.

Weke mînak di ferqê de ye; zanista aboriyeke ji ekolojiyê qut û wê hesab nake, derveyî jiyanê ye. Ji ber vê yekê jî hemû projeyên aboriyê û bandorên wê yên li ser ekolojiyê wê bi hev re nîqaş bike. Dîsa zanista demografyayê ku ji aborî û ekolojiyê qut be, dijraberî jiyanê ye, li ser navê zêdebûnê serfkarî ye. Zanistperestî vana ji hev qut digire dest. Lê Jineolojî, girêdanên jiyanî yên di navbera hemûyan de û bandorên wan ên civakî his dike, dinirxîne û di zemînên hevpariyê de van zanistan digihîne hev. Jineolojî, girêdana bi hev re ya tevahî qadên me diyar kirî, her tim di zîhniyetan de bi cî dike û pêş dikeve.

Jineolojî, divê bibe zemîna hevpar a feraseta zanista nû, yekparebûna nav zanistan û hevpariyê jî. Ji bo vê hevpariyê xerca wê an jî qadên xebatê yên xweser dema pêş dikevin, etîk û estetîk e ku wê hemûyan li gel hev bigire. Jineolojî nakeve tu têkoşîn û projeya civakî ya ku etîk û estetîka wê tune be. Cudahiya bingehîn a Jineolojiyê ji zanistperestî û feraseta zanistên civakî yên hakim vediqetîne jî ev e. Ger ev cudahiya girîng, di her qadê jiyanê de pratîk bibe, Kurdistan û Rojhilata Navîn dikarin bibin cihên pir cuda. Jiyana civakî wê weke cejnekê were rêxistinkirin û jiyankirin.

Di her qada ku feraseta serdest a mêr dest dayê de jiyan têk çûye. Wê çaxê em ê jî bi Jineolojiyê, fikra jinê di her qadên jiyanê de bi cî bikin û rêxistin bikin û li ser vê erdnîgariyê jiyanê şên bikin.

Dema qadên Jineolojiyê hatin destgirtin û lêkolînkirin tespîta divê bi girîngî li ber çav were girtin ev e:

"*Têkiliya hevjiyanê xwedî taybetiyên wisan e ku ji binî ve tesîrê li têkiliyên civakî û gerdûnî hemûyan dike. Ti qada jiyanê bi qasî qada hevjiyana azad xwedî taybetiya bingehîn û diyarker nîne. Aborî û dewletê weke têkiliya bingehîn hesibandin, fikreke sabit a sosyolojiya modernîteyê ye. Di encamê de aborî jî û dewlet jî navgînên hevjiyanê ne. Nabe ku hevjiyan bikevin xizmeta aboriyê, dewlet û olê. Berevajî, divê dewlet, ol û aborî bikevin xizmeta hevjiyanê.*" Ev diyarkirina Rêber Abdullah Öcalan ya teorîk a di bin banê Hevjiyana Azad de, dema aborî, demografya, polîtîka, ekolojiyê, etîk û estetîk û hemû qadên jiyanî yên din lêkolîn bike wê rêyek bide ber Jineolojiyê. Ev tespît, divê her tim di bîra mirov de be, ji ber ku girêka kor a bingehîn a zanistên civakî ye.

Ji bo di civakê de her tim windakirina jinê, di dîrokê de pêşketina vê windakirinê derxe holê; bi qadên di bin banê Jineolojiyê de, divê di nav pêşketina wan a dîrokî û rewşa wan a rojane de bi başî werin lênêrîn. Di ketin û windakirina jinê de, rola van qadan çiqas hene? Her ku ev mijar bi lêkolînan, bi xebatên îdeolojîk û zanistî were zelalkirin, wê Jineolojî berê xwe bide hedefa xwe ya din. Yanê di pêkanîna azadiya jinê de bandorên rêxistinkirina van qadan bi destê jinê, bi etîk û estetîka wê, wê çawa çêbibe? Bersiva vê pirsê, di heman demê de ji bo azadkirina jinê çalakiyên ku divê werin  pêşxistin e. Jixwe her yek ji dîsîplînên zanistên civakî ku dikevin bin banê Jineolojiyê, di heman demê de qadên çalakiyê yên xurt û girîng in. Ev qad çiqas bi perspektîfa azadiya jinê werin pêşxistin, wê têkoşîna demokrasî û wekheviyê jî kûr bibe. Ya girîngtir jî, rêxistinbûnên demokratîk ên konfederal, bi şêwazên komunan wê bi ser bikevin. Ji ber vê sedemê li hember dinyaya bi serdestiya mêr, tenê serîrakirin têr nake. Gazinc, jixwe li azadiyê nayê. Wisa be ya dikeve para me; bi Jineolojiyê çareserkerî û tijekirina valahiyên qadên jiyanê ne.

Qadên Jineolojiyê jî, qadên zanistên civakî ne ku valahî û di heman demê de çeloxwarî û jirêderketin di asta jor de tên jiyankirin. Faliyetên jiyana civakî ne. Di cewher de ew faliyetên bingehîn in ku civakê dikin civak. Qadên hebûnê yên xwezaya civakî ne. Ji ber vê yekê Jineolojiya bi îdîaya pêşxistina zanista jiyanê ye, wê di van qadan de xebatên xwe zêde bike. Di vê mijarê de nirxandina Rêber

Abdullah Öcalan: “*Jineolojî, jinê ji bûna objeyeke cinsî pir wêdetir, hem weke tort hem jî weke cewhera civakê ronîkirin û ji bo vê derfetên azadkirinê lêkolînkirin e. Bêguman heman lêkolîn ne tene di qadên zanistên pozîtîf ên bi paradîgmaya mêr tên pêşxistin de, di qadên olî, hunerî û felsefî de jî kirine ku bi heman paradîgmayê hatine çêkirin.*” qadên lêkolînê yên Jineolojiyê berfirehtir îfade dike. Ya girîng mirov bikaribe fêm bike bê jinê di her qadê de çawa kirine him tort û him jî mayîna weke cewhera civakê ye. Dest dana him halê me yê tort û him jî mayîna cewhera civakiyê ye. Tevî barana laneta bi hezaran sal in bi ser me de barî, biçûkxistin û reşkirinê, em ê di her kêlî û qada jiyanê de têkoşîna hebûnê bidin. Bi zanebûna ku ev di heman demê de hebûna civakîbûna me ye em ê tevbigerin.

## ETÎK Û ESTETÎK

Fîlozof Şehabedîn Suhreverdiyê ku bedêla lêgerîna heqîqetê bi canê xwe daye, felsefeya xwe ya bedewiyê mîna hêzeka ku tene bi zanîn û serwextiyê dikare bê hilgirtin aniye ser ziman û bi gotina “Zilm e ku *mirov bedewiyê nîşanî yê ne ehlî wê (karzan û pêzan) ye bide*.” vê dest nîşan kiriye. Suhreverdî, di cewher de têkiliya bedewî û zanîn û serwextiyê vegotiye. Dema gotiye bedewiya ku bi zanebûnê hatiye afirandin, divê bi kê re, çawa were parvekirin jî diyar dike, di heman demê de estetîkê jî îşaret dike. Têkiliya etîk û estetîkê pir xweş pênase dike. Ev gotina zanyarî ya hezar sal beriya roja me hatiye gotin, ji me re dibêje ku bedewî nabe karê her kesî. Ji bo mirov bikaribe bedewiyê hilgire, divê serwext û zana be. Mirova/ê zana bibe, bigihê rêgeza “xwe bizanibe”, ew mirov e ku hikmê dogma û pêşderaziyên di zîhnê xwe de hildiweşîne, yanê mirova/ê azad e. Ya/ê azad bibe jixwe bedew e.

Rêber Abdullah Öcalan jî di tevahiya dîroka têkoşîna me de di dahûrînên kirine de têgînên estetîk, bedewî, kirêtî, xweşik-nexweşik her tim bi kar anî. Her tim estetîkê bi asta azadiya jiyan û têkiliyan re girte dest. Di demen herî dijwar ên em di bin êrîşên dijmin de bûn jî bi milîtanên xwe û gelê kurd serwextiya felsefeya “*erdema herî mezin di şer de jî xweşik mayîn e*” da fêhmkirin. Di şerê çil salên bi Tirkiyeyê re tabloya derket holê, li gor welatên heman şeran dimeşandin, aşkereye ku trajedî, mirin û hilweşîn kêmtir bû. Sedema vê dema ji kêliyên herî dijwar ên şer re rêbertî dikir jî, ji rêgezên etîk û estetîkê tawîz nedana Rêber Abdullah Öcalan bû. Bi gotina wî, di şer de bi bedewmayînê ve girêdayî ye.

Rêber Abdullah Öcalan, ji destpêka têkoşînê heta roja me, şer, siyaset, rêxistinbûn û hedefa hemûyan afirandina kesa/ê azad, civaka azad, spart rêgezên girîng ên etîk û estetîkê. Di heman demê de vê weke divêtiyeke sosyalîstbûnê girt dest. “*Bedewî hunerek e. Sosyalîstek, şert e vî aliyî jî pêş bixe. Ger wisa nebe wê ber bi şêwazê serdest û kedxwaran ve biçe. Ger kesek nikaribe vê pêk bîne, kesayeteke sosyalîst bi dest nexe, ya xerabtir, jina hînî stûxwariyê hatiye kirin bipejirîne, wê ev wî tehdît bike*.” Rêber Abdullah Öcalan di vê destnîşankirina xwe de di pêkanîna hunera bedewiyê de rola berxwedan û neşibandina pergalê, îfade dike. Ji gelek serhildanên di tevahiya dîroka civakî de hatine jiyankirin, -tevî hemû heybeta xwe- pir kêm jê, vê heybeta xwe heta roja me ya îro nehêştiye ku biçelmise. Ji ber ku gelek jê, ji rêgeza etîk û estetîkê tawîz dane û şibiyane yê li dijî wan şer dikin. Ya/ê xwezaya xwe, cewher û cudahiya xwe winda kiribe nexweşik e. Ev serhildanên di dîroka mirovahiyê de jî li hev çûne û hemû sêhra xwe winda kirine. Rêber Abdullah Öcalan, di şexsê xwe, milîtanên xwe û gelê Kurdde, ji bo nexweşikiya jiyanê ji holê rake, baweriya ku em divê şerê xweşikiyê bidin, bi dersên ji van cêribandinên dîrokî derxistiye afirandiye. Dema dest bi têkoşînê kiriye, hemû taybetiyên nexweşik ên gelê kurd bi analîzên sosyolojîk girtiye dest û îfade kiriye ku ev encama qutkirina ji cewhera xwe, ji herikîna xwe ya xwezayî û ji atmosfera xwe ya çandî ye. Felsefeya, rakirina ev qas taybetiyên nexweşik tenê bi şerê azadiyê wê bê dayîn, ava kiriye. “*Azadbûn xweşikbûn e, xweşikî tenê bi têkoşîneke dijwar a li dijî nexweşikiyê tê qezenckirin.*” Ev formul, di heman demê de sêhra têkoşîna me ya çil salan e. Û di navenda vê sêhrê de, li hemberî nexweşikiya koletiya jinê, destpêkirina têkoşîna azadiya jinê

heye. Ji ber ku di dîroka Rojhilata Navîn de xweşikî jî nexweşikî jî di çarçoveya jinê de hatiye afirandin.

“*Civakeke mêr a bi nêzikahiyeke ev qas sivik, ji estetîkê bêpar, bênirx, milk û heta weke derdeke divê ji serê xwe bavêje nîşanî jinên xwe bide, îflah nabe û aşkera ye wê ji aştiyê bêpar û kirêt bijî. Civakên wiha mêr, pîroziya jinê, bilindiya niştimanê, dilpakiya rastîn, nêzikahiya xwezayeke watedar û zindî nikarin biafirînin.*”**(99)** Her wiha nikarin biafirînin jî.

Xwezahîbûna jiyanê, li ser wekheviya jin û mêr û yekparebûna diyalektîkî hatiye avakirin. Jiyana ji vê diyalektîkê qut bibe nexweşik e. Û li Rojhilata Navîn bi hezaran sal in jin ji jiyanê hatiye derxistin. Li her deverê dinyaya me ya hegemonyaya kapîtalîst lê serwer kirine jinê kirine “*torta jiyanê*”**(100)**. Mêraniya ku jiyana bi vê torta jiyanê re pejirandiye jî kirêtiya jiyanê heta bin biriye. Ji ber vê sedemê şerê herî watedar, dîtina vê kirêtiyê ye, hiskirin, pênasekirin û li dijî wê têkoşîn kirine. Ev jî mijara estetîkê, yanê zanista bedewiyê ye. Bedewî, bi qasî bi kozmetîkê, bi emeliyata ‘estetîk’ê, bi cil û bergan, bi xeml û xişran neyê bidestxistin buha ye û bi dayîna berdêlên herî mezin tê bidestxistin. Jineolojîya weke zanista jiyanê pêş dikeve, yek ji îdîayên wê yên herî bingehîn, afirandina zanabûn û daneheva xweşikiyê, pênasekirina kirêtiyê û meşandina şerê bi kirêtiyê re û afirandina jina bedew û jiyana bedew e. Bihêzkirina argumanên teorîk, îdeolojîk û zanistî ne ku bikaribin têkoşîna vê bimeşînin. Ji ber vê sedemê estetîk, bi etîkê re yek ji qadên Jineolojîyê ye. Ji ber heke Jineolojî bikaribe asta kirêtkirina jiyanê derbas bike, wê çaxê dê bikaribe bibe Jineolojî.

Jineolojî, giraniya xwe bide ser guherîn û veguherîna zanista estetîkê dikare pêk bîne. Ger mirov bizanibe koletî rewşeke zîhnî ye û çavkaniya xwe ji radestiya îdeolojîk digire wê ev ji bo azadiyê bibe gava yekem. Koletiya jinê ku bi giştî di civakê, bi taybetî jî di jinê de hatiye pesendkirin û pesendkirina hest û ajoyên (xerîzeyên) mêrên ku serweriya mêr û jinê weke milk dibine heke em bi xurtî analiz bikin, em dikarin him asta azadiya jiyanê û him jî asta estetîkê pêş bixin. Rêber Abdullah Öcalan dibêje; “*Mîtolojî, ol, felsefe, zanist û huner ji bo jiyanê ne û rola wan a sereke pêkanîn û avakirina wekheviyê ye. Divê ev bi girîngî bê têgihîştin, exlaqîkirin û estetîzekirin.*” Her wiha Jineolojî, pêşxistina teoriya “qada hevjiyana azad, ew qade ku divê destpêkê zanista wê were kirin” di heman demê de pêşxistina teoriya estetîkê dihesibîne. Dîsa Jineolojî, bi derbaskirina nezaniya ku ekolojiyê dixe bin lingan ku ruhê Manî yê narîn dibêje “axê neêşînin”, ferqkirina ku dibêje; “*Aborî, qada cikava exlaqî û poîtîk a rastin a demokratîk e. Aborî, çalakiya herî demokratîk a civakê ye.*” **(101)** û bi hişmendiya ku civakeke ji wateya felsefîk a zêdebûnê qut bûbe, nesîbê xwe ji bedewiyê nagire, tevdigere. Di vê maneyê de etîk û estetîkê, ekolojiyê, aborî û demografyayê di nav têkiliyekê de digire dest.

Gelek bizavên felsefeyê hewl dane estetîk yanê teoriya bedewiyê pênase bikin. Estetîk, di tevahiya pênaseyan de her tim bi etîkê re, di nav têkiliyekê de û weke coteke ji hev qut nabe hatiye destgirtin. Ya rastî ev, tevî hemû operasyonên kapîtalîzmê yên çeloxwarîkirin û ji cewher dûrxistinê, nîşan dide ku têkiliya baş, rast û bedew di bîra mirovahiyê ya kûr de cî girtiye û nayê derxistin. Têkoşîna Azadiya Kurdistanê jî di têkoşîna dimeşîne de girêdanên rast, baş û bedew baş daniye û nîşan daye ku endameke berxwedana vê ya watedar a mirovahiyê ye. Diyardeyek, divê baş û rast be ku bedew be. Divê bedew û baş bibe ku rast be. Xwedavendîtiya dayikê, ji ber rastî, başî û bedewiyê di xwe de hewandiye, karibûye bi deh hezaran sal, civaka exlaqî û polîtîk li derdora jinê rêxistin bike, têr bike, biparêze, bide jiyankirin û bîne roja me. Bi cêribandina civakîbûnê mirovahiyê bedew û exlaqî kir. Ger wiha nebûya, li hember hêza xwezayê, mirovahî yan wê tune bibûya yan jî di sînorên prîmat de asê bimaya.

Di roja me ya îro de, heke meriv bi feraseta bedewiyê ya empozeyî civakan kirine binihêre; xwedavendên ku bi peykerên xwe heta îro hatine, weke jinên nexweşik ên xwedî bedeneke qelew, nelihev wê bên nirxandin. Lê ew jinên qelew ên xwedî peykeran e, ji bo feydeya civakê, karên ku berdewamî û mezinkirina civakê

keşif kirine, rêxistin kirine û kirine xwedî jêravahî û sazîbûneke fikrî ya pir xurt. Forma civakî ya jiyanê ava kirine. Ji ber vê yekê xwedî etîk û estetîkê ne. Sembola bedewiyeke jinê ya pir xurt in. Piştî ku baweriya xwedavenda dayîk hilweşiyaye jî mirovahî bi aqlekî sehekî û hestiyar ev aliyê wan her tim zanibûye û li gel êrîşên pir mezin di baweriya wê de li ber xwe dane. Ev rola ku jin di demeke pir dirêj a dîroka civakî de girtiye ser xwe rojane bibe, wê azadî û demokratîkbûna civakê jî pêk were. Tam jî ji ber vê rola stratejîk etîk, yek ji qadên bingehîn ên zanista jinê ye, bêguman bi estetîkê re di nav girêdaneke xurt de.

Têkoşîna rizgariya xwezaya civakî ku her cure qirkirin dîtiye, cêribandinên jinan, kodkirinên di bîra civakî de weke sehek, jîrekiya hestiyar û his, enerjiya herikbar a ber bi jiyanê ve diherike, dikare asoyên nû bide qezenckirin. Mîna Rêber Abdullah Öcalan diyar dike; "Li gorî pêdiviya xwezaya jinê ye ku di hêla civaka exlaqî û polîtîk de zêdetir rasteqînî û berpirsyar tevbigere di warên nirxandin, destnîşankirin û biryarkirina aliyên baş û xirab ên perwerdeya mirovan; girîngiya jiyan û aştî; xirabî û saw/erjenga şer; her wisa pîvanên mafdarî û dadwerî." li gor vê rastiyê, ji bo asta berpirsiyariyê biafirîne bivênevêya jinê ye ku estetîkê pêş bixe.

Dema etîk tê pêşxistin, divê bi estetîkê re di nav ahengekê de hin rêgezên bingehîn ava bike. Suhreverdî dibêje, murîdê zanistê nas kiriye,derbarê zewac û ezebiyê de xwedî  qabîliyeta hilbijartinê ye û bi mînakeke wiha ev tîne ser ziman: "Murîdek ji pirsa tu çima nezewiciye re gotiye 'jinek ji bo mirovek e. Ez birastî jî nebûm mirov. Çawa bizewicim?" li ser vê mînaka balkêş mirov dikare etîkê weke; yek ji qabîliyetên mirov a herî muhteşem, zanebûna bikaranîna qabîliyeta hilbijartin û tercîhkirinê, hêz û estetîka wê, pênase bike. Di vê mînakê de mezinahiya murîd, zewac an jî ezebiyê li derveyî zextên civakî, hînbûyîn û pêwistiyên jiyanê, di hilbijartina bi biryara xwe de ye. Her wiha jiyana bi jinê re, netemambûn û girêdayî hêza xwebûnê sedema bingehîn a vê hilbijartinê ye. Dîsa bi wêrekî dikare bide daxuyakirin ku vê hêzê hê ne afirandiye. Wisa be etîk, bi qasî mirov tiştekî rast bike, hunera bi xweş gotina vê kirine ve jî girêdayî ye. Ev rêgez wê bibe yek ji rêgezên etîk ên bingehîn ên Jineolojîyê.

Di zanista etîkê de rêgezeke girîng a din; hizirkirina rastiya ku dibêje; '*zanîna bêwicdan ruh dikuje*'  ye. Di civaka xwezayî de çavkanî, kêrhatinî û hedefa her zanînê hebû, bi civakî dihat jiyankirin. Ev rastî, rastiyeke bi qasî aliyê estetîk ê jiyanê, afirandina aliyê etîkê bû jî.  Aqil, jîrekî û mêjiyê mirov, îro di bin êrîşên her kêliyê yên moderniteya kapîtalîst de şekil digire. Ev êrîş, bi rêya perwerde, dibistan, dê û bavên di pergala kapîtalîst de şekil digirin û înternetê tên pêkanîn. Bi vî hawî zanîna bêwîcdan tê empozekirin û ruh tê kuştin. Nifşên ku nizanin zanîna çi, ji bo çi qezenc dikin, bêruh dibin û bêwîcdan dibin digihîjin. Ev, civaka exlaqî ji bo çi hildiweşe, sedema wê ya herî bingehîn e. Çalakî û sûcê pergala kapîtalîst a 300 salan e. Astengkirin, teşhîrkirin û nêhêştina qetilkirina mejiyên teze û ciwan karên qada etîkê ne. Û erka herî mezin a exlaqî ye. Jineolojî, dema bi vî sûcî re têdikoşe, çandên gelên ku ji bo exlaqa civaka xwezayî li ber xwe didin, esas digire. Di vê mijarê de masîvanên qeraxên Kolombiyayê ji bo "zimanê rastiyê dibêje" tesewir bikin biwêjek derxistine "Sentîpensante", yanê têgîna bi hiskirin fikirandin pir girîng e. Dîsa exlaqa duayeke Çermesoran ku dibêje; "Ruhê mezin! Derbarê yekî ku ez di pêlavê wî de du hefte negeriyabim, min ji hikûmdayînê biparêze!" pir girîng e. Mîtolojiyên Rojhilata Navîn, belgeyên wan ên tesewifî, kevneşopiya devkî, kesayetên mezin jî çavkaniyên gel ên girîng in ku wê feraseta me ya etîkê jê xwedî bibe. Civakeke bê etîk nikare heyî bibe. Jineolojî vê zanebûnê esas digire û ji hînbûyînên jiyan û fikrî yên pergala kapîtalîst a dixwaze vê rastiyê hilweşîne berdana heta bi hetayî, weke rêgezeke bingehîn a jiyana azad pêş dixe.

Ji bo di avakirina pergaleke civakî ya demokratîk, azad û di nav cudahiyan de wekhev bi berpirsiyarî û dildarî cî girtin, ji bêruhuya çaxê em têde dijîn parastina civaka xwe, tolê ji kapîtalîzma têkiliyên jin û mêr bi harbûnî vediguherîne dubendiya kujer û qurban bigire, weke exlaqê vê afirandina jina azad û mêrê azad, ji bo hilweşandina ekolojîk pêkanîna têkoşînê, divêtiya civaka exlaqî û polîtîk e. Ji bo vê

têkoşînê fikirandina bi hisiyat, empatiyê, hilberandina zanîn, teorî, zanist û îdeolojiyê jî, karê etîk yanê teoriya exlaqe ku wê bi nêrîneke Jineolojîk were pêşxistin.

Rêber Abdullah Öcalan dibêje “*Rewşa jinê ya heyî ne di etîkê ne jî di estetîkê de cihê xwe heye*”. Rêbertî bala me dikşîne ser mijara, regeza destpêkê ya pêşxistina etîk û estetîka jinan, rastiya jinê ya heyî, di şexsiyetên xwe de guhertin û derbaskirin û afirandina nasnameya jina azad. Heta em vê pêk neynin, teorî û zanista etîk û estetîka em pêş bixin û di bedewkirina jiyanê de wê bêencam bimîne. Lê sêhra têgîn û teoriyên çaxên xwedavenda dayîk afirandî, di nasnameya jina azad û bi xwezayî jiyankirinê de bû. Ji bo jinûve vê sêhrê bi dest bixin, wê Jineolojî etîk û estetîkê pêş bixe.

Ji ber ziman helbestî bû, çaxên xwedavenda dayîk bisêhr bû. Yanê edebiyat bû. Ji cureyên edebiyatê helbest, çîrçîrok û çîrok jî ji berhemên vê demê ne. Ev ne tenê rasthatineke. Bi hêza jinê û dinyaya wê ya hest ve girêdayî ye ku li derdora wê hatiye honandin, bi rastiya civaka exlaqî û polîtîk a azad û xwezayî ve girêdayiye ku bê derew û hîle dijiya. Hêza gotin û vegotinê, jiyankirina hêza tiştên di hest û hisê de diyar dike. Heqîqeta serboriyan gotinê diafrîne. Ji ber wê yekê ye ku bi qiymet e gotin. Hêza gotinê ya ku ji heqîqetê tê, afirîner e, baş dike û hestiyar e. Fetla xwezayî ya jiyan-gotin û jiyanê bikar tê, dixebite. Yanê fetleke hilberîner a serborî vediguherin gotinê, yên tên gotin li jiyanê, cardin li gotinê vedigerin û berdewam dikin. Yek ji sedemên derketina Jineolojiyê jî, bi qasî dengê me yê hatiye birîn, gotina me ya hatiye bêdengkirin jî paşve girtin e. Yanê bi dest xistina edebiyata me afirandî ya ku di jiyana me ya serdemên helbestwarî de bişkivî bû. Bidestxistina qabîliyeta me ya ku jiyana xwe ber bi gotinê, gotina xwe ber bi jiyanê ve diherikîne. Ji ber vê sedemê, têkiliya jin, edebiyat û ziman, di nav bergeha etîk û estetîk a Jineolojiyê de wê were destgirtin. Lê dema hewce kir, di nav girêdana qadên cuda de yan jî serbixwe wê li serê were sekinandin, lêkolînkirin ku di serê wan diyardeyan de tê ku divê bi ciddiyet bê pêşxistin. Eger zimanê gelek zanistên ku jinan di destpêka civakîbûnê de pêş xistine û ya girîngtir jî zimanê zanyariyê helbest be, bêguman hîkmeteke vê heye. Û ev hîkmet bi hedefa exlaqîkirin û estetîzekirina jiyanê ve girêdayî ye.

Îro aşkera ye ku ji her demê zêdetir pêwîstiya me bi vê heye. Ev pêwîstî, bi qasî bi zanistên him etîk him estetîkê were bicîanîn, bi edebiyatê jî destgirtin û bicîanîna wê pir girîng e. Edebiyat, di gelek merhaleyên dîrokî yên civakan de weke awayê îfadeya civaka nû pêş ketiye. Zanista jinê jî, wexta ku bi hedefa li derdora jinê jiyaneke civakî bihone pêş bikeve, bêguman wê bi edebiyat û zimanê jinê pêş bikeve. Ziman û edebiyata jinê, tevahiya nirxên me yên ku çanda baviksalarî ew kirine endustrî û dinyaya zanist û akademiyên pozîtîvîst zenûn kirine, bêwîcdan kirine û ji wateyên wan ên civakî şûştine, wê xuyayî bike. Di heman demê de bi sêhra zimanê jinê û hêza edebiyatê, wê van nirxên me zindî bike, jinûve tevlî dinyaya nirxên civakîbûn û jinaniyê bike.

Ev hêza edebiyatê heye. Pabendên di navbera jin û edebiyatê de xwedî taybetiyên wisan e ku vê hêzê dikare zêdetir xurt bike. Eger wiha nebûya, beriya bi sedsalan demên mafê xwendin û nivîsandinê ji destê jinan hatin girtin û li wan qedexe kirin ku li ser navê xwe pirtûk binivîsin û çap bikin, jinan bi qasî bi navê mêrekî pirtûk binivîsin û biweşînin çavsor nedibûn. Eger ne wiha bûya, tevî paşverûtiya ol a ku deng û gotina jinê qedexe dike, wê jinan helbest, dengbêjî û çîrokên çandên gelan ku ew li ser lingan hiştine û dane jiyankirin mîna xizneyên xwe yên mezintirîn nediparastin. Di roja me ya îro de ku tevahî çandên civakî dixwazin bi hunera populer û endustrîbûyî asîmîle bikin, wê edebiyat û zimanê jinê weke qadeke alternatîf a dikare xîtabî beşên cuda yên civakê bike şîn nebûya.

Jineolojî jî, bi edebiyata jinê ya alternatîf û azad şîn bibe wê rengê xwe bigire. Bi astengiyên li ber pêşketina ziman û edebiyata jinê ya ku ruh, ziman, etîk û estetîka wê bide jiyankirin û teyîsandin re di qada fikrî de wê têbikoşe. Li dijî şertên zehmet ên jiyana modernîteya kapîtalîst, zalimiya ku mirov ji mirov û ji civaka wê/wî qut dike û

mehkûmî takekesiyê dike, herî xweş edebiyat dikare vebêje û bide fêmkirin. Dîsa edebiyat dikare zalimtiya lîberalîzma ku taybetiyên xweşikiyên jiyanê kolektîf diafirîne û parve dike tune
dike bi me bide hiskirin. Em dikarin bi edebiyatê li dijî ruhê tarî ku wîcdana xwe winda kiriye û qirra mirov, dar, çivîk, av û hewayê tîne, şerê herî xurt bidin. Zimanên ezop ên ku pergal ji bo neyên fêmkirin, bixapîne û ji lêgerîna azadiyê dûr bixîne bi kar tîne, em dikarin bi edebiyatê bi gotin bikin. Têgihîştinên mirov ên hatine gêjkirin, girtin yan jî bûcirk kirinê em dikarin bi edebiyatê vekin. Tevî ku deh hezar sal di ser re derbas bûne, xeyalên dewlemend ên ola dayîka xwedavendê û xwezaya civakî, bi qasî ku em wan û jiyanên wan di serê xwe de tesewir bikin bi hêz in. Em dikarin bi afirandina demên helbestwarî vê hêzê qezenc bikin. Jineolojî, edebiyatê weke qadeke ku zanistên civakî exlaq û wîcdana ku tevahî dinyaya zanistê, bi taybetî pozîtîvîzmê ew xesandine jinûve hîs bike û bidest bixwe, jêneger dibîne. Ji ber vê sedemê ji bo her mirov bikaribe ziman û edebiyata xwe bi taybetî bi zimanê zikmakî bide jiyankirin jî bi nêrîna jinê digire dest û têkoşîna pêşxistinê dide. Di roja me ya îro de qada edebiyatê heta bibêjî hatiye sînorkirin û li ber pêşketina wê hezar astengî hatine avakirin. Vê edebiyatê, bi armanca xurtkirina edebiyata jinê, ji bo edebiyata jinê ya di dîroka me de veşarî mane derkeve holê û pêş bikeve, lêkolîn û vekolanan dike.

## ABORÎ

Xwedavenda Dadê ya Sumerî Nanşe, ji hin tiştan tiştekî qet nedieciband; yê tiştê neaydî xwe bixwe û nebêje "min xwar", vexwe û nebêje "min vexwar". Çanda Sumer a ku ev xwedavend jê tê, tevî ku çavkaniya dewlet, perestgeh û gelek tiştên destpêkê yên desthilatparêz e, dad ji aliyê xwedavendekê ve tê parastin. Di demên diyar ên salê de ji ber sûcên kirine, mirovan didarizîne. Ya herî girîng jî; yek ji pîvanên dadê yên vê xwedavendê, bi nêzikahiya faliyetên aboriyê re têkildar e. Mirovek tiştekî bi keda xwe çênekiribe bixwe û vê înkar bike, xwedavend vê naecibîne. Her sal dema dor tê ser didarizîne. Serdema Sumeran ew serdeme ku xwedavendên dayîk û xweda di nav hevsengiyekê de ne. Bi alîkariya vê zanînê mirov dikare pêvajoyên beriya vê xeyal bike. Yanê dada pêvajoyên ku aborî bi destê jinê, bi dilê jinê hatiye afirandin.

Yek ji rêbazên bêhejmar ê lêgerîna heqîqetê, bêguman mîtolojî ye. Xwedavend faliyeta aboriyê ji pîvanên bingehîn ên dad û exlaqê dihesibînin. Tenê mîtolojî behsa vê rastiyê nake. Xwedavend, weke Nanşe, çi tiştê afirandibin pîroz dibînin û diparêzin. Ya rastî ev, razberkirineke ku civakê bi xwe afirandiye. Ji bo civakên wê demê, bi qasî yê ramanî di qadên aborî, olî û hunerî de jî bi gelek delîlan tije ne. Rastiyeke bingehîn ku bermahiyên arkeolojîk datînin holê; di civakên dayîksalarî de, faliyetên jinan ên hilberînê ya bingehîn, demeke dirêj berhevkarî bûye. Yanê jinê, bi vê şêwazê hilberînê, civakîbûnê li ser piyan girtiye û daye jiyankirin. Di dema vê faliyeta xwe de, di heman demê de derbarê nebat û axê de gelek agahiyên nû girtiye.

Jinên ku serdema hilberînê dan destpêkirin, teknîka ku mirovahiyê bi hezaran sal xwedî kiriye, çandinî, sewalkarî, xurek û endustriya cil û bergan, matematîk û hwd. Bingeha gelek qadan ava kirine. Remezan Çeper di pirtûka bi navê Ferhenga Etîmolojiyê de etîmolojiya jimar (hejmarê) wiha rave dike. *"Jî + mar / e. Hejmar / ejmar / hûmare / jmar. Mare, di zaravayê Dimilkî de bi maneya dayîk e. Jî+mare: ya dayîkê, ya aydî dayîkê ye, karê dayîkê. Peyva Mare jî Marya ya Huriyan tê. Hûrî ji jinan re dibêjin Marya. Jîmer kirin: di maneya karê hesabê ye, matematik e. Her çiqas jimar weke kare rahibên Sumer werin zanîn jî di dema Neolîtîk a beriya Sumeran de ji ber ku debar, aborî û parvekirin ji aliyê jinan ve dihatin kirin, bi hesab û jimaran re jî jin mijûl bûne."* Ev ravekirin, ji bo karên têkildarî hesab û matematîkê ne, yanî yên dayîkê, yên jinê ne, delîleke cuda pêşkêş dike. Dîsa gelek daneyên zanistî hene îspat dikin ku çandinî jî îcada jinê ye.

Rastiya em ji Nanşe fêr dibin ewe ku; pêşketina faliyeta aboriyê ya ku jiyan bê

wê nabe û di pêşengiya jinan de û bi saya zanyariya wan pêş ketiye. Fêrkirina vê zanînê, tavilê me tîne dinyaya roja me. Hemû tabloyên ku dilê mirov reş dikin li dû hev tên ber çavên me. Xizanî, bêkarî, birçîbûn, bêmalî, cureyên zilmê ne ku zêdetir jin êşa wan dikşînin. Ya herî bi êş jî; ya dewlemendiyê afirandiye ew e, ya ku karên civakê mezin bike dîtiye ew e, ya zad dîtiye û nan pijandiye ew e, ya xanî çêkiriye ew e. Lê çi bû ku tabloya destpêkê veguherî ya îro? "*Xwedayên xasûk, tim dizî kirin, firotin. Bi tevahî bi jinê dan windakirin. Her ku bi jinê dan windakirin, xizanbûna mezin a destpêkê ya civakê, weke çarenûsek dest bi pêkanîna hikmê xwe kir.*"**(102)** Ev hikmê weke çarenûs, hê jî derbasdar e û êşên giran bi gelan dide kişandin. Ev hemû derbarê aboriyê de bi biryarên hilweşîner ên ku mêr distînin û ji aboriyê qet fêhm nakin ve girêdayiye. Li gelek welatên dinyayê çandinîtiyê anîn ber qedandinê, di vê mijarê de welatan bi xwe ve girêdane û gelan fêrî tembelî û tiraliyê kirine. Sedema vê zilma ku her diçe li ser civakê zêdetir dibe, li derve hiştina jinan a bi aboriyê ve girêdayiye.

Jineolojî, jina dayîk a di vê destpêka de ye esas digire; aboriyê yek ji qadên xwe dibîne, lê hûr dibe, lêkolîn dike, bi proje dike. Di vê mijarê de rêgeza wê ya sereke; bi civakê re rêxistinkirina faliyetên aboriyê yên hevpar e. Ji aboriyê qut kirinê çawa civakê radest digrin û di vê mijarê de zext û polîtîkayên li ser gelan çawa pêktînin, bi serê xwe mijara lêkolîneke dîrokî ye. Ji bo civakekê, qutkirina ji aboriyê hilweşandin e.

Peyva aborî di kurdî de di heman demê de tê maneya 'tiştê pê debar tê kirin'. Yanê her tiştên ku mirov ji bo pêwîstiya jiyana xwe ya xwezayî pêk tînin aborî ye. Eger civakek ji vê were qutkirin nikare bijî. Îro tiştê ku pergala kapîtalîst dike, qutkirina civakê ji aboriyê ye. Piştre jî mirovan mecbûr dike ku li ser sergoya wan debara xwe bikin. Di tevahiya dinyayê de, qada mirovahî zêdetir bi zilm û bêçaretiyê re rû bi rû tê hiştin qada aboriyê ye. Jineolojî, di wê baweriyê de ye ku ev zilm û bêçaretî ne çarenûsek e û bi rêxistinkirina hevpar a beşên civakê wê ev bi dawî bibe. Ji bo di civakê de jî vê baweriyê pêş bixe, vê qadê bi teorîkî, rêxistinî û çalakvanî dinirxîne.

Qada aboriyê, zemîna bingehîn e ku qirkirina civakî xwe dispêrê. Dixwazin civakê bi vê radest bigirin. Di vê mijarê de, para bêçaretiya civak û kesan ku hatine hînkirinê pir girîng e. "Bêçaretiya hatiye hînkirin", bawer nake ku di vê qadê de guherîn, çalakvanî û vînek were pêşxistin. Şoreşa bingehîn a divê Jineolojî li dar bixe; hilweşandina vê bêçaretiya hatiye hînkirin e. Ji ber vê sedemê bi civak û kesan bide hînkirin ku li axê, ava di ber wan re diherike û keda destê mirov, weke barîna çavkaniyên bereketê binihêrin. Heta ku di nav dewlemendiyê de feqîrî û hînbûyîna jiyankirina vê neguhere, faliyetên me yên aborî wê negihîjin cewhereke demokratîk û komunal. Jinên ku di destpêka dîroka civakî de aboriyê pêş xistin, dikarin îro jî vê cewherê bi dest bixin û hemû civakê tevlî aboriya weke "pêkhateya hebûna bingehîn" a civakê bikin.

Jineolojî wê qada aboriyê bi hin rêgezên bingehîn bigire dest. Beriya her tiştî wê bi perspektîfa teoriya keda dayîkê ya Rêber Abdullah Öcalan pêş xistî li diyardeya kedê binihêre. Bi vê perspektîfê, wê wate û nirx bide keda jinê ya nav malê ku tevgerên jinan bi salan in têkoşîna wê didin. Di faliyetên aboriyê de keda dayîkê çavkaniya bingehîn e. Wê xebatên ku vê fikrê di civakê de bi cî bikin bimeşîne. Wê hedef bigire ku teoriya nû ya ked û nirxê ya me di ser keda jinê ya dayîktiyê pêş xistiye ava bikin, di vê çarçoveyê de perspektîfeke nû pêş bixîne. Weke di çaxên dayîka xwedavend de, wê bi analîzên aboriyê yên ku projeyên aboriyê teşwîq bike dest pê dike. Bi armanca zindîkirina çanda aboriyeke kolektîf a her civak, kom, bikaribe têrî xwe bike, bi cîranên xwe re di nav piştgiriyekê de hev temamkirinê esas digre wê tevbigere. "Aboriyeke bê sermaye mimkun e, lê sermayeyeke bê aborî ne mimkun e"**(103)** ev diyarkirin, xala destpêkê ye ku faliyetên aboriya divê em rêxistin bikin zelal dike. Hizirkirina hêza xwe ya hilberînê û di jiyanê de cihê vê. Ev baweriya xwe bixwe, li dijî karên kapîtalîzmê ku hemû pêkhateyên demokratik ên gêlan bi aboriya ne aboriye hildiweşîne wê me xurt bike. Em nikarin aboriyê di destê kapîtalîzma ne aborî ye de bihêlin.

“Aboriya misoger divê di çarçoveya kom, ekolojîk û esasên berhemdariyê de were rêxistinkirin, şertê hebûna bingehîn a civakê ye. Ji bilî civak û civatan, ti kesên din ne dikarin bibin xwedî vê hebûnê, ne jî vî mafî ji holê rakin.” Faliyeteke aboriyê ya li gor van esasên Rêber Abdullah Öcalan diyar dike; divê girêdana xwe bi ax û çandiniyê re hebe. Ji bo vê zemînên herî guncaw gund in. Ji bo pêşxistina komunan jî faliyetên çandîniyê yê li gundan xwedî zemînên guncaw in. Çandînîtî, li derdora xwe çand û şêwazê jiyanê diafirîne. Ji ber vê sedemê Rêber Abdullah Öcalan dibêje ku pêwîstiya Rojhilata Navîn bi “şoreşeke gund û çandiniyê ya duyem” heye. Weke ku daneyên zanistî jî datînin holê, yên şoreşa gund û çandiniyê ya yekem afirandin, dayîk, jin in. Îro şansê şoreşa gund û çandiniyê ya duyem ku pêwîstiya Rojhilata Navîn pê heye û şoreşa jinê ya duyem di zik hev de pêş bikevin pir zêde ye. Ji bo her duyan jî şertê bingehîn; ji hînbûyînên jiyana kapîtalîst û bêçaretiya em hîn kirine jiyankirina berdana heta bi hetayî ye. Jin dikarin weke hêza pêşeng a şayestaya rola wan a di dîrokê de, rêxistinkirin û çalakvaniyeke aborî bidin destpêkirin.

Heta ku zanatiya dîrokê nebe mirov nikare dîroka qirkirina civakî û aboriyê diyar bike. Heta ku zanatiyeke ekolojiyê nebe girêdana aborî û xwezayê, etîk û estetîk nebin em nikarin rêgezên bernameya me ya aboriya alternatîf diyar bikin. Her wiha bi Jineolojiyê em ê perspektîfa aboriyê bigirin dest, li ser lêhûrbûnê bikin, proje û plansaziyên berbiçav hilberînin. Ya girîngtir jî em bigihîjin zanebûna ku aborî “yek ji çalakiyên demokratîk ên qada civakî ye”**(104)** em ê tevlî çalakiya avakirina zanistên civakî yên alternatîf bibin. Van qadan, bêyî ku parçe bikin, dijberî hev bikin, nekin pêşbirkê, bi hev re û bi aheng, bi awayekî hevdu temam bikin destgirtin û nirxandin, wê bi her kesê/î bide qezenckirin. Ev, bi taybetî li erdnîgariya Rojhilata Navîn, pêwîstiyeke çiqas lezgîn e û divê bibe zemîna ku şoreşa duyem a gund û çandiniyê xwe bispêrê, Rêber Abdullah Öcalan wiha balê dikşîne ser: “*Di zanistên civakî de weke nexweşînek, tevahiyê li kadavrayan veqetandin û çareserkirin, encamên xwe yên herî bi xeta, herhal di xebatên şaristaniyê yên Rojhilata Navîn de nîşan dide. Aborî di serê van xebatan de tê. Şer û desthilatdarî, zîhniyet û civakîbûn ne di nav hev de bin, dahûrandinên aborî, tenê wê nezaniyê zêdetir kûr bikin.*”

Di pêşxistina perspektîfa aboriyê de, di rêgeh û jêravahiya wê ya zanistî û pêkanîna bi zanebûn de, pêşketina Jineolojiyê wê alîkariyeke pir girîng pêşkêşî vê qadê bike. Her ku qada aboriyê bigihê perspektîfa Jineolojîk, divê birçîbûn, tunebûn û bêkarî di dîrokê de bimîne. Bi vê hedef û biryardariyê qada aboriyê ku stûna nav malê ya jiyana civakî ye wê ava bibe. “Pirsgirêka aboriyê,kengî jin ji nava ekonomiyê tê derxistin, dest pê dike.”**(105)** Ev tespît; dide bawerkirin ku ji bo pirsgirêka aborî ji holê rabe, divê jin ji nû ve bikeve aboriyê û faliyetên aboriyê bi destê jinê, bi aqil û zihniyeta wê werin avakirin. Jina dayîk, cîvakîbûnê afirandiye ku keda herî mezin e. Faliyetên aborî ku yek ji şertên bingehîn ê hebûna civakî ye, bi tevlîbûna hêzên modernîteya demokratîk wê rêxistinkirinê jî bi ser bixe.

## DEMOGRAFYA

Hin deman li tevahiya dinyaya me hiqûqa dayîktiyê hakim bû. Ji wateyên bêhempa tenê wateyek bû ku dayîk zarokan perwerde dike, xwedî dike û eleqedar dibe. Ew zarokên bi şans bûn ku bi gelek taybetiyên xurt ên dayîkê xwedî dibûn , hîn dibûn û wisa mezin dibûn. Di dîroka me ya nêz de zarokên bêtir bi şens jî hebûn. Aborjînan wisa bawer dikirin ku bi zarokên ku îhtimala zayîna wan heye, beriya bikevin malzaroka dayîka xwe dikarin têkilî deynin. Jê dipirsîn ka dixwaze were vê dinyayê yan na, amade ye yan na. Eger zarok bixwaze were dinyayê hemletî çêdibû, na naxwaze an ne amade  ye hemletî nedibû. Wek tê zanîn hin qebîleyên Aborjînan, ger bawer bikirina ev dinya xera bûye û naxwazin li vê dinyayê bijîn, bi dilê xwe zêdebûnê didan sekinandin. Em nizanin Aborjînan bi vê zanyariya xwe ya kûr, bi enerjiya xwedî potansiyela bûyîna “zarok” a beriya bikeve malzaroka dayîkê re, girêdaneke çawa çêkirine. Lê fikir û xeyala îhtimaleke wiha jî muhteşem e. Her çend

mezin heye. Ev felsefeya kur di rêgeza zêdebûna koman de etîk û estetîkeke bêhempa hildigre. Cewhera vê zanyariyê, ji hiqûqa dayîkê ya ku cinsîtiyê bi zêdebûn û rêgezên diyar ve girê dide derdikeve. Ajoya (xerîzeya) cinsîtî ya ku îro dinyayê mehf dike, berde bi rêgez û rêzikên diyar were sekinandin, bi her cure amûran tê sorkirin û cinawirkirin, ji bo bi zanyariya jina dayîk ji nû ve were destgirtin, weke qadeke Jineolojiyê em dibêjin demografya.

Di her zindiya gerdûnê de zêdebûn, di bingeha xwesertiya xwe de xwedî wate, etîk û estetîkê ye. Bi dozîn û xerîze yan jî bi jîrekiyekê çêbibe jî vê cewhera wê naguherîne. Zêdebûneke curbecurî û daîmî, yek ji bûyerên biraz ên sirdar a jiyanê ye. Gerdûn, bi gelek awayan xwe tîne ziman, di nav wan de ya herî zêde heyecan dide ev e. Lê xwezaya bi sedsalan me jêre digot hov û biçûk didît, ji bo zêdebûnê periyotan diafirîne. Xwedî jîrekiyeke wisan e ku sînoran datîne. Mirovên civaka xwezayî, berevajî mirovên roja me, bi hezkirin û pîroziyeke mezin nêzî xwezayê dibûn, xwe weke zarokê wê didîtin, li gel wan jî ev sînor hebûn. Ew mirov jî bi sedsalan li ber çavê me hov û barbar bûn. Lê dema dixwestin zarok çêbikin, şertên xwezayê, derfetên xwarin û starbûna klana xwe û yek jî têkiliyên bi klanên cîran re jî li ber çav digirtin û li gorî vê biryar digirtin. Bi gotina biryar digirtin, em dixwazin îfade bikin ku di van civakan de di vê mijarê de dezgeha biryarê tenê dayîk û jin bûn. Bi deh hezaran sal, bi xêra van dayîk û jinên biaqil, komên mirovan hevsengiya hebûnê bi dest xistin. Hevsengiya hebûnê, rêgeza zêdebûnê rast û biaqil diyarkirin bû. Yanê sînorkirina ajoya cinsîtiyê bû. Di şertên wan deman de di navbera jin û mêrekê de bi girêdana hevsertiyê bibin ê hev, aşiqî hev bin yan jî jin û mêr bibêjin zaroka/ê min e û ji bo zewqê bihevrebûneke çewalêhato tune bû. Hiqûqa dayîkê hemûyan bi rêzikên heta bibêjî etîk û estetîk û ji bo feydeya civakê ve girê dabû. Wê demê berjewendiya civakê, bi giranî berjewendiya kes bû. Ji ber ku di cewhera civakê de newekhevî û bêdadî tune bû.

Mixabin ev kesayeta civakê beriya pênc hezar salan dest bi xerabûnê kir. Dayîkên ku hiqûqa dayîktiyê afirandin, bi gund û bajarên xwe ve hatin şewitandin. Û zanyariya wan a her tim dad, hezkirin, şîfa, aştî û aramiyê dianîn vê dinyayê, xwestin ku bi destê xwedayên firtoneyan ji bîra civakê paqij bikin. Zêdebûna bi sir xera bû. Dema jin derbarê bedena xwe û bedena mêr de xwedî agahî bû, ne ji bo zarokan, ne ji bo mêran û jinan bêdadiyek hebû. Bi demê re aqlê mêrê deshilatdar, zanîna rola mêr a di zêdebûnê de, bi hêrsa desthilatiyê re gihand hev. Ev aqil, argumanên tunekirina îdeolojîk ên ku rola jinê ya di zêdebûnê de êdî tune dihesibîne û bedena wê dadixîne tenê zarokhilgirtinê afirand. Çandeke baviksalarî hat afirandin ku di çêbûna zarok de bav diyarker dike û ji bo zarok aydî kî ye zelal were zanîn jinê di hepseke di nav hepsê de digire. Zarok aydî kê ye, ji hezkirin û eleqedariya zarok wêdetir, berdewamkirina hêrsa nijada xanedaniyê bi xwîna ‘esîl’ diyarker bû.

Ji fikra sabit a ku zarokê kurik wê nijadê dewam bike û ya rastî desthilatiyê dewr bigire, kirin prensîb û kakilê çanda xanedan a jêneger. Di vê pêvajoyê de, pêkanînên qetilkirina bi hezaran zarokên kurik –bebek, pitik jî têde- di bin navê tehdîta li ser desthilatiyê qewimîn. Li ba deshilatiyê bênirxkirin û tunekirina bi hezaran zarokên keçik jî li kêleka vê rûdanê bû. Ne dayîkên van zarokan dizên li ser zarokên xwe, ne jî zarokên çêdibin li ser mafê jiyana xwe hêza wan a biryarê tune bû. Çanda xanedaniyê, ya rastî berdewamiya desthilatiyê çi pêwîst bike, wê hikma zayîn û mirinê li gor wê bida. Ev tenê ne diyarkirina polîtîkayeke kontrola zayînê yan jî zêdebûnê ya çarenûsa deshilatî di destê wan de bû. Seqetiyeke zîhnî bû ku ji serî heta binî li çaviyên civakî enjekte dikirin. Civakan jî zarokên keç û kurik li gor vê seqetiyê girtin dest.

Mêrên deshilatparêz ku li ser qoqên bi milyonan mirovî împaratorî û qraliyetan ava dikirin, diviyabû ji xanedaniyeke xurt bihatana. Bi pêşketina dewletparêziyê re ku sê mêr yanî fermandarê leşkerî, şaman û mêrê xasûk kakilê wê bûn, xanedaniya xurt qerebalixbûnê dixwest. Yanî gelek jinên hevser ku gelek zarokên kur ên bibin ewlehiya jiyanê û desthilatiya wî, gelek zarokên keçik ku di peymanên siyasî de bikaribe weke mulk bifiroşe bînin dinyayê. Wê êdî çarenûsa dayîk û zarokan jibinî ve

biguheriya, bêguman a dinya û mirovahiyê jî. Wisa ku ajoya cinsî, bi qasî ku çavkaniyên xwezayî yên dinyayê, pergala ekolojîk, erd û esman li hember vê ajoyê binalin, wê bêserûber bimaya. Û mirovahî, wê dûrî aqlê selîmtiya qebîleyan biketa ku van qebîleyan hov didît û wê girêdayîna ti rêgezeke zêdebûnê nehişta. Wê jinê veguherandina amûra zarokanînê. Cinsîtî, wê ji hemû maneyên etîk û estetîk bihata kirin û bi ajoya berdewamkirina nijadê ve bihata girêdan. Ew zarokên bi hezkirin û narînî mezin dibûn, ew kulîlkên delal, wê êdî tene bibûna "dol". Eger di vê dinyaya bêrehm de bikaribûya li ser lingan bimîne û bibe parçeyek girîng ji desthilatiyê, wê mîna 'mirov' bihata dîtin. Çand yan jî bêçandiya zêdebûnê ya bi xwezayê re, bi cîranan re, bi xwezayên jin û mêr re, bi wateya mirovbûnê re hemû têkiliyên xwe qut kiriye, tenê li gor pêwîstiyên desthilatiyê şekil girtiye hatibû afirandin.

Êdî ya ku ji aliyê desthilatiyê ve tê teşwîqkirin û destek-kirin, rewa tê dîtin ev bêçandîtî bû. Êdî di serê mijarên ku ol, felsefe, zanist derbarê wê de herî zêde diaxiviyan, rewşên dayîktiyê bûn. Ji ber ku dayîktî taybetiyeke bi deh hezar salan civakê welidandî, xwedî kirî bû, wê kirin hedefa hemû êrîşên pergala baviksalarî. Di zêdebûnê de rola yek alî ya mêr hat nepixandin û îdeolojîkirin û ji deshilatiya wî re kirin palpişta bingehîn. Wisa bû ku Martîn Lutherê di olê de reform pêk anî bû, ji kesên balê dikşandin ser xeteriyên hemletiyê re vê bersivê dide: "*Eger jin ji ber zarokanînê bêhal dikevin yan jî dimirin, tu zirareke vê tune ye. Bihêlin heta ku dimirin bila zarokan bînin, jixwe hemû sedema hebûna wan ev e.*" Mêrekî ku sedema hemû hebûna wî ji Cihûtî û ji kapîtalîzma ku dijminê mirovahiyê ye re vekirina Xiristiyaniyê be, derbarê hebûna jinê de ku hêza mûcîzewî ya bêsînor a xwezayê hildigire, ji nirxandina wî ya bî vî hawî divê meriv şaş û metel nemine.

Civak û bi taybetî jinên ku zêdebûn û etîk û estetîka dayîka xwedavend winda nekirine, heta merhaleya kapîtalîzmê, weke xeteriyeke ew qas mezin nedihatin dîtin. Ev, şîfakarên xwezayî bûn û civak, bi bîra xwe ya xwezaya civakî ya bi hêsanî winda nabe, bi xweşbîni li vana dinihêrt. Lê di dema sermayeya destpêkê ya kapîtalîzmê de ev jinên şîfakar, ji ber ku zanyariya tendirustî, zêdebûn, plankirina malbatê û pirsgirêkên cinsîtiyê û bi taybetî hêza zarokanînê diyar dikin di dest wan de bûn, weke xeteriya herî mezin hatin dîtin û bi milyonan ji wan bi qirçeqirç hatin şewitandin. Ew zanyariya jinên hatin şewitandin ji bo ji ariya xwe ji nû ve xwe biafirînin em demografyayê di bin banê Jineolojiyê de weke zanist pênase dikin.

Karê me yê destpêkê, lêkolînkirina hemû xebatên demografyayê yên heta niha ne. Lê di vê mijarê de xala ku em stratejîk dibînin, zindîkirina rêgeza ew demên ku hiqûqa dayîkê serwer bû û rêgeza ku bi milyonan jin ji bonê hatin şewitandin e. Ev rêgez ev e; "Ev beden a min e, ez ê kîngê, li ku derê û ji bo çi di vê bedenê de caneke din hilgirim, encax ezê biryar bidim" Ev rêgez, wê çarenûsa dinyayê biguherîne.

Derbarê bedena xwe, cinsîtî û zayîna xwe de îro bi milyonan jin, wê zanyariya ku ji dema xwezaya civakî heta sê sed salên dawîn maye wendakirine û bi vê wendakirinê dijîn. Nizanin ku ev zanyarî bi êrîşên mîtolojî, ol, felsefe û zanistên îdeolojîk ên mêrên serdest hatiye wendakirin. Ew zanîna ku jin ji bo vê zanyariyê biparêzin bêhempa li ber xwe dane ji bîra wan hatiye derxistin. Îro ev terora bêrehm a mêr li ser bedena jinê hê jî tê meşandin. Ji ber vê yekê jî derbarê bedena xwe, zayokiya xwe û cinsîtiya xwe de ne xwedî agahiyên têr in. Zanyariya jinên ku karê tiba xwezayî dikin, şîfakar in û heta roja me hatine jî bi navê "pîrejin" bêqîmet tên dîtin. Ji ber vê yekê jî zarokanîn, cinsîtî û bedena jinê, bi temamî ji însafa polîtîka û sîstema baviksalarî û dewletparêz re hatiye hiştin.

Bêguman weke ku aqlê kapîtalîst, oryantalîst û pozîtîvîst îdîa dike, esas sedema van polîtîkayên demografyayê ne ev rewşa jinê ye. Her jin bi sehekên xwe jî be dizane wê bedena wê bikaribe çend zarokan bîne. Lê kapîtalîzm bi her cure tundiya propagandayê, 24 saet cinsîtiya mêr har dike û bedena jinê jî weke amûreka ku ev cinsîtiya harbûyî bikaribe jê zewqê bistîne empoze dike. Ji aliyê din ve ol, kurtajê, heta di dolgirtinê de, li derve valabûnê û dolan bereday xerckirinê, hemû rêbazên kontrola zayînê qedexe dike. Yanê polîtîkayeke nufûsê ya ku dewlet, ol,

desthilatî, hevser û bav li ser xwedî maf in heye. Rewşeke şikandina vîna kesên ku zarokan di malzaroka xwe de hildigirin, diwelidînin, dimêjînin, mezin dikin heye. Di feraseta demografya ya Jineolojiyê de rêgeza yekemîn, ji holê rakirina şikandina vê vînê ye.

Rêgezeke din a bingehîn, pêşxistina zihniyeta ku di tevahî civakê de berdewamkirina nîjadê, ji bûyereke fizîkî wêdetir aliye wê yê felsefî jî ber bi çav dike. Bi civakan qezenckirina zanyariya Aborjînan e. Çanda xanedantiyê, di rastiya serdema me de bi girêdanên xwînê nayê afirandin, bi girêdanên "pereyê fermandar" tê afirandin. Zarokên îro, bi spermê kê ber bigirin jî, di malzaroka kîjan dayîkê de neh mehan mezin bibin jî, her kêlî bi xeteriya nihîlîzma vê çaxê, lîberalîzma wê, bêkokiya wê û wehşeta wê re rû bi rû ne. Dema rewş wiha be mirov dikare behsa berdewamkirina nîjada bike an jî dol dayîna bênîjadîkirinê?

Di qada demografyayê de yek ji rêgezên bingehîn ku wê Jineolojî esas bigire, analîzkirina feraseta nufûsê ya Malthûswarî ye. Li hember vê ferasetê serwextkirina civakê û bilindkirina têkoşîneke civakî ya îdeolojîk û rêxistinkirî di bergeha Jineolojiyê de ye. Li hemberî vê bi tevger û kesên ku dijberî vê feraseta demografyayê alternatîf pêş dixin re, hevpar çalakî û xebatan meşandine. Ev ne Antî-Malthûswariya tê zanîn e ku hin welat kêmbûna nufûsê weke xeteriyekê dibinin û doktrîneke zayokiyê teşwîq dikin. Dijderketina Malthûsê ku xwe dispêre lîberalîzmê û nîjadperestî, antî humanîzmê, dijminatiya jin û feqîr û bindestan e. Jineolojî, teoriya polîtîkaya nufûsê ya ku Malthûs pêş xistiye, Neo- Malthûswariya di sedsala 20an de bi pejirandina fikrên Malthûs pêş ketiye, bi taybetî ji bo welatên dinyaya sêyemîn polîtîkayên plansaziya nufûsê ji xwe re kirine destek, felaketên afirandiye wê têxe rojeva xwe û lê hûr bibe.

Jineolojî rêgezên feraseta berdewamkirina nijadeka baş, li gorî jin û zarokan diyar dike. Ji bo vê lêkolîn û lêhûrbûn, bi rêgeha anketan ji civakê kom kirina daneyên şênber, analîzkirina van daneyan û pêşxistina tezên bi hêjayiya sosyolojîk û bi vê rê hilweşandina qalibên paşverû yên zanista demografyayê û bi zîhniyeteke nû pêkanîna destgirtina wê, wê bibe esasên nêzikahiya demografyayê ya Jineolojiyê.

Demografya jî weke qadên din ên Jineolojîyê bi hev re di nav têkiliyekê de tê destgirtin. Felsefeya berdewamkirina nîjadê ya şaş û encamên vê, bi aboriyê re, bi ekolojiyê re, bi hemû çaviyên civakê re, bi qadên tendirustî û perwerdeyê re, bi polîtîkayê re girêdanên xwe yên şidiyayî hene. Demografya bi van zanistan xwedî dibe, daneyan vediguhêze van zanistan û wan xwedî dike.

**EKOLOJÎ**

Di xwezayê de ku her tim li gorî sêgoşeya jiyan-mirin-jiyanê xwe nû dike, wateya her tiştekî heye. Ava diherike, kulîlka bêhn dide, moriya dixebite, dara kokên wê bi hezar salan e, qesela zad, ewrê li asîmanan, tîrêja rojê, dewra heyvê, mirova/ê çandiniya axê dike, wateya her tiştî heye. Ev wate zêdetir di feraseta xwezaya zindî ya civakê de beramberiya xwe dîtiye. Di vê derê de wekhevbûna lêgerîna civakê ya bi ruhên xwezayê re heye. Ev lêgerîn û wate, di heman demê de jiyan bixwe ye. Ev jî rêgeza bingehîn a lêkolîna ekolojiya ku têkiliya civak û hawirdorê bi hev re digre dest.

Ekolojî, zanisteke nû ye û di encama tehakuma şaristaniya bidewlet a li ser xwezayê texrîbatên çêbûye û têkiliya civakê ya bi xwezayê re lêkolîn dike. Di civaka xwezayî ya li derdora jinê pêş ketiye de girêdana civakê ya bi xwezayê re li ser esasê hurmetê bûye, ev girêdan bi şaristaniya bidewlet ji holê rabûye, mirovê ji xwezayê biyan bûye, ji xwe, jin û civakê re jî biyanî bûye. Ji ber vê sedemê ekolojî, tevî ku nû ye, bi hemû zanistan re di zik hev de, ji erka pêkanîna derbaskirina nakokiya xwezaya bi civakê re berpirsiyar e.Dîsa ji vegotina çîroka çandeke ji xwezayê bawer û rêzdar çawa veguheriye pergaleke ku bûye bela serê xwezayê berpirsiyar e. Ji bo vê zanîneke îdeolojîk a xurt û nêrîneke zanistî pêwîst dike.

Bi vê nêrîna zanistî –ku ev Jineolojî ye- divê bi aborî, civakî û felsefî rêyên yekparebûna bi xwezayê re lêkolîn bike. Ji ber ku pergaleke bi xwezayê re nebe yek exlaqî nîne. Girêdana di navbera kaosa pergala kapîtalîst dijî û felaketa derdorê ji bo vê mînak e. Lewra derbaskirina pergala kapîtalîst, di heman demê de tê maneya

derbaskirina nakokiyên bikok ên bi xwezayê re jî. Weke cewher ekolojiya ku tê maneya dostaniya bi xwezayê re, têkiliya wê ya sîmbiyotîk a bi Jineolojiyê re li ser vê esasê girîng e. Ji tevgereke hawirdorparêz a bi tena serê xwe wêdetir, veguherîneke exlaqî esas digire. Tevgereke ekolojîk ku vê esas digire, bi nêrîneke Jineolojîk biyanîbûna di navbera jin û xweza, mirov û xwezayê de derbas bike pêdivî ye. Ekolojî, di vê maneyê de bi qasî qadeke bingehîn a Jineolojiyê ye, yek ji rêyên ku diçe civaka exlaqî û polîtîk e.

Ahenga jiyana civakî bi hêzên xwezayê re jî mijara bingehîn a ekolojiyê ye. Avakirina exlaqeke di çarçoveya ahenga bi xwezayê re, di heman demê de wê bê maneya di civakê de bicîkirina herikîna giştî ya jiyana xwezayî. Birastî jî ti hebûneke ku bi hawirdorê re ne di nav ahengiyekê de be tune ye. Jirêderketinên wiha werin jiyankirin jî, hebûna xwe winda kirine û li derveyî pergala eko mane. Weke mînak, di civaka xwezayî de her kes parçeyekî dirust ê xwezayê ye. Li ser xwezayê hikum kirin gunehekî mezin e. Lê di şaristaniya bidewlet de ev feraseta exlaqî ya bingehîn serobin bûye, pêkhateya civakeke bi xwezayê re dijber çêbûye. Sedema vêya ya bingehîn, feraseta xwe dispêre dinyaya zihniyeta derew, xapandin, hikumkirin û talanê ye. Dema ev feraset hat windakirin, pirsgirêkên ekolojîk jî dest pê dikin. Xwezaya afirîner cihê xwe ji xwezaya hilweşîner re dihêle. Qirêjkirina ax, av û hewayê, texrîbkirina jiyana zindî dibe yek ji hînbûnên bingehîn ê civaka mirov. Di vî warî de nîqaş û çalakiya ekolojîk û jineolojîk, van pirsgirêkên wateyî û pêkhateyî yên civakê çareser dike û li rêyên derketina ji kaosê digere. Derbaskirina dîrok, çand û xwezaya bûye meta, têkiliya di navbera civak û xwezayê de ji nû ve were avakirin, ji qadên çalakiya bingehîn a van zanistan e û ji erkên wan e.

Dîsa bi destê heman hêzan û heman wextî xweza û jinê girtine bin tehakumê. Li ser bingeha kolekirina jinê, jiyana ji aliyê şaristaniyê ve hatiye afirandin, her roja derbas dibe zêdetir zorê dide xwezayê. Rêber Abdullah Öcalan di vê mijarê de dibêje: “*Jiyaneke bi vî awayî bi wê jinê re ya di vê statuya heyî de, xwezayîbûn û ekolojiya jiyanê her roja derbas dibe bileztir dixe xeteriyê. Beriya her tiştî pêdivî bi têgîneke hevjiyana ekolojîk heye ku di bingehê wê de pirbûn û dewamkirina zuriyetê tune ye, li gorî îdeala mirovatiyê ya gerdûnî ye û hebûna zindiyên din jî li ber çavan digire. Asta gerdûnî ya civak gihîştiyê jiyaneke azad bi jinê re ferz dike. Sosyalîzma rastî bi tenê dikare li ser bingehê jiyaneke azad bi jinê re bê avakirin*.”

Ekolojî; xwezaya fizîkî û biyolojîk e ku avahiya civakê xwe dispêrê. Biyanîbûna heyî derbas dike. Desthilatiya ku di bingeha pirsgirêkên ekolojîk de ye analiz dike. Bi Jineolojiyê, pênasekirina pirsgirêkên ekolojîk dibe zemîna nêzikahiyeke zanistî. Paradîgmaya me ya Demokratîk, Ekolojîk û Azadîxwaziya Jinê, li ser vî esasî weke di azadiya jinê de, di çareserkirina pirsgirêkên ekolojîk de jî desthilatiya ku çavkaniya van pirsgirêkan e dahûrandinê esas digre. Birastî jî demokrasiyeke rastîn jî tenê bi azadiya jinê û rizgariya derdorê tê bidestxistin.

Li ser vî esasî Jineolojî, bi şoreşa zanistî û rêbazî ya wê pêş bixe, xwezaya sêyem a weke xwezaya yekem û xwezaya duyem tê pênasekirin û ahenga xwezaya civakî îfade dike, yanê bi pêkanîna xwezaya azadbûyî berpirsiyar e. Mîna ku Rêber Abdullah Öcalan dibêje: “*Ji bo pêkhatina xwezaya sêyem ‘demeke dirêj’ pêwîst dike. Xwezaya yekem û xwezaya duyem di merhaleyeke jor de li ser esasên cudahiyan weke rejîma wekhevî û azadiyê; di pergala demokratîk de bi pêşketina taybetiyên civaka ekolojîk û femînen mimkun e. Xwezaya civakî ya mirov, dînamîkên pekhatina vê merhaleyê hildigire. Mirov bi vê rêbazê nêzikî mijara xwezayên cuda yên divê li ser lêhûrbûn were çêkirin bibe, wê me bibe pêkhatinên watedar ên teorîk û pratîk*.”

Rêber Abdullah Öcalan ekolojiyê wiha pênase dike; “*esas, rênîşaneya çalakiyê ya bejahiyê, civaka gund û çandiniyê, hemû koçer û cîwarbûyiyan, bêkar û jinan e*” Ji qadên bingehîn ên Jineolojiyê û weke ku Rêber Abdullah Öcalan dibêje yek ji rênîşên çalakiyê yên jinan ekolojî, ji holê rakirina xerabûna di civakîbûna mirov de û hilweşîna ku vê di xwezayê de çêkiriye berpirsiyar e.

Sedemên krîza ekolojîk em ne dikarin tenê di teknolojiye de an di zêdebûna şêniyan de ne jî weke ku hêzeke jorxwezayê mirovan ceza dike bigerin. Esas, mirov

bikaribe dahûrandina feraseta hikumkirina ser xwezayê rast bike û li hember feraseta tehakumê ya di bingeha pirsgirêka xweza û jinê de ye, bi Jineolojiyê divê li derçûneke nû bigere. Dema civak bû xwedî nêrîneke ekolojîk, ekoloji jî bi qasî ku bi nêrîneke Jineojîk ji pirsgirêkan re li çareseriyan bigere, wê pevrebûna jîrekiya analîtîk û hestiyar bikaribe hîn xurt ava bibe û modernîteya demokratîk jiyanî bibe. Eger heqîqeta esas a civakê xweza be; divê mirov vê bi zanabûneke xurt a dîrokê û îdeolojîk derxe holê û çalakiya wê pêk bîne. Ev jî dibe yek ji qadên bingehîn ên ekolojiyê ku bi Jineolojiyê re di nav girêdaneke sîmbiyotîk de ye.

Li ser vî esasî, Jineolojî çi qas bikaribe civaka ekolojîk pêş bixe wê ew qas bibe Jineolojî. Ji ber ku çarenûsa mirovahiyê, weke di destpêka civakîbûnê de, di destên xwezayê de ye. Di van sê sed salên dawî de bêkontrol hilweşandina me ya hevsengiyên ekolojîk, her roj li ser serê me weke karesatên xwezayî dibarin. Eger bi awayekî ev çûyîn neyê sekinandin, utopyayên civakî yên herî xweş jî wê maneya xwe winda bikin. Ji ber vê sedemê şertê yekemîn ê exlaqî yê mirovbûnê, sosyalîst û şoreşgerbûnê; bi destpêkirina ji cî û warê em lê dijîn, tevgerîna ekolojik e. Ev nebe nabe ye, ji ber ku weke Rêber Abdullah Öcalan diyar dike; "Hişmendîbûneke ji zanebûna ekolojîk bêpar, weke di diyardeya sosyalîzma reel de xuya bû, nikare ji jêrêderketin û jihevdeketinê xwe biparêze. Zanabûna ekolojîk, zanabûneke bîrdozî ya bingehîn e. Di nav sînorên felsefe û exlaqê de mîna pirehek e. Polîtîkayeke bikaribe ji krîza nûjen rizgar bike, encax dema ekolojîk be dikare ber bi pergalbûneke civakî ya rast ve bibe.
Weke di pirsgirêka azadiya jinê de, di çareserkirina pirsgirêkên ekolojiyê de jî di bin jiyaneke ev qas bi derengî ketî û tije şaşîtî de, roleke bingehîn a feraseta baviksalarî-dewletparêz heye. Her ku ekolojî û femînîzm were pêşxistin, tevahî hevsengiyên pergala baviksalarî û dewletparêz xera dibin. Têkoşîna sosyalîzmê û demokrasiyeke rastîn, encax dema azadiya jinê û rizgariya hawirdorê were armancgirtin dikare bigihê yekparebûnekê. Tenê têkoşîneke pergala civakî ya nû ku wiha yekpare bûbe, wê bibe ji awayên herî watedar a ji derketina kaosa rojane."**(106)**

Diyardeya herî zêde ekolojiyê bandor dike jî teknolojî ye. Bi perspektîfeke Jineolojîk, divê yekîneyên ekolojîk û aborî û teknolojîk di nav hevsengeke îdeal de bin. Ji bo vê li Rojhilata Navîn şoreşa teknolojîk a antî-endustriyal pêwîstiyeke lezgîn e.

Bi tevahî ev prensîbên ekolojîk weke di tespîta " Dinyaya nû ya manewî û zanistî ku divê weke alternatîfa dinya akademîk a modernîteya kapîtalîst a di nava krîzê de were birêxistinkirin, bivê nevêya civaka ekolojîk û ekonomîk e."**(107)** de îfade dike, di akademiyan de dikare were nîqaşkirin û projekirin. Jineolojî; hemû beşên civakî yên li bejahiyê dijîn, ciwan, cotkar, şivan û kedkarên di gelek qadên hilberînê de, bikaribin di qadên xwe yên xweser de beşdar bibin, di vî warî de rêxistinkirina akademiyan weke îfadeya îdîaya di vê mijarê de digire dest.

**DÎROK**

Ji bo di kêliyê de wate li herikîna jiyanê zêde bikin, kolana di çavkaniya demê de gelekî girîng e. Ji ber ku jiyaneke watedar, bi hişmendiyeke xurt a dîrokê mimkun e. Dîrok, herî zêde ji bo jiyaneke watedar pêwîst e. Ji bo vê jî zanîna sosyolojî û felsefeyê, lê van zanistan jî ji aliyê dîrokê ve xwendin girîng e. Ya ku wate dide jiyana civakî jî ev hişmendiya dîrokî ye. Ji ber vê sedemê xurt avakirina girêdanên dîrokî yên jiyana civakî ji me re vedibêje ku jiyan çiqas hêja ye.

Bi Jineolojiyê dest bi kolaneke wiha kirin, yek ji gavên herî girîng ên mirov bavêje jiyana azad in. Ji ber ku bi Jineolojiyê li dîrokê nêrîn û dîrokê bi nirxên ku jin pênase dikin sererastkirin, girêdanên dîrokê yên bi jiyan, civak û xwezayê re bi awayekî xurt ava dike. Dîsa nêrîneke Jineolojîk, dîroka di niha de jî dewam dike, nirxên parçeyek ji wê ne, çandên berxwedanê, ziman, exlaq, kult, çîrok û hê gelek jê çawa diherikin kêliyê vedibêje. Ji ber vê sedemê Jineolojî, dîrokê ji diyardeyeke hişk hatiye diyarkirin wêdetir, weke hebûneke di kêliyê de, demek, mekanek û bîrek digire

dest.

Em di serdemekê wisa de dijîn ku yekparebûna civakî, demî, mekanî heta bi şaneyên xwe parçe bûne. Ev yekparebûna di bin navê zanistê de hatiye parçekirin, parvenebûna jiyana civakî ya bi dem û mekan re jî tehdît dike. Jiyana ji heqîqeta xwe hatiye qutkirin banga hawarê dike. Ne tenê di jiyana mirov de, di jiyana hemû zindî û nezindiyên xwezayê de em vê hawarê dibihîsin. Di çavkaniya van de ji gerdûn û dema ku herikîna wê ye weke organîzmaya zindî ye digire dest wêdetir, zîhniyeta pozîtîf a weke diyardeyeke divê bi qanûnên misoger werin hikumkirin cî digire. Nêzikahiya ku bi taybetî dîrokê, bi dîtina nivîsê dide destpêkirin û vê jî dispêre Sumeran, beriya wê beşa ji sedî 98'ê dîroka cîvakîbûna mirov a destpêkê jî jinedîtîve tê, îro rastiyeke ku bingeha zîhniyeta zanistperest ava dike. Zîhniyeta rahîbên Sumerî, di roja me ya îro de di mirovên zanyar de berdewam dike, ev rastiyeke ku pêdivî bi nîqaşê nîne. Her wiha, mirov bizanibe ku dîrok ji aliyê şaristaniya bidewlet ve tê nivîsîn û vê jî weke dîroka fermî di bîra mirov de dikolin; ji bo mirov bikaribe xwendinên dîrokê xurt bike destpêkeke girîng e. Û bi Jineolojiyê, jina ku dîroka fermî wê li derve dihêle, çandan, sazîbûnên civakî û yekeyan weke kirdeya (subjeya) rast destgirtin girîng e.

Mirov ji mîtolojiyan heta olan, ji felsefeyê heta zanistan, di her demên dîrokê de bi rêbazên cuda li heqîqeta xwe digere. Mirov ger ev qas ji jiyana azad dûr ketibe ev, girêdana xwe bi destgirtina dîrokê ya ji rastiya civakî qut ve girêdayiye. Xwe pergalîkirina şaristaniya bidewlet de cudahiya kirdetî(sûbje) û tişteyiyan (obje) roleke girîng dilîzin û dubendiyên xwe dispêrin van cudahiyan bêtir kûr kirin û demê bi awayê dîrokeke razber digire dest, xizmetê ji desthilatiyên heyî re dike. Lê feraseta dîrokê ya Jineolojiyê ya ji nav jiyanê tê, hemû nirxên civakî yên ne yên desthilatiyane yên çandî û civakî têde kom bûne, dubendiyan li ser esasê hevdu temamkirinê digire dest, yekpareyî ye û di niha de jî dewam dike.

Afirandina formên zîhniyet û vînî yên tekûz ên Rêber Abdullah Öcalan weke "*Dîroka azadiyê (dîroka civakî)"* îfade kiriye, bi feraseteke dîrokê ya wiha mimkun e. Li ser vî esasî, li şûna ku dîrokê weke berhema di ser kesan re deyne holê, civakan bi rastiya demî û mekanî re bigihîne hev esas digire û bi awayekî bi xwezayê re yek e destgirtin girîng e. Rêber Abdullah Öcalan bi gotina "*Fernand Braudel bi gotineke gelek di cî de ku dibêje Sosyolojiyê dîrokîkirin, dîrokê jî sosyolojîkirin balê dikşîne ser şaşîtiyeke bingehîn a rêbaz û zanistê. Ev, di watenasiyê de yek ji şertê sereke yê pêşketinê ye. Avantajekî din ê vê rêbazê, ji nirxandina dîrokê ya weke wê re nêztir disekine.*" Balê dikşîne ser ku civakîkirina dîrokê hîn nêztirî heqîqetê ye.

Rêber Abdullah Öcalan dibêje: "*Dîroka şaristaniyê, di heman demê de dîroka windakirin û windabûna jinê ye. Ev dîrok, dîroka kesayeta serdest a mêr e ku bi xweda û qûlên xwe, bi hikumdar û tebayên xwe, bi aborî, zanist û hunera xwe ve xurt bûye. Her wiha windakirin û windabûna jinê, li ser navê civakê ketineke mezin û windakirin e.*" Li ser vî bingehî Jineolojî, rêbaza derbaskirina pergala kedxwariyê ya li derdora jinê pêş ketiye pêş dixe. Ji bo vê berxwedan û seknên jinê yên di dîrokê de derdixe holê. Desthilatî di ser vê danehevê de xwe bi rêxistin dike û berdewamî dike.

Di çarçoveya diyarkirina Rêber Abdullah Öcalan ya ku dibêje "*Dîroka koletiya jinê hê nehatiye nivîsin, dîroka azadiyê jî li hêviya nivîsandinê ye. Dîroka koletiya jinê bêguman di çanda Rojhilata Navîn de veşarî ye, derçûna wê jî ji ber vê sedemê wê li ser van axan pêk were. Lê aşkera ye ku wê bi şêwaze mêr pêk neyê. Jineolojî dibe ku bibe gava derketineke bingehîn.*" de dîrokê di çarçoveya jinê de jinûve nivîsandinê esas digire. Dîroka jinê, ne tenê dîrokeke di çarçoveya cins de ye, dîroka kedê, hilberînê, kolektîvîzmê, civakîbûnê, di kêliyê de rêzdariya ji rabirdûyê re û herikîna ber bi dahatûyê ve, ne ya bêdawî û bêserî, dîroka wateya niha vedibêje.

Li ser vî esasî, yek ji erken herî bingehîn a Jineolojiyê gihandina heqîqeta jinê ye ku di tevahiya dîroka şaristaniyê de wateyeke mezin winda kiriye. Ev, di heman demê de lêgerîna gihandina heqîqeta windayî ya civakê ye. Dîsa jina ku li dijî hêzên şaristaniyê her tim di nav berxwedanekê de bûye û di ava şaristaniya demokratik de diherike,dilop bi dilop bi nirxên ji dîrokê girtiye afirandina niha û avakirina dahatûyê

ye. Ev rêbaz, nirxên jinê yên di tariyê de mane, derdixe ser rûyê erdê. Li şûna ku li ser dîroka heyî zêde bike, bi nêrîna jinê jinûve avakirina dîrokê pêk tîne. Bi qasî rêzdariya ku dide cudahiya her hebûnekê, girêdana di navbera wan de xurt ava dike. Li dijî feraseta nêr a diyarker û dûz li ser xetekê, feraseta demeke vedigere, sehekî û herikbar e esas digire û her tiştên derbarê jiyan, xweza û civakê de digire nav xwe. Cudahiyên wan diparêze. Û lêgerînên azadiyê di niha de jiyanî dike.

**TENDIRUSTÎ**

Dî qeyda dîrokê de tendirustkara yekem Nînhursag, nexweşê yekem jî Enkî ye. Ya rastî Nînhursag di mîtolojiyê de bi nifirên xwe nexweşînê dide Enkî, hem jî xweda dikevin navberê û îqna dibe cardin wî baş dike. Em bînin bîra xwe, hin ji taybetiyên Nînhursag, Xanima Cihên Kûvî yên weke Çol û Çiyayan, Xwedavendek Dara ya têkiliya wê ji nêz ve bi maran re hatiye dîtin, xwedavenda hêzên wê yên weke zayîn, şîfa û nemirinê hene, ev helwesta wê rewşeke hevgirtî ye. Pir balkêş e ku têkiliya Nînhursag ji nêz ve bi maran re heye. Ji ber ku ew mar, piştî bi hezaran sal, li asayekê (darek, gopalek) pêçayî wê bibûya sembola tendirustî û tibê. Lê wê bihata bîra pir kêm kesan ku halê destpêkê yê wê asayê, dara kozmîk a Nînhursag e û ew marê tê de dijî temsîl dike. Wê bihata bîra pir kêm kesan ku destê wê asayê afirandî û digre destê jinekê ye.

Dibe ku ji ber nifira Nînhûrsagê be ku îro dinya bi gelek nexweşînan re şer dike. Ji bo aqil, wîcdan û bedena mirovên ku xwedavendên yanê şîfakarên jin ên destpêkê ji bîr kirine, hezar qatê nexweşînên daye Enkî, weke lanet barandibe. Di encam de bela sebep Enkî ceza nekiriye. Ya bûbû sedema nifirê, dizî û xwarina heşt nebatên Nînhursagê bû ku bi hezar ked û hezkirinê ew xwedî kiri bû. Piştî wê rojê, dinyaya bi desthilatiya mêr, bi pêşengiya Xwedayê Xasûk Enkî, gelek nebat û kulîlkên Nînhursagê dizîn û tevahî baxçê wê talan û wêran kirin. Ya rastî ew baxçeyê ku nebatên ji mirovahiyê re bibe şîfa têde digihên tune kir. Ev baxçe, zanyariya xwedavenda dayîk bû ku ji her nexweşînê re şîfa diafirand.

Nexweşîn û tedawî jî ji qadên zanyariya xwedavenda dayîk bûn. Di serdemên xwedavendîtiyê de gelek xwedavend, di heman demê de şîfakar bûn. Înanna, Îştar, Gula, Baû (Nînîsînna), Kîbele, Helen, Demeter, li Misirê Îsîs û Sekhmet, Hekate, Leto, Persenophe, Medea, Kîrke. Di Zerduştiyê de Ameretat û Haurvatat. Bi demê re ev xwedavend dibin keç an jî hevserên xwedayên tibê. Weke mînak, di mîtolojiya Yewnan de xwedayê tibê Askleopos e, keçên wî Panace, Hygîa û hevsera wî Epîone jî şîfakar in. Bi demê re hebûna jinan di qadên tendirustiyê de bi tevahî ji holê hate rakirin. Tib bû zanista ku herî zêde înkarwarî nêzî ked û hebûna jinê dibe. Di roja me ya îro de jî di pirtûkên dîroka tibê de nav, hebûn û keda jinê zêde nayê bibîranîn. Hele qet nayê ziman ku yên bingeha vî karî avêtine ew in.

Tevgerên tendirustiya jinê yên di salên dawîn de pêş ketin, di qada tendirustiyê de zêdebûna hejmara jinên dixebitin û bi destxistina zanebûna jinê, di rakirina vê zîhniyeta înkarwarî de pir girîng in. Jineolojî, weke zanisteke ku li dijî zîhniyeta biçûkdîtin û înkara li ser hebûna jinê têkoşanê hedef digire, vê keda tevgera tendirustiyê ya jinê dibîne û hevparîbûnê dike armanc. Di heman demê de weke qadeke Jineolojiyê xebatên zanista tendirustiyê pêş dixin plan dike. Jeanne Achterberg di pirtûka bi navê Şîfakarên Jin de wiha îfade dike: “*Hema piştî derketina mirovahiyê, mirova mê çavkaniya zanyarî û hêza awarte dihat hesibandin. Dikaribû can bida; can rizgar bikira, her wiha şîfakara bedenên nexweş û ruhên gerok ên bêçare bû. Di heman demê de dikaribû seqet bikira, can bistenda, ji ber vê yekê weke deriyekî li dinyaya xeyalan û hestan vedibe xizmetê dida. Jin, bi taybetî diwelidand, jina ku zarokên xwe ji bedena xwe xwedî dikir, biraz û bihêz bû.*” Di van tespîtan de ji “hêza mirova mê û zanyariya wê” bawer dike. Bi nêrîna pozîtîvîst a rojava înkarkirina vê zanyariyê, piştre jî ew nirxên afirandî di ser mîtolojiya Yewnan re aydî xwe kirinê napejirîne. Ji sembolên zanista tendirustiyê bigire, heta îcadên wan, derketina her tiştî bi dinyaya rojava yanê bi navend Grek destgirtinê rexne dike. Îspata daneyên arkeolojîk ên xwedavendên şîfakar ên destpêkê yên qada

tendirustiyê, xweda, reçeteyên tendirustiyê, derman, tedawiya bi nebatan û hekîmtî ku li Rojhilata Navîn dest pê kirine, esas digire. Ji ber vê sedemê, bi taybetî li Rojhilata Navîn qada herî zêde têde qirkirina civakî tê jiyankirin qada tendirustiyê ye; zanyarî û çavkaniyên Rojhilata Navîn lêkolîn dike û ji bo jinûve bibin destên bi şîfa têdikoşe.

Rêgeza bingehîn a vê têkoşînê xwe dispêre tespîta "*Civaka ku nikaribe tendirustiya xwe bi destên xwe biparêze, bingeh, hebûn û azadiya wê yan di bin tehdîtê de ye an jî bi tevahî hatiye windakirin.*"**(108)** Eger em îro nikaribin tendirustiya xwe ji destê şîrketên li gor qanûnên kara zêde ya yekdestdariyên kapîtalîst rizgar bikin, hebûna me di bin xeteriyê de ye. Em nikaribin xwe ji nexweşînên ku pergal bi me daye û feraseta nexweşînê rizgar bikin tê maneya ku parastina me ya cehwerî şikiyaye. Qada tendirustiyê îro bûye ew qada ku civak divê herî zêde parastina cewherî pêş bixe. Ji aliyekî ve bi destê pergalê gelek nexweşîn bi zanebûn tên çêkirin û belavkirin. Piştre dermanên ku çareya wan nexweşînan in tên hilberandin û tendirustiya me dikin metayeke bazarê. Nexweş dikin muşterî, yên xizmeta tendirustiyê didin jî dibin bazirgan. Ji aliyê din ve hemû xurek, av, hewa, ax tê qirêjkirin, bi hormon û kîmyasalan tê jehrîkirin û mirovan jehrî dikin. Dîsa ji aliyê din ve stresa bajaran, qerebalixî û geremola wan, di serî de pençeşêr, gelek nexweşînan çêdike. Yanê pergal bênavber me nexweş dike. Qada tendirustiyê jî dike sektoreke xizmetên bênavber buhaya wan zêde dibin. Jixwe di kaoseke wiha de du rê didin ber feqîran; yan mirin yan jî beramberî tendirustiya xwe ya bedenî firotin û kolekirina ruhê xwe! Li gelek deverên dinyayê mirov, bi pergala tendirustiyê bi hêzên dewletparêz û deshilatparêz re tên girêdan. Mîna ku diyalektîka xwedavendên dayik ên şîfa û mirinê belav dikirin vê carê jî li ser xerabiyê ji aliyê xwedayên kapîtalîst ve hatiye dewr girtin.

Jineolojî, weke zanista vê diyalektîkê di bingeha başî û başkirinê de li gor cewhera wê ya di despêka dîroka civakî de jinûve ava dike wê qada tendirustiyê bigire dest. Di qada tendirustiyê de, honandina nêrîna Jineolojiyê, wê zanînên jinên zanyar ên tedawî dikin ên di dema sermayeya hov a kapîtalîzmê de bi qirçeqirç hatine şewitandin wê dawerwîne hinavê xwe. Ew keçên bi wefa yên Nînhursagê bûn û parçeyek ji baxçeyê wê yê şîfayê ji talana aqlê nêr rizgar kiribûn. Ji aliyê rûyên kapîtalîst ên Xwedayê Xasûk Enkî ve hatin şewitandin.

Jineolojî hewl dide keda hemû mirovên di tevahiya dîroka civakî de bêberjewendî şîfa dane mirovan kom bike, bide hev. Ji zanyariya şîfakarên xwezayî yên keç û kurên ji baxçê Nînhursagê û destên wê yên bişîfa bawer in xwedî dibe. Ji bo ev zanyarî tune nebe, di civakê de pêşxistina hestiyariyê jî di berpirsiyariya Jineolojiyê de ye.

"*Avakirina saziyên xwe yên tendirustiyê û pisporên wê, divê weke maf û erkekî bingehîn ê civakê were dîtin. Desthilatî û dewlet vê erkê ji destê wê bigire û yekdestî bike, ev dibe derbeyeke li tendirustiya civakê hatiye xistin. Maf û têkoşîna tendirustiyê, hesasiyeta di mijara hurmeta xwe û azadiyê de ye.*"**(109)**

Jineolojî, beriya her tiştî, wê şîfakarên ku nêrîna Jineolojîk bipejirînin xwedî bike û rêxistinkirina akademiyên tendirustiyê hedef bigire. Bi qasî mezûnên fakulteya tibê perwerdeyeke bi feraseta ku wê jin û mêrên şîfakar jî bikaribin perwerde bidin pêş dixe. Bi tevgerên tendirustiyê yên ji deverên cuda yê dinyayê re feraseta rêxistinbûn û xebata hevpar pêşxistin, divê bibe divêtiyeke refleksa parastina cewherî ya di qada tendirustiyê de rûnê. Jineolojî, tendirustiyê weke qadeke xwe ya girîng dibîne û pêş dixe. Ji bo ciwanên di qada tibê de perwerde dibînin divê bi nêrîna Jineolojîk dîroka tibê fêr bibin jî her tim li ber çav digire û materyalan amade dike û lêkolînkirinekê berdewam dike.

**PERWERDE**

Perwerde heke faliyeta cêribandinên jiyankirî, zanînên fêrbûyî ji aliyê civakê ve ragihandina ji nifşên nû re be; mamosteya yekemîn a mirovan xweza ye. Xweza bi

pêvajoya afirandinê de mirov her ku xwezayê nas kiriye, hînî zimanê wê bûye, guh daye ders û şiyariyên ew dide û his kiriye, ji serboriya mirovbûnê re rêgehek xêz kiriye. Peydakirina xwarin û cil û bergan, starbûnê, gera bi komikan û nêçîrvaniyê, pîrozîkirin û hîndekariyê di bin çavdêriya şertên xwezayê de hîn bûye û form daye girtin. Şagirta herî baş a xwezayê jin/ dayîk bûye.

Çawa ku mirov zarokên xwezayê ne, zarokên jinê jî hene û xala hevpar a her duyan dayîktî ye. Zayîn, dayîn, parastin, xwedîkirin û hezkirin, ew taybetî bûn ku wan nêzî hev dikir. Jin, bû şagirta yekem a xwezayê, mamosteya destpêkê ya mirovan. Hem mêr perwerde kir, hem zarokên xwe. Di rêya dirêj û zehmet a civakîbûnê de jinê tu car ji bîr nekir ku şagirta xwezayê ye û mamoste û dayîka civakê ye. Ev jî wê dikir hem a fêr dibe hem fêr dike. Ji bo ku çavkaniya zanîna xwe, rêyên fêrbûnê, pîroziya fêrkirinê înkar nekir, baş dizanibû wê çi, çawa, çima, bi kê û kîngê bide fêrkirin. Heman mîna dayîka xweza di navbera zarokên xwe de cudahiyê nedikirin, jinan jî zarokên dianîn hevpar mezin dikirin, yek dayîka hemûyan bû. Dersa yekem, derbarê wate û hêza civakîbûnê de bû. Jinê, bi hezaran sal fêr kir, hîn kir. Ew bixwe fêr bû, xwe perwerde kir. Gelek zanistên ku civakîbûnê bidin jiyankirin wiha keşif kir, civaka exlaqî û polîtîk wiha li derdora xwe pêş xist.

Heye ku bi sehekiya ji xwezayê girtiye jin dizanibûn ku divê perwerdekirina zarokên xwe ji kesî re nehêlin. Ji ber vê yekê di civaka xwezayî ku dayîka xwedavend lê hakim e perwerde, yek ji xebatên esas a jinê bû. Jin ne tenê zarokan, hemû civakê perwerde dikir. Bi taybetî xwedavendîtiya di qada ol û baweriyê de, jina bi raz zarokan diwelidîne, hilberîneriya wê, bi berhevkariyê xwedîkirina civakê, bi dermanan başkirin hurmeteke mezin ava dikir. Civak fêrbûna ji jinê nedikir mijara xirûrê.

Di bin zext û êrîşên zêde yên saziyên fikra baviksalarî de, di perwerdekirina zarokan û civakê de cihê jinê guherî. Bi mîtolojiyan li hember wê şer dihat kirin û bedena wê bi du parçeyan dihat parvekirin, bi îmgeyên dayîka xwedavend di jiyana civakî de beden û ruhên jinan bi du parçeyan dabeş dibû. Mafê perwerdekirina zarokan êdî ji jina dayîk zêdetir di saziyên perwerdeyê yên avakirî de bû. Bi demê re ket rewşeke wisan ku tiştên di perwerdeyên fermî de cî nedigirtin wê weke xurafe bihatina nasandin. Zarok, destpêkê zarokên kurik, destpêkê ji venêrîna dayîkê, piştre ji venêrîna civakê wê biketana venêrîna hêzên dewletparêz û desthiltparêz. “*Di tevahiya dîroka şaristaniya civakê de bi amûra perwerdeyê ya dewlet û desthilatiyê, di şerê li hember xwe dida meşandin de mirov dikare bi rihetî diyar bike ku herî zêde derbe xwariye. Mafê perwerdeya civakan, mafên herî zor ên tên pêkanîn in.*”**(110)** Dewletê ev mafê ku pêkanîna wê herî zehmet e desteser  kiriye. Bi hezaran salan e ji temenê destpêkirina dibistana seretayî, heta pergala perwerdeyê, wê çawa rabin rûnên dewlet bi darê zorê bi zarokan dide hînkirin. Ya rastî em di halê nûjen ê efsaneya Kawa de ne. Lê rojê ne du ciwan, bi milyonan ciwan ji vê pergala perwerdeya cinawirî re tê dayîn. Ev pergal bi rastiya “şekilgirtina bîrdozî ya herî xetere ku zêhnan dinepixîne (pirolekirin), bêruh dike her wiha pêşketina ruhî ziwa û vala dike û bedenên ter û taze dihêre. ”**(111)** Zîhnên bi dogmayan diqerisin tên avakirin û zêhna vekirî ya mêjiyan tê tunekirin.

Pergala perwerde û dibistanê ya mafê perwerde û mamostetiyê bi xespê ji jinê girtiye û ava kiriye îro li ber qeraxa îflas û qedandinê ye. Dibistanên taybet ku li ser navê alternatîfa vê derketin, mafê perwerdeyê ku yek ji mafê herî pîroz ê mirov e bi pereyan stendin û xistin rewşa meta, di ser vê re qezenckirinê hedefa destpêkê qebûl kirin. Pergala perwerdeya fermî û dibistan bi afirandina yekdestiyê, zanîna li derveyî dibistanên fermî, perwerde û mamoste rewa nehesiband in. Lê bi taybetî li Rojhilata Navîn, bi hezaran sal terîqet, dergah, xelwextxane (manastir), tekke, medrese û hwd. bûne mekanên dibistanan. Ev qas cêribandin û daneheva perwerdeyê ya civakê tune hesibandin bi îdeolojiya deshilatparêz ve girêdayî ye. Desthilatî, pergala perwerdeyeke bikaribe xwe berdewam bike rewa dibîne û dimeşîne. Lê heta sedsala dawîn jî dibistanên perwerdeya fermî û saziyên perwerdeyê yên li gor pêwîstiyên civakê di nav hev de pêş ketin. Lê bi sedsala 20. re

*pêkanîna hebûna civakê, ketiye dema herî zehmet a dîrokê.*”**(112)** Tam jî di vê kêliya herî zor de, divê feraseta perwerdeya jinê, daneheva dewlemend a derbarê têkiliya mamoste û şagirt de bixe dewrê, mafê perwerdeyê ku mafê herî bingehîn ê hebûna civakê ye ji nûve li ser navê civakê qezenc bike.

Pêwîstiya civakê bi dilnizmiya jinê ya di perwerdeyê de, jîrekiya wê ya hestiyar û hezkirinê heye. Perwerdeya civakê girtina ser xwe dil û hezkirineke mezin dixwaze. Dibe ku ji ber vê yekê ye koka têgîna “perwerde” ji “Perwer” a hem di Kurdî de hem di Farisî de di maneya “xwedîkirin, parastin û hezkirin”ê de ye. Tê maneya per-bask. ‘Wer’ bi baskbûn, bi maneya ketina bin baskan e. Ya rastî perwerdekirina mirovekê/î, wê/î bibask-kirin, her wiha maneya bi firê xistinê jî dide. Ev taybetî hemû, ji taybetiyên bingehîn ê dayîka xwedavend e ku ji dema xwedavendan ve em dizanin. Jina dayîk, bi hezaran sal hemû mirovahiyê weke zarokên we xwedî kir, parast, hez kir û girt bin baskên xwe. Weke çivîkên çêlikên xwe yên hê bi bask nebûne fêrî firînê dikin, mirovahiyê fêrî bibaskbûn û firandinê kir. Hedefa Jineolojiyê, têgîna “perwerde”yê ku dîrok û cewhera faliyeta perwerdeyê îfade dike li gor maneya wê jiyanî kirin e. Yanê di serî de zarok û ciwan, wan ji pergala perwerdeya cinawirî ya moderníteya kapîtalîst parastin, bi hezkirin perwerdekirin, bi nirxên civakî û felsefeya azadiyê xwedîkirin e. Wan û hemû civakê girtina bin baskên xwezaya bi dad a jinê ye, bi perwerdekirinê bibaskirin û firandin e.

Di dinyaya roja me ya îro de yek ji qadên ku mirovan bi pergalê ve girê dide jî, herî kêm bi qasî qada tendirustiyê, perwerde ye. Şertê yekemîn ê xwedî pîşe bûnê, hurmetê û di hevrikiya kapîtalîst de cî girtinê, êdî bawernameya zanîngehê ye ku êdî ji marka (nîşan) û etîkêtê pêk tê. Zarok ji bo vê qezenc bikin, ji 7 saliya xwe ve weke hespê pêşbirkê di kulvarên pergalê de tên bezandin. Yên di vê pergala perwerdeyê de serkeftî nebin, demxeya korîzantiyê û neserfiraziyê dixwin û hewl didin bi vê demxeyê di jiyana civakî de cihê xwe bigirin. Pergal dixwaze di têgihîştina civakan de weke perwerdekirî an neperwerdekirinê bi parçeyek kaxiz nîşan bide biafirîne, esas hedefa wê zarok û ciwanan ji civakê qutkirin e ku bi rêjeyeke girîng vê bi ser dixe. Dîsa hedefeke wî, dûrxistina civakê ji saziyên wê yên perwerdeyê û ji kevneşopiyên wê ne. Di merhaleya em gihanê de, di vê de jî bi rêjeyeke girîng serketiye. Ev her du sedemên ku civak zêdetir winda kiriye bi serê xwe pêwîst dikin ku Jineolojî, perwerdeyê mîna qadekê bigire dest û pêş bixe.

Ji bo afirandina civaka exlaqî û polîtîk, yek ji faliyetên sereke yên jinan perwerde bûye. Hêza wê ya perwerdekirin û fêrkirinê bûye. Ji ber vê sedemê, îro jî weke divêtiya avakirina civaka exlaqî û polîtîk Jineolojî, wê saziyên perwerdeyê yê civakê ava bike û her cure xebatên akademîk û teorîk pêş bixe.

Ji aliyê din ve jî ji bo avakirina qadên din û afirandina kadroyan, Jineolojî divê faliyetên berfireh ên perwerdeyê bigire dest. Îro qada perwerdeyê ku ji bo her qada jiyanê pêwîstiyeke jiyanî ye, pirsgirêka hebûn û tunebûnê ye, divê bi nêrîneke Jineolojîk were pêşxistin. Jina ku şagirta destpêkê ya xwezayê bûye, daneheva zanistî û teorîk a moderníteya demokratîk, di aborî, ekolojî, demografya, polîtîka, etîk û estetîkê de, di tendirustî, dîrok û qadên din ên wê pêş de pêwîstî pê hebin de, encax dikare bi pergaleke perwerdeyê ya pir berfireh bi afirîne. Dema ku vê pergala perwerdeyê bi civakê re ava kir, jixwe wê ew mêjiyên ku pergala kapîtalîst qetil kirine rizgar bibin û wê zîhneke vekirî bi wan bide qezenckirin. Zarok û ciwanên zîhnê wan vebûne, avakirina civaka exlaqî û polîtîk wê weke pirsgirêka hebûnê watedar bikin. Perspektîfa Rêber Abdullah Öcalan ya dibêje; “*Pirsgirêka perwerdeyê, çawa ku di cewher de saziyên (çaviyên) exlaqî û polîtîk ên civakê pêwîst dike, erka exlaq û polîtîkayê jî esas perwerdeya civakî pêk anîn e. Civaka xwe perwerde neke, wê derfeta wê ya exlaqa xwe ya cewherî û saziyên polîtîk pêş bixe û li ser piyan bihêlê ji holê rabe. Nikare xwe her tim ji jiyana di bin xeteriyê de, rizîbûn û belavbûnê rizgar bike.*” bi civakê re nîqaş bike, pêdiviyên wê, di qada perwerdeyê de, dîsa bi hemû beşên civakî re bi rêxistin dike.

Jineolojî ji bo vê guherîn û veguherînê biafirîne, bi feraseteke perwerdeyê ya xweseriya her qadî û bi peywendiya bi qadên din re divê pêş bixe. “*Di vê derê de*

*hemû, her qad, desthilatî, têkoşîna polîtîk, aborî, jin, hawirdor, pergal weke goşt û neynûk di nav hev de ne. Tu nikarî yekî tune bihesibînî. Tiştê ku sosyalîst fêm nakin ev e. Ê vana jiyana wan a taybet cuda, aboriya wan cuda, têkoşîna wan a polîtîk cuda dixebite.*" Dersên ku wê Jineolojî ji vê rexneya ku Rêber Abdullah Öcalan pêş xistiye derxînin pir girîng e. Weke mînak miroveke/î di akademiya aboriyê de perwerde bibîne, mecbûr e qadên aborî û ekolojî, aborî û demografya û hwd. zanîna qadên aboriyê bandor dikin û ji aboriyê bandor dibin jî bigire. Mirov bernameyên perwerdeyê li gor vê amade bike, li dijberî nexweşîna parçekirinê ya pozîtîvîzmê wê di heman demê de bibe pêşxistina tedbîra îdeolojîk jî.

Perwerdeya ku wê di bergeha Jineolojiyê de pêş bikeve, mijareke girîng jî mekanên perwerdeyê ne. Mekan, vebûna têgihîştin û zêhnê mirov, an teşwîq dike yan jî digire. Di serkeftina perwerdeyê de faktoreke girîng e. Carna mekanê perwerdeyê ji aliyê qada zanistî ya wê têde perwerde bê dîtin diyar dike. Weke mînak di navbera perwerdeyeke ekolojiyê ya li qatên avahiyên sar û perwerdeyeke ekolojiyê ya li gundekî, li qeraxa golekê were dîtin, bi qasî çiyayan cudahî heye. Yan jî mekanên perwerdeya tendirustî û demografyayê pêwîst dikin, dem bi dem ji aliyê xweseriyên van qadan ve tên diyarkirin. Bi qasî mekanê dema perwerdeyê jî mijareke girîng e. Perwerdeyeke derbarê qadekê de jêravahiyeke girîng, têgihîştin û veguherîna zîhniyetê neafirîne wê ne perwerdeyeke serkeftî be. Perwerde, vê yekê di kes û civakan de, di komunan de dikare di çiqas demê de biafirîne divê esas bigire.

Derbaskirina pergalên perwerdeyê yên weke cewher û şekil mirov jixwe, ji civak û derdorê biyanî dikin, mirovên bi dewlet û hiyerarşiyê ve girêdayî ava dikin, li hemberî vê yek ji rêbazên herî bibandor, her civakek li gor xwezaya xwe, pêwîstî û şertên xwe yên xweser avakirina saziyên xwe yên perwerdeyê yê. Dibistan û akademiyên li ser vê esasê rêxistinkirin e. Di dîroka Rojhilata Navîn de hêzên şaristaniya demokratîk, her tim alternatîfên xwe pêş xistine. Pergalên perwerdeya pêxemberan, dibistanên fîlozofan, qadên tesawifê, dergah, ocax, terîqet, medrese, mezheb, xelwetxane, tekya, mizgeft, dêr û perestgeh bûne saziyên perwerdeyê yên alternatîf ên civakê. Jineolojî van û cêribandinên cuda yên di dîroka jinê de di tarîtiyê de hatine hiştin lêkolîn dike. Dema pergala xwe ya perwerdeyê ava dike, nirx û wateya ji van cêribandinan derxistî, wê li sazîbûyîn û zîhniyeta xwe, li rêbaz û amûrên xwe zêde bike. Li şûna rastiya perwerdeya heyî model bigire, wê ji cêribandinên dîrokî xwedî bibe û avahîbûnên resen pêş bixe. Mijarên weke xebitîn, bername, têkiliyên mamoste û şagirt, tevlîbûna beşên cuda yên civakê, wê bi esasên demokratîk ava bike. Ji bo ev pergala me ya perwerdeyê teorîk nemîne divê faliyetên pratîk ên piralî pêş bikevin.

Xebatên perwerdeyê yên bikaribin bibin layiqî sehek û hestên Rêber Abdullah Öcalan yên dibêje "*Bila jin azad bibe, pêş bikeve. Jin jiyanê çêdike, bedew dike*" bi beşên cuda yên civakê re pêşxistin, ji hedefên bingehîn ên Jineolojiyê ne.

**POLÎTÎKA**

"*Eger erka exlaqê herî baş kirina karên jiyanî be, erka polîtîkayê jî peydakirina karên herî baş e. Mirov bala xwe bidê, hem aliyê exlaqî yê polîtîkayê heye, hem jî zêdetir di hindirê xwe de dihewîne. Karên baş dîtin ne hêsan e. Pir baş naskirina karan, yanê zanîn û zanistê dixwaze, yek jî pêwistî bi dîtin yanê lêkolînkirinê heye. Dema têgîna baş jî tevlî vê dibe, pêwistî bi zanîna exlaqê jî heye. Weke tê dîtin polîtîka hunereke pir zehmet e. Polîtîkaya rast di pênaseya xwe de veşarî ye: Berjewendiyên jiyanî yên civakê, ji bilî azadî, wekhevî û demokrasiyê tu koma têgînan nikare rave bike. Wisa be polîtîka bi esasî, civaka exlaqî û polîtîk, di her şert û mercî de ji bo vê wesfa xwe yan jî hebûna xwe berdewam bike, çalaksaziya azadî, wekhevî û demokratîkbûnê ye.***(113)** *Di xwezaya polîtîkayê de azadî heye. Civak û neteweyên ku polîtîk dibin ew civak û netewene ku azad* dibin."**(114)**

Jineolojî, jina dayîk a hêza sereta ya civakîbûnê ye weke afirînera hunera

polîtîkayê digire dest û wisa dest bi lêkolîn û vekolanên xwe yên di vê qadê de dike. Birastî jî ya ku bi deh hezaran sal ji bo civakê ya ku karên baş keşif kiriye û pêk aniye ew bû! Ji serî ve dijbertiya hebûnî ya wan a beramberî hev dibe sedema şerê di nav bera civakîbûna li derdora jina dayîk pêş ketî û yê şaristaniya dewletparêz û deshilatparêz de ku ji serî de ev şer qewimiye. Polîtîka çawa bi azadiya civakî û jiyanîbûnê ve têkildar be, dewlet jî ji bo civakê bike kole, bi afirandina argumanên îdeolojîk, polîtîk û çalaksaziyê ve têkildar bû. Ji bo dewlet pêş biketa, yanê li ser navê tevahiya civakê vîn, gotin û biryar di destê çend kesên desthilatparêzan de kom bibûya, pêwîst bû polîtîka bihata tengkirin, qada wê bihata sînorkirin. Ji bo vê jî, yekeyên civakî yên bingehîn ku civakê didin jiyankirin û çavkaniyên wan, diviyabû bihatana tunekirin. Civaka exlaqî û polîtîk a di bingeha çanda xwedavendîtiya dayîkê de pêş ketî, tevahiya 2 hezar salan bi êrîşên bêeman re rû bi rû mabe, çavkaniya xwe ji vê digire; hebûnên wan ên bi nakok ên bi avahiya dewletparêz a dixwaze li şûna wê pêş bikeve. Di vê maneyê de “qedandina polîtîkayê”**(115)** weke pirsgirêkeke civakî ya bingehîn derdikeve; mîna tunekirina azadî û çaviyên civakî dikeve bergeha Jineolojiyê.

Jineolojî bi îdîaya xwe ya bibe zanisteke civakî ya nû, aboriyê, ekolojiyê, demografyayê, etîk û estetîkê, tenduristiyê, perwerde û dîrokê digire bergeha xwe û pêş dikeve, heta zanista polîtîkayê pêş nexe nikare bi ser bikeve. Ji ber ku di tevahiya van qadan de karên baş ên wê bike divê diyar bike. Yanê derbarê van qadên zanista civakî de, pêwîst e polîtîka pêş bixe. Di qada aboriyê de pêwîstiyên bingehîn ên civakê çi ne? Çawa tên bicîanîn? Ji bo ev werin bicîanîn, karên baş ên divê werin kirin çi ne? Di qada tenduristî û perwerdeyê de karên baştirîn ku wê pêwîstiyên civakî bi cî bînin çi ne? Weke vê, di hemû qadên dikevin bergeha Jineolojiyê de, Jineolojî; van pirsan, bi nêrîna azadîxwaz û bêyî ku ji rêgezên exlaqî yên bingehîn qut bibe, divê bi zanistî ji nîqaşê re veke. Weke zanista civakî ya wê zanista polîtîkayê xwe bispêrê, divê xwe vesaz, ava bike.

Ji ber ku polîtîka ji erka xwe û wateya xwe hatiye dûrxistin, li hemû dinyayê, bi giranî jin û ciwan  ji polîtîkayê hez nakin, heta bi nefret nêz dibin . Di bingeh û cewhera xwe de jî bi muxatabên esasîn ên polîtîkayê re yanê bi beşên civakî re ji ber qutkirina tayên wê ne. Her ku jin û ciwan, yanê hêzên herî dînamîk û azadîxwaz ên civakê, xwe ji polîtîkayê dûr bixin, biryar û mekanîzmayên boçûna jiyana civakî diyar dikin, bi berdewamî di yekdestdariya şaristaniya dewletparêz û desthilatparêz de dimînin.

Ji bo polîtîkayê ku mirov dikare bibêje xwe bi xwe birêve birina civakê jî, têgînek e ku bi azadiyê re bi têkiliyeke zeximtir pêş dikeve. Xwe zanîna civakê, nas kirin, pênase kirin û destpêkirina çalaksaziya derbarê xwe de ye. Polîtîka di heman deme de rojane ji bo pirsgirêkên xwe bi asas girtina exlaqê pêşxistina çareseriyê ye.Ya rastî em dikarin bibêjin, sînordarkirin, ji holê rakirin an jî guhertina diyardeyên ku herikîna azadîxwaz a xwezayî ya jiyanê disekinînin, berfirehtir û mezinkirina vîn û çalakiya yên vê herikînê xurt dikin e.

Eger em polîtîkayê wiha pênase bikin; em dikarin baştir watedar bikin ka çima Jinolojî divê vê qadê bigre nav xwe. Bêguman zanista polîtîkayê qadeke pir berfireh e. Ev pirtûk, tenê bi xetên sereke nêzikahiya me ya polîtîkayê, nêrîna me ya li ser wê û rêgezên bingehîn ê destgirtina vê qadê ya Jineolojiyê wê diyar bike. Jineolojî, wê ji lêkolînkirina pênaseyên polîtîkayê yên di merhaleyên cuda yên dîroka civakî de hatine pêşxistin bigre, di civaka xwezayî de ev pênase hebûye yan tune bûye ji vê serbixwe, heta pêkanînên bi hostayî yên polîtîkayê, wê bi nêrîna jinê li ser gelek diyardeyan bisekine. Hem di wateya giştî de civak çawa li derveyî polîtîkaya weke çalakiya xwe ya cewherî ye hatiye hiştin, hem jî jinan vê pêvajoyê çawa jiyane wê lêkolîn bike. Di civakê de, pêşî di jin û ciwanan de hişmendiya pênase û têgihîştina polîtîkayê pêş dixe. Polîtîka rastiyeke civakan a jiyanî ye ku wê tu car dest jê bernedin û ji bo bikaribin têkoşîna paradigmatik û zanistî pêç bixînin wê argumanên vê ya derxînin holê.

Di dîroka civakî de wateya polîtîkayê çi bû? Çawa hat jiyankirin? Xwezaya

civakî, di eslê xwe de exlaqî û polîtîk e, ev tê çi wate yê? Jineolojî, heta ku têgihîştina polîtîkayê ya wê hemû beşên civakî bi rengên xwe wê têde cî bigirin, takekes bi vîna xwe ya cewherî beşdar bibin pêk bîne, wê derbarê polîtîkayê de gelek pirsên din bipirse û di asta zanistî û akademîk de bersivan pêş bixe.

Jineolojî dema diyardeya polîtîkayê lêkolîn dike; wê hewl bide dahûrîne, kî an jî çi ji vê asta biyanîbûna di navbera civak û polîtîkayê de tê jiyankirin berpirsiyar in. Ji aliyê rêgezên destpêkê ve Jineolojî, wê bi zanîna polîtîka bi şêwazekî bê civakê nikare çêbibe, nêz bibe. Eger polîtîka, ji bo civakê afirandina ya baş, rast û xweşik be; civak bixwe wê vê baştir bizanibe. Di vî warî de azadiya nîqaşê ya civak û kesan, derbarê jiyanên xwe de di maneya rastîn de aşkerekirina vîna xwe, ji bo polîtîka bigihê wateya xwe ya rastîn şertên bivê nevê ye. Heta ku feraseta polîtîkayê ya xwe dispêre dewletparêziyê û hînbûyînên ku polîtîka weke amûreke xapandin û çewisandinê tê bikaranîn neyê hilweşandin; wê civak her tim li derveyî polîtîkayê bimîne, bibe objeyeke polîtîkayê. Ji bo ev neyê jiyankirin, civak û kes divê dinyaya xwe ya zîhniyetê pir xurt amade bikin. Erka Jineolojiyê jî di vê derê de derdikeve holê. Di asta zîhniyetê de ji qada polîtîkayê re amadekirina civak û kesan. Di encam de Jineolojî, zanisteke ji bo hedefa jiyana azad, civak û kesê azad pêk bîne pêş dikeve. Aşkera ye ku azadî jî heta nebe xwedî polîtîkayeke rast, nikare pêş bikeve.

Zanista jinê, çiqas asta exlaqî û zanistîtiyê qezenc bike û bi civakan bide qezenckirin jî, eger polîtîkayên civakîbûnê di bingeha azadî, wekhevî û demokrasiyê de, di zîhniyetê de pêş nexe wê bêwate bibe. Jineolojiya ku wê bi qutnekirina girêdanên exlaq, zanist û polîtîkayê pêş bikeve, di qada zanistên civakî de dikare derbarê pirsgirêkên azadiya jinê de çareseriyan bîne. Lê na heke hemûyan ji hev qut, bê girêdan bigire dest, wê bibe ji wan bêhejmar hewldanên di sînorên zanînên desthilatiyê de winda bûne.

Jineolojî tespîta dibêje; "*Li Rojhilata Navîn di tarîtiyê de hiştina rastiyan, erkeke girîng a perwerde û polîtîkayê ye. Heta ev bi serfirazî pêk neyê hunera desthilatiyê nayê bicîanîn. Xerabûna sêhrê ji rohnikkirinê derbas dibe.*"**(116)** digire ber çav û xebatên hişmendiya diyardeya polîtîkayê û polîtîka li hember civak û jinê çawa tê bikaranîn pêş dixin plan dike. Jineolojî, bi pêşxistina avahiya zîhniyeta xwe dispêre zanista civakî, hîmên ku wê hunera polîtîkayê li ser pêş bikeve bihone.

Têgihîştina polîtîkayê ya jinan, bi qasî xwe dispêre cêribandinên pir cuda, bandorên têgîn û diyardeya polîtîkaya ku pergalên desthilatparêz pêş xistine jî dihewîne. Ji ber vê sedemê, dîroka pêşketina têgihîştina polîtîkaya kes û tevgerên ji bo azadiya jinê têkoşiyane jî hêjayî lêkolînê ye. Lê hemû ev lêkolîn û vekolan wê bigihên heqîqeta ku têgîna polîtîkaya civakî û hemû hebûnên ji bo azadiyê pêwîst in divê polîtîka pêş bixin. Ji ber ku trajediyên bingehîn ên dîroka me ya jinaniyê yan jî travmayên wê jî girêdana xwe bi vê rastiyê ve heye; bêparbûna ji hêza polîtîkaya ku berjewendî, başî û feydeyên cinsê me li ber çav digire. Ev, ji cinsîtiya me dest pê dike ber bi em ê çawa bijîn û bimirin ve diçe û heta em ê çend zarok bînin berfireh dibe. Rastiyeke ku em jin, pênc hezar sal in ji mekanîzmayên nîqaş û biryarê yên ji bo hebûna me ya cewherî, hewcedariyên me yên madî û manewî, xeyalên me pêwîst in, bi sîstematîkê bêpar tên hiştin. Her wiha ji bo hêza me ya fikrî ya cewherî, xebatên me yên hevpar, weke di destpêka civakîbûnê de em karên berjewendiyên jiyanî yên civakê keşif bikin û serfiraz bibin, em her tim dûçarî astengiyên desthilat û dewletê dibin jî rastiyek e.

Wisa be ji bo jinan polîtîkayeke rast peydakirin û pêkanîna karên ku dawiyê li vê rastiyê bînin, di heman deme de guherandin û li ser asasê wekhevî û azadiyê ji nû ve vesazîkirin e. Ji bo civaka exlaqî û polîtîk a em ê bikaribin li derdora jinê jinûve pêş bixin ev şert e. Em êdî zêdetir vê paşve bavêjin, jinedîtîve werin û bijîn; tê wê maneyê ku em dibin hevparê sûcên takekesiya lîberal a civakê hildiweşîne, atomîze dike û li hember hêzên desthilatiyê berxwedaniya wê dişkêne. Mirov polîtîkaya civakî biafirîne û pêk bîne, ev wê bibe jehrkuja takekesiyê û modernîteya kapîtalîst a qirkirina civakê pêk tîne. Di vî warî de hemû jin, aliyên neyînî yên cêribandinên jiyane, dikarin bi dersên xurt veguhêzin. Aliyên erênî jî weke çalakiya afirandina

civaka demokratîk û azad, tevlî pêşketina polîtîkaya civakî bikin. Em jin, dikarin dawî li lîstoka pergalên dewletparêz bînin ku polîtîkayê dijberî civakê yan jî civakê li derveyî polîtîkayê dihêlin. Bi qasî pirsgirêkên herî bingehîn ên civaka me, tu kes bi qasî me bi çareseriyên wan nizane.

Wê demê pêkanîna çalakiya hişmendiya bi exlaqê re, yanî ji bo azadiya xwe pêşxistina polîtîkayê, di têkoşîna Azadiya jinê de divêtiya rêgezên hevgirtiye jî. Jineolojî, ji bo polîtîkaya civakî pêş bixe; bi qasî her tim nîqaş, lêkolîn û vekolanê, li ser esasên daneyên wê ev derxin holê di civak û kesan de pêşxistina asta hişmendiyê jî esas digire. Derbarê hêza xwe bixwe rêvebirina civakê û bi dest xistina kêrhatîbûna jihevderxistina pirsgirêkan de her wiha gihandina mekanîzmayên bi kar anîna vê hêzê û kêrhatîbûnê, ji bo rol girtin û bi nêrîna jinê pêşxistina zanistên civakê di wateya elîfbê de ye. Ji ber ku zanist, tenê dema bikaribe ji bo hewcedariyên civaka me bersivan biafirîne wê çaxê zaniste. "*Exlaqa me weke wicdana dîrok û civakê, ji her demê zêdetir meşandina polîtîkayeke bi hişmendiyeke wiha, fermana guherîn û veguherîna civakî ku bi rêya vê tê xwestin û pêşdîtin dide.***(117)** Eger em azadiyê dixwazin, diyar e weki din çareya me tine ye ji bilî ku em di serî de exlaq, ku wijdana kolektîv a civakê ye, û polîtîka, weke aqilê hevbeş, bi hemû aliyên wan û bi hêza xwe ya rewşenbîrî, rakin ser piyan û wan bikin. "**(118)**

**Jêrnot:**
**(98)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(99)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(100)** Ji Nameya ji bo KJB'ê hatiye şandin 7'ê berfanbara 2013'an / Abdullah Öcalan
**(101)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(102)** Ji Dewleta Rahip a Sumer Ber Bi Şaristaniya Demokratîk I /Abdullah Öcalan
**(103)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(104)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(105)** Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan
**(106)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(107)** Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan
**(108)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(109)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(110)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(111)** Ji Dewleta Rahip a Sumer Ber Bi Şaristaniya Demokratîk I /Abdullah Öcalan
**(112)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(113)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(114)** Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan
**(115)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
**(116)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(117)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
**(118)** Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan

**ENCAM**:
"*Heqîqet,* di bingehê xwe de tevahiya serdeman, rewşa manedariya civakî ya di serwextbûna mirov de gihiştiyê, îfade dike. Bi rêyên mîtolojîk, dînî, felsefî, hunerî û zanistî xwe îfadekirin û ji bo xebata di vî warî de em dikarin, lêkolîna heqîqetê û anîna wê ya ziman, bibêjin. Civak bi tenê ji heqîqetan nehatine hûnandin, di heman demê de hêza ravekirinê ne jî. Civaka nikaribe heqîqeta xwe diyar bike, ketiye rewşa herî giran a koletiyê, asîmîlasyon û qirkirinê. Di navbera wate û heqîqetê de têkiliyeke xurt heye. Wate, bi awayekî potansiyela heqîqetê ye. Ev potansiyel çiqasî were

gotin. .”

Em ji aliyê têkoşîna azadiya jinê ve li vê nirxandina Rêber Abdullah Öcalan ya heta bibêjî girîng, bifikirin. Li hemberî dinyaya mêr a serwer ku tu carî dev ji berxwedaniyê bernade, bi hezaran sal di encama têkoşaneke bêhempa de wate û nirx daye hev. Ji bo ev dinyaya wateyê bi heqîqet bibe, yanê bi ziman bibe divê bigihê civakê. Ji bo bigihê civakê, tevgerên jinên dinyayê, wê Jineolojî bibe pireha vê dîdariyê. Wateyên em ê biafirînin, wê bi zanistên ku qadên Jineolojiyêne werin ser ziman û biherikin. Keda jinê ya afirîner bi zanista aboriyê, jirekiya wê ya bi sehekan û dinyaya wê ya hestiyar bi etîk û estetîkê, hêza wê ya hezkirin, eşq û azadiyê bi hevjiyana azad, zanyariya wê bi demografya û ekolojiyê, hestiyarî û berpirsiyariya wê bi polîtîkayê biherike. Wateyên di van qadan de kom bûne wê bibin heqîqet. Jineolojî hatina ser ziman a keda bi wate ya dîroka jinaniyê ye.

Ev hatina ser ziman di heman demê de bikaribe ji pirsgirêka rizgariya jinê re bibe çareserî wê pêş bikeve. Jineolojî, bi tezên derxe, jiyana ji jinê re nayê jiyankirin azad bike wê bibe heqîqet. Em ê binê vê îdîayê çawa tije bikin, di girîngiyeke stratejîk de ye. Û pir bi cidiyet, teorî, bername, rêxistinbûn, çalakvanî û kadrobûyîn divê. Jin, “*ji cinsiyetê wêdetir, wateyên ku aliyên wê yên aborî, civakî û siyasal ên berfireh hene dihewîne*”**(119)** ev rastî, encax dikare wê demê weke heqîqet were pejirandin.

Rêber Abdullah Öcalan bi gotina; “*Aqlê jinê yê bi hestiyarî, ji aliyê aqlê mêr ve her tim tê xwestin weke ‘kêm’, kesayeta jinê bixwe were teyisandin. Aqlê mêr, li ser jinê çend operasyonên mezin meşandiye, dimeşîne”* van operasyonan wiha rêz dike. *“Ya yekemîn wê kiriye weke koleya ewil ya yekemîn. Ya duyemîn, wê kirine amûra seksê. Ya sêyemîn, kedkara bêheq, bê beramberiyekê ye. Ya çaremîn, wê kirine metaya herî narîn ‘keybanûya metayan e’*.”

Yek ji hincetên derketina Jineolojiyê; ji operasyonê aqlê mêr li ser jinê pêk aniye, bi jîrekiya bi sehekan û hêza jinê ya hestî afirandina bersivan e. Li hember koleya malê bi pêşxistina zanista demografyayê, bi afirandina vîna azad a jinê û hêza xwedîderketina li bedena xwe wê bibe bersiv. Wê tola xwe bi pêşxistina teoriya hevjiyana azad ji kirina amûra sekse bigire. Bersiva wê ji kirina karkera bêheqdestiyê re bi deste jinê bi pêşxistina zanista aboriyê be ku demekê aborî ji karên cewherî yên jinê bû. Ji kirina keybanûya metayan re, wê bi pêşxistina zanista etîk û estetîkê bibe bersiv û bedewiya jina civaka xwezayî  wê bike taca serî. Bi tevahî bi pêşxistina Jineolojiyê wê bi zîhniyeta cinsparêz a civakî re bikeve nav hesappirsînekê.

Weke zanisteke jiyana civakî, wê Jineolojî bi civakê re pêş bikeve. Teşiya jinan a bi hezaran  salan e dizivire, îcar wê ji bo Jineolojiyê birêse bizivire. Dezgahên wê yên qet xera nabin, ji kokê ve hilnaweşin, îcar di meclîsên gel, komunan de, di akademiyên çand û hunerê, aborî, ekolojî, siyaset, tendirustî û wêjeyê de, li gund û taxan, di zanîngehan de wê saxlemtir werin avakirin. Pêwîstiya jiyana civakî bi çi hebe wê ev dezgeh wê bihonin. Em ê bi nîqaşên kollektif biryar bidin bê zanista jinê çawa, bi kîjan aqlê bi sehek û hestiyar, bi jîrekiyan û bi kîjan destên bi huner û marîfet wê bê honandin û di encama vê de em ê bare hev hêsan bikin. Em ê li bajar û çolteran akademiyan ava bikin da ku em bikaribin van nîqaşên xwe bi azadî bimeşînin.

Bi bişkêfîna tevnên çarenûsa li eniya me hatine honandin; em ê dinyaya jinê, pêşeroja jinê, weke dinyaya xweş û azad a zarokan, bindestan û hemû mirovan, ta bi ta bineqişînin. Hundirê hemû saziyên kemîn ên nûjen û kevneşop, ên Mardûk û Enkiyan li ser serê me, musakkattîman vala bikin û em ê perestgehên xwe yên azad, mal û dibistanên xwe, dergah û baxçeyên xwe ava bikin. Argumanên me yên xwezaya jinê û tevgera azadiya jinê, weke hêza sereke ya modernîteya demokratîk wê hîn xurttir motîve bikin, ji kavilên lê hatine binerdkirin û tarîtiyan derxin.

Çawa ku bi hezaran sal beriya niha civaka exlaqî û polîtîk li derdora jinê bi rêxistin bûbe, di sedsala 21. de jî şaristaniya demokratîk wê li derdora jina ronî bûye, rêxistin bûye û ji bo azadiyê têdikoşe wê bi rêxistin bibe. Jin wê civakîbûna xwe bi hêzên bingehîn ên modernîteya demokratîk re di nav hevgirtinê de jinûve biafirîne. Ji bo vê afirandinê, teşiya jinê bi hiqûqa jina dayîk, li Rojhilata Navîn a gelek destpêkên

jiyana civakî lê hatine jiyankirin, îcar ji bo ku Jineolojiyê birêse dizivire.

**Jêrnot:**
**(119)** Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan

**ÇAVKANÎ**

1) Şaristanî - Serdema Qralên Piştperdeyê û Xwedayên bi Maske / Abdullah Öcalan
2) Şaristaniya Kapîtalîst - Serdema Qralên Tazî û Xwedayên Bêmaske / Abdullah Öcalan
3) Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê / Abdullah Öcalan
4) Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk / Abdullah Öcalan
5) Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî de – Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk / Abdullah Öcalan
6) Parastina Gelekî / Abdullah Öcalan
7) Ji Dewleta Sumer a Rahiban Ber bi Civaka Demokratîk I-II /Abdullah Öcalan
8) Dahûrandinên YAJK û Partîbûna Jinê / Abdullah Öcalan
9) Çağlar Boyunca Büyük Kadınlar / Carol Prunhuber, Lynn Thoreau
10) Feminist Epistemolojilere Giriş / Alessandra Tanesini
11) Vikipedia
12) Alevi –Bektaşi Kadın Dervişler / İbrahim Bahadır
13) Felsefe Sözlüğü (Ferhenga Felsefeyê) / Ahmet Cevizci
14) Tanrilar Kadinken (Dema Xweda Jin Bûne) Merlîn Stone
15) Batı Düşüncesinde Dönüm Noktası / Fritjof Capra
16) Dinsel İnançlar ve Düşünceler Tarihi / Mircea Eliada
17) Feminist Teori / Josephine Donovan
18) Kuran’ı Kerim
19) İncil
20) Tevrat